# RASTIYA RÊBERTIYÊ

Hevalê Cuma

WEŞANÊN AKADEMIYA ZANISTÊN CIVAKÎ YA ABDULLAH OCALAN

Cihê Çapkirinê: Çapxaneya Azadî
Dîroka Çapkirinê: 2011

NAVEROK...

ÇÊBÛN Û ROJBÛNA RÊBERTIYÊ ........................................ 07
Dî Dîrokê De Pêşengtî ........................................ 08
Di Kurdistanê De Rola Pêşengtiyê ........................................ 11
Derketina Rêber APO Li Hemberî Tinekirina Kurdan e ........................................ 14
Rêbertiya Apoyî Pêşengtiya Nirxên Komînal û Demokratîk e ........................................ 16

DI ÇÊBÛN Û ROJBÛNA RÊBERTIYÊ DE QONAXA YEKEMÎN ........................................ 17
Li Vê Jiyanê Îxanet Hatiye Kirin ........................................ 18
Di Rastiya Rêber Apo De Hevaltî Esas e ........................................ 21
Di Rastiya Rêber Apo De Sînorên Heqîqetê Nîne ........................................ 22
Di Rastiya Rêbertiyê De Lewazî Dibe Sedema Bihêzbûnê ........................................ 30
Lêgerîna Rêbertiyê Ji Bo Avakirina Civakê Ye ........................................ 33

DI ÇÊBÛN Û ROJBÛNA RÊBERTİYÊ DE QONAXA DUYEMÎN ........................................ 37
Çavkaniya Hêzê Mirov û Gel Bi Xwe Ye ........................................ 40
Pêşengtiya PKK'ê Bi Temamî Xwe Fedakirin e ........................................ 41
Avabûna PKK'ê Ber Bi Jiyaneke Nû Ve Gav Avêtin e ........................................ 45
Milîtantiya PKK'ê Derwêştî Ye ........................................ 47
Ûrfa Navenda Şoreşa Neolîtîkê Ye ........................................ 50
Jin Çavkaniya Jiyanê Ye ........................................ 52

Rastiya Rêbertiyê Nirxên Jiyanê Mezin Kirin e ..... 54
Şerê Min, Şerê Namûsê, Dayîkê, Jinê Û Erdê Ye ..... 57
Destkeftiyên Çaxa Çêbûna Duyemîn Yên Heyî ..... 64
Di Rojhilata Navîn De Hilhatineke Nû ..... 65
Di Nav Pêngavên Dîrokî Yên Tevgerê De Aliyên Kêm ..... 66
Şerê Rêbertiyê Li Hemberî Sîstema Desthilatiyê Ye ..... 68
Rêzdayîna Rêbertiyê Ji Dostaniyê Re ..... 71
Şêwazê Rêbertiyê Li Ser Hêza Xwe Ya Şexsî Rabûn e ..... 72

DI ÇÊBÛN Û ROJBÛNA RÊBERTİYÊ DE QONAXA SÊYEMÎN ..... 76
Di Dîrokê De Gelek Komplo Hene ..... 82
Pêwîst e Mirov Tola Xwe Di Fikir, Rêxistin Û Çalakiyê De Bigire ..... 84
Divê Mirov Xwe Ji Modernîteya Kapîtalîst Rizgar Bike ..... 88
Pêngavên Herî Mezin Bi Rexne Û Rexnedanê Pêktên ..... 90
Di Rastiya Rêbertiyê de Rabirdû (Pêşeroj) Rastir e ..... 91
PKK Ji Bo Demokrasî Û Azadiyê Têdikoşe ..... 97
Kapîtalîzm Mirovahiyê Tune Dike ..... 99

SEDEMÊN PÊŞKETINA KOMPLOYA NAVNETEWÎ ÇI BÛN? ..... 104
Kesayet Bi Nirxên Demokratîk Û Komînal Tê Avakirin ..... 105
Parêznameyên Rêbertiyê Haveynê Mirovên Azad e ..... 107

ŞÊWAZÊ RÊBERTIYÊ ..... 113
Tempo Çî Ye? ..... 113
Uslub Çî Ye? ..... 114
Tevlîbûna Ji PKK'ê Re, Tevlîbûna Ji Rêber Apo Re Ye ..... 117
Rêbertî Hêza Îdeolojîk Û Rêxistinî Dike Yek Û Bi Vî Awayî Bi Ser Dikeve ..... 120
Di Nav Refên PKK'ê De Erk Û Berpirsiyarî Pîroz İn ..... 123

Îrade Bi Hestan, Zanebûnê Û Ruh Bihêz Dibe .... 133
Hest Û Hedefên Mezin, Mirovan Ber Bi Hezkirineke Mezin Ve Dibe .... 137
Divê Em Ji Bo Çi Bijîn? .... 141
Têkoşîna PKK’ ê Ji Bo Mirov Bibin Xwedî Îrade Û Fikrê Azad e .... 147
Ti Kes Nikare Bi Derfetên PKK’ê Axatiyê Bike .... 151
Rêbertî Xwe Naspêre Derfetan, Derfetan Diafirîne .... 153
Di Têgihîştina Rêbertiyê De Derfetê Herî Mezin Mirov Bi Xwe Ye .... 156
Soz Ji Bo Rêbertiyê Pîroz e .... 159
Rastiya Rêbertiyê Xwe Perwerdekirin Û Nûkirin e .... 161
Bi Dîsîplînê Mirov Serkeftî Dibe .... 165
Rêbertî Her Tim Rexê Mirov Yê Baş Esas Digire .... 170
Mirovên Azad Mirovên Vekirî Ne .... 174
Rêber Apo Heta Ku Nede Naxwaze .... 178
Rêber Apo Mirovê Kurd Mehkumî Çareseriyê Kir .... 181
Di Têkoşîna Rêbertiyê Nemirbûn Û Jiyana Azad Bingehîn e .... 184
Em ê Şêwazê Vê Tevgerê Ji Bo Xwe Esas Bigirin .... 200
Azadiya Rêbertiyê Çareserkirina Pirsgirêka Kurd e .... 202

## ÇÊBÛN Û ROJBÛNA RÊBERTIYÊ

Em rastiya Rêbertiyê di çarçoveya her sê çêbûn û rojbûnên Rêbertiyê de digrin dest. Çêbûn û rojbûna yekemîn, ji dayîkbûna Rêbertiyê ye. Ji bo vê ji dayîkbûnê Rêbertiyê bi xwe biryar nedaye. Ev ji heft saliyê destpêdike heta avêtina hîmê rêxistinê diçe. Çêbûna duyemîn jî ji avabûna rêxistinê destpêdike, hetanî komploya navnetewî berdewam dike. Ya sêyemîn, ji pêvajoya Îmralî destpêdike hetanî vê pêvajoya ku niha em di nav de ne tê.

Rêbertî, ji bo gel û civakê di asta herî jor de, destnîşankirina hest û hizran e, parastina berjewendiyên wan e, ji bo pêşdebirina gel û civakê çalakî û amûr pêşxistin e. Herwiha ji bo vê amadekirina kadroyan û pêşxistina wan, fêmkirina pirsgirêkan û çareserkirina wan e. Mirov bi awayekî giştî dikare terîfeke wisa ji bo rêbertiyê bike: Manedayîna her tiştî ye.

Cardin mirov dikare bêje rêbertî nirxên ku di sîstemekî de komî serhevbûne ye. Dîsa rêbertî ew e ku dema xwe ya borî û ya niha tê de, cihê ku tê de, şertên ku tê de, zor û zehmetiyên wan derbas dike, paşerojê li ser van bingehan di kesayeta xwe de temsîl dike.

Di kesayetekî de gelek û dîrokek pêkanîn e û dîsa di tevahiya van de civak û dîrok di kesayeta xwe de pêkanîn e. Di kesayetekî de gelek, tevgerek û dîrokek pêkanîn e. Dîsa Rêbertiya Apoyî, li Kurdistanê bi Rêber APO re, li diji ew pêşengtiyên ku hatine ji rêderxistin, pêngava civaka jêrîn pêş de birin e. Rêbertiyeke li ser bingehê azadiyê, demokrasiyê û wekheviyê pêşxistin e. Rêbertiya Apoyî, di her dem û qonaxa dîrokê de bi berxwedaniya hemû gelên bindest re xwe dike yek û bi vê serwextbûnê di pratîkê de gav diavêje. Rêbertiya Apoyî, li dijî ew pêşengtiya ku desthilatdariyê esas digire, pêşxistin û derxistina pêşengtiya gelan û azadiyê ye.

Rêbertiya Apoger, sentezkirina wan aliyên pêşengtiyên Rojava û Rojhilat yên baş e. Li ser wî bingehî pêşxistina pêşengtiyeke nû ye. Rêbertiya Apoyî, li dijî wê pêşengtiya ku li ser bingehê dewlet, desthilatî û şer pêşketiye ye. Derxistina pêşengtiya ku nirxê demokratîk û komînal ji bo xwe bingeh digire ye. Û ew kesayet e ku civakekî li ser bingehê demokrasî, ekolojî, azadiya jinê ji bo xwe bingeh digire û çêdike.

Dî Dîrokê De Pêşengtî

Gelek rengên pêşengtiyê (serokatiyê) hene. Serokatiya ku li ser netewekî çêdibe jê re dibêjin 'serokê netewê.' Lê ya ku li ser netewan çêdibe jê re dibêjin 'serokatiya li ser netewan.' Berê jê re digotin 'serokatiya enternasyonalîst.' Niha em jê re dibêjin pêşengtiya ku di ser netewan re çêdibe. Ango gelek netew û gel wî ji xwe re wek serokatî qebûl dikin. Dîsa serokatiya gelan, çînan, cinsan, dînan, mezheban, eşiretan çêbûne û çêdibin. Dîsa çand, wêje, hûner û teknîkê de jî gelek pêşengtiyên wiha çêbûne û çêdibin. Kesên ku bi wê hunerê re pêşengtî kirine, heke di hunerekê de gaveke nû pêşxistibin, wê demê jê re dibêjin 'pêşengê hunerê.' Kesê di wêjeyê de gav avêtibe, dibe hostayê wê wêjeyê. Kesê ku serokatî ji olekî re kiribe û oleke nû pêşxistibe, dibe serokatiya wî olî. Ango ew ola bihêz kiriye. Wê demê serokatî wiha bi gelek rengan çêdibe.

Di mijara serokatiyê (pêşengtiyê) de, yên serokatiya gelekî kirine hene, ango serokatî û pêşengtî kirine. Car din çînên ku ji çînekî re serokatiyê (peşengtiyê) dikin hene. Di ol de jî olên ku serokatiyê dikin hene. Mînak di dîrokê de, dibêjin gelê Fransa gelekî pêşengtî kiriye ye. Çima wiha dibêjin, ji ber ku pêşengtiya şoreşa Fransayê bandor ser hemû gelan kiriye. Û pir şoreşan mînakên xwe ji şoreşa Fransayê girtin. Ji wê faydê digirin û wê ji xwe re dikin bingeh. Ji ber vê gelê Fransa dibe gelekî serokatî kiriye. Mînak em çînan bêjin, şoreşa proleterya ji çîna proleterya rehbertî kiriye. Wê çînê pêşengtî kiriye.

Di meseleya serokatiyê de, yên serokatiya stratejîk dikin hene, yek jî serokatiya taktîkî heye. Her serokatî nabe serokatiya stratejîk. Seroktiya stratejîk, ê ku hedefekî datîne ye. Li ser wî bingehî yê ku rê pêşdixîne ye. Yê ku îdeolojî, felesefe, sîyaset, rêxistin û taktîkê pêşdixe re tê gotin 'seroktiya stratejîk.' Serokatiya taktîkî çî ye? Yê ku tiştên ji alî serokatiya stratejîk ve hatine destnîşan kirin di pratîkê de pêktîne ye. Vî cûreyê Serokatiyê re jî, dibêjin 'serokatiya taktîkî.' Ango îdeolojî, felsefe, xet heye û li gorî wê xetê, xeta rêxistinî, leşkerî heye, serokatiya taktîkî wê xetê di piratîkê de pêktîne.

Dîsa di meseleya serokatiyê de, rêbertiyeke xwezayî çêdibe heye. Yek serweriya xwezayî ji xwe re bingeh digire, ya din jî li ser bingehê zorê çêdibe. Serokatiyeke ku li ser serweriya xwezayî çêdibe, ti car dewlet, desthilatî, hakimiyetê û koletiyê ji xwe re bingeh nagire. Ji bo xwe cewaziyê esas nagire. Bi temamî li ser hizira xwe,

piratîzekirina xwe, xwe dide qebûlkirin. Herkes wê serokatiyê ji bo xwe qebûl dike. Serokatiya ku li ser dewlet, desthilatiyê, serdestiyê û koletiyê çêdibe, ji bo xwe cewaziyê esas digire, ew şêwazê serokatiyê li ser zorê çêbûye.

Cardin di xala serokatiyê de, serokatiyek heye ji bo demekê çêdibe, yek jî ya ku dûrûdirêj, ango dîrokî çêdibe. Ya ku ji bo demekê çêdibe, ji bo wê demê ye û mohra xwe li wê demê dixe. Lê ya ku dîrokî û ji bo demeke dûrûdirêj çêdibe, mohra xwe dirêj didomîne. Ya ku bandora xwe û mohra xwe wiha demeke dirêj bidomîne, jê re dibêjin 'serokatiya dîrokî.'

Di dîrokê de serokatî çawa çêbûye, pêşketiye û heta roja me ya îro hatiye? Di dîrokê de di civaka xwezayî de pêşengtiya ku çêbûye pêşengtiya jinê ye. Her tiştek di dorberê jinê de çêdibe. Ev pêşengtî, pêşengtiyeke komînal e. Bi temamî otorîteyeke xwezayî ye. Ji bo wê jî klanê ew jidil qebûl kiriye. Tê de zor, hiyarerşî û desthilatî nîne. Dema ku mirovahî ji civaka xwezayî ber bi civaka çînî ve diçe, hîna bi temamî çîn çênebû ye. Di civakê de parçebûneke berbiçav çênebû ye, dewlet çênebû ye, desthilatî û koletî hîna çênebû ye; lê mirovahî ji civakbûna xwezayî derketiye û ber bi civakeke ku li ser çînê çêdibe gav diavêje. Ango demeke navbere de ye. Wê demê di otorîteyê de jî hinek guhertin çêdibin. Êdî ji otorîteya jinê a xwezayî ber bi serokatiya zilam ve gavek pêşdikeve. Hîna bi temamî serokatiya zilam çênebû ye. Otorîteya jinê ji holê bi gelemperî ranebûye. Lê guhertinek jî tê jiyîn. Ev jî li dorberê kê pêşdikeve? Dorberê zilamê yextiyar pêşdikeve. Çima, ji ber ku tecrûbe li gel heye. Nêçîr kiriye, asteke xwe yê zanebûnê çêbûye, bûye xwedî komeke agahî û tecrûbe. Hiyarerşî di wê demê de hêdî hêdî pêşdikeve. Zilamê yextiyar ciwanan dorberê xwe kom dike, ji ber ku hêz li gel ciwana ye û tecrûbe jî li gel wan e. Hêza ciwanan bi tecrûba xwe re dikin yek. Hêla xwe ya leşkerî jî bihêz dike. Êdî li vir em dikarin bêjin hiyerarşî pêşdikeve. Lê ew hiyerarşî hîna ne li ser bingehekî desthilatiyê ye. Desthilatiyekî nîv bidil tê qebûlkirin. Lê êdî ji kolektivîzmê dûrketin çêdibe, êdî hêdî-hêdî ferdiyet pêşdikeve. Otorîteya di vê dema navber de pêşdikeve, otorite û pêşengtiyeke ferdî ye. Ji kolektivîzmê dûr ketiye. Hîna sazîbûna xwe tam çênebûye, ne li ser zorê ye, lê êdî pêşengtî wan taybetmendiyên xwe yên kolektîf wenda dikin. Êdî jin otorîteya xwe wenda dike. Serokatiyeke li ser hiyarerşiyê, ferdiyetê çêdibe.

Piştî vê êdî ev navber xelas dibe û mirovahî digihêje çax û serdema ku dewlet li ser avadibe. Li vir êdî serokatî cuda dibe. Li vir serokatî sazîbûna xwe çêdike. Bi temamî li ser zorê, zilmê, kedxwariyê û desthilatiyê çêdibe. Ji wê dîrokê heta niha serokatiya ku tê meşandin, serokatiya li ser esasê civaka dewletbûnê avabûye ye. Sazîbûna xwe bi tememî çêbûye, desthilatiyê ji xwe re esas digire. Dema ku dewlet avabûye heta roja îro ew serokatî cewher û esasê xwe neguhertiye, lê di şekil de hinekî guhertin jiyaye. Mînak, di destpêka koletiyê de serokatiya ku çêbûye li ser koletiyê çêbûye. Bi temamî koletî ji bo xwe esas girtiye. Li ser wê sîstema xwe avakiriye. Ji bo wê, yê ku ji wê sîstemê re serokatî kiriye, serokatiyeke ku sîstema koletiyê daye meşandin e. Di wê çaxê de li dijî wê sîstemê derketin jî heye. Yê ku ji koleyan re serokatî kirî jî heye. Spartakûs serê koleyan kişandiye, ji lewra Spartakûs navdar e. Wî li dijî sîstema koledar serokatiya koleyan kiriye. Dîsa pêxember derketine, destpêkê Hz. Îbrahîm derketiye. Derketina pêxemberan jî li dijî sîstema koletiyê ye. Ew ji bo kole û bindestan serok in. Ji koleyan re serokatî kirine û xwastine civaka bindest ji koletiyê derxînin. Hz. Îbrahîm yek ji wan e, dîsa li Romayê Spartakûs wiha ye.

Dîsa di çaxa feodalîzmê de, yê ku serokatiya feodal ji bo xwe esas girtine hene, yê ku li dijî wê derketine jî hene. Yê ku li dijî serokatiya feodalan derketine, ji gundiyan re, ji gelan re serokatî, pêşengtî kirine. Yan jî serokatiya hin mezheban kirine. Ji ber ku di wê çaxê de dînên ku dixwazin xwe serwer bikin hene. Wê demê hinek dîn dixwazin hinek dînan tesfiye bikin û bikin bin desthilatiya xwe. Yan jî hinek mezheb dixwazin mezhebê din bikin bin desthilatiya xwe. Kesên li dijî wê desthilatiyê derdikevin û serokatiyê dikin, di wê çaxê de derketinên li dijî sîstema feodalîzmê ye.

Di çaxa kapîtalîzmê de yên serokatiya kapîtalîzmê dikin hene, ji vê serokatiyê re dibêjin serokatiya bûrjûwaziyê. Ya din jî kesên ku serokatiya proleteran dikin hene. Ji wan re jî dibêjin serokatiya proleteryayê.

Di roja me ya îro de Rêber APO jî temsîla rêbertiyekî dike. Dixwaze pêşengtiyekî pêşbixe. Serokatiya ku Rêber APO dixwaze pêşbixe, xwe dispêre pêşengtiya civaka jêrîn. Yanî em jê re dibêjin serokatiya gelan. Pêşengtiyeke bi temamî jiyana azad esas digire ye. Kesayet û civaka azad esas digire ye. Niha Rêber APO li ser vî esasî rêbertiyeke nû temsîl dike û pêşdixe.

A din jî serokatiyên dîrokî hene. Di dîroka mirovahiyê de yê ku ji bo gelekî, çînekî, cinsekî, dînekî, hunerekî, îlmekî û çandekî serokatî kirine; nûbûneke mezin, guhertineke mezin çêkirine û mohra xwe li wê demê xistine û bûne serokên demên pêş jî. Ji yên wiha re dibêjin serokatiyên dîrokî. Mînak Hz. Muhemmed.

Hz. Muhemmed serok e, lê ne serokê demekî ye, serokekî dîrokî ye. Ji ber ku bi sed salan bandora xwe li ser civakê kiriye. Dibe ku di nav gelê Ereb de derketiye, lê serokatiya ku pêşxistiye tenê ne ji bo Ereban e. Hem di nav Ereban de, hem jî di nav gelê din de hatiye qebûlkirin; hîna jî tê qebûlkirin. Yanî bi sed salan e bandora xwe dewam dike. Ji ber wê serokatiya wî dîrokî ye.

Di dîrokê de di serî de serokatiya jinê ya ku bi temamî li ser xwezaya civakê çêbûye heye. Piştî wê serokatiya şaman, ya rahîbên Sumeran, ya pêxemberan, di felsefê de jî mînak Sokratês, Arîsto û Eflatûn, di sosyalîzmê de Marks, Engels û Lenîn derketiye. Pêşengiya muzîkê Mozart dike. Mozart mirovekî bi nav û deng e. Di mîmariyê de Leonardo Da Vincî li Îtalyayê bi nav û deng e. Wî di mîmariyê de gaveke nû avêtiye û hîna jî tê qebûlkirin. Di demokrasiyê de jî Jean Jack Rouseau bi nav û deng e. Di fîzîkê de jî qanûnên Newton demekî dûr û dirêj dihatin qebûlkirin. Niha qanûnê kûantûmê tê qebûlkirin. Mînak di şoreşa Neolotîk de Kurdan ji wê şoreşê re serokatî kirine. Di şoreşa îndûstrî re Emerîka, Îngiliztan û Fransayê serokatî kirine. Hîna jî şopên wan diyarker e. Dema te got şoreşa îndûstrî hema Emerîka, Îngiliztan û Fransa tê bîra mirov. Dema te got neolîtîk Kurd tê bîra mirov. Te got mîmarî Leonardo Da Vincî tê bîra mirov. Te got muzîk Mozart tê bîra mirov. Ji ber ku van bandoreke mezin kirine. Di dîrokê de bandoreke dûr û dirêj kirine. Bi kurtasî yên ku bandor çaxeke dûr û dirêj kirine re dibêjin serokatiyên dîrokî.

## Di Kurdistanê De Rola Pêşengtiyê

Dema ku mirov bixwaze di Kurdistanê de li ser mijara serokatiyê bisekine, divê mirov behsa serokatiyên klasik û serokatiyên nûjen bike.

Gelê Kurd dûr û dirêj li dijî wan êrîşên ku ji der ve dihatin ser wan, û dîsa li dijî ew dagirkirinên ku çêbûne sekiniye. Bi çi li hember van êrîşan parastina kiriye? Berxwedana xwe bi rêya eşîr û qebîleyan kiriye. Di wan berxwedaniyan de carnan eşîr û qebîleyan li

dijî wan êrîşên der ve hevkarî kirine. Carnan jî bi tena xwe li dijî wan êrîşan sekinîne. Di roja me ya îro de jî ew eşîr û qebîle hene, lê ne weke berê ne û pir lewaz in. Gelek taybetmendiyên xwe wenda kirine. Guhertin bi wan re çêbûye, dejenere bûne. Lê hîna jî li Kurdistanê de dijîn. Tu niha jî lê temaşe dikî eşîret e û li dijî dewletê û eşîrên din xwe diparêze. Tavilê li hemberî tehlukê radiweste. Yan jî tu temaşe dikî du-sê eşîret dibin yek û li dijî eşîretekî din disekinin, ji ber ku bi tenê hêza xwe têre nake, bi hev re yekîtiyê çêdikin. Ji ber ku hêza xwe dikin yek û dikarin li dijî êrîşan bisekinin. Hîna jî ev li Kurdistanê lewaz be jî heye.

Di serdema koletiyê de ya ku pêşdikeve li dijî Asûriyan îtîfaqa Kurd û Babiliyan e. Wiha tehluka Asûriyan ji holê rakirine. Piştî demekê mirov dibîne ku bi Persan re yekitî û îtîfaqê dikin, Kurd wiha jiyana xwe dimeşînin û dijîn. Heta dema Osmaniyan bi vî rengî didome. Dema mirov dîroka Kurdan lêkolîn bike, mirovê van baş bibîne. Kurdan herî zêde îtîfaq pêkanîne. Bi vî rengî jiyana xwe berdewam kirine.

Piştî Osmaniyan jî, mirov temaşe dike êdî Kurd bi Osmaniyan re tevdigerin. Bi qebûlkirina İİslamê jî êdî di civaka Kurdan de guhertin çêdibe. Di nava civakê de çînîbûn xurt dibe. Di nava Kurdan de yên serwer ango civaka jorîn, êdî berjewendiyên xwe di hêzên der ve de dibînin. Bi wan re têkiliyên xwe çêdikin. Têkiliyên ku pêktînin jî, di cevher de ne weke ya bi Babil û bi Persan re çêkirî ye. Bi Babilî û Persan re îtîfaq çekirine. Lê dema çîna jorîn, desthilat û serwerên Kurd bi Osmaniyan re têkiliyên xwe pêşdixînin, ne weke ya bi Persan, Babiliyan re çêkirine. Bi temamî dikevin xizmeta Osmaniyan. Dixwazin berjewendiyên xwe wiha biparêzin.

Ev di civaka Kurdistanê de guhertineke bingehîn e. Hem di civakê de guhertin çêdibe, hem jî di serokatiya civaka Kurdan de guhertin çêdibe. Lewra hem civaka Kurd azadiya xwe wenda dike, hem jî serokatiya Kurdan êdî ji serokatiya Kurdan derdikeve û bi temamî dikeve xizmeta hêzên der ve.

Ji bo wê di civaka Kurd de serokatî bi Osmaniyan û Îslamê re lewaz dibe. Ji ber ku serokatî êdî dest ji civaka xwe berdide û bi temamî ji bo berjewendiyên xwe yên teng û Osmaniyan tevdigerin. Ev tişt, civakê jî pir lewaz dike. Civaka ku serokatiya xwe wenda bike yan lewaz dibe, yan jî ji holê radibe. Kurd ji holê ranebûne, lê belê gelekî lewaz bûne. Mirov dikare bêje, kêm maye ku ji holê rabin.

Heke Kurd ketine vê rewşê sedema bingehîn ew e ku Kurdan serokatiya xwe wenda kirine, bê serokatî man e.

Ev çi çêdike? Di civaka Kurdan de çîna jorîn bi dijmin re dike yek û îxanetê di wan de pêşdixîne. Di civaka binî (gel) de jî feqîrî û belengaziyê pêşdixîne. Civaka binî nirxê xwe diparêze, ji ber ku şoreşa neolîtîkê Kurdan çêkirine, birêvebirine. Nirxên komînal û demokratîk di xwe de diparêzin.

Lê belê civaka jorîn, serwerên Kurd xwe ji binî ve ji van nirxan û ji civaka Kurd qut dike. Îxanetê ji xwe re hildibijêre. Ev di civaka Kurd de guhertineke bingehîn e. Pirsgirêkên ku îro em dijîn, çavkaniya xwe ji wir digirin. Êdî serwerên Kurd, ji bo Kurdan ji holê rabikin, roleke wiha digirin ser milê xwe. Ji ber ku îxanetê esas digirin. Li gel desthilatdaran li dijî gelê xwe disekinin. Êdî serokatiya wan ne ya Kurdan e, serokatiyeke ku Kurdan ji holê radike û îmha dike ye. Ji ber ku wan bi temamî siyaseta desthilatdaran ji xwe re esas girtine.

Wiha di nava Kurdan de serokatiya sexte pêşdikeve. Naxwe ne serokê Kurdan e, lê bi temamî îxanet kirine û li gel dagirkeran cih girtine, îmhakirina Kurdan esas girtine. Wiha xwe jî serok dibînin. Em ji vê re dibêjin serokatiya sexte. Ev jî di nava Kurdan de pirsgirêkeke mezin e.

Ji bo wê di roja me ya îro de serokatiya ku serwerên Kurd dikin, serokatiyeke sexte ye û tê de durûtî heye, bi temamî bi dijmin re ye, li dijî gel e. Ji bo gel tiştekî ava nake. Mirov binêre serwerên Kurd berjewendiyên xwe di dagirkeran de dibînin û li dijî gelê xwe disekinin. Ji bo Kurdan ev rewşeke cidî ye.

Li Kurdistanê ev çi pêşdixe? Di pirsgirêkên serokatiyê de, pirsgirêkekê cidî pêşdixe. Ji ber ku Kurdan ji bo xwe serokatiyek çênekiriye, ji serokatiya heyî îxanet kiriye, Kurd bê îdeolojî, bê siyaset, bê felsefe man e û pêşneketine. Vê di Kurdan de bêîrade û bênasname mayîn pêşxistiye. Vê jî Kurd ber bi îmahê ve biriye. Heke Kurd nêzîkî îmhayê bûne, sedem ev e.

Yên ku di dîrokê de serokatiya xwe çênekirine, yan tine bûne, yan jî pir lewaz bûne û pirsgirêkên cidî jiyane. Yên di dema xwe de serokatiya xwe pêşxistine, zêde pirsgirêk nejiyane û pêşketine.

Dema ku mirov li Kurdan dinêre, ev pirs dikeve aqilê mirov, gelo çima kurd ewqasî nêzîkî mirinê bûne? Ji ber ku serokatiya xwe wenda kirine, serokatiya wan ji rê derketiye û ketiya xizmeta dij-

min. Civak bê serokatî maye. Bê serokatî mayîn jî bê rê, bê îdeolojî, bê siyaset, bê rêxistin û bê felsefe mayîn bi xwe ye. Ev tê çi maneyê? An îmhabûn e, yan jî pirsgirêkên cidî jiyîn e.

## Derketina Rêber APO Li Hemberî Tinekirina Kurdan e

Ji ber ku Kurdan serokatiya xwe wenda kiribûn û ketibûn rêka îmhayê, Rêber APO destwerdanî vê rewşê kir. Derketina Rêber APO destwerdana li hemberî tinebûna Kurdan e.

Rêbertî di her cîh û demê de bi xwestinê çênabe. Yanî kê bixwaze bêje, 'ez serok im, yan jî ez rêber im û min wek rêber û serok qebûl bikin', kes wî wiha qebûl nake, bi vî rengî mirov nabe serok jî. Serokatî di kîjan demê de, li ku derê, çawa derdikevin holê û çawa tên qebûl kirin? Heke li welatekî yan di civakekê de ketinên pir mezin çêbibin, wê civakê her tiştê xwe wenda kiribe; bêexlaqiyeke pir mezin çêbûbe, jiyana heyî ketibe wê astê ku êdî nikare bê jiyîn, nakokî pir kûr bûbin, mirin û mayîn hatibe rojevê, dagirkirin û îmha pir pêşketibe; yan jî di nava civakê de guhertinek mezin çêbibe, li ser wî esasî dema pêngaveke dîrokî xwe dide pêş. Di wan dem, merc û cihan de, pirsgirêkên serokatiyê tên rojevê.

Yê ku ew hîs kir, dît û jiya û hest, rih, çalakî, jiyan, çand, exlaq, rêxistin, kesayet û îradeya wê di xwe de pêşxist, dibe bersiv, dibe serokatî. Nexwe serokatî wiha derdikevin, di encamê van tiştên me gotî de derdikevin. Dema ku ev şert û merc li cihekî çêbûn, di wê demê û li wî cihî serokatiyek derneket, wê demê ew gel wenda dike. Wexta ev şert û merc derketin yê ku ev hîs kir, di xwe de temsîl kir, pêkanî, bû bersiv, li wir dîrok tê zivirandin. Dîrokeke nû derdikeve û pêşketinek dest pê dike.

Yê ku ev nekir jî wenda dike, ji holê radibe. Kesên di dîrokê de serokatiya xwe pêşnexistibin wenda dikin. Yê ku serokatiya xwe çêkirî lê ne parastine, dîsa wenda dikin. Yê ku serokatiya xwe lewaz çêkirine, her dem rastî pirsgirêkên mezin û wendahiyên mezin hatine. Ji ber wê bê serokatî jiyan nabe. Ji bo gelan serokatî û rêbertî nebe jiyan jî nabe. Ji lewra serokatî girîng e.

Kurd îro vê baştir fêm dikin. Heke Kurd îro dibêjin, 'bê serok jiyan nabe', evê rastiyê vedibêjin. Ji ber ku dîtin ku bi serokatiyê re ji mirinê xelasbûn û rabûn ser piyan, ji bo rêbertiyê rêz girtin. Kerameta xwe bi wê serokatiyê ji bin piyan derxistin, bi wê serokatiyê ji bo xwe hinek nirx ava kirin.

Rêbertî heta derneketibû, Kurd di bin lingan de bûn, kes ew weke hebûn û mirov nedidîtin. 'Kurd hene yan nîn in' kesekî hesabê vê jî nedikir. Dema ku Rêber APO nasname, îrade û înîsiyatîf da wan, ji bo wan nirx ava kir bi xwe hesiyan. Û dema bi komployê Rêbertî hate girtin jî, gel hemû bi hev re rabûn ser piyan. Gotin: "bê serok jiyan nabe!" Ez texmîn dikim îro ji hemû gelan zêdetir gelê Kurd Rêbertî fêm kiriye. Lewma her wextê girêdayîn û dilsoziya xwe tînin zimên. Ruxmê hemû êrîş li ser Rêbertiyê pêşdikevin jî, dest jê bernadin. Mirov baş bala xwe bidiyê dijmin gelek êrîşî ser Rêbertiyê dike, da ku li ber çavên gel reş bike û gel dev ji Rêbertiyê ber de. Lê her ku êrîş zêde dibin, gel hê zêdetir girêdana xwe ya bi Rêbertiyê xurtir dikin. Ji ber ku gel hebûn û tinebûna xwe di Rêbertiyê de dibînin.

Di pêvajoya ku li ser Kurdan îmha û înkar dihate meşandin, wê pêvajoya ku Kurd tam ketibûn, ji wê zêdetir êdî ketin tinebû; bi navê Kurd û mirovahiyê çi hebû, ji destê Kurdan hatibû girtin, tişta layiqî Kurdan dihate dîtin komkujî, îşkence, lînçkirin, heqaret, asîmîlasyon û bi birçîbûnê terbiye kirin bû û ji bo dagirkeran kar kirin û jiyîn esas dihate girtin de Rêbertî derket. Pêvajoya ku Rêber APO derket, pêvajoyeke wiha bû.

Rêbertiya ku nû li Kurdistanê pêşketiye, di şert û mercên wiha de pêşketiye. Heke gelek asta herî jêr de ketibe, her tişt ji dest wî hatibe girtin, tiştek di dest de nemabe û êdî ji wê wêdatir mirin be, di rewşeke wiha de pirsgirêkên serokatiyê tên rojevê. Rêber APO jî ew hîs kir û di xwe de pêkanî, lewra xwest vê pirsgirêkê çareser bike. Di mercên wiha de zehmet e serokatî derbikevin, ger derketin jî mezin derdikevin. Di roja me ya îro de heke li Kurdistanê serokatiyekî ewqas mezin pêşketiye, ew girêdayî vê rastiyê ye.

Şertên gelê Kurd tê de ye heke ewqasî giran nebûna, serokatiya ku derbiketa jî wê sivik bibûya. Mercên ku gelê Kurd tê de bû pir giran bûn. Pêşengtiyên li Kurdistanê derketine xwestine ku pirsgirêkên pêşengtiyê çareser bikin; lê çareser nekirine. Çima ew pirsgirêkên rêbertiyê çareser nekirin? Ji ber ku asta rêbertiya wan ne li gorî wê rastiya giran bû. Ji ber wê nebûn serok û tevger pêşneketin. Heke tevgera PKK'ê pêşket sedem, pêşengtiya ku PKK'ê avakirî ye. Rêber APO, PKK li gorî rastiyên heyî avakir. Lewra PKK pêşket û bû bersiva xwestekên gelê xwe.

Rêbertiya Apoyî Pêşengtiya Nirxên Komînal û Demokratîk e

Rêbertiya me nirxên komînal û demokratîk ji bo xwe esas girt. Rêbertiyê ew nirxên ku mirovahiyê di dîrokê de ji bo demokrasiyê, azadiyê, wekheviyê, edaletê avakiriye û zanist û teknîk di xwe de kir yek. Li ser van esasan jî Rêbertî derket. Ji berk u derketineke li ser hîmên mezin bû, bi xwe re guhertinên pir mezin jî di nava civakê de pêşxist.

Rêbertî her çiqas li Kurdistanê derket jî, tenê li ser hîmekî teng ê netew û çîn derneket. Dîsa xwe nesipart zayendgerayî, dîngerayî, ferdgerayî û netewgerayîyê. Berovajî van tiştan, li diji van şer kir, ew red kirin. Rêbertî li ser vî bingehî çêbû û pêşket. Ji ber wê nebû pêşengtiyeke teng û tenê ji bo Kurdistanê. Rêbertiyê heke di çêbûna xwe de tenê Kurd, di nav Kurdan de jî tenê çînek, yan jî cinsek, yan jî dînek û mezhebek esas bigirta wer mezin nedibû.

Rêbertiyê civaka jêrîn, demokrasî, azadî, aşitî, edalet, wekhevî ji bo xwe esas girt. Her çiqasî li Kurdistanê dest pê kiribe jî, her ku çû bandora wî ji sînorê Kurdistanê derket û heta ji çarçoveya Rojhilata Navîn jî derket û di çarçoveyekî firehtir girt. Asta ku îro xwe gihandiye asteke gerdûnî ye. Heke mirov vê rastiyê baş fêm neke, mirov tam nikare rastiya Rêber APO û rastiya ku di Kurdistanê de pêk tê fêm bike. Di derbarê girîngiya pêşengtiya civakê em niha ewqas dibêjin û êdî emê behsa qonaxên çêbûnên Rêbertiyê bikin.

## DI ÇÊBÛN Û ROJBÛNA RÊBERTIYÊ DE QONAXA YEKEMÎN

Cihê ku Rêber APO tê de derketiye cihekî çawa ye? Herêma ku lê çêbûye navenda şoreşa neolîtîkê ye. Şoreşa neolîtîk di dîroka mirovahiyê de şoreşeke herî mezin e. Li gorî lêkolînên ku çêbûne navenda wê Ûrfa (Ruha) ye. Rêber APO li Ruhayê ji dayîk bûye. Yanê li navenda şoreşa neolîtîkê ji dayîk bûye. Li wê herêmê hîna jî bandor û taybetmendiyên wê şoreşê hene. Ew herêmeke çawa ye? Li wê herêmê tenê Kurd najîn, Kurd, Ermenî, Asûrî, Tirk û Tirkmen li wir bi hev re dijîn. Ev tê vê wateyê ku gelek netew li wê herêmê dijîn, ev jî dewlemendiyek e. Heke mirov çavên xwe li cihekî ku tenê Kurd tê de dijîn veke cuda ye, lê li cihekî ewqas gel lê hebin çavên xwe veke cuda ye. Wê demê mirov van gelan hemûyan dibîne, taybetmendiyên wan dibîne, mirov ji wan gelek tişt digire û bandora wan li ser mirov çêdibe. Ev di mirov de dewlemendiyê çêdike.

Cihê ku Rêbertî lê çêbûye eşîret, qebîle, malbat û mezheb lê hene. Ji vî aliyê xwe ve pir dewlemend e, di heman demê de li wê herêmê çînayetî jî pêşketî ye. Çîn hene û di navbera wan çînan de şer heye. Di navbera kes û civakê de, zayendan de, ferdan de, civak û dewletê de, civaka jêrîn û ya jorîn de nakokî hene. Di navbera şaristaniya ku dewletê esas digire û bermahiyên neolîtîkê de nakokî hene. Nakokiyên çand û ekolojiyê... hene.

Di vê herêmê de nakokiyên sedsalan, çaxan, sîsteman, welatan hene. Rêber APO ji gundekî ku ev nakokî hemû tê de hene, di malbateke van nakokiyan hemûyan dijî de ji dayîk bûye. Cihê lê çêbûye cihekî wiha ye. Gelek taybetmendî û nakokiyên xwe yên wiha hene. Ew di nava van dewlemendî û rastiyan hemûyan de çêbûye û van taybetmendiyan jî bandoreke xurt li ser dirûv û awayê Rêbertiyê kiriye.

Heke îro kesayeta Rêber APO li ser bingeheke teng çênebûye û di asta gerdûnî de rêbertiyekî pêk tîne, rastiya wê girêdayî vê bingehê ye. Rêbertî ew qarekterê gerdûnî ji cihê lê çêbûye girtiye. Heke di cihekî wiha de çênebûya, zehmet bû ew asta gerdûnî di kesayeta Rêber APO de pêkbihata. Dibe ku pêkbihata jî, lê wê pir lewaz pêkbihatiba.

## Li Vê Jiyanê Îxanet Hatiye Kirin

Rêber APO di heft saliya xwe de, dema çavê xwe li jiyanê vekir, dît ku jiyana dorberê wî nayê jiyîn. Herkes wê jiyanê dibîne, dibêje 'jiyan ev e!' û dixwaze wê bijî. Lê Rêber APO wê jiyanê jiyan nahesibîne. Red dike û qebûl nake. Dibêje "ev ne jiyan e, li vê jiyanê îxanet hatiye kirin." Ger li jiyanê îxanet hatibe kirin, mirov wê îxanetê nikare bijî. Jiyaneke îxanet lê hatibe kirin, mirov nikare bijî, dema mirov bijî û qebûl bike, wê demê mirov îxanetê qebûl dike. Wê demê mirov li jiyanê îxanetê dike. Lewra Rêbertî dibêje "ev jiyan ne jiyan e, ji ber ku li jiyanê îxanet hatiye kirin. Ez vê jiyanê qebûl nakim û jê re nabêjim jiyan". Baş e, heke li jiyanê îxanet hatiye kirin û ev jiyan ne jiyan e, wê demê jiyan çi ye? Lêgerîna vê di Rêber APO de pêşdikeve. Dibîne tişta ku bi navê jiyanê tê jiyîn jehr e, her roj mirin e û tê de ne moral, ne jî xweşî heye. Ji bo wê red dike û bi redkirinê re alternatîfa wê dixwaze pêşbixe. Wê çi bibe alternatîf, çi dibe alternatîf? Rêber APO ev ji xwe re esas girt.

Heke di kesayeta Rêber APO de jiyaneke azad di asta bengîniyê de pêşketiye, ji vir dest pê dike û girêdayî vê ye. Rêber APO di wê çaxê de jiyana azad ji bo xwe esas girtiye. Gera li vê, ji bo wê karkirin ji bo xwe esas girtiye. Lewma Rêber APO jiyana heyî red dike. Ew tişta ku her kes jê re dibêje 'jiyan', ew dibêje "ne jiyan e. Ez vê jiyanê qebûl nakim û najîm." Ji ber wê dixwaze alternatîfa wê pêşbixîne. Heke alternatîf dît wê pêşbixîne û bijî. Dema nedît jî wê ya heyî nejî, biryara dayî jî ev e. Ji lewra wê bixwaze alternatîfa xwe ya jiyanê pêşbixîne. Wê bixwaze herkesî jî bikişîne vê.

Rêber APO ji bo wê têdikoşe. Heke encam girt-girt, heke negirt wê jiyana heyî najî. Weke gelek mirovan ku di dîrokê de xwe ji jiyanê qut kirine, bi mehan û salan di şikeft û çiyan de mane (jê re dibêjin înzîwa) tevdigere. Jiyana pêxemberan bi temamî jiyaneke wiha ye. Ya derwîşan jî wiha ye. Ên ku jiyana heyî jiyan nahesibînin, ji bo ku xwe ji bin bandora wê jiyanê derbixînin, jiyana heyî terk dikin û têkiliya xwe jê qut dikin da ku bikaribin alternatîfekî pêşbixînin. Yên înzîwayê ji xwe re esas digirin, ji ber vê digirin. Biryara Rêber APO jî ji ber vê ye. Wê alternatîfa jiyana heyî peyda bike û herkesî bikişîne wê, ger alternatîf pêşnexist wê xwe bide aliyekî û înzîwayê bijî. Biryara Rêbertiyê ya dayî ev e.

Jiyan tenê bi civakê re gengaz dibe, derveyî civakê ji bo însan jiyan nabe. Mirov bi civakê dibe mirov. Ji bo wê pêwîst e, mirov bi

civakê re bijî. Weke din ji bo însan jiyan nabe. Lewra di wê dîrokê de Rêber APO dest pê dike û vê ji xwe re esas digire: wê çawa civakbûna xwe pêşbixîne. Civaka heyî dibe ku navê wê civak be, lê ji civakbûnê derketiye. Dagirkeran civaka Kurd belav kiriye û parçe kiriye, jixwe her roj mirin tê jiyîn. Kurd ji civakbûnê û însaniyetê derxistine. Êdî Kurd ber bi mirinê ve diçin. Dagirker Kurdan weke mirov nabînin û wana weke heywan dibînin. Nêzîkbûna ji Kurdan re dikirin weke ya ji heywanan re bû. Ji ber wê çendê ji Kurdan re dibêjin, 'Kurdê bidûvik'. Heke civakek civakbûna xwe wenda bike, mirovbûna xwe jî wenda dike. Êdî cudabûna wan û heywanan namîne. Dijmin gelê Kurd wekî lawir didît. Rêber APO ev dîtibû. Wê çawa civakbûna Kurd careke din çêbike, wê çawa civakê ji wê rewşê derbixîne, li Kurdistanê careke din mirovbûnê wê çawa rake ser piyan? Ev bi rengekî tenê dibû, ew jî pêwîst bû, civak li ser esasê azadiyê dîsa rabûya ser piyan. Ger te ev pêşxist, tu dikarî vê pirsgirêkê çareser bikî. Ji bo wê Rêber APO got "ez vê jiyana heyî najîm, qebûl nakim û ezê alternatîfa wê pêşbixînim". Alternatîfa wê çi ye? Derxstina Kurdan ji wê rewşê ye û ew gihandina civakbûnê ye. Pêwîst e ji bo wê civakbûna xwe pêşbixîne, da ku karibe alternatîfa civakbûnê pêşbixîne.

Di serî de civakbûna xwe li ser çi esasî dixwaze pêşbixîne, dixwaze ji xwe re di gund de hevalan çêbike. Ji bo wê pir kar dike ku bikaribe zarokên gund li dorberê xwe kom bike û civaka xwe çêbike. Heke bi hinek zarokên gund re têkiliya xwe pêşdixîne û dixwaze hevaltiyê bike, sedem ew e. Bi vê dixwaze civakbûna xwe ava bike. Heta dema bi zarokan re têkiliyê pêşdixîne, di gund de malbateke dijminê malbata Rêbertiyê heye. Rêbertî diçe û bi zarokê wê malbatê re jî têkiliyê datîne. Dayîk û dapîra wî li dijî vê têkiliyê derdikevin. Wê demê dapîra wî jê re dibêje "tu çawa diçî bi zarokê dijminê me re têkiliya xwe pêşdixî, tu xayîn î!" heta dixwaze wî biqewitîne. Lê Rêbertî di têkiliya xwe ya bi wan zarokan de israr dike. Yek ji wan hevalê Rêbertiyê Hesen Bîndal bû. Lewra ew hevalekî wiha bû. Heta ku şehîd ket jî bi Rêbertiyê re hevaltî kir. Ji malbateke dijminê malbata Rêber APO bû dihat. Heke dayîk û dapîra Rêbertiyê xwe aciz dikirin, ji ber Hesen Bîndal bû. Lê Rêbertiyê dixwest civakbûna xwe çêbike, lewma li ser wê hevaltiyê israr dikir.

Li derveyî têgihîştina dayîkê têgihîştinek ji xwe re esas digirt, di wê de israr dikir. Ji bo civakbûna xwe ava bike, li dijî dayîka xwe

derket. Ferzkirinên dayîka xwe qebûl nedikir. Çima li dijî dayîka xwe derdiket? Yan jî bi rastî li dijî dayîka xwe derdiket? Na, ne li dijî dayîka xwe bû, lê belê di kesayeta dayîka xwe de, li dijî wê jiyan û civakbûna heyî derdiket. Ji ber ku dayîka wî jiyana heyî li ser wî ferz dikir. Digotê "tê vê jiyan bikî, exlaq, çand û kesayeta vê jiyanê bijî." Ya rastî li holê civakbûn bi navê civakbûna Kurd tine bû. Her tişt parçe-parçe bibû, hatibû belavkirin û di şûna wê de civakbûna Tirk pêşketibû û pêşdiket.

Jiyan hatibû belavkirin û îxanet lê hatibû kirin. Bi navê Kurd û Kurdistan çi hebû, xistibûn bin lingan. Rastiya ku heyî ev bû. Ji her aliyê ve jiyana heyî li dijî Kurd bû, xizmeta dagirkeriyê de bû. Dayîka Rêbertiyê ev dida pêşiya wî. Heke Rêber APO li dijî dayîka xwe derdiket, ji bo vê derdiket, ne ku dayîka xwe qebûl nedikir, red dikir. Di şexsê wê de jiyanek û civakbûnek red dikir. Di jiyana ku dixwest jiyan bike, civakbûna dixwest pêşbixîne de israr dikir. Lewra li dijî dayîka xwe derdiket.

Tiştê ku dayîka Rêbertiyê dixwest bidiyê zêde nebû. Tiştê ku bidayê çi bû? Çand, exlaq û kesayeta dagirkeriyê bû. Herî zêde jiyanek ferdî bû, derveyî vê tişteke din nebû. Jixwe Rêbertî ji bo wê digot "min ji dayîka xwe re wiha got, tu wê mirîşkê û cûcikên wê dibînî, te çima ez anîm dinê, da tê çi bidî min te ez anîme dinyayê". Ji bo wê digot, "lê dayîk ne di wê zanebûnê de bû. Dayîkê di ya xwe de israr dikir." Nakokiyên Rêbertî û dayîkê di vir de ye, sedem ew e. Dayîk bêzanebûn civakbûn, jiyan, çandu û kesayeta sîstema dagirker pêşxistiye dide pêşiya Rêbertiyê, lê Rêbertî vê qebûl nake û red dike. Rêbertî di ya xwe de israr dike. Şerê serokatiyê bi dayîka wî re ji ber wê bû.

Rêbertî ji bo civakbûna xwe çêbike hevalan ji xwe re çêdike, di vir de israr dike. Ji ber ku wê civakbûna xwe li ser bingehê hevaltiyê pêşbixîne. Ew lêgerîna Rêber APO ya hevaltiyê û girêdana Rêbertiyê ya bi hevaltiyê re, ji vir dest pê dike. Her diçe pêş dikeve û xurt dibe, digihêje asta îroyîn. Di Rêbertiyê de hevaltî pir girîng e. Di destpêka gavavêtina xwe de wê li jiyanê û hevaltiyê ti demî îxanetê neke. Wê li axê, gel, nirxên mirovahiyê yên demokratîk û komînal ku berhema kedeke pir mezin e ti demî îxanetê neke. Van ji bo xwe esas digire. Li ser van esasan gav diavêje.

Di hîmê PKK'ê de ev esas in. Pêşengtiya di PKK'ê û Kurdistanê de pêşketî li ser van hîman ava bûye. Ev Rêbertî û PKK li ser van hî-

man pêş ketiye. Ji ber wê her dem di Rêbertiyê de di jiyana azad de israr kirin heye. Derveyî jiyana azad ti jiyanê qebûl nake. Her tişt ji bo jiyana azad e, pêwîst e her tişt xizmeta wê de be. Tişta xizmeta jiyana azad neke, ne rast e. Nêzîkbûna Rêbertiyê ev e, ji ber wê ti demî dest ji azadiyê bernedaye. Wê ji bo azadiyê bijî û ji bo azadiyê bimire. Derveyî vê wê jiyan û mirinê li xwe heram bike.

Heke ewqas sal di bin êrîşan de Rêbertî dest ji azadiyê berneda, sedem ew e. Ger xwe, rêxistin û gel nefirotiye, bi hinekan ve girê-nedaye, teslîmî hinekan nekiriye û nexistiye xizmeta hinekan ji bo wê ye. Hevaltiya Rêber APO pir xurt e. Wê ji bo hevaltiyê bijî û îxa-netê lê neke û şaş nekeve. Wexta mirov îxanetê bi hevaltiyê re nake, tê wê wateyê ku girîngî dide hevaltiyê. Nirxdayîna hevaltiyê her dem ji mirov çi dixwaze? Divê tu her tim hevalê xwe biparêzî, pêş-bixînî û wî bikî hêza çareseriyê. Tuyê hevalê xwe her tim bidî jiyîn, tê xwe bidî ber xeteriyên ku bi ser hevalê te de were, tê hevalê xwe biparêzî û li pêş bisekinî. Tê bi hevalê xwe lewaziyan nedî jiyîn, ji ber ku lewazî bindixîne û dikuje. Tuyê nehêlî hevalê te hewcedarê kesan be, da ku bikaribe di her şert û mercekî de li ser piyan bise-kine û nekeve. Da ku bikaribe xizmeta gelê xwe bike û nekeve, tê nexînî.

Destpêkê heta roja îro bala xwe bidinê, di tekoşîna Rêber APO de hevaltî û jiyana azad de israr kirin heye. Wê çawa bike ku îxanetê neke, şaş nekeve û mezin bide jiyîn. Û di heman demê de Rêbertiyê ji bo hevaltiyê bide jiyîn, hevaltiyê biparêze û mezin bike PKK ava kir.

## Di Rastiya Rêber Apo De Hevaltî Esas e

Rêbertiyê piştî şehadeta hevalê Heqî Karer, ji bo wî bide jiyîn rê-xistin ava kir. Hevalê Heqî di destpêkê de bi Rêbertiyê re hevaltî ki-ribû, bibû alîkarê Rêbertiyê. Piştî şehîd ket, Rêbertiyê ji ber ku he-valtiya wî esas digirt, ji bo hevalê Heqî bide jiyîn PKK pêşxist. Lew-ma hevalê Heqî Karer ji bo PKK'ê her dem dijî.

Hevalên zindana Amedê berxwedaneke bêhempa pêşxistin, bi wê berxwedanê rêxistin û gel parastin. Ji bo parastina rêxistin û gel canê xwe helandin, ketin rojiya mirinê û şehîd bûn. Mazlûm Dogan beriya şehîd bikeve gotibû "pêwîst e deng û qêrîna me, rêxistin bigihîne cîhanê". Rêbertiyê ew berxwedan û daxwaziya wan ji bo xwe wek ferman girt dest. Rêbertiyê ji bo hevaltiyê çi kir? Hizirî ka

çawa dengê wan hevalan bigihîne cîhanê. Ji bo wê Pêngava 15'ê Tebaxê pêşxist. Ew heval wiha dane jiyîn û dengê wan jî gihand cîhanê. Di Rêber APO de hevaltî bihêz e. Ji bo Rêber APO bi hevaltî re jiyîn esas e. Wê ji bo hevaltiyê bijî û ji bo hevaltiyê bijî jî çi pêwîst be dike. Hevaltî mezin kirin, hevaltî dayîna jiyîn bi xwe ye.

Em dibêjin em girêdayî Rêbertiyê ne û hevalên wî ne. Lê di me de hevaltî çawa tê jiyîn? Heke bi rastî em bi Rêbertiyê re hevaltiyê dikin, em milîtanê vî Rêberî ne, pêwîst e em ji xwe vê lêpirsîn bikin. Divê rastiya hevaltiya me derkeve holê. Hevaltî wiha tenê bi axaftinê nabe! Rêbertiya em qebûl dikin wê hevaltiyê esas bigire û ji bo hevaltiyê bijî, her tiştekî ji bo hevaltiyê pêşbixîne; lê em ê rêzê nedin hevaltiyê. Yan jî emê weke xwe nêzî hevaltiyê bibin, emê nirxê û rêzê nedin hevaltiyê. Ji bo em hevalên xwe bixînin emê fitne û fesadiyê bikin, bêrêziyê bikin, weke komplogeran li hevalên xwe komplo bikin. Em ji bo dewsa hevalê xwe bigirin her tiştî dikin. Çi pêwîstiya van kiryarên me heye? Em bi hevalên xwe ve negirêdayîbin, em hevalê xwe di nava kêmasî û xerabiyan de bihêlin; wê çawa ev bibe hevaltiya bi Rêber APO re? Ev li dijî  Rêbertiyê sekin e. Yê ku rastî li pey Rêbertiyê dimeşe û dibêje ez girêdayî Rêbertiyê me, wê ne bi axaftinê, wê bi hevaltî û bi girêdana xwe di piratîkê de evî tiştî ispat bike.

Wê li hemberî kêmasiyên hevalên xwe çavê xwe negre û we nebe temaşevanê kêmasiyên hevalê xwe. Wê di kesayeta hevalê xwe de lewazî, kêmanî û xerabiyê rabike.  Kesayeteke bihêz û milîtanê tevgerê çêbike. Weke çawa Rêber APO milîtanan çêdike wê çêbike. Wê demê mirov dikare bêje girêdan û hevaltiya wî/ê bi Rêbertiyê re heye, Rêbertiyê ji xwe re esas digire. Her kesên vê Rêbertiyê qebûl dikin wê di kesayeta xwe de lêpirsînê pêşbixînin. Rast e, gelek heval bi Rêbertiyê re hevaltiyê dikin, lê di piratîka xwe de berovajiyê vê dijîn. Wê demê pêwîst e, girêdana xwe baş fêm bikin!

## Di Rastiya Rêber Apo De Sînorên Heqîqetê Nîne

Di kesayeta Rêbertiyê de jiyan ancax bi rastiyan re dikare pêk bê. Wê demê jiyan çî ye, li ku ye, mirov çawa dikare xwe bigihîne wê jiyanê? Ev pirsên bingehîn in. Ji ber ku Rêbertiyê jiyana heyî red kiriye û xwestiye jiyaneke azad pêşbixîne. Wê demê jiyana azad jiyaneke çawa ye û mirov çawa dikare xwe bigihîne wê jiyanê? Ev jiyan çawa û li ku çêdibe? Rêbertiyê lêpirsîna vê pêşdixist. Ji ber wê

Rêbertî di parêznameya dawiyê de bêhsa ‘rejîma heqîqetê’ dike û li pey rejîma heqîqetê dibeze. Heqîqet li ku ye, wê çawa xwe bigihîne wê, wê çawa heqîqetê bijî?

Di lêgerîn û têkoşîna Rêberiyê de xwe gihandina jiyana azad esas e. Wê jiyana azad bijî û bide jiyîn. Ji bo ku jiyanê fêm bike, wateyê bidê û jiyanê bidest bixîne, lêpirsîneke mezin dike. Ji xwe yê ku lêpirsînê bike dikare wate bide jiyanê. Watedan li gel Rêbertiyê pir girîng e. Lewma Rêbertî dibêje “fêm kirin pêkanî ne.” Ango fêm kirin pêkanîn e, te çi û çiqas fêm kiribe, tu ewqasî jî pêktînî. Têştên ku neyên fêm kirin, nayên pêkanîin jî. Ger pêkanîn hebe jî wê şaş bibe.

Ji ber wê li gel Rêbertiyê fêm kirin û hêza fêmkirinê çêkirin esas e. Yê ku hevaltiya Rêbertiyê ji xwe re esas digire, wê vê ji xwe re bingeh bigire. Wê di jiyanê de lêpirsînê esas bigire, da ku karibe wateyê bide jiyanê û jiyana divê bê jiyîn û ya divê neyê jiyîn ji hev derbixîne. Ji bo karibe wê jiyana ku dixwaze bijî pêşbixîne. Weke din ne gengaz e mirov bijî.

Çima Rêbertî dikeve nava lêpirsîneke wisa mezin? Ji ber ku jiyana heyî ji jiyanê nahesibîne. Ji bo karibe wê jiyana ku dixwaze pêşbixîne û bide avakirin, lêpirsînê dike, dixwaze hêza wê di kesayeta xwe de bide avakirin. Wê çawa alternatîfê pêşbixîne? Li gel Rêbertiyê lêgerîn, lêpirsîn û lêkolîn her tim bingehîn e. Di Rêbertiyê de ti car têrbûn nîne. Yan jî di lêpirsîn û lêgerînên xwe de digihîje hinek encaman, lê nabêje ez gihêştim encamê û tenê rastî û heqîqet ev e. Wê bes û têr nabîne. Her ku gavan davêje û encaman derdixîne dibêje “gelo hîna mirov dikare encamên din derbixîne, hinek heqîqetên din bibîne? Gelo ev heqîqet e, yan heqîqeteke din jî heye? Dibe ku ez gihabim heqîqetê, lê dibe heqîqeteke din hebe û hîna cudatir be?” Sedema ji pêşketinan têrnebûna Rêbertiyê ev e. Her biguman nêz dibe. Ji bo wê Rêbertî bi van nêzîkbûnên xwe heqîqeta ku heyî dûr û dirêj najî; dema ku di têkoşîna xwe de digihîje heqîqetekê nabêje, ‘ev heqîqeta mutleq e.’ Dibêje, ‘dibe ku heqîqetên din jî hebin.’ Ev her dem dihêle ku Rêbertî di nava lêpirsîn, lêkolîn û lêgrînê de be. Ev di Rêbertî de pêşketinan çêdike. Heke di Rêbertiyê de her dem nûbûn û hêza çareseriyê peyda dibe, ew girêdayî vê rastiyê ye. Ji ber ku di Rêbertiyê de her dem li pey heqîqetê bazdan heye û sînorekî ji heqîqetê re danayne. Lewma di Rêbertiyê de girtîbûn û xetimandin çênabe. Girtîbûn bi kê re çêdibe, bi mirovên ji bo xwe sînoran datîne re çêdibe. Di wan de girtîbûn çêdibe û heya cihekî

nûbûn heye, lê paşê disekinin û girtîbûn dest pê dike. Heke di Rêbertiyê de ev çênabe, ji ber vê yekê çênabe. Di Rêbertiyê de wate dayîn bingehîn e. Heta wate nede tiştan, rehet nabe. Heta digihîje wate dayînê lêkolîn, lêgerîn, lêpirsîn û têkoşîna xwe didomîne. Ev nahêle Rêbertî lewaz bibe, û Rêbertiyê bihêz dike û pêşdixe. Ji ber ku Rêbertiya vê tevgerê gavan paş de navêje, tevger her dem pêşveçûnê dijî û nakeve. Heke tevger ewqasî li hemberî êrîşên derve disekine ji ber wê disekine. Heke ne ev ba tevgerê wê nekarîba li hemberî van êrîşan ewqasî berxwe bidaya. Her kes dibêje, 'tevger çawa li hemberî ewqas êrîşan li ser piyan disekine?' Rastî bi tiştên me behsê kirin ve girêdayî ye.

Em dibêjin, em hevaltiya vî Rêbertiyê ji bo xwe esas digirin, baş e, di me de çi dijî? Gelo di me de çiqas lêpirsîn heye, çiqasî em nûbûnê, watedanê di xwe de pêşdixînin? Ev di me de lewaz e û di hinekan de jî nîne, di yê heyî de jî pir lewaz dijî. Em bi hinek tiştên derdikevin têr dibin. Em du gavan diavêjin, em dibêjin, 'rastî ev e û xelas, em gihêştin rastiyê; weke din rastî ne pêwîst e.' Ev li gel me çi çêdike, şaşitiyan, girtîbûnê û wendakirinê dide jiyandin. Baş e, ev çawa dibe hevaltî û girêdana bi Rêbertiyê ve? Milîtanên ku vî Rêberî esas digirin, wê her dem wate bide tiştan; lêpirsîn, lêkolîn û lêgerînê bikin. Wê ti car nebêje heqîqet ev e, wê her dem di lêgerîna heqîqetê de be. Wê demê rast e, ew milîtanî milîtaniya Rêbertiyê ye. Xwe çêkiriye û li ser rastiya Rêbertiyê milîtaniyê dijî.

Nêzîkbûna Rêberiyê ya di derbarê jiyanê de li dijî sîstemê ye. Rêbertiyê jiyana heyî qebûl nekiriye û red kiriye. Ev çi îfade dike? Ev redkirina sîstema heyî ye. Ji ber ku jiyana heyî ya wê sîstemê ye, li dijî wê jiyanê derketin, li dijî wê sîstemê derketin e. Ev di bingeh de vê rastiyê îfade dike. Dibe ku di wê demê weke tê xwestin ev formûle nekiribe, wate û zanebûna wê demê têra manedayînê nekiribe, lê vê îfade dike. Heke Rêbertiyê ji bo xwe sîstem esas negirtibe û bandora vê sîstemê li ser Rêbertiyê û tevgerê çênebûbe, ew jî bi vê rastiyê ve girêdayî ye. Rêbertî di serî de li dijî wê jiyana ku sîstemê li Kurdistanê ava kiribû rabû. Ji lewra wê sîstemê qet serweriya xwe li ser Rêbertiyê nekiriye. Her ku çû Rêber APO xwe ji wê sîstemê qut kir. Loma Rêbertiyê wê bikeve nava lêgerîna sîstema ku dixwaze bike alternatîf û pêşbixe. Lêgerîna jiyaneke alternatîf, ketina nava pergaleke alternatîf e û gera li wê ye.

Li gel Rêbertiyê tişta ku pêkhatiye çî ye? Rêbertî her dem bi sîstemê re di nava nakokî û şer de bû ye. Ji bo wê pergala xwe pêşdixe. Heke her dem bi pergala heyî re nakokiyên wî nebûna, ew red nedikir, nedikarî sîstema xwe jî pêşbixe. Di me de çi tê jiyîn? Em dibêjin em hevalê Rêbertiyê ne, em Rêbertiyê esas digirin. Lê em têkiliyên xwe ji sîstemê qut nakin û em teqlîdê dijîn. Heta em bi hinekan teqlîdê didin jiyîn. Hinek newêrek in û newêrin bi xwe weke sîstemê bijîn, sîstemê bi dorberên xwe didin jiyîn, da ku ew jî rehet xwe bidin jiyîn. Ji bo xwe cih çêdikin. Ji ber wê çendê em nakevin nav sîstema Rêbertiyê. Ev çawa dibe hevaltî û girêdana bi Rêbertiyê ve? Yên ku girêdanên xwe bi Rêbertiyê re hebin, wê têkiliyên xwe weke Rêbertiyê ji sîstemê qut bike. Yê pergala Rêbertiyê ji bo xwe esas bigire, wê her dem xwe mezin bike da ku karibe bibe hevalê Rêbertiyê. Heke ne wisa be wê demê nabe. Ew hevaltiya bê kirin jî hevaltiyeke sexte ye, hevaltiya sexte jî mirinê bi xwe re tîne. Komployê, tasfiyegerayiyê çêdike û pêşdixe.

Zemînê ku niha li Kurdistanê çêbûye, zemînekî her dem lewaziyê, pirsgirêkan û tasfiyê avadike. Ji ber ku dagirkeriyê civak û ferdê Kurd parçe-parçe kiriye, hilweşandiye, pir lewaz û bêtaqet hîştî ye. Loma di mirovê Kurd de bi xwe bawerbûn, li ser hêza xwe rabûn lewaz e. Her dem ji xwe bêbawer e, li ser hêza xwe ranabe û çavê xwe pir zêde berdana derve heye. Ev timî têgihîştinên şaş û xeter pêşdixîne. Ev zemîn tasfiyegeriyê bihêztir dike, hîmê wê pêşdixîne. Dema êrîşên derve jî li ser tevgerê pir pêşdikevin, ev zemîn hîna xurtir dibe. Lewra her dem pêwîstî bi şerê îdeolojî, rêxistinî, rexne û rexnelixwegirtinê heye. Da ku mirov bikaribe vî zemînî tasfiye bike. Heke wiha te şerê îdeolojyê, rêxistinê, rexne û rexnedayînê pêşnexist, wê demê rêxistin lewaz dibe û tasfiyegerî serwer dibe. Temaşe bikin cihê ku şerê îdeolojî û rêxistinî tê de lewaz bûye, rexne û rexnedan lewaz bûye, li wir tasfiyegerî bihêz bûye. Mirov dikare vê di piratîka rojane û di dîrokê de jî bibîne. Kesayeta ku her dem şerê rêxistinî, îdeolojî, rexne û rexnedayînê bi xwe re pêşxistiye nahêle ku tasfiyegerî di şexsê wî/ê de pêşbikeve. Yên wiha nahêlin di nava rêxistinê de jî ev tasfiyegerî pêşkeve. Yanî ji xetê û rastiyê dûr nakeve û qut nabe. Ji PKK'ê û rastiya Rêber APO qut nabe û dûr nakeve. Wiha nebe wê dûrkeve, qut bibe. Wê bi temamî qut bibe û biçe îxanetê. Kes dema qut dibin û diçin îxanetê ji ber wê ye, ev bi niyeta însên ve ne girêdayiye.

Rêber APO di kesayeta xwe de çi û di kîjan astê de pêkanîbe, daye kadro û gel jî. Ev rastiyek e, rastiya Rêbertiyê ye. Ti caran tiştên di kesayeta xwe de pêkaniye, ji bo xwe tenê pêk neaniye. Ji bo rêxistinê, gel û mirovahiyê pêkaniye, kiriye xizmeta rêxistin, gel û mirovahiyê. Xwestiye vê astê di kadro û gel de jî pêşbixe. Ji bo wê têkoşîn kiriye. Her çiqas hinek encam girtibin jî, lê bi temamî ew hedefa ku xwestiye di kadro û gel de pêkbîne, pêkneaniye. Ev jî girêdayî rastiya civak û însanê Kurd e. Sedem jî texrîbata mezin a ku ji alî dagirkeran ve di civaka Kurd û însanê wê de hatiye avakirin e. Ji ber wê zû zû mirov nikare wê texrîbatê rabike. Tu hewqas kar dikî, lê pêşketin kêm e. Rêbertiyê ne ku kêm kar kiriye, lê asta ku di xwe de çêkiriye xwestiye kadro û gel jî bîne wê astê.

Rêbertiyê her tişt kir û jiyana xwe ya şexsî li xwe heram kir, lê encama girtî, ne li gorî karê kiribû ye. Sedem jî, wekî me anîbû zimên, texrîbatên ku dagirkeriyê çêkirî ye. Ev dihêle fêm kirin dereng çêbibe, kêm çêbibe û dirêj bikişîne. Kar pir tê kirin, lê belê encam kêm tê girtin. Ev jî rastiyeke, ji rastiyên civaka me ye. Demeke dûr û dirêj gelê me koledarî jiyaye, gelê me ne weke gelên din e. Her tiştê wî ji dest hatiye girtin. Mirovahî ji dest hatiye girtin, dijmin ew ber bi lawirkirinê ve biriye. Rêbertiyê ev civak ji wir zivirand. Ev hemû di kesayetê de dibin sedem ku, pêşketin dereng be, zanebûn kêm be, hêza çareseriyê dernekeve holê. Divê milîtan vê ji bîr neke, wer xwe nexapîne û nebêje “min kar kir û encam girt”. Ev xwe xapandineke mezin e. Divê her dem kar bike û li encamê bigre. Belkî li gorî karê kirî kêm encam girtibe, dema ev dît divê hê zêdetir xebatê bike. Da ku karibe vê rastiyê biguhere. Wekî çawa Rêbertî dike.

Em milîtanên vî Rêberî ne, baş e, em tarzê Rêberiyê çiqasî ji xwe re esas digirin? Heke me ev di xwe de ava kiribe, em çiqasî didin derdora xwe? Bi hevalên xwe re em çiqasî parve dikin, em ji bo wê çiqasî têdikoşîn? Lê ya em dikin çî ye? Em encama karê me kirî, ji bo xwe bikartînin. Ti caran em naxwazin bikin xizmeta heval û gelê xwe. Û wan bi xwe re pêşnaxînin. Em ji xwe re dikin sermaye. Dema ji bo me pêwîst kir em ji bo xwe bikar tînin. Yanî em ji bo xwe ne! Şoreşgerî û milîtaniya ku em dikin tenê ji bo me ye. Heke em şoreşgeriyê ji bo rêxistin û gel bikin, em ê bi temamî wê bikin xizmeta wan. Rêber APO ev kir, di vir de rastiya Rêber APO derdikeve holê. Tê diyarkirin ka em çiqasî vê rastiyê dijîn.

Ji ber ku Kurd di bin siyaseta dagirkeriyê de hatiye belavkirin, ji rastiya xwe dûr ketiye, dagirkeriyê rastiya xwe li ser wan ferz kiriye, mirovê Kurd êdî baweriya xwe bi xwe wenda kiriye û ji her aliyê ve dagirkerî jiyaye. Ji bo dagirkeran jiyan kiriye. Di encamê van de çi pêşketiye? Kesayeta Kurd ji axa xwe dûr ketiye, yanî bûye xayînê ax, civak û jiyana xwe. Pir milan ve bûye dijminê xwe. Heke mirov her tiştê xwe wenda bike, ji bo xwe nejî, ji bo hin kes û derdoran bijî û bimire; ji bo hinekan bike, mirov dibe yekî din û dibe xayîn. Di bin siya dagirkeriyê de ya ku di Kurdan de pêkhatî ye ev e. Kîn û nefreta Rêbertiyê li hemberî vê ye. Rêbertî ji Kurdên wiha nefret dike. Kurdên ji jiyan, ax û gelê xwe biyanî bûye. Ji ber ku xayîntiyê qebûl nake. Rastiya Rêber APO li dijî vê sekin e û şer kirin e. Ev red kirin e û ev ji bo xwe şerm dîtin e. Ji ber wê di Rêber APO de ji bo jiyana azad, hevaltiyê, gel, axê, mirovahiyê, nirxên mirovahiyê ti car qut bûn û dûrketin çênebûye û qet çênabe. Di destpêkê de Rêbertiyê gotiye "ez ê li van qet îxanetê nekim." Derketina Rêbertiyê li ser vî esasî ye.

Rêbertî her tiştî dike, da ku ters nekeve û îxanetê neke. Lewra Rêbertî ters neketiye û îxanet nekiriye û nake. Ax ji bo Rêbertiyê dayîk e û çawa dayîk serkaniya jiyanê ye, ax jî serkaniya jiyanê ye. Yê li axê îxanet kiriye, li jiyanê îxanet kiriye. Da tersî axê nekeve, têkoşînê, şer û welat esas digire. Lewra ti carî Rêbertiyê dest ji axê bernedaye.

Wexta mirov li welêt temaşe dike, dibîine ku dagirkeriyê her tişt ji dest mirovê Kurd girtiye, tiştê heyî jî dijmin daye pêş, û berê wan daye dagirkeriyê. Kurdan êdî axa xwe wenda kirine; ax û welat ji bo Kurdan êdî ne tiştek e. Ji bo Kurdistanê tênakoşe, dikare rehet berê xwe bide cihên cuda û Kurdistanê terk bike. Wer fêm dike ku dikare bêax û li ser axeke din jî bijî. Jixwe mirov dema ji axê qut dibe, mirov ji jiyanê jî qut dibe. Mirov ji rehên (kokên) xwe qut dibe. Mirov xwe û jiyanê wenda dike. Lewra di kesayeta Rêbertiyê de ji axê dûrneketin, û li ser axa xwe têkoşîn kirin bingehîn e. Rêbertiyê dema heval perwerde dikir wiha digote wan: " divê hûn biçin ji nû ve welat û kokên xwe çêbikin. Da ku hûn careke din bêkok nemînin, çawa darek kokê xwe berdide bin axê û xwe kûr dike ku wer jiyan bike û hişk nebe, divê hûn jî heman tiştî bikin. Divê hûn li çiyayê Kurdistanê di wê axê de kokên xwe berdin bin erdê. Dema we kokê xwe berda nav axê, hûnê şîn bibin û bijîn."

Rêbertî kar û xebata xwe ji bo wê pêşdixîne. Karê Rêbertiyê koka xwe di erdê de berdan bû, hem jî koka xwe kûr avêtin û ji jiyanê û erdê nequtbûn bû.

Eger di Rêbertiyê de îxanet çênebûye û Rêbertî nêzî îxanetê nebûye, timî li dijî îxanetê şer kiriye, ev girêdayî vê rastiyê ye. Di Rêbertiyê de çanda îxanetê pêşneket, bi vê ve girêdayî Rêbertiyê sîstem û dewlet ji xwe re esas negirt û nagire. Di zarokatiya xwe de ji vê pergalê nefret kiriye, li dijî wê timî li alternatîfê hiziriye, ka wê çawa karibe alternatîfekî pêşbixe. Ji ber wê li dijî îxanetê û çanda wê nefretek pêşxistiye û li Kurdistanê îxanet bêbandor kiriye. Rêber APO di serî de gotiye “jiyana ku her kes dijî, ez najîm.” Pergal red kir, îxanet red kir, durûtî red kir, xapandin û eyarkirin red kir. Ev çand û exlaq hemû yên kê ne? Ên pergala desthilatiyê ne. Pergal û çîna desthilat her dem dikare xwe li ser xapandinê, durûtiyê û îxanetê pêşbixîne, weke din ne gengaz e ku karibe pêşbikeve. Ew kesayeta ku çanda xapandinê, durûtiyê esas digire, tê wateya ku çanda kesayeta desthilatiyê esas digire. Di çanda civaka jêrîn de ango çanda gel de ev nîne. Durûtî, xapandin, îxanet, dekûdolab û eyarkirin nîne. Çîna desthilat ji bo civaka binî bixapîne, ev hemû afirandiye. Divê em vê yekê fêm bikin ku di ew kesayetên ku sîstema desthilatiyê dijîn de ev taybetmendiyên xirab hene. Di çand û kesayeta PKK’ê de ti carî cihê durûtiyê, dekûdolaban, fitne û fesadiyê nîne. Kesayetên ku ev pê re hebin, divê mirov bizane çand û sîstema dijmin dijî. Divê mirov vê tesbît bike û li ser raweste. Heke ew kesayetên wiha ji wan teybetmendiyan neyên rizgarkirin, xeternak dibin. Çawa fersendê dibînin, xapandinan û derewan dikin.

Temaşeyî dîrokê bikin, desthilatdaran her dem desthilatiya xwe bi zordariyê, durûtiyê û derewan dane meşandin. Weke din ne gengaz e desthilatî serweriya xwe bide meşandin. Li vê derê kesayeta xeternak di nava PKK’ê de kîjan e? Ew kesayeta ku durûtiyê û xapandinê ji xwe re bingeh digire ye, dîsa yên ku pêdiviya derewan dibînin xeternak in. Ger mirov li yên wiha de sererastkirinekî çêneke, ew ê desthilatiyê pêşbixînin. Jixwe wê çetetiyê û her cûre xerabiyê bidin pêş. Mirov dema dîroka PKK’ê baş lêkolîn bike, di kesayetên wiha de çetetî, şerê desthilatdariyê û hwd, dîsa hemû rengên xerabiyê dibîne.

Prensîbên Rêber APO ji jiyana azad û nû re hene. Rêber APO, ji bo jiyanê got: “ey jiyan, yan ez ê wateyên pir mezin li te barbikim,

yan jî ez ê weke ku min te qet jiyan nekir, qebûl bikim”, ev pîvanek e. Rêgezên xwe çawa formîle kir, yan jiyanê azad be yan jî wê nebe. Nêzîkbûna xwe ji jiyanê re wiha ye û li ser vî bingehî ye. Pir zelal e û biprensîb e. Rêber APO ti carî ji vê prensîbê gav paş de neavêtiye. Rêber APO her tim li gorî vê prensîbê jiyaye û her tim jiyana xwe li gorî vê prensîbê avakirî ye. Derveyî vê prensîbê, jiyan li xwe heram kir û tiştekî re jî negot ‘ev jiyan e.’ Li gorî Rêber APO jiyanê yan azad be, yan jî wê nebe. Yan tê hinek tiştan li jiyanê barbikî, tê wate bidiyê, ger te wiha nekir jî, tê bizanibî ku te ew jiyan, nejiyaye. Prensîb ev e. Her milîtanekî PKK’ê wê vê ji bo xwe esas bigire û wiha nêzî jiyanê bibe. Weke din bi Rêbertiyê re hevaltî kirin nabe.

Ya ku di kesayeta me de tê dîtin çî ye? Em dibêjin, “em dikarin wiha jî bijîn.” Em bêprensîb dijîn. Lê em ji xwe re dibêjin “em jiyanê rast dijîn û em hevalê Rêbertiyê ne.” Bi Rêbertiyê re wiha hevaltî nabe, tenê li ser wan prensîbên me gotî de hevaltî bi Rêbertiyê re dibe. Ger milîtanek wiha nêzîkî jiyanê û Rêbertiyê bû, rast nêzîk dibe.

Li Kurdistanê yekem car bi Rêber APO re jiyan çî ye, mirin çî ye, gihîşt maneya xwe. Beriya wê ti wateya wê nebû. Beriya Rêbertiyê jiyan çî ye û çi nîne, nedihate fêm kirin. Mirovê Kurd hebû-tinebû, diyar nebû. Her roj mirin dijiya û digot, ‘ez dijîm.’ Ji bo kê û ji bo çi dijiya û dimir, ji bo kê û çi dimir nedizanî. Nedizanî jiyana wî xizmeta kê dike. Bi Rêber APO re ev hemû ji nav hev hatin derxistin, hatin zelalkirin û gihêştin wateya xwe.

Mirov bala xwe bidiyê Rêber APO di xwe de çi pêşxist? Ji malbatê qutbûn, ji gund qutbûn pêşxist. Çima ji malbat û gund qutbûn? Ji ber ku di wê malbatê û wî gundî de jiyaneke azad nebû. Ji bo wê qutbûn esas girt. Serokatî dibêje: “heke wisa be, di vî gundî û malbatê de ez nikarim jiyaneke azad pêşbixînim, wê demê divê ez di vê malbatê de nejîm.”

Hedef û armanca Rêbertiyê jiyaneke azad e, ji lewra li dijî malbatê û gund sekinî, berê xwe da bajêr. Di malbat û gund de li wê jiyana azad digeriya û ew jiyana azad nedît. Wê demê pêwîst bû li derveyî malbatê û gund li wê jiyana azad bigere. Sedema berê xwe dana bajêr ew bû û dûrî malbatê û gund ket. Ev qutbûn çi îfade dike? Di heman demê de ji nirxên komînal û demokratîk jî qutbûnê û berê xwe dana dewletê jî îfade dike. Dibe ku pir bi zanebûn nebe, lêgerîn ji bo jiyaneke azad be, li gund nikaribûye wê peyda bike û

wir terk kiriye. Lê tişta tê jiyîn, di heman demê de ji nirxên komînal û demokratîk qutbûn e û berê xwe dana dewletê ye. Ji ber ku şaristanî li ser dewletê ava bûye, û berê xwe dana bajêr jî, ber bi dewletê ve çûyînê îfade dike.

## Di Rastiya Rêbertiyê De Lewazî Dibe Sedema Bihêzbûnê

Em niha li malbata Rêbertiyê binêrin ka malbateke çawa ye? Bavê wî, ne kesayetekî bihêz e, kesayetekî lewaz e. Dayîk jî pir bihêz e, di malê de otorîte ye. Hem bandora bav hem a dayîkê li ser Rêbertiyê çêdibe. Rêbertî ji otorîteya dayîkê, wê çawa xwe bike hêza çareseriyê digire, ji lewaziya bav jî, wê çawa xwe ji lewazbûnê xelas bike û xwe têke hêz ê digire. Vê ji xwe re esas digire û dike prensîb. Destpêkê ev ji bo Rêbertiyê dibe prensîb, paşê jî ji bo PKK'ê dibe prensîb. Taybetmendî û prensîbên Rêbertiyê di heman demê de yên PKK'ê ne. Rastiya PKK'ê rastiya Rêbertiyê ye. Mirov nikare Rêbertiyê û PKK'ê ji hev cuda bigire dest. Dibe ku bi temamî hemû rastî ne weke hev bin, lê belê cuda jî nînin. Rastiya Rêbertiyê rastiya PKK'ê ye.

Wê Rêbertiyê ji taybetmendiyên bavê xwe çi derxe zanebûnê? Wê xwe çawa ji bin bandora dagirkeriyê, ketinê û bêhêziyê rizgar bike? Rêbertî vê ji bo xwe esas digire. Lewra wê Rêbertî ji bindestiyê û ketinê şerm bike. Wê vê bike sedemeke bingehîn ya kîn û nefretê. Wê çawa bike ku lewaziyê rake û xwe bike hêza serkeftinê. Wê vê ji bo xwe esas bigire. Di hilhatina Rêbertiyê û tevgera PKK'ê de ew hest heye. Ew hesta ku ji bêhêziyê û koletiyê şerm dike. Lewma jî wê her tiştî bike, da ku bikaribe xwe ji vê şermê xelas bike.

Rêbertiyê ji wê rewşa ku civak û mirovê Kurd di bin hukmê dagirkeriyê de ketibû pileya mirinê şerm kir. Ji bo Kurd ji wê rewşê xelas bibin têkoşiya. Di bingehê wê têkoşînê de ev hest heye. Prensîb û rastiya Rêbertiyê ev e.

Lê ya ku bi me re heye çî ye? Em ê çawa xwe ji pozîsyona bêhêziyê derxin,? Em ê çawa lewaziyê bikin sedema hêzbûna xwe? Em ê çawa kesayeteke wer bihêz ya ku rêxistin dixwaze derxin holê. Em ê çawa civakeke bihêz derxînin holê? Em vê ji xwe re qet bingeh nagirin. Ji ketinê em şerm nakin, em wê nakin sedemeke têkoşînê. Li vir em çi dixwazin? Em dibêjin: "bila hevalên bihêz bên gel me, bila derfetên xurt bidin me." Ev nêzîkbûna me ye. Binêrin li saziyên me, tenê ne sazî her hevalekî/ê me dixwaze xwe ji hevalên

lewaz xelas bike, dixwaze kesên lewaz yê li gel xwe bişîne cihekî din, bi vî rengî xwe ji wan xelas bike. Nabêje ev hevalê min nirxek e, ger di wê lewaziyê de bimîne ji bo me şerm e, çi dibe bila bibe divê ku ez hevalê xwe ji vê rewşê xelas bikim. Vê ji xwe re bingeh nagire. Li şûna vê ji gel xwe derdixe û dişîne cihekî din. Vê ji bo xwe şerm nabîne, lewra vê nêzîkbûna xwe xwezayî dibîne.

Mirov dinêre gelek kes dibêjin, 'hevalên lewaz ji me re neşînin, yên xurt ji me re bişînin.' Bê ku şerm bikin van gotinan dibêjin " hevalên ku pirsgirêkên xwe tinebin ji me re bişînin, bila qet lewaziyên wan tinebin." Ev tê vê wateyê yên herî bihêz ji xwe re dixwaze. Ev jî nêzîkbûnek ji wan nêzîkbûnên me yên li gorî xwebûnê ye. Li vir çi têkiliya vê nêzîkbûnê bi nêzîkbûnên Rêbertiyê re heye? Ti eleqeya van nêzîkbûnan bi yên Rêbertiyê re nîne! Di rastiya Rêbertiyê de her dem dayîn û lewazî ji holê rakirin, nêzîkbûneke bingehîn e. Di mirovekî lewaz de hêza çareseriyê çêkirin, kesayetek bihêz çêkirin esas e. Rêbertî wer nabêje "ev lewaz e bikêr nayê, ez vî/ê bavêjim cihekî din û xwe jê xelas bikim." Rêbertî ti car wiha nabêje. Ev nêzîkbûnên me li gorî prensîb û rastiya Rêbertiyê, hem berovaj in, hem jî şaş in. Lê mixabin, ya ku di me de dijî jî ev e. Ev çawa dibe hevaltiya bi Rêbertiyê re? Çawa dibe girêdana bi Rêbertiyê ve?

Rêbertî mirovê lewaz digire û wan bihêz dike, vê ji xwe re peywir dibîne, lê em vê ji bo xwe peywir nabînin. Em dixwazin xwe jê xelas bikin. Em dibêjin "em girêdayî Rêbertiyê ne". Heke heval bala xwe bidinê em li derveyî rastiya Rêbertiyê ne. Em Rêbertiyê bihêz nakin. Em Rêbertiyê nakin hêz. Em Rêbertiyê lewaz dihêlin. Em weke Rêbertiyê kar nakin. Em li gorî xwe kar dikin. Tişta li hesabê me tê em wê dikin. Ya rastî jî civaka me civakeke lewaz e. Ji ber ku demdirêj di bin hukmê dagirkeriyê de maye, însanê me însanên lewaz in. Ev jî rastiya me ye.

Heke rastî wiha ye, tu jî ji bo vê civakê kar dikî, erka te mirovê vê civakê ji lewaziyê derxistin e. Heke tu wisa tevgeriyayî tu rast dixebitî, bi rastiya Rêbertiyê re dijî. Lê na tê heta dawiyê ji vê peywirê birevî, tê mirovê bihêz û bêpirsgirêk bixwazî ku tu xwe qet neêşînî, nexasim mirovên wiha jixwe nîne, paşê jî tê bêjî "ez milîtaniya Rêbertiyê dikim." Ev, nêzîkbûneke şaş e.

Beriya niha jî me gotibû dagirkeriyê li Kurdistanê civakbûn belav kiriye. Hest û fikra mirovê Kurd nehîştibû. Ruhê mirovê Kurd şikandibû, reş kiribû, hest û fikirê mirovê Kurd ji rê derxistibû. Bi

temamî Kurd xistibû xizmeta dagirkeriyê. Êdî Kurdan hest, ruh û fikra dagirkeran dijiya. Ji ber vê êdî ketibû xizmeta dagirkeran. Dagirkeran li Kurdisatnê tenê malbat hîştibû. Bi navê Kurd û Kurdistanê rêxistin nehîştibû, hemû belav kiribû. Ji bo însanê Kurd derveyî rêxistina malbatê ti hêz û rêxistin nemabûn. Ji ber ku rêxistin û hêza ku xwe bispêriyê nemabû, tenê di dest de malbat mabû. Ji bo wê jî însanê Kurd xwe bi malbatê ve girêdabû. Ji bo wî/wê yek tişt hebû, ew jî malbat bû. Derveyî malbatê ti tiştê wî/wê nebû.

Ger li Kurdistanê ewqasî malbat bihêz e, sedem ev e. Li ti welatên din tu malbat evqas bihêz nîne. Ji bo mirovê Kurd hebûn-tunebûna wan malbat e. Tenê bi wê dikare bijî, derveyî wê nikare bijî. Dijmin ev bi zanebûn çêkiriye û pêşxistiye. Heke malbat wiha çêbe, jixwe wê di malbatê de zilam bihêz be. Wê demê jî malbat dibe ya zilam. Di malbatê de zilam dibe her tişt. Jin jî dibe koleya wî. Derveyî têkiliya cinsî ti tiştekî din ji însanê Kurd re namîne. Binêrin dijmin tenê têkiliya cinsî di dest Kurdan de hîştiye, qedexe nekiriye. Her tiştê din qedexe ye, tenê têkiliya cinsî ne qedexe ye û bêsînor e. Bi vê tenê tu dikarî nifşê xwe bidomînî. Ev dide îfadekirin ku, civak hatiye belavkirin, asîmîlekirin û mirov ji mirovbûnê hatine derxistin. Mirovê wê civakê daxistine pileya lawiran. Ji ber ku heywan jî nifşê xwe bi têkiliya cinsî didomînin. Ya di nav Kurdan de daye jiyîn ev e. Loma ev gotin di nav Kurdan de tê gotin “dema pere bi dest Kurdekî dikeve, yan jinekê tîne yan mêrekî dikuje.” Ev mînak binav û deng e. Ev hemû encamên kiryarên dagirkeriyê ne. Dagirkeriyê însanê me kiriye vê rewşê. Ji ber ku li Kurdistanê civakbûn hatiye belavkirin û tenê malbat jê re hîştiye, malbata heyî jî li ser hîmê pergalê hatiye avakirin, tenê tê de bêsînor têkiliya cinsî dijî. Vê bi xwe re li Kurdistanê çi çêkiriye, civakek û mirovek nexweş çêkiriye. Heke civaka Kurd nexweş e, an jî seqet e, ji ber vê ye.

Civaka ku mirovê wê ewqas nexweş û seqet dibin, di wê civakê de pirsgirêkên kesayetê yên xurt derdikevin. Di wê civakê de pirsgirêka herî dijwar pirsgirêkên kesayet, îrade û nasnameyê ne. Heke di Kurdisanê de nasnamê, îrade ewpas zehmet pêşdikeve, sedema vî tiştî yek jî ev e. Ev bû sedemek ji bo ku Rêber APO giraniyê bide pirsgirêka îradê, nasnamê û kesayetê. Ji ber ku mezintirîn pirsgirêk ya kesayet, îrade û nasnamê ye. Heke mirov van pirsgirêkan çareser neke, encam nayê girtin û li wir pêşketin çênabe.

Di nav PKK'ê de sedema ewqas li ser meseleya kesayetê, îradê û bûna xwedî nasnameyê sekinandinê, rastiya ku Kurd tê de dijîn e. Li vir mirov dikare vê jî bipirse, gelo çima tevgera PKK'ê pêşket û yên din peşneketin? Sedemek ji yên pêşketina PKK'ê ew bû ku pirsgirêkên kesayetê baş girt dest. Beriya PKK'ê kes li ser kesayeta Kurd, nasname û îradeya Kurdan nesekinî bû. Tevgerên derdiketin dixwestin bi wê kesayetiya ku bi destê dagirkeriyê hatibû hûnandin, şoreşê çêkin. Ev negengaz bû. Bala xwe bidinê yên wiha nêzîkbûn, yekî ji wan jî encam negirt. Tenê PKK'ê encam girt, ji ber ku PKK'ê rastiya Kurdan girt dest. Rastiya dagirkeriya ku li Kurdistanê pêşketiye fêm kir. Wê dagirkeriyê di Kurdistanê de di kesayeta Kurdan de çi çêkiriye fêm kir. Ew baş fêm kir û analîz kir, wisa destpêkir û di wir de çareser kir. Ji ber ku heke di wir de çareser nebûya, te nedikarî encamê bigirî. Lewra PKK'ê giranî da mesela nasnamê û ewqas pêşketin û guhertin çêbûn. Her kesê digot "PKK çima ewqas li ser mesela kesayetê disekine?" PKK ji bo wan tiştên ku di civakê de pêkhatibûn fêm bike û derbas bike, li ser wan pirsgirêkan disekinî.

Lêgerîna Rêbertiyê Ji Bo Avakirina Civakê Ye

Dayîka Rêbertiyê di malê de xwedî otorîte bû. Exlaqê jiyanekî, civakbûnekî dida pêşiya Rêbertiyê. Rêbertiyê ji bo wê dayîka xwe qebûl nekir, ew red kir. Ji ber ew tiştên ku dayîka Rêbertiyê jê re digot di civaka heyî de israrkirin bû. Ew Rêbertiya ku di zarokatiya xwe de dixwest ji zarokan re pêşengtiyê bike, paşê dest avête dîn ku xwe pê kûr bike. Û xwe wiha bi civakê bide qebûl kirin, li derdora xwe civakeke dînî ava bike. Dema dît ew jî armanca wî pêk nayîne, di dibistanê de xwest xwe bike xwendevanekî baş û xwe bi mamosteyan û xwendekaran bide qebûlkirin. Bi vî rengî bikaribe bandora xwe zêdetir bike. Ev hemû ji bo civaka xwe çêkirinê ne. Wê demê Rêbertî tim û tim di nav lêkolînê de ye û dixwaze zarokan li derdora xwe bicivîne. Dît bi wê jî çênabe, li ser civakê bandora dîn heye, xwest xwe di wê de kûr bike. Lê dît ku zêde encam dernakeve, paşê berê xwe da xwendinê û xwest bibandor be. Ev lêgerînên Rêbertiyê hemû ji bo civaka xwe ava bike ye.

Dema ku Rêbertiyê xwest dibistanê bixwîne, ev meyla ber bi dewletê ve bû, ber bi dewletê ve gav avêtin bû. Wateya wê ev e û vê îfade dike. Ev terka civaka xwezayî, û nirxên demokratîk û komînal

bû. Ev ber bi sîstema dewletê ve gav avêtin e. Ji malbat û gund qutbûn û berê xwe dana bajêr, xwendin, karmendî, çi îfade dike? Vê îfade dike, ka wê çawa bibe zilamê dewletê. Ber bi fikreke wiha de çûn e. Dîsa mirov dikare bêje terka kesayeta xwezayî ya gund e, û kesayeta bajêr-dewletê ji bo xwe esas girtin e.

Rêber APO dema dibîne ku nikare jiyaneke azad pêşxîne, ji malbatê û gund qut dibe. Êdî pêwîst e li derveyî wir li wê jiyanê bigere. Lewra jî berê xwe dide bajêr. Gava yekê ya ku diavêje çûna Nîzîpê ye. Li wir ji bo ku karibe bi rengekî xwe rêve bibe, dest bi kar dike. Dawiyê beşdarî ezmûnên dibistanan dibe. Dema dibîne ku li Tirkiyê leşker siyasetê dikin û yê serwer ew in, meyla xwe ji bo leşkeriyê çêdibe. Dibêje “ez bikevim bin banê leşkeriyê û bibim general, wê demê ez dikarim armanc û hedefên xwe pêkbînim.” Heke daxwazeke Rêbertiyê ya ketina nav hêzên leşkerî heye, ji bo wê ye. Ji bo ku armanca xwe pêkbîne. Lê belê hêzên leşkerî wî qebûl nakin. Ji ber çi Rêbertiyê nagirin? Ji ber ku Kurd e, di bingehê xwe de ji malbateke feqîr e. Wî ji bo xwe xeternak dibînin. Ev nêzîkbûn ji bo Rêbertiyê dibe pirsgirêk.

Hizirandina Rêbertiyê ew e wê çawa xwe ji wê rewşê derxe, wê çawa hedefên xwe pêkbîne? Heke sedema neqebûlkirina wî ya hêzên leşkerî feqîrî û Kurditiya wî ye; wê careke din bikeve nav lêgerîn û lêkolînê. Mirov bala xwe baş bidiyê tim û tim Rêbertî di nav lêkolînê de ye. Li gund digere nabe, li dîn digere nabe, li xwendinê digere nabe, li leşkeriyê digere nabe, ji wan yek jî wî têr nake. Û dibîne ku armanc û hedefên wî bi wan tiştan pêknayê û nikare xizmetê bike. Dema ku wî nagirin leşkeriyê û sedem jî ji ber ku Kurd e û feqîr e di hindirê wî de li dijî dewletê nerazîbûneke mezin pêşdikeve. Ji gund berê xwe dabû bajêr û dewletê, li bajêr nerazîbûna xwe pêşdikeve. Ev nerazîbûn lêkolîna Rêbertiyê ber bi sosyalîzmê ve dibe. Dibîne ku sosyalîzm hinekî bersivê dide lêgerîn, hedef û armancên wî. Hêrsa xwe dide sosyalîzmê da ku karibe xwe kûr bike û karibe armancên xwe pêkbîne.

Destpêkê ji ber ku Kurd bû, li Stenbolê diçe DDKO (Ocaxên Çandê yên Şoreşger ên Rojhilat)’ê. Ji ber ku Rêbertî bi xwe jî Kurd e, meyla xwe ji bo wê tevgerê çêdibe. Lê belê, demeke pir kin di nav de dimîne û dibîne ku DDKO ne ew wasiteya ku karibe armancên xwe di nav de pêkbîne ye. DDKO li gorî armancên Rêbertiyê pir li paş de ye, Rêbertiyê têr nake. Ji ber wê dev jê berdide. Çima dev jê

ber dide? Ji ber ku wê demê çepên Tirk zêdetir sosyalîst û radîkal bûn, her wiha têkoşer bûn. Di nav DDKO'ê de Rêbertî milîtaniyeke li gorî tê xwestin nabîne. Di nav de guhertin û cidiyetê nabîne. Ji ber ku avakarên wê û yên di nav de cîh digirin, herî zêde kurên beg û axa ne. Rêbertî dibîne hem di aliyê çînî de ruhê wan û yê Rêbertiyê ne yek e, hem jî li piratîka wan temaşe dike û dibêje "ji piratîka van tiştek çênabe û pêşketin nabin." Ji ber wê dev ji wan berdide.

Rêbertî bala xwe dide tevgerên Çepê Tirk û rewşa wan zêdetir nêztirî lêgerînên xwe dibîne. Lewra meyla Rêbertiyê ji bo Çepê Tirk pêşdikeve. Di nav Çepê Tirk de jî wê demê THKP-C koma ku Mahîr Çayan pêşengtiyê jê re dike, zêdetir bala Rêbertiyê dikişîne. Ji ber ku zêdetir xwedî teorî bûn. Mînak, THKO û TİKKO ne weke Mahîr Çayan xwedî teorî bûn. Lewra Rêbertî wê demê dibe sempatîzanê THKP'ê. Hinekî têkiliya Rêbertiyê bi wan re çêdibe û dibîne ku ew jî ne weke ku texmîn kiribû ye, daxwaziyên wî pêknayîne. Rêbertî xwe ji nav wan jî dide paş.

Di wê pêvajoyê de zêdetir zanebûna Rêbertiyê pêşdikeve. Rêbertî tim û tim di nav lêkolîn û xwendinê de ye. Di nîqaşan de jî asteke Rêbertiyê ya zanebûnê pêşketiye û zanebûnek hilhatiye. Êdî baştir dikare tiştê diqewimin fêm bike. Rewşa THKP'ê jî baştir fêm dike, eşkere dibe ku rêxistineke ne li gorî daxwaziyên Rêbertiyê ye. Hedefên ku dixwaze pêkbîne, dibîne ku bi THKP'ê re pêknayê û nikare pêkbîne. Ji wê tevgerê dûr dikeve.

Rêbertî wê demê dibîne ku pirsgirêkên Rêbertiyê hem li Kurdistanê hem jî li Tirkiyê bi awayekî cidî tê jiyîn. Her çiqas wê demê rêxistin hebin jî, xwe pêşeng jî bibînin, heta hinek kes di nav wan rêxistinan de weke pêşeng û serok bên dîtin jî, lê ya rastî yek ji wan rêxistinan ne pêşeng bû. Ya din jî ew dûrî pêşengiyê û Rêbertiyê bûn. Valatiyeke wiha mezin hebû. Rêbertî wê valatiyê baş dibîne.

Mesela rêbertî û pêşengtiyê li Kurdistan û Tirkiyê xwe ferz dike. Rêbertî vê valatiyê tespît dike. Wê Rêbertiyê vê valatiyê çawa dagire, wê çawa vê pirsgirêkê çareser bike? Berê xwe dide wê pirsgirêkê û li ser diponije. Rêbertî vê di parêznameya xwe de wiha tîne zimên: "min li pêşberî xwe ew pirsgirêk dît, lewra min nedikarî jê birevim." Dema ku pirsgirêkek hate pêşberî mirov, divê mirov jê nereve. Tu nikarî xwe jê dûr bixî. Divê mirov çareserkirina wê pirsgirêkê hilde ser milê xwe. Ya Rêbertiyê kirî jî ev e. Rêbertî dibêje "ne min xwest ez bibim rêber." Jixwe bi xwestinê kes nabe

serok û rêber. Şert û mercan, dem û cihên rast pêwîst dike. Dema ew şet û merc çêbûn, pirsgirêka pêşengtiyê tê pêşberî mirov. Kesê bixwaze bibe bersiv, wê demê dikare bibe bersiv. Yê ku wê derfetê di xwe de dibîne, dikare bibe bersiv.

Rêbertî jî wê demê dibîne li Tirkiyê û Kurdistanê pirsgirêkên wiha hene. Kes xwedî li wan pirsgirêkan dernakeve, kesê xwedî lê derdikevin jî nikarin bibin bersiv. Wê dibîne û fêm dike. Lêkolîna wê çawa civakbûna xwe ava bike, dike. Li vir ya ku pêşdikeve çî ye û çi mesele ye? Mirov dikare bêje ev mesela Rêbertiyê ye, di heman demê de mesela civak avakirinê ye. Rêbertî di kesayeta xwe de hêz û derfetê dibîne. Dixwaze xwedî li vê pirsgirêkê derkeve.

## DI ÇÊBÛN Û ROJBÛNA RÊBERTİYÊ DE QONAXA DUYEMÎN

Rêbertî di sala 1970'î de li vê pirsgirêkê xwedî derket. Koma xwe wê çawa çêbike? Ji bo komê çêbike, divê di serî de hîmê wê yê teorîk çêbike. Wê îdeolojî û felsefeya wê, dîsa şêwazê wê pêşbixe, da ku bikaribe li ser vî bingehî vê pirsgirêkê çareser bike. Êdî gavên ku Rêbertî biavêje jî wê li ser vî bingehî be. Ev çî ye? Çêbûn û rojbûna Rêbertiyê ya duyemîn e.

Rojbûna duyemîn a Rêbertiyê, li ser vî bingehî çêdibe. Rojbûna duyemîn li ser naskirina sosyalîzmê pêş dikeve. Di vir de xwe kûrkirin, li ser wî esasî komek ji bo xwe bingeh girtin tê dîtin. Hîmê wê di sala 1973'an li Enqerê, li Bendava Çubuk'ê hatiye avêtin. Çêbûna duyemîn li vir hiltê. Wiha ev gav tê avêtin.

Sosyalîzm ilma civakê ye, ev aliyê sosyalîzmê bi qasî dîroka mirovahiyê kevin e. Dîroka sosyalîzmê bi dîroka mirovahiyê re dest pê dike. Însan bi çi bû însan, bi civakbûnê bû însan. Sosyalîzm jî ilma wê ye. Lewra dîroka wê wiha dest pê dike, ewqas jî kevin e. Sosyalîzm wer demên dawiyê derneketiye. Ji ber wê Rêbertî dibêje "ji sosyalîzmê guman kirin, ji mirovahiyê û civakbûnê guman kirin e û jê dûr ketin e." Mirovahî û civakbûna xwe wenda kirin e. Ji ber wê Rêbertî dibêje " mirov nikare ji sosyalîzmê bikeve gumanê. Nikare derveyî sosyalîzmê tevbigere û bijî." Yê ku dixwaze mirovahiyê bijî, wê sosyalîzmê ji bo xwe bingeh bigire. Ji ber ku sosyalîzm ilmê civakbûnê ye. Lewra yê ku di mirovahiyê de israr dike, di heman demê de divê di sosyalîzmê de jî israr bike.

Rojbûna duyemîn ya Rêbertiyê ji civakên li ser esasê dewletê avabûyî û ji dewletê qutbûn e. Li ser vî esasî civakbûna xwe û sîstema xwe ya siyasî avakirin e. Loma Rêbertiyê komeke îdeolojîk ava kiriye, bi wê komê têkoşîna xwe dest pê kiriye. Ev çi îfade dike? Me gotibû dema ji gund qut bû û berê xwe da bajêr, di heman demê de berê xwe dabû dewletê. Ji nirxên demokratîk, wekhev û ji jiyana komînal a gund qut bibû. Bi vî rengî careke din berê xwe dide nirx û jiyana wê ya komînal û demokratîk. Ji kesayeta ku bajêr û dewletê esas digire qutbûn, vegera li kesayeta xwezayî ye. Mirov baş bala xwe bidiyê Rêbertî her dem di lêgerînê de ye, tim û tim gavan li gorî armancên xwe diavêje. Li gorî armancên xwe tevdigere. Heke gavên ku diavêje şaş bin jî, lê ji ber ku girêdayî armancên xwe ye, ti car ji

armancê xwe qut nabe û careke din wan gavên şaş rast dike. Mirov vê di Rêbertiyê de dibîne. Li vir ya tê diyarkirin ev e: heke mirovek bi hedef û armancên xwe ve girêdayî be, ti car ji armancên xwe qut nabe. Di karê xwe de ji bo bigihîje hedef û armancên xwe, carnan bikeve şaşitiyan jî, ew şaştî nabin xeterî û dikare li ser wan raweste. Dema ku dibîne ku gavên diavêje di xizmeta hedef û armancên wî de nînin, ew girêdana wî ya bi hedef û armancên wî, wî dike nava liv û tevgereke xurttir. Wiha xwe ji xeletî û şaşitiyan xelas dike. Lewma texrîbatên mezin najî. Lê belê yê di hedef û armancên xwe de israr neke û xwe bi wan re neke yek, ger ket şaşitiyan nikare wan derbas jî bike. Kesayetên wiha texrîbatên mezin dijîn û didin jiyîn. Lê me gotibû yê girêdayî hedef û armancên xwe be, dema şaşitiyan bike jî dikare wan texrîbatên derketine rake û derbas bike. Yên wiha dikarin li ser hedef û armancên xwe bimeşin. Ger çep û rast lêxist jî nakeve, dê cardin di rêka hedef û armancên xwe de bimeşe.

Mirov vê baş di jiyan û têkoşîna Rêber APO de dibîne. Lêgerînên Rêbertiyê hemû ji bo jiyaneke azad e. Sedema qutbûna Rêbertiyê ji malbat, gund û berê xwe dana bajêr û dewletê ji ber wan hedefên wî bû. Mirov bala xwe baş bide Rêbertiyê, tim gavên şaş rast dike. Ji ber ku hedefa wî heqîqet e. Her tiştî dike da ku xwe bigihîne heqîqetê. Wê çawa xwe bigihîne heqîqetê? Wê demê heqîqet çî ye? Li ku derê ye? Ev her dem çavkaniya lêkolîn û lêgerîna Rêbertiyê ye. Ev nahêle Rêbertî ti car ji heqîqetê dûr bikeve. Ger carna qut jî bibe, lê jê dûr nakeve, her dem ber bi heqîqetê ve diçe. Xwe digihîne lêgerîna wê.

Em cardin vegerin û bêjin Rêber APO civakbûna xwe ya yekê li ser çi bingehî pêşxistibû? Bi dîn, dibistanê û komkirina zarokan pêşxistibû. Ji bo xwe bi civakê bide qebûl kirin, têkiliya xwe bi mamosteyan re pêşxistibû. Li ser vî bingehî gavên civakbûna xwe ya yekê avêtibû. Pêngava Rêbertiyê ya duyemîn jî li ser sosyalîzmê bû. Li ser xwendevanên zanîngehê û li ser fikrê neteweyî bû. Êdî Rêbertiyê li ser van esasan xwe pêşxist.

Mirov dikare di lêkolînên Rêbertiyê de guhertinan bibîne. Êdî civakbûna xwe ya duyemîn li ser hîmekî din pêşdixe. Gelo Rêbertî wê pêngavê çima diavêje? Ji ber ku Rêbertiyê heta wê demê hîmên din hemû lêkolabû. Tevlî wan bibû û ji nav wan derketibû. Dema tevlî wan tevgeran dibû û piştî demekî ew nas dikir, didît ku nikare

li ser wan esasan civakbûna xwe pêşbixe. Dema ku têkiliya Rêbertiyê bi sosyalîzmê re çêbû, dît ku ancax civakbûna xwe li ser sosyalîzmê wê bikaribe pêşbixe. Ew pêngav li ser fikrê netewî ye. Jixwe wê demê fikrekî netewî heye. Sosyalîzm bersivê dide Rêbertiyê. Êdî Rêbertî li ser wî esasî fikrê xwe pêşdixe. Çêbûna li ser vî esasî, li gorî çêbûnên berê nû ye.

Rêber APO, dema ku li ser hîmeke nû xwest civakbûna xwe pêşbixe, gelo li dijî çi sekinî? Li dijî sîstema kapîtalîzmê sekinî. Li dijî wan fikrên ku bi navê sosyalîzmê tê jiyîn sekinî, yanî li dijî wan fikrên dogmatîk sekinî. Dîsa li dijî netewperestiyê, li dijî wan tevgerên ku bi navê netewê pêşdikevin û cevherê xwe de reformîst in, sekinî. Da ku di fikir de karibe fikreke serbixwe pêşbixe. Ev ji bo ku karibe civakbûna xwe serbixwe û azad pêşbixe. Rêbertiyê wê demê gelek asteng li pêşberî xwe dîtin. Ew asteng çi ne? Tiştên li pêşberî Rêbertiyê dibûn asteng sîtema kapîtalîzmê, nirxên feodal, koletî, netewperestî, şovenîzma Tirkan û tiştên bi navê çep dihate jiyîn... bû. Ev hemû wê demê li pêşberî Rêbertiyê asteng bûn. Heke kariye li dijî van bisekine, xwe di sosyalîzmê de kûr bike, li ser netewê xwe pêşbixe, wê demê karî civakbûna xwe jî pêşbixîne. Mirov dikare bêje ew qonax û serdem ji aliyê îdeolojî û felsefê de xwe pêşxistin e. Ji aliyê teorî ve bi xwe re komkirinek çêkirin e, li ser wî bingehî îdeolojî û felsefeya xwe pêşxistin e. Îdeolojî û felsefeya xwe ji van têgîhîştinên min berê gotî dûr xistin e. Rêbertî wê demê dixwest xwe ji van fikrên berê xelas bike, da karibe di aliyê îdeolojî û felsefê de serkeve. Li ser vî bingehî îdeolojiyekî, felsefeyekîi û tevgerekî pêşbixe. Hemû liv û tevgera Rêbertiyê ji bo vê ye.

Rêber APO di serî de bi biryar û wêrek dest pê kir. Bi rexne û rexnelixwegirtinê dest pê kir. Bê dudilî rexne û rexnedaneke mezin da, wiha dest pê kir. Herî zêde jî wê çawa rastiyê bi mirovê Kurd bide qebûl kirin, di serî de di vê de rexne û rexnedan da. Eşkere got "ez we bi vî rengî qebûl nakim." Heta wê demê gelek kesan ji bo tevgerê û Rêbertiyê rexne pêşdixistin. Wiha digotin, "Ev çawa serokê tevgerekî ye ku gelê xwe, hevalên xwe rexne dike?" Bi van rexneyan Rêbertiyê gelê Kurd, mirovê Kurd ji wî halî derxist. Heke wiha nekiriba, ne gengaz bû ku gelê Kurd ji wê rewşê derketiba. Rêber APO li gel rexne û rexnedanê, hêza xwe û ya gelê xwe esas girt. Li ser hêza xwe ya şexsî rabû, bi xwe bawer kir. Çareserî di xwe de dît, pê re xwe mehkumî serkeftinê kir. Li derveyî serkeftinê tiştekî din

qebûl nekir. Xwe bi temamî bi azadiyê, hevaltiyê, gel û axê ve girêda. Rêbertiyê xwe bi nirxên mirovahiyê, yên ku girêdayî demokrasiyê, wekheviyê, azadiyê û aştiyê ne girêda. Hemû asteng, bêderfetî kir sedema têkoşînê da ku van rake. Di xwe de ew civakbûna ku dixwaze, çêkir. Bi temamî di xwe de fedayîbûn çêkir. Wiha dest bi civakbûna duyemîn kir.

Çavkaniya Hêzê Mirov û Gel Bi Xwe Ye

Ji ber ku kesekî Kurd û Kurdistan qebûl nedikir, civakbûna xwe ya duyemîn li ser vî esasî pêşxist. Pergala dagirker înkar û tinekirina Kurdan esas digirt. Kurdan bi xwe jî êdî înkar û tinekirina xwe esas girtibûn. Kurdan bi xwe ew siyaset dimeşandin. Heke mirovên civakekî di vê rewşê de bin, wexta ew bixwazin ji bo xwe tevgerekî ava bikin jî, wê ti kes alîkariya wan neke. Dest ji alîkariyê berdin, wê her kes bixwaze li pêşiya wan bisekine û nehêle ku ew tevger pêşbikeve. Her kes wê bixwaze ku îrada wî gelî bişikê û ew gel dest ji dozê berde. Ev rastî ye, heke her kes înkar û tinekirina te esas digire, wê demê tê bi xwe bawer bî û tuyê li ser hêza xwe rabî. Dema ku te ji bo xwe çareserî çêkir, ji bo xwe derfet çêkir; wê demê tu dikarî rabî. Wekî din ji bo te jiyan nîne û ne gengaz e hebe jî. Kesên alîkariya te bike nînin. Ger Rêber APO hîmê vê Rêbertiyê û tevgerê li ser vî bingehî ava kiriye, sedema wê ev e. Ev girêdayî rastiya ku gelê Kurd tê de dijiya ye. Dema li ser hêza xwe rabû bi xwe bawer kir û pêdiviya xwe ji bo çi hebû ew ava kir. Wekî din ne gengaz e ku jiyanekê pêşbixe.

Ev bûye hîm û prensîbên vê tevgerê. Kadroyên vê tevgerê li ser vî bingehî tên avakirin. Ne li ser tiştên berê. Ji ber ku tiştê amade li holê nînin, kesekî ku tiştekî bide jî nîne. Çi pêwîstiya te hebe, tuyê bi xwe çêkî. Tê wê jî li ser hêza xwe ya şexsî û ji baweriya gelê xwe çêkî. Dema te ev çêkir, tu dikarî li Kurdistanê gavan biavêjî û xwe di raya her kesi de bidî qebûlkirin. Wiha nebe, ne gengaz e ku mirov pêşbikeve. Ev jî bi xebateke dijwar dibe.

Civakeke ku baweriya mirovên tê de nemabe, vîna xwe nemaye, bi temamî şikestî ye. Baweriya wan bi wan nemaye ku êdî rabin û serî hildin. Civakên wisa êdî mecalê jiyanê li gel dijmin dibînin. Ji dijmin re kar dikin ku fîzîkî bijîn. Civaka me civakeke wiha ye. Da ku tu însanê wê civakê ji dijmin qut bikî, tu bikî ku ji xwe bawer bike, li ser hêza xwe rabe û têkoşînê bike ne wisa rehet e, pir zehmet

e. Ev bi însanê Kurd dana qebûlkirin jî têkoşînekî dixwaze. Rêber APO ew kir, ji bo wê di têkoşîna xwe de herî zêde bi Kurdan re mijûl bû. Derfet zêde nedît ku bi dijmin re mijûl bibe. Ji ber ku dema tu însanê xwe ji wê xelas bikî tu dikarî bi dijminê xwe re mijûl bibî. Lewma tê li ser însanê xwe bisekinî. Zêdetir li ser wî bingehî rexne û rexnedayîn pêşket. Ev bû, sedema pêşketina tevgerê jî. Ji bo wê Rêbertî di serî de çi esas girt, di serî de jiyana xwe mehkumî serkeftinê kir. Derveyî serkeftinê her tişt li xwe heram kir û qebûl nekir. Ji ber ku pêdiviya gelê Kurd tenê bi serkeftinê hebû. Wekî din ti tişt xizmeta gelê Kurd nake. Tu nikarî derveyî serkeftinê tiştekî din bi Kurdan bidî qebûlkirin. Rêber APO xwe di azadiyê de mehkûm kir. Ji lewra derveyî azadiyê jiyaneke din ji xwe re esas negirt. Ancax jiyaneke azad dikare însanê Kurd ji wê rewşê derbixe. Yanî ji bo azadiyê bijî û ji bo azadiyê bimire. Derveyî vê jiyan yan jî mirinek xizmeta gelê Kurd nake û gelê Kurd ji wê rewşê dernaxe.

## Pêşengtiya PKK'ê Bi Temamî Xwe Fedakirin e

Rêber APO rêbertiyeke çawa derxist? Rêbertiyeke bi temamî xwe bihurandiye û civakbûn û azadiyê di xwe de ava dike ye. Nirxên însaniyetê, demokrasiyê û azadiyê di xwe de çê dike. Bi temamî azadiyê ji bo xwe esas werdigire. Xwe li gorî wê rêxistin dike û jiyaneke li derveyî van prensîban ji bo xwe heram dike.

Rêber APO bi temamî rêberekî fedayî ye. Heke rêbertiyeke fedayîtî di xwe de pêkneanîba, nikaribû tevgerekî, kadroyekî û gelekî fedayî çêke. Ancax tevgereke fedayî dikare pirsgirêkên gel yên heyî çareser bike. Wekî din ti tişt pirsgirêkên Kurdan û rewşa ku Kurd ketinê nikare çareser bike. Heke tevger di serî de li ser ruhekî fedayîtiyê ava bûye, ji ber vê ye. Ger ne wiha ba wê ev tevger jî weke tevgerên din bibûya. Tevgerên din çiqasî guhertin çêkirin, wê vê jî weke wan guhertin çêkiriba. Ger Rêber APO rêbertî li ser ruhê fedayîtiyê ava kir, di wî ruhî de israr kir û ew ruh pêşxist, ev girêdayî rastiya ku civaka Kurd tê de bû ye. Ne ji kêfa dilê xwe ew esas girt. Ji ber ku derveyî fedayîtiyê tiştek din nedibû bersiv û nedikarî gelê Kurd ji wê rewşê derxista û rakira ser piyan. Nedikarî keramet û şerefa Kurdan ji bin lingan derxe.

Wê demê derketin û teşegirtina vê tevgerê li ser vî esasî ye. Divê milîtanên vê tevgerê vî baş fêm bikin. Ger fêm nekin, nikarin bibin milîtanê vê tevgerê. Rêbertiyê bi temamî li ser vê rastiyê xwe ava

kir. Rêbertiyê rêxistin, kom û kadroyê çêkirî jî li ser vî esasî ava kir. Rêbertiyê bi vê hem di aliyê teorî de hem jî di aliyê piratîk de li Kurdistanê, di însanê Kurd û civaka Kurd de çi çêkir da xwe nas bike? Da ku karibe rewşa di nav de ye nas bike. Da bikaribe çawa ji wê rewşa heyî xelas bike, fêm bike, jê derbikeve û gavan bavêje. Ev hewldanên Rêbertiyê hemû ji bo wê bû.

Her çiqas Rêbertî di serî de bi tevdîr nêzî sosyalîzma heyî û tevgerên çep bûbe jî, lê bi temamî xwe ji bin bandora wê tevgerê xelas nekir. Dibe ku ew sosyalîzma heyî ji her aliyê ve nejiyabe, lê tam nekarî xwe ji bin bandora wê jî derxîne. Di serî de bi rexne nêzîk bû, gelek tişt rexne kir û xwest xwe ji gelek tiştan biparêze, xwest xwe ji bin bandora vê derxe. Ev nêzîkatiya destpêkê pir girîng bû, di serî de heke wiha nebûya dibe ku ev tevger jixwe nehatiba roja me ya îro jî.

Sosyalîzma pêkhatî dema tesfiye bû, hemû tevgerên sosyalîst tesfiye bûn û berê xwe dan sîstemê. Ger tevgera me tesfiye nebû û berê xwe neda sîstemê, berovajî piştî wê pêşketina xwe hîna zêdetir çêkir; ev girêdayî wê destpêkê ye. Divê ku mirov vê baş fêm bike, mînakekî Kurdî heye binav û deng e dibêjin “ji şîrî heya pîrî.” Lewra destpêk pir girîng e. Destpêk dawiye jî diyar dike. Niha pêşketina vê tevgerê, pirsgirêkên vê tevgerê jî hemû girêdayî destpêka wê ne. Dibe ku hinek tişt di dawiyê de çêbûne, lê hemû girêdayî destpêka wê ne. Lewaziyê wê jî xurtibûnê wê jî, hemû di hîmê wê de ne. Ji bo wê destpêk pir girîng e. Dîsa meseleyek heye dibêjin “dema te hîmê xaniyekî saxlem avêt, saxlem dimîne, lê dema te hîm ne saxlem avêt, ew xanî hildiweşe.” Di serî de hîm pir girîng e. Di şoreşgeriya mirov de jî hîm pir girîng e, gavên destpêkê pir girîng in. Ango kes dawiyê nabe şoreşger, gavên diavêje di serî de diavêje. Heke gavê destpêkê saxlem avêtibe, di dawiyê de hinek xeletiyan bike jî, lê ti car şoreşgeriya wî/ê xelas nabe. Yanî îxanetê najî. Lê di hîmê şoreşgeriya kes de di destpêkê de şaşitî pir bin, xeletî zêde bin, ew dê pirsgirêkên mezin bijî. Dawiya vî kesayetî, wê îxanet be. Ji lewra destpêk girîng e. Pêşketin û paşketina rêxistinê hemû girêdayî destpêka wê ye.

Temaşeyî pirsgirêkên ku destpêka dîroka PKK’ê hatine jiyîn bikin. Ya ku PKK’ê meşandî û gihandiye roja me ya îro, hemû girêdayî hîmê wê yê seretayî ye. Ji ber ku yên tevlî tevgerê bûne tevlî Rêbertiyê bûne, ji ber wê heta roja me ya îro dimeşin.

Mirov di serî de dibîne ku hevalê Kemal û Heqî bi Rêber APO re hevaltî kirine. Ev her du heval ne Kurd in, ne jî Kurdistanî ne. Gelekî girîng e mirov vê bizane. Di dîroka gelan û tevgeran de gelek însan hene tevlî tevgeran bûne. Lê belê li holê ti tevger nînin ku hevalê Heqî û Kemal tevlî bibin. Dîsa bi navê kîjan gelî tevlî dibin? Bi navê gelê Kurd tevlî dibin. Ji bo gelê Kurd li gel Rêbertiyê hevaltiyê dikin. Wê demê Kurd bi xwe ji xwe direvin. Yanî dema tevgerek, hîmek, mîrasek, nirxek hebe, tu tevlî wan bibî cuda ye. Lê wê demê Kurd bi xwe ji rastî û Kurditiya xwe direvin, li xwe xwedî dernakevin. Di navendek wiha de bê dudilî li gel Rêbertiyê cih girtin.

Di destpêka tevgerê de Rêbertî û ew her du heval hene, ji bo wê tevlîbûna her du hevalan pir girîng e. Her du heval ne Kurd û Kurdistanî ne, ti neçariya wan nîne tevlî bibin. Lê li gel Rêbertiyê bê dudilî cih digirin. Çima li gel Rêbertiyê cih digirin? Ji ber ku di Rêbertiyê de serkeftinê dibînin. Ji ber vê ye li gel Rêbertiyê ne. Di wê Rêbertiyê de rêbertiyê, azadiyê, hedef û armancên xwe dibînin. Lewma bê dudilî tevlî Rêbertiyê dibin. Rêbertî ji bo wê dibêje: “nîv demjimêrekî ez bi wan re axifîm, min re bûn yek û heta ku şehîd ketin hevaltiya xwe domandin.” Ev jî pir girîng e, Rêbertî tenê nîv demjimêrekî bi wan re axiviye.

Kemal û Heqî tevlî Rêbertiyê bûn. Li ser wî esasî jî meşiyan. Ji ber wê tim Rêbertî ji bo xwe bingeh digirtin. Ji ber ku tevlî Rêbertiyê bibûn. Heta ku şehîd ketin jî hevaltiya xwe bi Rêbertiyê re domandin. Qet paş neman û dest ji hevaltiya xwe bernedan. Di her şert û mercî de li Rêbertiyê xwedî derketin. Yekitiya Rêbertiyê, Kemal û Heqî yekitiya Kurd û Tirkan e. Ev di astekî bilind e, li ser esasê demokrasiyê, azadiyê çêkirina yekîtiyê îfade dike. Lewra Rêbertî wê tim û tim çi esas bigire? Wê li hemberî wan hevalan rêzdar be. Çawa wan hevalan ji Rêbertiyê re rêz digirt, wê Rêbertî li hemberî wan rêzê bigire. Di kesayeta wan de hevaltiyê giran û xurt bibe. Nêzîkbûna Rêbertiyê ji hevaltiyê re ev e.

Wê di kesayeta wan hevalan de wê çawa yekîtiya gelan ava bike. Di asteke bilind de li ser esasê azadî û demokrasiyê pêkbîne. Wê di kesayeta wan hevalan de, xwe deyîndarê gelê Tirk û însaniyetê bibîne. Her tim wê Rêbertî di nav têkoşînê de be.

Lewra Rêbertî dibêje “Heqî û Kemal ruhê min ê veşartî bûn.” Ev çi îfade dike, ango rastiya min, kesayeta min di wan hevalan de wiha pêkhatiye, bi temamî vê îfade dike. Rêbertî ji bo wan hevalan çi

dibêje? Dibêje: ez nîv demjimêrekî bi wan re axivîm û ew tevlî min bûn, heta şehadetê jî hevaltiya wan qet lewaz neket”. Li vir divê em bizanibin ew ruh ruhekî çawa ye? Ev kesayet kesayeteke çawa ye? Ev ruh ruhekî nirxê demokrasiyê, azadiyê, wekheviyê û aştyê di xwe de pêktîne ye. Ew ruh e ku bi temamî azadiyê ji bo xwe esas digire, ji ber ku tenê ji bo azadiyê dijî û dimire. Derveyî vê ne jiyanekê û ne jî mirinekê qebûl dike. Ew ruh bi temamî li ser hêza xwe rabûye, ruhekî ku hêza çareseriyê di xwe de dibîne û pêşdixe ye. Ew ruh pêdiviya azadiyê bi çi hebe, ewî dide pêşberî xwe û pêktîne. Ew ruhê ku ji bo serkeftinê, xwe bi hedefên xwe ve girêdaye û derveyî vê her tişt di xwe de kuştî ye. Ruhê ku xwe di serkeftinê de mehkum kiriye ye. Ew ruh e ku hevaltiyê, jiyanê, axê û gel pîroz dibîne, ji bo azadiya wan dijî. Ew ruhê ku tê de bawerî, moral, hest, hizir, li gorî wê piratîkê dijî ye. Ew ruh, rastiya Rêbertiyê di her şertekî de bêdudilî ji bo xwe bingeh digire û li ser wî bingehî dimeşe. Di vî ruhî de hestên pir mezin, fikrên pir mezin, rêxistin û çalakiyên mezin dibîne. Di vî ruhî de tu nirxê avakirinê û mezinkirinê dibînî. Di vî ruhî de tu girêdayînê, fedekariyê, wêrekiyê û dilpakiyê dibînî. Ev ruh erk û meqamê esas nagire, tim xizmetê bingeh digire. Vî ruhî ji xwe re jiyan û nirx avakirin û pêşxistin esas girtiye.

Ev ruh ruhê Rêbertiyê ye. Ruhê Rêbertiyê di Kemal û Heqî de pêkhatiye. Ji ber wê Rêbertî dibêje “ruhê min yê veşartî bûn.” Niha ger heval baş bala xwe bidinê di rewşên xeternak û kiritik de, Rêbertî ruhê Kemal Pîr dide pêş. Dî pêvajoya tesfiyegeriyê de, di sekna li dijî tesfiyegeriyê de û jî nû ve avakîrîna PKK’ê de Rêbertiyê wiha got: “ruhê Kemal Pîr û şêwazê Kema Pîr.” Pêwîst e, em baş fêm bikin ka çima Rêbertî di wê pêvajoyê de ev ruh da pêşberî me. Yanî tuyê partîbûnê bi wî ruhî bijî. Dema te wiha kir tu rast dijî.

Çima Rêbertiyê digot ruhê Kemal Pîr? Ji ber ku Fatimê digot “hizirên min yê Rêbertiyê, hestê min yê Rêbertiyê, ruhê min û yê Rêbertiyê ne yek in.” Hevalê Kemal jî digot: “heke yê te û Rêbertiyê ne yek in, tu di nav me de li çi digerî? Yê me bi yê Rêbertiyê re yek e. Heke yê te cuda ye, divê tu di nav me de nemînî.” Hevalê Kemal Pîr partîbûn çawa fêm dikir? Di hest û hiziran de, di yekitiya şêwaz de fêm dikir. Rêxistin wiha fêm dikir. Partîbûna ku Rêbertiyê pêşdixist jî, li ser vî bingehî bû. Wer fikrên cuda, hestên cuda, ruhê cuda, wisa rêxistin çênabe. Ev çi çêdike? Tesfiyegeriyê, belavbûnê û

bêrêxistiniyê pêşdixe, wendahiyê çêdike. Lewma Rêber APO dibêje “şêwazê Kemal Pîr.” Mirov wiha dikare rêxistinbûnê bijî, ger mirov wiha jiya rast dijî. Wê demê mirov dikare bêje bi Rêbertiyê re dijî. Derveyî vê mirov nikare bi Rêbertiyê re bijî. Ev bi axaftinê nabe, divê bê jiyîn.

Niha em li rewşa xwe binêrin, Rêbertî dibêje, ez nîv demjimêrê bi wan hevalan re axivîm û biryara xwe dan bêdudilî meşiyan. Girêdaneke wiha bihêz dan diyarkirin. Dilpakiyeke wiha bihêz dan nîşandan. Yê me ne nîv demjimêrî, Rêbertî bi salan bi me re axivî, bi sedan analîz kir, her dem perwerde da me, lê em dîsa jî weke xwe man û me di ya xwe de israr kir. Em her wextê dibêjin “ya min.” Ev jî rastiya me ye. Axaftinên Rêbertiyê nîv demjimêrê têra Kemal Pîr dikir, têra Heqî Karek dikir, lê yê me sal têra me nakin. Ew jî hevalê Rêber APO ne, em jî hevalê Rêber APO ne. Ev çawa dibe hevaltiya bi Rêber APO re? Wer hevaltiya erzan bi Rêber APO re nabe. Hevaltiya bi Rêber APO re weke ya Heqî Karer e û Kemal Pîr dibe. Bila ya me ne nîv demjimêr, salek be. Dibe ku salek têra me bike ku em bibin PKK’yî û bikevin ruhê Rêbertiyê. Em ruhê Rêbertiyê di xwe de pêkbînin. Em kesayeta Rêbertiyê di xwe de pêkbînin. Heke sal têra me nakin, wê demê ispat dibe ku, pirsgirêkên cidî di kesayeta me de hene.

Divê em vê encamê derxîn: ev ne dilpakî ye. Di nav PKK’ê de dilpakbûn li gor rastiya Rêbertiyê xwe çêkirin e, li ser wê rastiyê meş e. Girêdan û dilpakî jî ev e. Weke din girêdana bi rastiyê re dilpakî nabe. Ewçend Rêbertî li ser me sekinî, ewqas analîz pêşxist, parêzname da dest me, dîsa tevî ku rêxistin ewqas dixwaze me pêş bixe, lê girêdan û meşa me bi pirsgirêk e. Kesayeta me her roj ji bo rêxistinê pirsgirêk e. Ev çawa dibe hevaltiya bi Rêbertiyê re? Ev çawa dibe milîtaniya Rêber APO?  Wê demê di vir de derewek û xapandinek heye. Pêwîst e rast bê fêmkirin. Yê ku Rêber APO ji xwe re bingeh digire, wê xwe bi ruhê Rêber APO bişû û xwe pak bike. Ruhê Rêber APO ruhekî çawa ye? Ruhê Rêber APO yê Kemal Pîr e, divê mirov wî ruhî di xwe de pêkbîne. Wê demê em dikarin bêjin em bûne hevalê Rêber APO.

## Avabûna PKK’ê Ber Bi Jiyaneke Nû Ve Gav Avêtin e

Gûrûba îdeolojîk û çêkirina PKK’ê, di lêgerîna jiyana azad a nû de, alternatîf bû. Ji ber ku jiyana heyî, ji alî Rêbertiyê ve nedihat qe-

bûlkirin û dihat redkirin. Rêbertiyê digot: “Ez ê alterantîfa wê pêşxim”. Li ser wî bingehî kom çêkir, li ser wî bingehî PKK ava kir. Di lêgerîna jiyana azad de, jiyana heyî red kir û alternatîfa wê pêşxist. Çêbûna tevger û rêxistinê, ne tenê çêkirina rêxistinekî ye, ger mirov wiha fêm bike, mirovê şaş fêm dike. Dibe ku gotinê de wisa be, lê di rastiya xwe de ne wiha ye. Avabûna PKK’ê gav avêtina jiyaneke nû ye. Li ser wî esasî jiyaneke nû, civakeke nû û kesayeteke nû pêşxistin e, û bi giştî jî PKK ev e. Bi temamî çêbûna PKK’ê vê îfade dike. Ger wiha bê fêmkirin, wê rast bê fêmkirin. Jiyan vê astê de pêşxistin girîng e. Ev çi îfade dike? Milîtantiya PKK’ê li ser van esasan çêdibe û pêş dikeve. Bi temamî vê îfade dike, di vê milîtaniyê de jiyaneke nû tê afirandin.

Milîtaniya ku di nava PKK’ê de çêdibe, pêwîst e li ser esasê milîtaniya Rêbertiyê çêbibe. Min berê jî gotibû, ev milîtanî bi temamî kesayeta xwe ya heyî derbas dike, dibe yekî/yekê nû. Di xwe de civakbûnê çêdike. Pêwîst e, ev milîtan di nav civak û dîrokê de bijî. Bi xwe re dîrok û civakbûnê jî pêşbixe. Bi xwe re dîrokê û civakbûnê pêşbixe. Milîtaniyeke bi temamî xwe bi azadiyê ve girêdide û ji bo azadiyê dijî û dimire. Dervayî vê xwe nêzîkî jiyaneke din nake, bi temamî pêdiviya azadiyê û xurtkirina gel esas digire. Li ser vî esasî têkoşîn dike ka wê çawa vê kesayetê pêkbîne. Di vê de israr dike. Ji dervayî serkeftinê tiştekî layîqê xwe nabîne. Ti car ji bo xwe sînoran ava nake. Milîtanên li ser van bingehan çêbûne, rêxistina ku bi van milîtanan tê damezrandin, dikare gelek milîtanên fedayî jî çêke. Ew milîtanî bi milîtaniya Rêbertiyê re jî dibe yek.

Bi temamî têkoşîn û nezîkbûna Rêber APO ji rêxistinbûn û kadrobûnê re li ser van esasan e. Li ser vî esasî li Kurdistanê jiyaneke nû avakirin û pêşxistin esas e.

Di bingehê xwe de têkiliya Rêber APO û PKK’ê bi sedsala 20. re nîne. Dibe ku ev rêxistin di sedsaliya 20. de hatibe damezrandin û ev Rêbertî di van deman de hilhatibe. Dibe ku milê şeklî ve hinek aliyên xwe rengê sedsaliya bîstan bide, ev gengaz e. Dibe ku hinek bandora sedsala bîstan li ser Rêbertiyê û vê rêxistinê hebe. Ev hene jî, lê ev bi temamî şeklî ye, di bingehê xwe de ti têkiliya vê bi Rêbertî û bi rêxistinê re nîne. Divê mirov wiha fêm bike. Ger wiha hate fêmkirin wê rast bê fêmkirin.

Rêber APO her dem xwe xulikand, xwe li ser wî bingehî kûr kir, cudatiya xwe û serokatiya heyî pêşxist. Li ser vî bingehî PKK’ê û

civaka Kurd jî ev rastî ji xwe re esas girtin. Lewra Rêbertî û PKK ti caran weke rêxistinên sosyalîst û komînîst yên din nebûn. Ji wan cudatir bûn. Ji lewra senteza Rojhilat û Rojava di vê Rêbertiyê û rêxistinê de pêkhat. Ji ber wê mirov nikare bêje ev rêxistin û Rêbertî tam yan Rojhilatî ye, yan jî Rojavayî ye. Hinek aliyên xwe Rojavayî ye, hinek aliyên xwe jî Rojhilatî ne. Çima, ji ber ku hem di Rojhilat de, hem jî di Rojava de, aliyên ku bikaribe xizmeta demokrasiyê, azadiyê, wekheviyê bike hebe, ew ji bo xwe bingeh girt. Ji ber wê bû sentezek. Ji ber wê jî ferqa xwe ji yê Rojava û Rojhilat cudatir bû.

Kesayet, fikir, ruh, hest, têgihîştin û jiyana Rêbertiyê, rêxistina ku Rêbertiyê pêşxist û li ser vî esasî çalakiya Rêbertiyê bi sedsala 20. re ne weke hev e, di navbera wan de nakokî û cudahî hene. Lewra Rêber APO hem cuda xwe afirandiye û pêşketiye, heman demê de bûye hedef. Sedema êrîşên li ser Rêbertiyê pêş dikevin jî ev in. Ji ber ku ti demê Rêbertî û tevgerên heyî ji bo xwe esas negirtiye, cudatiya xwe çêkiriye û xwe kûr kiriye. Cuda pêşketiye, lewra neketiye xizmeta wan. Tim bûye alternatîf. Ji bo vê jî Rêber APO bûye hedefê neyaran. Heke Rêbertî li derketinê heta niha di hedefê de ye, sedem bi vê rastiyê ve girêdayî ye.

## Milîtantiya PKK'ê Derwêştî Ye

Kesayeta ku Rêber APO temsîl dike, kesayeteke ku di dîrokê de bingehê mirovahiyê ji bo xwe esas digire ye. Yê ku mirovahiyê pêşdixe û dide jiyîn e. Em ji vê re dibêjin kesayeta derwêşî û pêxemberî. Di roja me ya îro de ev bi fedayitiyê tê îfadekirin. Ev çandek e, kevneşopiyek e û di dîrokê de heta roja me ya îro didome. Dibe ku bi hinek navan hatibe îfadekirin, lê di roja me ya îro de bi navê fedayetiyê tê îfadekirin.

Milîtaniya PKK'ê ya ku di kesayeta Rêber APO de pêkhatiye, ew kevneşopiya di dîrokê de ye, bi navekî din pêkhatina wê ye. Bi temamî wê esas digire. Yê ku dixwaze careke din bi bingehê mirovahiyê re têkiliya xwe çêbike û têkoşîna wê bide, di milîtaniya PKK'ê de temsîliyeta xwe dibîne. Ew kesên ku piştî neolîtîkê li dijî koletiyê û desthilatiyê sekinine, tên zimên. Yê ku dixwazin di civakê de azadiyê pêşbixin, derdikevin holê. Ev kevneşopiya têkoşer, bi pêxemberan dest pê kir û heta roja me ya îro bi navên cuda-cuda hat.

Kevneşopiya pêxemberan di dîroka berxwedaniya li dijî koletiyê de cîhekî girîng digire. Ew piştî neolîtîkê kevneşopiyek e, çandek e, kesayetek e. Yê ku li dijî koletiyê derketiye, li dijî desthilatiyê derketiye, ji bo demokrasiyê, azadiyê, wekheviyê, aşitiyê û edaletê, şer kiriye vê kevneşopiyê jî esas digire. Ev ji berê de bi gelek navan îfade bûye.

Di nav PKK'ê de bi navê fedayîtiyê tê îfade kirin. Ji lewra tevgera PKK'ê tevgerek pêxemberî ye. Rêbertiya wê pêxemberiyê û derwêşiyê ji bo xwe esas digire. Di derwêşiyê û pêxemberiyê de çi esas e? Jiyana heyî ya ku sîstem tê de serwer e li xwe heramkirin esas e. Ji bo civakê jiyan kirin esas e. Lêgerîn û lêkolîna ji rewşa heyî civak derxistin esas e. Jiyana van kesayetan jiyaneke wisa ye.

Kesayetên wisa, têkiliyên xwe ji civakê qut dikin û diçin di çiyan de, di şikeftan de bi mehan, bi salan dimînin û difikirin. Piştî wê tên û fikirên xwe weke wehiyên xweda belav dikin. Wer dixwazin fikirên xwe bi civakê bidin qebûlkirin. Bi vî rengî dixwazin civakê ji wê rewşa tê de derbixin.

Niha ya ku Rêbertiya me kirî ew e. Rêbertî ji bo ku gelê Kurd ji rewşa heyî derbixîne, ji jiyana heyî bi temamî xwe qut kir, ew li xwe heram kir. Bi salan di hizir de lêhûrbûnek jiya, di encamê de gihîşt wan hedefên xwe. Îdeolojiyek û felsefeyek di xwe de xurt kir û pêşxist. Li ser wî esasî hîmê teorî, lêhûrbûna îdeolojî, felsefe, siyaset, rêxistin, çand û kesayeta ku van xwe de temsîl bike wiha pêşket. Weke çawa derwîş û pêxember pêşdixin. Di vî aliyî de bi temamî derketina Rêber APO û tevgerê weke derketina pêxemberan e.

Mirov baş bala xwe bidiyê di dîrokê de li dijî koletiyê derketina Hz. Îbrahîm girîng e. Cihê lê derketiye Ruha ye. Li dijî Nemrûd, yanî li dijî sîstemê derketiye. Berê xwe da welatê Kenan, herêma ku niha jê re dibêjin, Filîstîn, rexekî wê jî Lubnan e. Sedem çi bû ku berê xwe da wir? Ji bo azadiyê berê xwe da diyarê Kenanê. Ji ber ku li dijî koletiyê derketibû. Ji bo azadiyê li hemberî Nemrûd derket û berê xwe da wir.

Mirov baş lê temaşe bike derketina Rêbertiyê jî li Ruhayê ye, hema weke ya HZ. Îbrahîm e. Ew jî berê xwe dide Kenanê. Gelo ji ber çi berê xwe didin heman diyarî? Da ku li dijî dagirkeriyê nefetise û karibe li ser piyan bisekine û li dijî dagirkeriyê şerê azadiyê berdewam bike. Çawa Hz. Îbrahîm di wê meşê de gelek zor û zehmetî dît, li dijî zehmetiyê sekinî, Rêber APO jî heman rengî meşiya. Mirov

dikare bêje her du jî weke hev in. Dibe ku di demên cuda de derketibin û her du pêkhatinên cuda bin, lê bingehê xwe wek hev in.

Dibe ku Hz. Îbrahîm li dijî koletiyê derket û ji bo wê berê xwe da Kenanê. Rêbertî li dijî şaristaniya ku li ser dewlet ava bûye derket. Rêbertî nirxên komînal û demokratîk ji bo xwe bingeh girt. Li ser wî esasî berê xwe da diyara Kenanê û meşiya. Ji bo wê mirov dikare bêje Rêber APO Hz. Îbrahîm ê hemdem e. PKK jî tevgera wî ye. Dema mirov wiha îfade bike, mirovê rast îfade dike. Ji ber ku Rêber APO û PKK kevneşopiya derwêşiyê û pêxemberiyê esas digire. Felsefeya wê jî ji bo xwe esas digire. Di felsefa derwêşiyê de çi heye? Loqmeyek û hirqeyek heye, felsefe ev e, baş e wateya wê çî ye? Ji bo karkirinê birçî nemîne bes e. Ji bo ku mirov bikaribe divê xwarinekê bixwe; lê divê neyê gotin filan-bêvan xwarin. Yanî xwarin tenê ji bo karibe pê bijî. Hirqe çi ye? Yanî bila tazî nemîne ku karibe kar bike. Felsefe ew e. Dervayî vê ji bo xwe tiştek xwestin di nav de nîne, ji bo xwe kirin nîne. Tê her tiştî ji bo gel û mirovahiyê bixwazî pêkbînî. Tê ji bo wê bijî û kar bikî. Jiyana xwe bi temamî li ser wê tê avabikî û rêxistin bikî.

Li jiyana derwêşan temaşe bikin, ji bo wan tiştek nîne, di nav gel de digerin û pirsgirêkên wan çareser dikin, li wan guhdar dikin û daxwaziyên wan pêktînin. Di xizmeta wan de ne, weke din ji bo xwe jiyanekê naxwazin, ti daxwazî û tiştekî wan nîne.

Felsefa vê tevgerê jî li ser vî bingehî ye. Lewma mîlîtanê vê tevgerê wê vê felsefê ji bo xwe esas bigire. Ango wê ji bo xwe tiştekî nexwaze, ji bo xwe tiştekî çêneke û hesabê xwe yê şexsî neke. Jixwe hemû xerabî û gemarî di ku de dest pê dike, di meseleyên şexsî de dest pê dike. Heke kes xwe fikirî, ji bo xwe tişt kir, ji bo xwe xwest, mirov êdî dizane ku ew kes ji civakbûnê derketiye û bi temamî ferdiyet ji bo xwe esas girtiye. Ji bo xwe jiyîn derdikeve holê. Wê demê di kes de wê çi pêşbikeve, ji bo ku ji xwe re hîna derfetan çêke, yê dest bi xerabiyê, gemariyê, xapandinê, diziyê û derewan bike. Xerabî û gemarî di wir de dest pê dike.

Mirov baş bala xwe bidiyê û binêre mirovê ji bo xwe tiştekî naxwaze û najî, tu xerabiyê li gel nabînî, paqij e. Di kîjan kesayetan de xerabî pêşdikeve? Yên bi temamî ji bo xwe kar dikin de pêşdikeve. Dema mirov vê lêbikole, dikare birehetî vê bibîne. Yê ku di jiyana xwe de bi gelemperî rêxistin û gel esas digire, tu xerabiyê û çetebûnê li gel nabînî, ti dekûdolaban, dirûtiyê li gel nabînî, weke

firişteyan pak û zelal e, bi şev û roj kar û xizmetê dike. Lê yê ku ji bo xwe dijî, ji bo xwe dixwaze kar bike, her dem hesabên xwe yên şexsî pêşdixe. Di wan de her tişt normal dibe. Jixwe gemarî di vir de dest pê dike. Ger mirovek ji xwe bibihure, ji bo xwe nejî, xebata azadiyê, gel û însaniyetê bike, di kesayeta wan kesan de ti car xerabî pêşnakeve.

Çima PKK'ê di nav gel de cih girt? Ji ber bi wan taybetmendiyên xwe di nav gel de cîh girt û bandoreke mezin li ser gel kir. Lewra, gel ji wan milîtanên PKK'ê re got: "ev weke melekan e." Gel bi wan bawer kir. Însanê ku bi birayê xwe bawer nedikir, digot, ez ji milîtanê PKK'ê bawer dikim. Ji ber dît ku di milîtanê PKK'ê de, tiştekî şexsî nîne. Her tişt ji bo welat, azadiyê û însaniyetê ye. Lewma ji wan pir bawer kir. Milîtanê PKK'ê di ruhê gel de cîh girt, sedem ew bû ku di ruhê gel de cîh girt. Bi rastî jî milîtanê PKK'ê li ser wê felsefa min gotî çêbibû. Li ser wê kevneşopiyê, kesayeta ku çêbibû pir temîz û pak bû. Mirov tê de ti gemarî nedidît. Bi temamî xwe feda kirin heye, xwe dide wê rêkê, ev derwêşî ye. Lewra ji bo xwe najî û tiştekî naxwaze. Bi temamî bi jiyana derwêşan, bi felsefa loqmekî û herqeyekî re radibe û rûdine. Ev rastiya PKK'ê û milîtaniya wê ye.

Ji bo ku tu milîtantiyeke wiha di xwe de çêkî, pêwîst e tu xwe ji sîstemê qut bikî. Ji bo tu xwe bikî melek, divê tu xwe ji zêhniyet, çand, exlaq, jiyan û pîvanên wê sîstemê qut bikî. Ji bo mirov bikaribe xwe pak bike û xwe bike melek û derwêş, divê kes bi temamî xwe tevlî bike û di nav de xwe bihelîne û her tiştê xwe bike xizmeta gel, mirovahiyê û hevaltiyê. Ev hemû da ku tu bikarî kar bikî. Yê wiha neke û xwe neguherîne, wê fêlbaziyê, sextekariyê, durûtiyê û xapandinê bike. Ji ber ku dayîm xwe dihizire ka wê çawa ji bo xwe derfetan çêbike. Wê demê wê dest bavêje her tiştî û ji bo xwe bikar bîne. Heke em naxwazin bikevin rewşên wiha, divê em di kesayeta xwe de kevneşopiya derwêşiyê ji bo xwe esas bigirin.

Di roja me ya îro de em ji vê kevneşopiya derwêşiyê re dibêjin 'fedayîtî. Ji bo gel, mirovahiyê, hevaltiyê, axê û nirxên mirovahiyê jiyîn, û ev di xwe de temsîl kirin tê wateya xwe feda kirinê. Fedayîtî, bi vê re bûna yek e û derveyî vê jiyaneke din li xwe heram kirin e.

## Ûrfa Navenda Şoreşa Neolîtîkê ye

Quran jî di navê de gelek pirtûkan de behsa Nemrûd dike. Di wan pirtûkan de çi tê nivîsandin? Dibêjin: "mêşek ketiye mejiyê

Nemrût her dem mejiyê Nemrût xwariye, Nermrût her dem bi wê êşê re jiyaye û di dawiyê de jî miriye.” Di vir de Nemrût kî ye? Nemrût desthilatdar e, desthilatdariyê wê demê temsîl dike. Mêş kê ye, şêwazê Hz. Îbrahîm e û fikra wî ye. Ji ber ku gel li dijî koletiyê şiyar dike û radike. Jixwe ev ji bo desthilatdaran xeteriyekî mezin çêdike. Êşa ku Nemrûd dijî ew xeterî ye, wateya wê ev e. Lewma Rêbertî dibêje: “mîtolojî gelek rastiyan di nav xwe de vedişêre, divê ku mirov wiha besît nêzî van meselan nebe. Mirov baş lêkolîn bike.” Mîtolojî çîrokî be jî gelek rastiyan îfade dike. Divê mirov rast jê fêm bike û encaman jê derbixe.

Fikrê Rêber APO ji dagirkeran re çi çêdike? Êşekî mezin çêdike. Çawa Hz. Îbrahîm ji bo Nemrûd xeteriyek û êşeke mezin çêdikir. Ji bo wê Nemrûd dixwast Hz. Îbrahîm ji holê rake. Sîstema dagirkeran jî xwestin Rêber APO ji holê rakin. Çima, ji ber ku fikrên ku Rêber APO pêşdixe ji bo dagirkeran, desthilatan û sîstemê xeteriyeke mezin çêdike. Lewra sîstem pêdiviya ji hole rakirina vê xeteriyê dibîne. Çawa Nemrûd çû bi ser Hz. Îbrahîm de, sîstema desthilatan jî wiha hate bi ser Rêber APO de. Çawa Hz. Îbrahîm ji bo ku radest nebe û derbeyekî nexwe, berê xwe da welatê Kenan, Rêbertiyê jî li hemberî hukmê faşîst yê dagirker ji bo ku bikaribe hêviya gel temsîl bike, berê xwe da welatê Kenan. Ger Rêbertiyê berê xwe daye wir ne ji bo tiştekî din e. Çawa ku Nemrûd xwest Hz. Îbrahîm bişewitîne, Nemrûdê roja me ya îro jî xwestin Rêber APO wiha bikin. Gelek komplo pêşxistin. Herî dawiyê komploya navnetewî pêşxistin. Rêbertî jî dibêje “ez xistim çarmixê.” Çarmixa roja me ya îro sîstema Îmraliyê ye. Mirov dikare bêje weke hev in.

Niha Ûrfa navenda neolîtîkê ye. Ûrfa çawa navenda neolotîkê ye, heman demê li dijî şaristaniya ku dewlet li ser ava bûye ye jî. Ûrfa di heman demê de cîhê serhildêriyê ye. Serhildêriya HZ. Îbrahîm, ew kevneşopiya serhildêriyê li dijî dewletê li wir dest pê kiriye. Bi Hz. Îbrahîm dest pê kir. Mirov dikare vê jî bipirse gelo çima li wir dest pê kir û ne li cihekî din? Ji ber ku Ûrfa navenda neolîtîkê ye, şoreşa neolîtîk di wir de kûr hatiye jiyîn. Lewra kevneşopiya serhildêriyê li wir didome.

Derketina Rêber APO ya li Ûrfayê pêkhat, ne tesadufî bû. Ev çi îfade dike? Bi derketina Rêber APO ya li Ûrfayê, dîrok di roja me ya îro de pêk tê. Nêzîkbûneke Rêber APO ji bo dîrokê heye dibêje “dîrok di roja me de veşatî ye, em jî di destpêka dîrokê de veşartî ne.”

Dîsa Rêber APO dibêje: “te çiqas li ser van kevneşopiyan zêde kir, pêşketin ew bi xwe ye.” Nêzîkbûna Rêbertiyê ji dîrokê re wiha ye.

Niha derketina Rêbertiyê li Ûrfayê, dîrok di roja me ya îro de pêkanîn e. Bi vî rengî têkiliya xwe bi dîrokê re heye. Pêwîst e mirov wisa bibîne û wiha îfade bike. Ev tê çi wateyê? Wateya wê dîrok di roja me de pêktê ye. Yanî ew çand û kevneşopiya ku mirovahiyê temsîl dike û pêşdixe û dide jiyîn. Di roja me ya îro de pêkanîn û temsîlkirina wê îfade dike. Dema mirov vê lêkolîn bike mirov çi dibîne, mirov wê nêzîkbûna Rêbertiyê ya rast ji dîrokê re dibîne. Mirov di encamê de vê rastiyê dibîne û derdixe holê.

Li Ûrfayê pîrozî û lanetbûn bi hev re hene. Hem cihê ku di serî de pîrozî lê hebûye, hem jî cihê ku di serî de lanetî lê hebûye ye. Lewra Rêbertî parêznameyeke xwe li ser navê Ûrfayê pêşxist. Ango li ser pîrozî û lanetiyê parêznameya xwe ya doza Ûrfayê pêşxist. Bi vî rengî parêzname pêşxistin, rast e. Weke din jixwe Rêber APO nedikarî pêşxista. Ger pêşxistina jî wê ew parêzname lewaz bima. Çima Ûrfa girt dest? Me berê jî gotibû li hin cihên Ûrfayê de pîrozî hebûye, hinekan de jî di serî de lanetî hebûye. Li wir pîrozî û lanetî derketiye, Rêbertî bi xwe jî ji wir derketiye. Rêbertî ji cihekê wiha derketiye ku li wir lanetî û pîrozbûn bi hev re hebûne. Pêwîst e mirov bizane lanetî çi ye, pîrozî çi ye. Wan şîrove bike, fêm bike û bide fêmkirin. Ger mirov wiha kir kes dikare peywirên xwe pêkbîne. Rêbertiyê parêznameya xwe di serî de li ser lanetiyê û pîroziyê bi navê Ûrfayê pêşxist, pê re Rêbertiyê xwe girte dest. Rêbertiyê wiha bersiv da Nemrûdê îroyîn. Lewra Rêbertiyê ew parêzname bihêz nivîsî. Ew parêzname wiha nebûya wê lewaz bûya.

Jin Çavkaniya Jiyanê ye

Di serkaniya pîroziyê de çi heye? Şoreşa neolîtîkê, jiyan û nirxên civakî heye. Çavkaniya şoreşa neolîtîkê de çi heye? Dayîk û jin heye. Jiyana ku li ser fikra dayîkê pêşketiye heye, ew jiyana ku dorberê jinê pêşketiye heye. Di serkaniya pîroziyê de keda jinê, dayîkê û ked bi xwe heye. Li ser vî esasî mirov dikare bêje, pîrozî li ser çi pêşdikeve? Pîrozî li ser azadiyê, wekheviyê, edaletê û aşitiyê pêşdikeve. Di bingehê pîroziyê de jî ked heye, ked û jiyana jinê heye. Pîrozî bi temamî çavkaniya xwe ji vê digire.

Dema em dibêjin jin, ev hem temsîla jinê dike, hem jî di şexsê dayîkê de temsîla axê dike. Wateya dayîkê ev e. Jin jiyanê pêşdixe û

çavkaniya jiyanê ye, ax jî jiyanê pêşdixe û çavkaniya jiyanê ye. Çawa dayîk însan diafirîne, erd jî tiştê ji bo însan pêwîst hemûyan diafirîne. Ji lewra çawa jin pîroz e, erd jî pîroz e. Tiştên ku dikevin xizmeta erdê, yên wê dewlemend dikin, yên ku ji axê çêdibin û dikevin xizmeta mirovahiyê hemû pîroz in. Lewra dema mirov li wê dîrokê temaşe dike, dibîne ku jin û ax pîroz hatine dîtin. Ji wê serdemê genim, nok, nîsk, xwerek hemû pîroz hatine dîtin. Av, baran, ewr, agir... hemû pîroz hatine dîtin û wate dane van tiştan hemûyan. Ji lewra tiştên ji bo xwe pîroz dîtine kirine xweda. Ew têgîn wiha pêşketiye. Lewra têgotin "xwedê hemû tişt e, ji pîroziyan her tiştî ava dike û xirab jî dike, ango çavkaniya jiyan û pîroziyê ye." Tiştê tê gotin"tiştê jiyanê ava dike û xizmeta jiyanê dike dibe xwedê." Jin jiyanê ava dike, erd jiyanê ava dike ji bo wê her du pîroz in. Sedema pîroziyê jî ev e.

Di jiyana neolîtîkê de demokrasiya komînal heye. Wê demê demokrasî li ser çi bingehî ye, li ser bingehê azadî, edalet, wekhevî û aşitiyê ye. Ev temsîla pîroziyê dike. Têgîna ku Rêbertî di demokrasiyê de bingeh digire, demokrasiya komînal e. Rêbertî wê têgihêştinê ji bo xwe bingeh digire. Vê dixe hîmê çêkirina civakeke azad. Lewra di nav PKK'ê de li gorî kesan têgihîştina demokrasiyê nabe. Heke tu vê Rêbertiyê qebûl dikî, tê têgihiştina vê demokrasiyê ji bo xwe bingeh bigirî. Ji bo te demokrasî ew e. Weke din demokrasî nabe. Çima ez vê tînim ziman? Gelek kes dibêjin em girêdayî Rêbertiyê ne, em Rêbertiyê ji bo xwe esas digirin, lê li gorî xwe têgihîştina demokrasiyê pêşdixin, lewra ez vê dibêjim. Yê ku Rêbertî bingeh girtibe, wê ji xwe re demokrasiya komînal esas bigire. Wê jiyana komînal esas bigire, wê aşitiyê, azadiyê û wekheviyê ji bo xwe bingeh bigire. Wê li ser vî esasi civakbûnê ji bo xwe bigire. Wê wer nikaribe ferdiyetê, keyfiyetê, li gorxwebûnê bijî. Pişt re jî ji van re bêje demokrasî!

Çi demê çewsandin, desthilatî, zilm, talankirin, îşkence, lêdan, heqaret hwd... pêşketiye, wê demê şaristaniya dewletê ava bûye, pêşketî ye. Ev hemû wê demê pêşketin e. Dîsa bi vê ve girêdayî înkar, tinekirin, derew, wehşiyet û xapandin pêşketî ye. Di serdema neolîtîkê de tu yek ji van jî nabînî. Çi dema ku mirovahî ji neolîtîkê derket û ber bi şaristaniya ku dewlet li ser avabûye ve çûye, ev hemû pêşketine. Wê demê çi hat rojeva mirovan, têgîna bihuşt û dojehê hate rojeva mirovan. Beriya wê bihuşt û dojeh nînbû. Serdema

neolîtîkê ji bo mirovan bihuşt bû, dojeh nînbû. Têgîneke wiha nebû, dema desthilatî pêşket, xwe sazkir, koletî çêbû, sîstemê wehşiyet, komkujî pêşxist. Ew dem bû dojeh. Mirovahî êdî kete nav lêkolîn û lêgerîna bihuştê. Ji bo ku bizane wê çawa bihuşta ku wendakirî cardin bidest bixe. Da ku bizanibe wê çawa xwe ji dojehê xelas bike.

Mirovahiyê bi dewletê re, civakbûna li ser dewletê avabûye re, bihuşt wenda kir. Piştî wê careke din têkoşîna xwe ji bo gihandina bihuştê da meşandin. Li dijî Nemrûdan wê çawa karibin xwe biparêzin, wê jiyana wenda kirî çawa careke din bidest bixin, mirov dibîne têkoşîna wê tê meşandin. Li vir bihuşt wenda kirin çi îfade dike? Lanetiyê îfade dike. Bihuşt pîroziyê, dojeh lanetiyê îfade dike.

Li Ûrfa bi kiryarên desthilatiyê dawî de çi pêşket? Ya pêşketî pîrozî û lanetbûn tevlîhev bûn, desthilatan ew tevlîhev kirin û herî dawiyê desthilatan xwestin pîroziyê jî bi dest xwe bixin. Xwestin xwe wiha îfade bikin ku temsîla pîroziyê ew bi xwe dikin. Bidin nîşandan ku gel jî temsîla lanetiyê dike. Lê ya rastî ya ku temsîla pîroziyê dike gel bi xwe ye, yê ku lanetiyê temsîl dikin jî desthilat in. Ya ku dixwestin bikin ew bû ku di zêhna mirovan de ji rê derketinekî çêbikin. Xwestin têgihîştineke wiha pêşbixin ku desthilat temsîla pîroziyê dikin.

Rêber APO di dîrokê de, bi taybet di dîroka Ruhayê de pîrozî ji bo xwe esas girt. Wê çawa pîroziyê careke din ji bin lingan derbixe, ji dest serweran û desthilatan derxe, ev ji xwe re esas girt. Wê çawa xwe bi pîroziyê re bike yek, wê çawa pîroziyê temsîl bike? Wê çawa pîroziyê bicih bike, lanetiyê bicih bike; wan ji nav hev derbixe? Wê çawa rola ku desthilatan tevlîhev kirî ji nav hev derxe; mafê pîroziyê çawa bidiyê, ji bo xwe esas girt.

Bi Rêber APO re pîrozî û lanetî ji nav hev derketin û gihan maneya xwe ya rast. Rastiya Rêber APO bi temamî vê îfade dike. Edalet ji bo xwe esas girtin, pîrozî û lanetî ji hev derxistin û mafê wan dayîn. Ji ber ku Rêber APO ev esas girt û ev kar kir, edalet pêkanî. Lewma Rêber APO edaletê temsîl dike.

## Rastiya Rêbertiyê Nirxên Jiyanê Mezin Kirin e

Rastiya Rêber APO, rastiya edaletê temsîl kirin e, ew pêkanîn e. Ev bi kedeke mezin pêkaniye. Ji lanetiyê hesab pirsiye û wiha pêkaniye. Pîrozî mezin kiriye û wisa pêkaniye. Bi rexne û rexnedayîneke mezin pêkaniye. Di nav van de ya rast çî ye, ya xweşik çî ye, ya şaş çî

ye, ya nexweşik çî ye? Rastiya hemûyan derxistiye holê. Bi derxistina rastiya van hemûyan re yê şaş, nexweşik ji holê rakiriye. Xweşikbûn serwer kiriye. Ji bo wê di rastiya Rêber APO de tim hesab pirsîn heye. Gotinek heye dibêjin “divê mirov mafê Sezar bide Sezar”. Di rastiya Rêber APO de ew heye. Tê mafê her tiştî bidiyê. Yê şaşitiyê û yê rastiyê jî, tê bidiyê. Mafê şaşitiyê û rastiyê çi ye, hesabê şaşitiyê dîtine û ew bi temamî ji holê rakirin e, rastî dîtin, mezin kirin û hakim kirin e.

Ji ber wê di Rêbertiyê de çi esas e, pêwîst e kes bêhesab nemîne. Ti tişt bê hesab nemîne. Ji ber wê Rêbertiyê digot “hinek biçin qebristanê jî, ez ê pêsîra wan bernedim û di qebristanê de jî ji wan hesab bipirsim.” Ango dibe ku hinek ji bo xelasbûnê mirinê bidin pêş çavên xwe, lê dîsa jî nikarin ji dest Rêbertiyê xelas bibin. Mirin ne xelasbûna ji hesab dayinê û ne çareserî ye. Wê her kes hesabê xwe bide. Kirêtî, şaşitî wê her dem hesab bide. Rastiya Rêbertiyê vê îfade dike.

Ti carî wer bi şaştiyan, xerabiyan û nexweşikbûnan Rêbertî nejiyaye û ne gengaz e jî bijî. Yê ku bi van re nejî, ti caran qebûl nake kes li gel wan jî bijî. Şerê Rêbertiyê li hemberî şaşitiyê nexweşikbûnê pir mezin e. Hesab xwestin û pirsînê pir mezin pêk tîne.

Heke em vê Rêbertiyê ji bo xwe esas digirin, em dibêjin em hevalên Rêbertiyê ne, em girêdayî Rêbertiyê ne, gelo di me de çi tê jiyîn? Ya bi me re tê jiyîn, îdarekirin e, hesab nepirsîn e. Em bêdadiyê esas digirin. Têkiliya vê û Rêbertiyê bi hev re çî ye? Ti têkiliya vê bi Rêbertiyê re nîne. Milîtanekî ku vê Rêbertiyê esas digire, nikare wer bi şaşitiyan û xeletiyan re bijî. Nikare çavê xwe li beramberî şaşitiyan bigire, pê re li hev bike û wan îdare bike. Nikare bê dadiyê bijî. Dema ku te îdare kir, pê re li hev kir, çavê xwe jê re girt, tu li dijî şaşitiyan û qirêjiyan nesekinî û te têkoşîn nemeşand, ew ji holê ranekir, wê demê tu qirêjiyan û şaşitiyan qebûl dikî, dixwazî bidî qebûlkirin. Wê demê tu bêdadiyê dijî û didî jiyîn. Mirov têkiliya vê û Rêbertiyê bi hev re nikare çêke, ev li dijî Rêbertiyê sekinandin e. Ev li dijî Rêbertiyê şerkirin e. Gelek wisa li dijî Rêbertiyê disekinin, şer dikin û her rojê Rêbertiyê dikujin û dibêjin em hevalê Rêbertiyê ne, em bi Rêbertiyê ve girêdayî ne. Bi vî rengî xapandinek mezin dijîn. Pêwîst e ev bê sererastkirin. Rêbertî ked e. Mirovê bê ked dijî, Rêbertiyê qebûl nake. Bi temamî tê bi kedê bijî, tê bibî xwedî ked. Dema mirov kesekî bê ked dît, divê ew kes neyê qebûl kirin û pê-

wîst e, li hemberî wan têkoşîn hebe. Milîtanê vê rêxistinê wê xwedî li kedê derkeve, xwedî li nirxan derkeve, biparêze û mezin bike. Milîtanekî PKK'ê dê vê ji bo xwe bingeh bigire. Wê ji bo jiyana azad nirxan ava bike. Wê tim û tim girêdayî wan be.

Milîtanê wê wan nirxên mezin bijî û bide jiyîn. Nirxdayîna jiyanê, nirxa jiyanê ya herî mezin e. Yê ku li hemberî jiyanê rêzdar nebe, nikaribe nirxan ava bike, nikare jiyanê jî pêşbixe. Wê bide wendakirin, wê jiyanê û nirxan tine bike. Yê ku bê ked be, jiyaneke bê ked ji bo xwe esas bigire, bi wî rengî bijî, wê li ser nirxan rûnê, wê li ser ked û nirxê ku hinekan avakiriye bijî. Bi vî rengî jiyîn çi îfade dike? Ev desthilatiyê îfade dike. Kesên desthilat xwedî kedê nînin, tiştekî ava nakin. Li ser nirxên heyî desthilatiya xwe ava dikin. Yê ku hatî avakirin, dest dixin û li ser wê dijîn. Lewra kesên desthilat xwînmij in. Keda însanan dixwin, xwîna însanan vedixwin, li ser wê dijîn.

Di nav rêxistinê de jî yên ku jiyanê û nirxan neparêzin, wan mezin nakin, wê bê ked bin, û di nav rêxistinê de li ser nirxan û jiyana bi kedê hatiye avakirin bijîn. Kesayetên wiha wê bibin xwînmij. Ev keayetên wiha di nav vê rêxistinê de nayên qebûlkirin. Hevaltiyeke wiha di nav rêxistinê de bi Rêbertiyê re kirin nabe. Ne gengaz e ku bê qebûlkirin jî. Ji ber ku rastiya Rêbertiyê û Rêbertî bi temamî jiyan û nirx avakirin e. Nirx dayîn e, mane dayîn e. Yanî mezin jiyan kirin e. Yê ku Rêbertiyê re hevaltiyê dike wê van ji xwe re esas bigire. Wê çawa jiyanê û nirxan mezintir bike, wê ji xwe re esas bigire. Yên ku vê ji xwe re esas nagirin, bi nirxan, jiyanê û Rêbertiyê dileyîzin. Di nav rêxistinê de dijminiyê dikin. Milîtaniya Rêbertiyê bi vî rengî nabe. Ew dibe sîxûrtî û dijbertî.

Lewma yên di nav rêxistina PKK'ê de milîtaniyê dikin û hevaltiyê bi Rêber APO re dikin, wê nirx bidin dayîkê, erdê û tiştên ku hatine afirandin. Mirovan dayîk diafirîne, erd qûd-zad diafirîne. Tê hem qîmetê bidî însan, hem jî bidî tiştê ku erd diafirîne. Ancax wisa mirov bibe hevalê Rêbertiyê. Berovajiyê vê mirov dibe dijminê Rêbertiyê. Ji lewra Rêber APO nirxekî pir mezin dide însan û însan wek nirxê herî mezin dibîne. Ruxmê hemû kêmasî û lewaziyên însan, însan wek nirxekî mezin dibîne. Û di heman demê de wê çawa wan însanan hîna mezintir bike, ji bo wê kar dike.

Lê ya ku em dijîn ev e, em kar dikin da ku însanan bi hevalan bidin qebûlkirin, da pê re bijî û kar bike. Ev jî karek pir zehmet e.

Ruxmê vê jî tu dibînî hev qebûl nakin. Zû zû vê qebûl nake û yê ku nayê hesabê wî, dibêje “ez pê re kar nakim, ez pê re namînim.” Bi vî halê xwe ve jî xwe PKK’yî dibîne û xwe hevalê Rêber APO dibîne. Ewqasî berovaj e, lê dîsa jî xwe milîtan dibîne. Yek ji rastiyên însanê Kurd ev e. Di nav xwe xapandinê de ye, ne di ferq û cudatiya wê de ye. Xwe dixapîne, pê re dorberê xwe jî dixapîne. Lewra însanê Kurd bi sernakeve. Însanê ku xwe bixapîne wê çawa biserkeve? Di kesayeteke wiha de serkeftin çênabe û nikare serkeftinê jî pêşxe.

Nêzîkbûna Rêbertiyê ji hemû nirxan re, nêzîkbûneke pir mezin e. Qeteke nan jî dema li erdê dibîne radike û nabêje qeteke biçûk e tiştek nabe. Hevalên ji nêz ve Rêbertî dîtine vê nêzîkbûna Rêbertiyê dizanin. Rojekê Rêbertî li Akademiyê qetek nan li erdê dibîne û radike, bi milê xwe wê qeta nan paqij dike û dixwe. Rêbertiyê her dem gotiye “şerê min şerê nan e.” Ji bo ku bi kadro jî wan nirxan bide fêmkirin ku têkoşîna tê kirin a nirxan e. Ew qeta nan nirxek e û di wê qeta nan de nirx heye, ked heye. Mirov nikare seranser nêzîk bibe. Ha tu wiha nêzî qetekî nan bûyî, ha tu nêzîkî çuwalekî ar bûyî, weke hev in. Yê ku îro wiha nêzîkî qetek nan dibe, wê sibê wiha nêzîkî çiwalekî ar jî bibe. Wê sibarojê bi wî rengî nêzîkî welatekî jî bibe, ji sedîsed ev mesele wisa ye. Ev di piratîkê de jî bi hezaran caran îsbat bûye.

Di hevalên me de çi heye, gelek tişt dirijin, dikevin erdê lê ranakin, tu dibêjî qey heram e; ne tenê qeteke nan, bi kîloyan erzaq dirije tu dinêrî kom nakin. Bi xwe re nabînin ku kom bikin. Tişta dikişin, turikên wan kun in, bi xwe re nabîne ku wê kunê bidirû, tu li rêkê dinêrî tu dibêjî qey li erdê reşandine. Ev jî milîtanê PKK’ê ne, hevalê Rêbertiyê ne? Rêber APO hevaltiyeke wiha ti caran qebûl nake. Ji ber ku rastiya Rêber APO ne ew e ku wiha mirovan jî qebûl bike. Li hemberî kesên wiha qîyametê radike. Mirovê ku wate neda jiyanê û nirxan, wiha nêzî nirxan û jiyanê dibe. Bi heman rengî nêzî însanan jî dibe.

### Şerê Min, Şerê Namûsê, Dayîkê, Jinê Û Erdê Ye

Rêbertî di hevdîtinê de wiha dibêje: “şerê min şerê namûsê ye, şerê dayîkê ye, şerê jinê û erdê ye. Ez dixwazim hem jin-dayîkê, hem jî erdê ji bin lingan derxînim. Ger mirov ew kir, dikare jiyaneke azad pêşbixe.” Ji bo wê girêdana Rêber APO bi dayîkê ve, girêdaneke bingehîn e. Şer û têkoşîna vê dike, ka wê çawa dayîkê temsîl bi-

ke. Girêdan ev e, yê ku girêdana xwe bi dayîkê re hebe, wê ji bo kerameta dayîkê têbikoşe. Girêdana bi dayîkê ve tê wateya ji nû ve civakbûn înşakirinê, û li ser hîmê wekhevî û azadiyê jiyan ava kirinê. Weke din girêdan bi dayîkê ve nabe. Yê ku girêdana dayîkê esas digire, wê vê esas bigire û di piratîkê de pêkbîne. Wê hemû hêza xwe li ser vî bingehî pêşbixe. Ev jî çi îfade dike? Ev îfadeya, ji nû ve avakirina civakbûna li dorberê jinê ye. Tê jinê ji nû ve avabikî. Ger bi rastî tu dixwazî ji nû ve civakê li ser hîmê azadiyê, aşitiyê, wekheviyê û edaletê avabikî, wê demê divê tu jinê ji nû ve avabikî. Ger Rêbertî jin esas girt û xist navenda her tiştî, ji ber wê bû. Lewra, Rêbertî dîroka civakbûnê esas digire.

Bala xwe bidinê di kongreya sêyemîn de Rêbertiyê got: “yê tê analîzkirin ne kes e civak e, ne dem e dîrok e.” Ji ber ku dîrok û civak esas digirt. Piştî wê binêrin analîzên Rêbertiyê di sala 1987’an de bi giranî li ser jinê ne. Ji ber ku dîrok û civak ji bo xwe esas girt gihêşt rastiya jinê. Dît ku hemû pirsgirêk bi pirsgirêkên jinê ve girêdayî ye. Ger pirsgirêka jinê çareser bibe wê pirsgirêkên din hemû çareser bibin. Civakbûn li ser têgihîştina jinê ava bûye. Ger tu dixwazî ji nû ve civakê avabikî tê li ser zêhniyeta jinê avabikî. Jin çî ye, pirsgirêkên wê çi ne? Rêbertiyê hem kesayeta jinê hem jî pirsgirêkên jinê baş dît. Lewra di sala 1987’an de piştî kongrê pir li ser mesela jinê sekinî. Beriya wê jî analîzên Rêbertiyê hene, lê kêm in. Rêbertî çiqasî di dîrok û civakbûnê de kûr bû, ewqas gihîşte rastiya jinê. Ji ber wê jin esas girt.

Li ser wî esasî Rêbertiyê bêhsa ‘kuştina zilamtiyê, di jinê de pêşxistina azadiyê; di navbera jin û mêr de pêşxistina yekîtî, azadî û wekheviyê’ kir. Rêbertî ket nav vê têkoşînê, girêdana xwe ji bo dayîkê bi vî rengî pêkanî. Wê çawa jinê ji wê rewşê derbixe û wê çawa jinê mezin bike, wê careke din jinê çawa bi rastiya jinê re bike yek da ku bikaribe mirovahiyê jî bi rastiya mirovahiyê re bike yek. Ew esas girt. Rêbertiyê di vir de têkoşîn pêşxist û girêdana xwe wisa îfade kir.

Niha Rêbertî girêdana xwe wiha îfade dike, em jî dibêjin em girêdayî ne, lê girêdana me tiştekî îfade nake. Ev jî rastiya me ye. Girêdan tenê bi axaftinê nabe. Yê ku dibêje ez girêdayî me, wê weke Rêbertî girêdana xwe îfade bike. Ger girêdayî jinê ye, wê jinê mezin bike. Wê rêz û kerameta jinê çêbike. Wê kesayet û vîna jinê çêbike. Ger dibêje ez girêdayî erdê me, wê qîmetê bide erdê. Wê bizane

dema erd di bin destê dagirkeran de be wê êşê bikişîne, di heman demê de wê mirovên li ser wî erdî êşê bijîn. Wê bizane çawa têkoşîna wê bide, wê ji têkoşînê nereve.

Rêbertî wiha nêzîkî mesela jinê û dayîkê dibe, lê em çawa nêzîk dibin, divê em ev ê ji xwe bipirsin. Em binêrin ka bi rastî em hevaltiyê bi Rêbertiyê re dikin ya nakin. Rêbertî wê ewqasî jinê mezin bike, wê di kesayeta jinê de baweriyê çêbike, wê rêkê nîşan bide, wê hestên jinê mezin bike, fikra wê mezin bike, rêxistina wê mezin bike, nasname û vînê bidê; nêzîkbûna me jî wê 'em ê çawa vê jinê bikin jina xwe' be. Em ê vê esas bigirin, ka çawa em ê xerîzeya xwe ya cinsî tatmîn bikin. Ev çawa dibe hevaltiya bi Rêbertiyê re û girêdana bi jinê ve? Di kesayeta zilaman de wiha derdikeve holê, wê çawa jinê bike jina xwe, wê çawa xwe tetmîn bike. Nêzîkbûna zilam li ser vî esasî ye. Nêzîkbûna jinên ku xeta azadiyê naşopînin jî, ji ya zilam cudatir nîne. Li şûna ku têkoşîna wekheviyê, azadiyê bide, tu dinêrî hinek kesayetên lewaz, wê çawa zilamekî bixîne, pey wê ne. Yanî li şûna têkoşîna azadiyê bidin, daxwazên zilam pêktînin. Ev, çanda ji sîstemê û malbatê girtî pêkanîn e. Wê çawa xwe bike jina zilamekî û daxwaziyên zilamekî pêkbîne û xwe tetmîn bike, vê esas digire. Ti têkiliya van bi Rêbertiyê re nîne.

Di kesayeta Rêbertiyê de heta dawiyê ji berdê hezkirin, ji erdê qutnebûn, îxanet li erdê nekirin û ji bo wê têkoşîn kirin li pêş e. Ji wan kesên ku erdê difiroşin û pêşkêş dikin, hesab pirsîn esas e. Lê mixabin ev zêde bi me re nîne, yan jî ger hebe lewaz e. Yanî kê ev erd kiriye vê rewşê, kî difiroşe, kî pê dileyîze, kî bi me dileyîze, ji wan hesab zêde nayê pirsîn. Kîn, nefret bi me re nîne. Hestên rêxistin kirin û li gorî wan hestan çalakî kirin zêde bi me re nîne. Lê yê ku bi rastî girêdayî erdê be nikare van tehemûl bike. Yê ku mirov be nikare qebûl bike ku erd û mirovên wê erdê di bin dagirkeriyê de bin. Çi dibe bila bibe, wê vê erdê ji bindestiyê û dagirkeriyê derbixin. Wê vê erdê di bin destê dagirkeriyê derxin û li ser wê erdê azadiyê pêşbixin. Da ku bikaribin di wê civakê û di nav însanên wê de azadiyê pêşbixin. Wê ji erd û welatê xwe hez bike, wê ti car paş de nezivire, teslîm nebe û nereve. Ji yên ku radest dike wê hesab bixwaze.

Mînak, Rêbertî di parêzname û hevdîtinê xwe de li ser gundê xwe diaxive. Li ser darê gund, newalên wir û lawirên wir diaxive. Girêdaneke xwe ya ewqasî kûr heye û wir ji bîr nake. Heta rexne-

dayîna xwe dide. Dibêje. “ ji gund qutbûn şaş bû.” Dîsa rexnedayîna xwe di derbarê nêzikbûna xwe ya ji dayîka xwe re dide. Dîsa derheqê nêzîkbûna xwe ya ji bav re jî rexnedayîna xwe dide. Dema li gund dibêje “min çûk kuştin” rexnedayîna wê dide. Rexnedayîna van  hemûyan girêdanê û hezkirinê îfade dike. Yê ku hez bikin û girêdayîna xwe hebin, dema dikevin şaşitiyan û kêmasiyan, weke Rêbertiyê rexnedayîna xwe didin. Lê ger wiha nebe, di ser re derbas dibe û diçe. Di gelek kesayetan de ev heye.

PKK cihê ku mirov bi kedê nirxan ava dike ye. Milîtanê wê yên ku nirxan ava dikin, lewra xwedî kedê ne. Ji bo wê jî PKK cihê pîroziyê ye. Ji ber ku PKK jiyanê ava dike, nirxan ava dike, lewma cihekî pîroz e. Yên ku di nav PKK’ê de cih digirin, di cihekî pîroz de cih digirin. Pêwîst e ziyanê nedin pîroziyê, PKK’ê û xwe. Milîtaniya PKK’ê û hevaltiya bi Rêber APO re ji mirov vê dixwaze. Ger te ziyan da pîroziyê, tu lanetî dibî. Yên lanetî jî nayên qebûlkirin, hesab ji wan tê pirsîn. Kes nikare di nav cihekî pîroz de lanetiyê bijî û temsîl bike, pê re azadiyê jî bixwaze, ev ne gengaz e. Ji ber ku şerê PKK’ê şerê pîroziyê ye. Rastiya Rêber APO rastiya pîroziyê ye, li dijî lanetiyê sekin e û hesab pirsîn e. PKK jî cihekî pîroz e û li dijî lanetiyê hatiye avakirin, da ku hesabê ji lanetiyê bipirse. Însanên tên nav PKK’ê jî ji bo wê tên nav PKK’ê. Ji bo pîroziyê bijîn û bidin jiyîn, hesabê ji lanetiyê bixwazin. PKK cihê mirovên wiha ye.

Tu dinêrî milîtanê PKK’ê ye, yê Rêber APO ye, lê pê re nirx avakirin, jiyan avakirin nîne. Ji vê rewşa xwe aciz jî nabe. Kesayetên bi rastî jiyanê û nirxan ava dikin, tu dibînî ji yên ku jiyanê ava nakin aciz nabin. Di vir de pirsgirêkeke cidî heye. Heta tu dinêrî ku di nav PKK’ê de hinek hene tiştekî nakin, nirxekî ava nakin, lê ji her kesî zêdetir jî derfetên PKK’ê xerckirinê mafê xwe dibînin. Dema ku van derfetan dixwazin û rêxistinê jî neda, nerazîbûnê nîşan didin û heta ev nerazîbûna kesên wiha xwe digihîne dijminiyê û îxanetê. Bi van nêzîkbûnên xwe jî xwe mafdar dibînin. Ev çî ye, di nav PKK’ê de lanetî jiyîn û temsîl kirin e. Ev li dijî PKK’ê sekin e û sîxûriya dijmin di nav PKK’ê de kirin e. Ya rastî ev e. Yê ku dibêje ez hevalê Rêbertiyê me, nikare wiha lanetiyê, bêkediyê bijî û nirxên ku PKK’ê ava kirine mafê xwe bibîne. Mafekî xwe yê wiha nîne.

Maf di nav PKK’ê de erk, nirx û jiyan ava kirin e. Ev e mafê di nav PKK’ê de. Weke din mafê ti kes nîne. Di şoreşgeriya PKK’ê de tê kar û xizmetê bikî, tê ji bo xwe tiştekî nexwazî. Tê bêşert û hesab xwe

tevlî bikî. Wer gotina 'min ev ava kiriye, mafê min heye, ka mafê min bidin...' di nav PKK'ê de ev nîne. Yê ku wiha nêzîkî PKK'ê dibe, diyar e ku ji PKK'ê û rastiya Rêbertiyê tiştek fêm nekiriye. Yên wiha divê ji derveyî PKK'ê biçin li mafên xwe bigerin. Li ku çi karî dikin bila hesabê wê ji wir bixwazin. Di nav PKK'ê de ev nêzîkbûn nabe, tê bêhesab şoreşgeriyê bikî. Bêşeret tê şoreşgeriyê bikî. Tê şev û roj kar û xizmetê bikî, tê bizanî ku tu erka xwe pêktînî. Te çiqas pêkaniye tê wê kêm bibînî û hîna zêdetir tê kar û xizmetê bikî. Weke çawa Rêber APO dike.

Di nav PKK'ê de mirov wiha dijîn, weke din di nav PKK'ê de jiyîn lanetî ye. Bi lanetî di nav PKK'ê de jiyîn dijminî ye. Di nav PKK'ê de li dijî PKK'ê sekinîn e, hem jî bi derfetên PKK'ê li dijî PKK'ê sekinîn e û ev jî gunehê herî mezin e.

Mirov dikare sala 1972 heta 1984'an ji gelek aliyan ve binirxîne. Mirov dikare ji vê demê re bêje, hilhatin û şiyariya gelê Kurd. Weke din jî mirov dikare jê re bêje, îsyan û serhildêriya destpêkê. Mirov dikare bêje namûs û keramet rakirina ser piyan bû. Yan jî mirov dikare bêje, bi wêrekî pêngava azadî û hizirê avêtin bû. Dîsa ji her aliyê ve xwe ji koletiyê qutkirin e, li dijî dagirkeriyê çalakiya serkeftî ya destpêkê ye. Mirov dîsa dikare bêje, di hestan de jî ew ji rêderketin û ji rêderxistina dijmin çêkirî rast kirin e. Mirov dîsa dikare bêje ji bo gelê Kurd îdeolojî û felsefe pêşxistin e. Ev gihandina rêxistinê û milîtanê wê, gerîlayê wê çêkirin e. Ev hemû jî ji bo salên 1972-1984'an rastin û mirov dikare vê pêngavê bi vî rengî îfade bike. Ev pêvajo bi kedê, baweriyê, serkeftinê û bu manedanê, hatiye avakirin. Ev pêvajoyeke wiha ye.

Çêbûna Rêbertiyê ya duyemîn, dema di navbera 15'ê Tebaxê û 15'ê Şibatê de ye. Ev pêvajo herî zêde bi pêngava partîbûnê ya duyemîn e, u udi heman demê de tevgera leşkerî pêşxistin e. Ji 15'ê Tebaxê heta komploya navnetewî, kare ku Rêbertiyê bi giranî kiriye, karê rêxistinbûnê ye. Pêngava duyemîn ya rêxitinbûnê pêşxistin e. Ev bi xebatên çekdarî pêşketiye.

Mirov dikare bêje serdema yekemîn ya hilhatinê, weke Hz. Îsa ye. Çawa hewariyên Hz. Îsa fikr û ramanên wî bi awayekî veşartî belav kirin; yê Rêber APO jî wiha ye. Bi temamî fikir bi awayekî veşartî belav kirin. Heta demekê, çawa Hz. Îsa xwe destpêkê bi rêxistin kiriye, xwe ji her kesî veşartiye û wiha hizirê xwe belav kiriye, tevgera PKK'ê eynî weke wê xwe rêxistin kiriye. Rêbertiyê wê demê

fikir jî veşartî pêşxist. Rêbertî dibêje dema min li Çubuxê got: “Kurdistan bindest e. Min baş li derdora xwe temaşe kir ka kes heye tineye, bibîhîze, bigihîne dijmin, negihê dijmin? Wer bi veşartî, min ew kar destpêkir.” Ji ber ku dijmin bibihîze wê tavilê biçe bi ser de û ji holê rabike. Dijminekî ewqasî dirinde ye, ji ber wê divê tu karê xwe veşartî bikî û xwe bi rêxistin bikî da ku tu bikarî gavan bavêjî.

Di hilhatinê de dema duyemîn weke derketina Hz. Mûsa û Hz Mûhemed e. Hem aliyekî xwe weke Hz. Mûsa ye, aliyekî xwe jî weke HZ. Mûhemed e. Ji Ruha derdikeve, diçe Kenanê, û li wir ji xwe cih çêdike. Li dijî zor û zehmetiyan disekine. Dîsa li wê derê amadekariyan dike, rêxistinê kom dike. Careke din berê tevgerê û kadro dide welêt. Da ku tevger bê wendahî li welat xwe bi cih û bi rêxistin bike, li ser wî bingehî amadekariya çekdarî dike, ji bo ku amadekariya 15’ê Tebaxê bike. Mirov dikare bêje eynî weke meşa Hz. Mûsa ye. Hz. Mûsa li Misir di bin desthilatiya Fîrewn de amadekariyên xwe dike da ku gelê xwe ji wir derbixe û bi zehmetiyeke mezin derdikevin; dijmin dide pey wan. Ji ber ku qewma wî nayê rêxistinê û rêzkariyê, gelek zor û zehmetiyan di meşa xwe de dibîne. Çavê gelê wî her li paş û dorûberê ye. Lewma Hz. Mûsa hem xeteriyên dijmin dide aliyekî, hem jî rêxistina gelê xwe çêdike. Baweriya gelê xwe bihêz û xurt dike, moralê dide wan, ta ku bigihên erdê pîroz. Lewra ji wan re dibêjin, qewma lanet lê hatî kirin. Mûsa xwest wan ji lanetiyê derbixe, lê zû zû derneketin. Ji ber wê bi wan re şer kir. Hz. Mûsa şerê herî mezin li dijî qewma xwe dimeşîne, wiha qewma xwe ji Misirê derdixe û digihîne cîhên bi ewle.

Derketina Rêbertiyê û vegera li welat weke heman demê ne. Derketina Rêbertiyê pir bi zor û zehmetî, veşartî û xeternak çêbûye. Cih û derfet çêkir û kom xwest. Komên ku çûbûn jî vîna xwe şikestî bûn, Rêbertiyê ew perwerde kirin. Gelek ji wan baweriya wan bi şer nema bû. Baweriya wan nebû ku vegerin welat, xeteriya penabertiyê hebû. Ji hêlekî ve Semîr ew fikir xurt dikir. Çawa hinekan di nav gelê Mûsa de wiha dikirin û digotin, ‘ev derewan dike, çima em li pey vî diçin, em bizivirin, ev tiştekî nade me.’ Semîr jî di nav rêxistinê de eynî tişt dikir. Rêbertiyê bi van hemûyan re şer kir, wer berê rêxistinê da welat, berê kadro da welat. Ev pêvajo weke pêvajoya ku Hz. Mûsa li Misirê derketî û hatî erdê Filistîniya ne. Lewra ev her du pêvajo pir nêzî hev in.

Piştî ketina welat û şûn de, pêngava 15'ê Tebaxê û bûyerên pişt re qewimîn, rêxistinkirinê de israr kirin, li dijî komployê sekin... di van xalan de mirov dikare bêje weke tevgera Hz. Mûhemed e. Lewra amadekarî û pêşxistina şer, kadro perwerde kirin, derfet û amûr şer hazir kirin û têkiliyên wê amade kirin, tewazina wê çêkirin, di şer de israr kirin... van xalan de jî pratîk dişibe pratîka Hz. Mûhemed. Hz. Mûhemed çawa ji Mekê diçe Medînê, li Medînê jî hazirtiyan dike û dawiyê de tevgerê pêşdixe; PKK'ê jî heman tişt kir.

Di wê pêvajoyê de baweriya Rêbertiyê bi şer pir xurt e. Di wê demê de tevlîbûna Rêbertiyê ya demê re bêsînor e. Her tiştê xwe dike xizmeta şerê gerîla, da rêxistinbûn biserkeve û neşikê. Li Kurdistanê karibe sosyalîzmê û welatekî sosyalîst ava bike. Yanî her tiştekê xwe xistina xizmeta soyalîzmê, ji bo sosyalîzmê xwe helandin heye. Çirkeyekî jî ji bo xwe jiyan nekirin, bi şev û roj kar kirin heye. Di xewn û xeyalên xwe de jî wê dijî û ji bo wê kar dike. Bi wê re radizê, bi wê re radibe. Rêbertî bêsînor xwe tevlî dike.

Ji bo wê Rêber APO di wê pêvajoyê de şer pîroz dibîne. Wek çalakiyeke pîroz dibîne. Jiyana xwe bi temamî li ser vê bi rêxistin dike. Ji ber ku bi vî şerî wê dagirkeriyê bişkîne, bi vî şerî wê azadiyê û sosyalîzmê pêk bîne. Ger di vî şerî de gerîla derbê bixwe, wê rêxistin derbê bixwe, û her tiştê wenda bibe. Da ku wenda neke, wan nirxên çêkirî zêdetir biparêze û mezintir bike, da ku hedefê xwe pêkbîne, pêwîst e şerê gerîla û rêxistinbûnê xurt bike. Wê demê her tişt li ser wî şerî çêbûye, rêxistinbûn, azadî, sosyalîzm jî li ser wî şerî çêbûye. Lewra di nav de xwe dihelîne. Di wê pêvajoyê de Rêbertî civakbûyînê tam dijî, lewra her tişt ji bo sosyalîzmê ye. Tevlîbûna Rêbertiyê bêsînor e û civakbûneke tam dijî.

Wê demê zekaya Rêbertiyê ya analîtîk di zirwê de ye. Zekaya xwe ya analîtîk pir zêde pêşxistiye, zekaya xwe ya hestiyarî paş dixe. Ji lewra di navbera zekaya analîtîk û ya hestiyarî de bêtewazinî jî çêbû. Ji ber ku giranî dabû ka wê çawa şer pêşbixe. Di encama wê de zekaya hestiyarî di plana duyemîn de dihêle. Ev jixwe li ser tendurûstiya Rêbertiyê jî bandorê dike. Ji ber ku xwe dihelîne, şev û roj ji bo wê kar dike, difikire. Ji bo wê zekayê analîtîk di zirwê de ye û zekaya hestiyarî di plana paş de ye. Jixwe ev bêtewazinê çêdike, ev nahêle ku gelek tiştên din bibîne. Ji ber ku hemû bala xwe û lêhûrbûna xwe li ser şer e. Dijmin bi awayekî topyekûn êrîş dike, dixwaze derbê li rêxistinê bide. Rêbertî wê çawa van êrîşan pûç

bike, û wê çawa artêşbûna gerîla biserxe, bi temamî li ser wê hûrûkûr dibe. Ji bo wê zekayê analîtîk ê Rêbertiyê pir xurt e û digihîje lûtkeyê.

Di vê pêvajoyê de gavên ku Rêbertî davêje ne berovajiyê demê ne û ne şaş in. Yanî pêvajo ji bo wî guncav e da ku kar bike. Di bin bandora sosyalîzma pêkhatî û têgihîştina rizgariya netewe ye. Ev li gorî gelemperiyê jî guncav e.

Destkeftiyên Çaxa Çêbûna Duyemîn Yên Heyî

Lê her çiqas ew destkeftiyên mezin hene jî, li gel wê sîstema ku Rêbertî dixwaze û ji xwe re kiriye armanc hîna bi temamî pêk neaniye, ev rastiyek e. Rêbertî ji bo Kurdan Rêbertî pêşxistiye, rêxistin pêşxistiye, gerîla pêşxistiye, rêxistina gel çêkiriye, li ser wî esasî gelek xulikandiye, ev hemû çêbûne. Her wiha milîtaniyek pêşxistiye, li ser wî bingehî jiyanek pêşxistiye. Pergalek pêşxistiye, lê ev çiqas pêşxistibe jî, li gorî hedef û armancên xwe ji van yek jî pêknehatiye. Di vir de çiqasî gav hatine avêtin, encam jê hatine derxistin, li gorî têgihiştina xwe hedefên dayî pêşiya xwe bi cih nehatiye. Ji vê zêdetir di mijara rêxistin, gerîla, gel û milîtantiyê de weke tê xwestin encam nehatiye bidestxistin. Ev tişt tam pêknehatine. Vê nakokî û nerehetî bi Rêbertiyê re çêkiriye. Wê çawa pêşengtiyek, gerîlayek, gelek, milîtanek û jiyaneke dixwaze çêbike û pêkbîne? Vê her dem bi Rêbertiyê re nerehetî di jiyana wî de pêşxistiye.

Di vê pêvajoyê de gelekî ku biryarê azadiyê daye, hatiye xulikandin. Gelekî ku ji bo azadiyê şer dike çêbûye. Di têkoşîna Rêber APO de ev karekî bingehîn bû. Wê çawa gelê Kurd ji wê rewşê derbixe, ji mirinê ber bi têkoşeriyê ve bibe, ew gel her dem di hemû şert û mercan de ji bo azadiya xwe bikaribe têbikoşe afirandiye. Di hedef û armanca Rêbertiyê de ev heye, gelekî wiha çêkiriye. Di vê pêvajoyê de tiştê ku çêkiriye yek jî tevgera jina azad û rêxistina wê ye. Di vir de jî gelek gav pêşxistiye. Ev jî rastiyek ji rastiyên Rêbertiyê ye. Beriya Rêber APO û PKK'ê siyaset di dest desthilatan de bû. Di nav civaka jor de bû. Yên di nav civaka jor de cih digirtin siyaset di-kirin. Civaka binî yanî gel derveyî siyasetê bû. Rêber APO civaka binî xist nav siyasetê. Siyaset ji dest civaka jor girt û da dest civaka binî, yanî da dest gel. Xwedayê li ezmanan daxiste erdê. Gel bi tevahî xiste nav siyasetê. Ev jî guhertinek pir mezin bû. Di gel pêngavên din jî, ev li Kurdistanê pêngaveke pir mezin bû.

Di Rojhilata Navîn De Hilhatineke Nû

Rêber APO hîmê dîplomasiya Kurdan ji nû ve avêt. Ew diplomasiya di Kurdistanê de dihate meşandin, dîplomasiyeke sexte bû, tiştek zêde nedida gelê Kurd. Kurd dikirin xizmeta herkesî de. Ji ber vê rastiyê, Rêbertiyê derxiste holê ku ew ne dîplomasî ye, bi navê Kurdan dîplomasiyeke sexte tê meşandin. Rastiya wê derxiste holê, ji bo Kurdan hîm û prensîbên dîplomasiyeke rast danî. Li ser wî bingehî li Rojhilata Navîn dîplomasiya Kurdan pêşxist. Ji bo Kurdan rêzek çêkir. Dibe ku îro PKK zêde ji vê sûdê nabîne, zêdetir PDK-YNK'ê sûd wergirtine, lê ev rastiyek e. Di vir de Rêber APO ji bo Kurdan xizmeteke mezin kir. Li vir pêşketineke mezin pêşxist.

Rêber APO ruhekî netewî li Kurdistanê çêkir. Beriya Rêber APO di Kurdan de ruhekî netewî tinebû. Ev jî destkeftiyeke pir mezin bû. Ji bo Kurdan hest û hizir çêkir. Ji bo Kurdan yekîtî çêkir û pêşxist, lewra çalakiya vê pêşxist. Ev hemû bi Rêber APO û PKK'ê çêbûn. Ev hemû ji bo Kurdan destkeftiyên mezin in. Li Kurdistanê Rêber APO jiyanek, kesayetek û civakek nû çêkir, li ser wî bingehî Rêber APO exlaqek û çandeke nû pêşxist. Vê li Kurdistanê guhertineke mezin çêkir. Civaka Kurdistanê ser û binî hev kir. Vê şoreşek çêkir. Şoreşa vejînê çêkir. Kurd bi vê şoreşê rabûn ser piyan. Kurd êdî ji bo xwe dijîn û dixebitin. Bi vê li pêşiya mirina Kurdan bi temamî hate girtin. Ew xeterî hate rakirin. Ji bo Kurdan êdî mirin negengaz bû. Êdî berde mirina Kurdan, serkeftinek û jiyaneke nû, çareserkirina pirsgirêkên Kurdan peyda dibe. Bi temamî ji bo Kurdan derfetên serkeftinê çêkir.

Ev hemû destkeftiyên wê çaxê ne. Serkeftinên mezin wê demê pêkhatin. Kes nikare van înkar bike, ancax yê ku însaniyeta xwe wendakirî, wîjdana xwe wendakirî dikare van înkar bike. Ti demê kesekî wiha ji bo Kurdan ewqas kar nekir û nirx nexulikand. Ev rastiyek e. Kes nikare vê rastiyê înkar bike.

Weke berê jî min got, yê ku mirovahî û wîjdanê xwe wendakirî, dikare wiha rehet van destkeftiyên hatine pêkanîn înkar bike. Rêber APO û PKK'ê mohra mezin li civaka Kurd xist. Wê bandora xwe bi sedsalan berdewam bike. Guhertina ku di civaka Kurd de çêkirî, wê berdewam bike. Kes nikare li pêşiya wê bisekine, êdî kes nikare weke berê nêzîkî Kurdan bibe.

Di Nav Pêngavên Dîrokî Yên Tevgerê De Aliyên Kêm

Dema em van tînin ziman, bi van destkeftiyên mezin re kêmasî û xetayên wê demê jî hene. Ew kêmasî û xetayên wê demê çi ne? Rêbertî dibêje : “dema ku ji derveyî welat min berê tevgerê û kadro da welat, ji bo pêngava 15’ê Tebaxê pêşkeve, pêwîst bû ku min pêşengiya wê jî amade bikira. Min kadroyên ku bikarin pêşengiya wê pêngavê bikin hazir bikira, pêwîst bû ez wiha wê hêzê bişînim welat, lê min ew nekir. Bi taybet kadroyê ku pêşengiyê bikin min hazir nekirin, min hewl da ku ez kadroyan hemû hazir bikim. Min ji hevalan jî bawer kir, bawerî û girêdaneke min ya bihêz bi hevaltiyê hebû, tiştê min bidana wan min hemû dan. Min got êdî wê bikaribin bikin. Lê ev xelet bû, pişt re min ev fêm kir.”

Kemasiya din jî dema ku krîza di sala 1991’an ya li Rojahilata Navîn destpêkir, bi destwerdana Emerîkayê detpêkir, ew jî krîza Kendavê bû. Rêbertî dibêje: “Pêwîst bû wê demê ez biçûma welêt û min rasterast gerîla rêvebibira. Ez neçûm û dîsa min bi hevalan re hişt. Ev jî kêmasî bû. Min ev jî paşê fêm kir.”

Kêmasiyek din ew çetegeriya di nav pêşengiya rêxistin û gerîla de bû. Rêbertî wiha dibêje: “Min di dema wê de ew nedît û tevdîra wê negirt. Çetegeriyê pir xerabî kir, rêxistin ji rêka wê derxist. Gerîla ji rêka gerîla derxist û ji gelek aliyan ve dûr xist û qut kir. Çetegeriyê texrîbatên mezin kir û di gelek aliyan ve serweriya xwe çêkir û PKK di nav PKK’ê de kêm kir. Qonaxên mezin, dejenere-bûnên mezin çêbûn. Vê bi me da wenda kirin.”

Li Suriyê pir mayîn, di demê de ji Suriyê derneketin, têkîliyên bi Suriyê re stratejîk dîtin, ev li ser Suriyê ferz kirin; xelet bû. Rêbertî ji bo vê jî wiha dibêje: “min rolek dida Suriyê, ez stratejîk nêz dibûm, min dixwest ez Suriyê jî bikişînim vê, lê belê Suriye nehate vê. Çiqas ew nehat min bi israr dixwest wê bikişînim. Ev îsrara min ji bo Suriyê xelet bû. Diviya bû ku min israr nekiriba, ji ber ku diyar bû ku Suriyê neyê wir.” Çima Rêbertî vê dibêje? Rêbertiyê dixwest, Kurdan, Suriyê, Îranê, Filistînê û Lubnanê hwd. hemûyan bikişîne eniyekê. Bi vê li Rojhilata Navîn guhertinekî pêşbixe, pêvajoyeke nû pêşbixe. Rêbertî dîsa dibêje: “min di vir de israr kir, lê Suriyê ne-xwest bê vê. Min dîsa israr kir û ev şaş bû. Diviya bû min ev ne-kiriba û diviya bû ez ji Suriyê derketibam.” Rêbertî derneketina xwe wiha dide diyarkirin. “Ji bo ku bi Suriyê gavan bidim avêtin min dev ji Suriyê berneda. Ji ber wê ez wiha demeke dirêj li wir mam. Divi-

yabû ez li wir demdirêj nemabam, rastiya Suriyê ne wiha bû.” Dîsa kêmasiyeke din Rêbertiyê wiha destnîşan kir: “pêwîst bû min kadroyên navendî li ber çavan re derbas bikira. Di ya heyî de min israr kir û baweriya min bi hevalan hebû. Çiqasî kêmasiyên wan û şaşitiyên wan min dîtin û min didît ku nikarin wê erkê pêkbînin jî, lê dîsa jî min israr kir ku ez bi wan re kar bikim û wiha wan pêşbixim. Min meşa bi wan re esas girt. Lê ya rastî ev şaş bû. Ji ber ku di nav de hinek hebûn ku bi salan rastiya wan derketibû ku nikarin vê erkê bikin. Pêwîst bû min di vir de israr nekira.”

Dîsa xetayekî çavkaniya xwe ji nedîtina guhertinên li cîhanê bû. Piştî ku Sovyet belav bû û Emerîkayê xwest ku her kesî bike xizmeta sîstemê, dîsa li gorî her kesî di nav sîstemê de cîh bide wan. Bi vî şêwazî serweriya xwe çêkir. Rêbertî di vê noqteyê de jî dibêje: “Ji ber ku ev li cihanê guhertinek bû, vê guhertinê bandora xwe li ser Rojhilata Navîn wê çêkiriba, li ser Suriyê, Tirkiyê, Kurdistan û PKK’ê pêwîst bû bandora ku çêbûyî min di demê de bidîta û li gorî wê jî guhertinên di nav PKK’ê de çêbibûna.” Disa: “min ew guhertina li dunyayê çêbûyî, bandora ku li ser Rojhilata Navîn, Suriyê, Tirkiyê, Kurdistanê û PKK’ê çêbûyî, min tam di demê de bi kûranî nedît. Ji bo wê jî ji bo tevdîr girtinê ez dereng mam. Ev jî kêmasiyeke mezin bû.”

Li gel vê ger di vê çaxê de destkeftiyên mezin çêbûn, ev bi têgihîştinekî, şêwazekî û zêhniyetekî çêbûn. Divê ku mirov vê jî baş fêm bike. Ji ber ku ew destkeftiyên mezin ji xwe ve çênebûn bi têgihîştinekî çêbûn. Heta vir baş e, lê yê ku ew destkeftiyên mezin derxistî holê gelo kîjan têgihîştin bû? Pêwîst e em bi kurtî li ser vê jî rawestin. Rêber APO bi Fatimê re dûr û dirêj şerek û têkoşînek meşand. Di vî şer û têkoşînê de têgihîştinên kevneşop, hem di jinê de hem jî di zilam de yê ku hene, şikand. Di vir de têgihîştineke nû pêşxist, têgihîştina ku kevneşopiyê bingeh nagire, ya ku li dijî wê disekine û ya ku di jinê de azadiyê pêşdixe esas girt. Jineke azad, tevgereke azad a jinê wê çawa pêşbikeve, da ku bikaribe kesayetiyek, civakek û jiyaneke nû li Kurdistanê pêşbixe, li ser wê xebitî. Şerê ku bi Fatima re meşandî li ser vî bingehî bû. Ew têgihîştina kevneşop lewaz kir, têgihîştineke nû pêşxist. Vê Rêbertî gihand têgihîştina jina azad û tevgera jina azad avakirinê.

Rêber APO di şerê xwe û Fatmê de xwe radestî têgihîştina kevneşop nekir, li dijî wê sekinî. Dîsa di şerê bi Fatimê de teslîmî

Kurdê xayîn û hevkar nebû. Di vî şerî de Rêber APO Kurdê hevkar û xayîn binxist, têgihîştina kevneşop binxist. Şer û nakokiyên Rêbertiyê bi Fatimê re, şer û nakokiya çî ye? Şerê di navbera têgihîştina kevneşopiyê û azadiyê de ye. Şerê navbera kesê ku Kurdê azad esas digire û ya ku hevkariya bi dijmin û Kurdê xayîn de ye. Ne şerê di navbera du mirovan de ye, yan jî jin û mêrekî de ye. Şerekî pir bingehîn e. Heke di vî şerî de Rêber APO ew şer pêşnexista, rast û di demê de pêşnexistiba, ti car rêbertiya ku çêbûye, rêxistina ku çêbûye, milîtaniya ku çêbûye, wiha çênedibû û pêşnediket.

Rêber APO bi Fatimê re deh salan ew şer meşand. Sebir kir, me kesî nedikarî wiha rojekê jî xwe lê ragirin. Mînak min sebir nedikir. Hinek hevalên din jî sebir nedikirin. Lê belê Rêber APO tam deh salan ew tehemûl kir. Israr kir ku Fatimê bikişîne xeta xwe. Fatimê jî israr kir ku Rêbertiyê bikişîne xeta xwe. Xeta Fatimê têgihîştinên kevneşop bû, xeta hevkar û xayînê Kurd bû. Heke Rêbertî di vî şerî de biserneketa, wê Fatimê biserketa. Wê Rêbertî û PKK di wê demê de xelas bibûna. Lewma ew şer ewqasî girîng e.

Di vî şerî de Rêbertî ji bo ku PKK teslîmî têgihîştinên paşverû, hevkar û îxanetê nebe, jiya. Bi PKK'ê jî ev da jiyîn. Ger di nav PKK'ê de têgihîştineke kevneşop, hevkar û îxanetkar tineye, sedem ew e. Ger di PKK'ê de her dem li dijî têgihîştina kevneşop, hevkar û xayîn tê sekinîn, dîsa ji ber wê ye.

## Şerê Rêbertiyê Ne Li Hemberî Kesan e, Li Hemberî Sîstema Desthilatiyê Ye

Li vir qasî girîngiya şerê Rêbertî û Fatimê, girîngiya şerê Rêbertî û Pîlot (Necatî Kaya) jî heye. Pîlot di vî şerî de dewletê temsîl dike, Rêber APO jî Kurdan temsîl dike. Pîlot dixwest ku Rêbertiyê têke bin kontrola xwe û bike xizmeta dewletê. Jixwe erka wî ev bû, zilamê dewletê bû. Destpêkê me ev tespît nekiribû, Rêbertiyê ew tespît kiribû. Paşê Rêbertiyê ji me re nêrîna xwe got. Di serî de çima ji me re negot, ji ber ku heke ji me re gotiba, me yê jî ji hevalên din re bigotiba, wê her kes pêhesiyaba û Pîlot jî wê pêhesiyaba. Me yê nekarîba kontrol li ser wî çêkiriba. Ji ber wê Rêbertî tam bawer bû û tevdîr girtin û pişt re jî ji me re diyar kir. Wê demê Pîlot nedikarî xeteriyê çêbike. Dewletê Pîlot şandibû nav me, erka wî ew bû ku li ser Rêbertiyê û tevgerê kontrolê çêke. Pîlot wê tevger têxista nav şer û di nav şer de tine bikira. Weke çawa anîne serê tevgerê din,

wê eynî tişt bianîna serê tevgera me jî. Yan jî wê parçe-parçe bikirana û wisa tine bikirana. Heke firsend hebûya jî wê Rêbertî dîl bigirtana, da ku tevgerê bikin bin kontrola xwe.

Rêber APO di şer û têkoşîna xwe bi Pîlot re, wê çawa nekeve bin kontrola Pîlot, ev ji xwe re esas girt. Ango nekeve bin kontrol û xizmeta dewletê. Wê çawa bike ku xwe û tevgerê biparêze, kerameta xwe biparêze û xwe nefiroşe. Ji ber ku Pîlot pere jî bikardianî. Wê demê tevger di aliyê aborî de hewcedar bû. Dewletê jî ew tespît kiribû. Di aliyê aborî de, pêwîstiya me bi peran hebû. Wê demê Pîlot pere pir xerc dikir. Dixwest ku wiha tevgerê û kadro bike bin kontrola xwe. Wê demê her kesî ji me re digot, "ev birçî ne, pêxwas in, yanî tiştekî xwe nînin." Digotin "ji birçîna bêhn ji nefesê wan tê." Ji me re her kesî wiha digot. Rast bû, em rojekê têr bûn, du rojan jî birçî bûn. Ji ber ku kadroyên tevgerê ji gel tevlî bibûn ango feqîr bûn. Kadroyên destpêkê hemû xwendevanên zaningehê bûn, û milê aborî de feqîr bûn. Derfet jî zêde nebûn. Komek wiha bû. Ji bo ku em bixwînin û debara xwe bikin, me hemaltî dikir. Her kes vê dizane. Lê rojekê jî kesî negot em ê bi vê rewşê çawa bibin şoreşger! Kes ji vê rewşê aciz nebû. Wê demê ew jiyan qebûl kiribûn. Tevger wiha qebûl kiribûn. Dijmin jî ev tişt dizanî.

Ji bo vê yekê dijmin bawer dikir ku wê bikaribe bi pere dîsa mirovê Kurd bikire. Bi vî rengî Kurd nas kiribûn. Rehet dikare bi mirovên Kurd bileyîze û henekê xwe lê bike û bixapîne. Ev rast bû, Kurdê dijmin çêkiribû wiha bû. Lê Kurdê ku Rêber APO çêkiribû ne wiha bû. Yanî ji bo peran tenazul nedikir. Kerameta xwe bi peran nedifirot, birçîbûn qebûl dikir, lê qet wisa xwe bi peran firoştin qebûl nedikir. Dewletê ev nedizanî, digot ev Kurd in mirov dikare rehet van bi peran bikire û bixapîne. Lewra pere didan Pîlot û Pîlot jî dida me. Hinek pêdiviyên me pêkdianî, xwarin û cil û berg digirt. Bi vî rengî dixwest kontrolê li ser me çêbike. Berê wiha bû, te xwarinek bida mirovekî Kurd, te dikarî wî bikî xizmeta xwe. Lewma dijmin wiha dikir.

Ji aliyekî din ve Pîlot berê me dida şêlandina saziyên dewletê. Li gorî Pîlot pereyekî pir zêde û bi rengekî rehet me dikarîbû bidestxista. Me jî digot pêdiviyên me hene û ji bo ewqas pere em hazir in şehîdan jî bidin. Me digot em ê bi vî şêwazî di aliyê aborî de tevgera xwe rizgar bikin. Ji ber ku wê demê me hemaltî dikir. Me ev mesele ji Rêbertiyê re got. Lê Rêbertiyê qebûl nekir. Em şaşwaz bûn ka

çima Rêbertiyê qebûl nekir. Wê demê Rêbertî di derbarê Pîlot de ketibû gumanê. Çawa ketibû gumanê, didît ku Pîlot zêde peran xerc dike. Jixwe ew li 'Türk Kuşu' (navenda perwerdekirina pîlotan)'yê kar dike, gotiye mûçeya min evqas e, lê perên xerc dike ji wê zêdetir e. Ev bala Rêbertiyê dikişîne. Ya din jî dibîne ku madîyatê bikar tîne. Ev jî bala Rêbertiyê dikişîne. Ji ber ku di vê tevgerê de kes madiyatê bi kar nayîne da ku însanan bandor bike. Pêdivî û pêwîstiyên xwe me wê demê bi hev re pêktanî. Ger hebûya me bi hev re pêktanî, lê ger tiştek nebûya jixwe tinebû. Lê Pîlot dixwest pêdîviyên kesan pêkbîne. Di vir de Rêbertî ketibû gumanê. Lê Rêbertiyê wê demê ji me re nedigot da ku em belav nekin û tam bawer be, wê wextê wê bêje me. Ya din jî da ku karibe kontrolê çêbike.

Lê hesabê Pîlot çi bû? Me bike nav wê çalakiyê de, di wê çalakiyê de me bide girtin û kuştin. Bi vî şêwazî tevgerê tesfiye bike. Heman weke 'Yüzbaş İlyas' çawa bi THKPê kir. Paşê eşkere bû ku bînbaşî bûye.

Lewra xwe neradestkirina peran, neradestbûna dewletê û neketina xizmeta peran û dewletê ji bo me girîng bû. Rêbertî di şerê li hemberî Pîlot de bi vî rengî serket, tevger jî wiha biserxist. Ji bo wê jî ti kes zû zû nikare bi peran li ser vê tevgerê kontrolê çêbike. Vê tevgerê qet xwe neçarî kesan nekiriye. Birçî jî bimîne, dîsa xwe neçarî kesan nake. Tevger dizane dema xwe neçarî kesan bike, wê azadiya xwe wenda bike.

Dema em li Qamişlo bûn, me heval ji Filistînê dişandin welêt. Ev kara min organîze dikir, min heval dişandin. Pere nebû ku em pêwîstiyên xwe li Qamişlo pêkbînin; dema ku qûryeyan heval derbasî Nisêbînê dikirin, ji Nisêbîn ji me re xwarin dianîn û me li Qamişlo dixwar. Ev rastî ye ne çîrok e. Me ev tecrûbe ji pratîka xwe ya berê derxistibû zanebûnê, ji mesela Pîlot me derxistibû zanebûnê. Em birçiya bimirana jî ti carî me xwe muhtacî kesan nedikir. Da ku azadiya me ji dest neçe. Ruxmê ku Qamişlo bajarekî Kurd bû, me ji kê alîkarî bixwesta wê ji bo xatirê Kurdewatiyê be jî bidana me. Hûn dizanin, însanên me tên nasîn yek tiştekî bixwaze nabêje na, dide. Lê me ev layîqî xwe nedît. Têgihîştina ku me di kesayeta xwe de pêkanîbû, rê nedida vê. Çima ez van dibêjim? Niha gelek kadroyê me hene dema yek cilekî jê re bikire û xwarinekê bidiyê temam dibîne, bi xwe jî dikeve xizmeta wan û partiyê jî dike xizmeta wan. Xwe û tevgerê dike xizmeta kesan. Heke sîxûrekî dewle-

tê wiha di nav me de kar bike, dikare rehet kar bike. Dikare her tiştê bike xizmeta dewletê. Di şexsê wan kesayetên lewaz de tevgerê jî bike xizmeta dewletê. Ji ber vê şerê Pîlot û Rêbertiyê pir girîng e. Encamê ku ji vî şerî derketî pir girîng in. Ger Rêbertiyê ev şer li wir nemeşanda, Pîlot rehet dikarî rêxistinê û kadro bi peran bikiriya û bixista bin xizmeta dewletê.

Rêzdayîna Rêbertiyê Ji Dostaniyê Re

Rêbertî bi salan li Filistîn û Suriyê ma. Li wir dostanî pêşxist, bi Filistîniyan, Lubnaniyan û Suriyê re di rêka van têkiliyan re rêza dostaniyê girt, qîmet da dostaniyê. Lê her dem azadiya xwe û ya tevgerê bingehîn girt. Yanî nehişt ne Filistînî, ne Lubnanî û Suriyê kontrola xwe li ser tevgerê çêke. Nehişt tevger bikeve bin bandora wan û xizmeta wan. Rêbertî bi şiyariyekî mezin tevgeriya. Di herêmeke weke ya Rojhilata Navîn de siyaset kirin ne rehet e. Azadiya xwe, serbixwebûna xwe parastin, pir zehmet e. Hela di qada Suriyê de xwe parastin hîna zehmetir e. Ji ber ku Suriye hemû tevgeran ji holê radike û ji bo xizmeta xwe bikartîne. Eger nikaribe bi tevahî têke xizmeta xwe, parçe dike, lewaz dixe, bêbandor dike. Bi vî şêwazî dike bin xizmeta xwe. Pêwîst e hem mirov li wê qadê bijî, hem jî ji bo tevgerê û gel derfetan biafirîne. Divê ku mirov xwe biparêze ku azadiya xwe wenda neke, rêxistinê wenda neke, xetê wenda neke.

Rêber APO di wê qadê de hem dostanî pêşxist, bi wê dostaniyê re derfet çêkir, tevger bi wan derfetan xwedî kir, mezin kir. Ji bo tevgerê û gel cîhê têkoşînê çêkir. Di şertê zor û zehmet de ew çêkir û erka herî mezin û xeternak da ser milê xwe. Di vir de jî encam girt. Ji ber wê xebata Rêbertiyê li wir kirî, xebateke destanwarî bû. Encamê wê jî li ber çavan e. Heke ku Suriyê ewqas sal çavê xwe ji Rêbertiyê re girt, rêz da Rêbertiyê; ew girêdayî vê rastiya Rêbertiyê bû. Birayê Hafiz Esed xeletiyek kir Hafiz Esed ew efû nekir, ew qewitand. Hîna jî Refed Esed nikare bikeve Suriyê. Refed Esed bi salan xizmeta Hafiz Esed kir, ji bo desthilatiya wî her tişt kir, lê xetayek kir Hafiz Esed ew efû nekir û ji Suriyê derxist û niha jî nikare bikeve Sûriyê.

Heke Hafiz Esed ewqas sal Rêbertî li wir mêvan kir, çavên xwe jê re girt, dît ku ev Rêbertî û tevger ne tevgereke besît e. Rêber APO ne weke serokên din e, tevgera PKK'ê ne weke tevgerên din e.

Suriyê dît ku ev Rêbertî wiha li pey jiyaneke ferdî, berjewendiyên şexsî, malbatê û eşîrê nagere. Bi temamî jiyana xwe li ser azadiyê birêxistin kiriye. Şev û roj ji bo hevalên xwe kar dike. Ji bo xwe jiyaneke şexsî çênake. Dîtin ku nirx dide dostaniyê. Ji bo xwe û gelê xwe karekî bêhempa dike. Dîtin ku sûda wan jî ji vê xebatê dibe, feyda tevgerê jî dibe, ji bo wê çavên xwe girtin. Rêbertiyê bi baldarî tevgeriya û xeletî nekir. Ziyan neda dostaniyê. Lewra di kesayeta Rêbertiyê de dostanî pir girîng e, pir jî nirx didiyê. Ji bo ku ziyanê nede dostaniyê, pir hesas nêzîk dibû. Wiha sûîstîmal nake. Ji ber ku Hafiz Esed ev dît, ji lewra çavê xwe ji Rêbertiyê re girt û hîşt li wir bimîne û kar bike.

Suriyê tiştek neda Rêbertiyê, nasnameyek jî neda Rêbertiyê. Karê Rêbertiyê li wir kirî hemû bi keda xwe kir, hemû bi zanebûna xwe kir. Ziyan neda dostaniyê, ji bo wê jî kar kir û encam girt. Gelekan wiha fêm kir ku Rêbertî li wir bi alîkariya Suriyê dimîne û kar dike; dizanîn ku Suriye gelek derfetan dide, peran dide sîlah dide... Tiştek wiha nîn bû. Berde sîlah dayînê, nasnameyek nedan Rêbertiyê! Tiştek tenê kirin, ew jî çavên xwe ji Rêbertiyê re girtin ku li wir bimîne. Ew jî ji bo Rêbertiyê pir girîng bû. Ev ji bo Rêbertiyê derfetek mezin bû. Derfetê Rêbertiyê dîtî bi qasî serê derziyê bû, ew derfet ji bo xwe mezin dît, wê çawa mezintir bike, bi çi awayî bikarbîne, ev şêwaz û nêzîkbûna Rêbertiyê ji derfetan re ye. Bi wî şêwazê xwe encam girt. Ne ku Sûriye bi tevgerê re alîkar bû. Heta carna Suriyê gef li Rêbertiyê xwarin. Ji Rêbertiyê re digotin “tu dînamîtê dixî bin me.” Gelo çima wiha ji Rêbertiyê re digotin? Ji ber ku Rêbertiyê şiyariyeke mezin û hilhatinek di nav Kurdan de çêdikir û bi hezaran însan tevlî tevgerê dikir. Mirovên berê ketibûn bin xizmeta sîstemê. Rêbertiyê her tişt kir bin xizmeta tevgerê. Karê me hemû bi wan însanan dihate meşandin. Lewma Sûriyê digot “tu dînamîtê dikî bin me, wê li me neke.”

### Şêwazê Rêbertiyê Li Ser Hêza Xwe Ya Şexsî Rabûn e

Di Rêbertiyê de li ser hêza xwe rabûn, her dem bi xwe bawer kirin, guh dayîna xwe, azadiya xwe esas girtin, çareserî di xwe de dîtin, hemû pêdiviyên xwe bi xwe peyda kirin; têkoşîn li ser wî bingehî pêşxistin tarzê Rêbertiyê ya bingehîn e. Ya ku Rêbertiyê û tevger li ser piyan girtî ev e. Vê nehişt ku tevger û Rêbertî bikeve xizmeta ti kesî. Heke her dem li ser hêza xwe rabûn esas negirtiba,

bi xwe bawer nebûya, derfetên xwe bi xwe çênekiriba, di xwe de li çareseriyê negeriyaba û pêşnexistiba, hemû pêdiviyên xwe bi xwe peyda nekiriba, di azadiyê de xwe kilît nekiriba, wê niha ev tevger ji tevgerên din xirabtir bibûya. Her kesî wê dest biavêta û encam jê bigirta. Dema em vê dibêjin ne ku kesekî dest neavêtê, her kesî dest avêtê, lê encam negirtin. Nikarîn encamê bigirin. Ji ber ku şerê vê tevgerê dikir, şerê kerametê bû, yê şerefê bû, yê vînê bû. Ji ber ku vîn, nasnamey û keramet ketibû bin lingan. Ger tu dixwazî van ji bin lingan derbixî, tê li ser hêza xwe ya şexsî tevbigerî. Tê bi xwe bawer bî. Tê xwe biêşînî, weke din ne gengaz e tu karibî van ji bin lingan derbixî û karibî xwe biparêzî. Heke ev tevger neket, tine nebû, nekete xizmeta vî-wî, nebû dûvikê vî-wî, ev girêdayî vê rastiyê ye. Bingehê xwe ji îdeolojî, felsefe, siyaset û rêxistinê girt. Rastiya Rêbertiyê ev e, rastiya PKK'ê ev e. Her kadro yên vê tevgerê wê vê rastiyê ji bo xwe esas bigre.

Kadro wê li ser derfetên hazir şoreşgeriyê neke. Di vir de rizîn çêdibe. Niha di kadroyê me de ne ku li ser hêza xwe rabe, bi xwe bawer bike, bi rêxistin û gelê xwe bawer bike, hêza îdeolojî ya rêxistinê bikarbîne, dixwaze her tiştek hazir be, û li ser wan kar bike. Li ser hêza xwe ya ferdî xebat kirinê ji xwe re esas nagire. Bi temamî dixwaze li ser tiştê hazir rabe. Divê tu jê re gel hazir bikî, rêxistinê hazir bikî, hem jî weke ew dixwaze bidî, da ku şoreşgeriyê bike û kar bike. Yên ku wiha dikin dikevin çi rewşê li ber çav e. Lê ev Rêbertî û tevger ne tevgerek û rêbertiyeke wiha ye. Divê kadroyên tevgerê vê baş bizanin û fêm bikin! Ger tiştan dixwaze wê, ger nîne wê biafirîne. Ger derfet hebin jî wê bi yê heyî kar bike. Wê derfetên heyî mezin bike. Wê ji xwe re vê esas bigire, ka çawa wê wan derfetan mezin bike. Di serî de wê xwe bike hêza çareseriyê. Tim û tim wê di xwe de li çareseriyê bigere. Wê li ciheke din li çareseriyê negere. Derfetên rêxistinê ew in, tê wan derfetan mezin bikî. Kes derfetan nade mirov, ger kesan derfet dane mirovan, wê demê bizane ku ew mirov dixwazin te têkin xizmeta xwe. Ji bo mirov bikin xizmetkarê xwe, derfetan didin. Weke din kes jixwe ve li vê cîhanê derfetan nade mirov. Divê ku kadroyên vê tevgerê van rastiyan baş fêm bikin. Ger fêm kir, dibe kadroyê vê tevgerê. Lewra wiha erzan kadrotî di nav vê tevgerê de nîne û nabe.

Tê xwe neêşînî, her tiştî hazir bixwazî, û wexta her tişt bi dilê te bû, tê şoreşgeriyê bikî, ger her tişt ne hazir be tê bêjî nabe... ev ne

milîtantiya vê tevgerê ye. Di nav vê tevgerê de milîtantiya bi vî rengî nabe, kadrotiya di nav PKK'ê de wiha nabe.

Bi temamî milîtan wê xwe li ser hêza rêxistinê û ya gelê xwe, kesayeta xwe çêbike. Wê bi gelê xwe û tevgerê bawer be. Wê çareseriyê di xwe de, di rêxistin û gelê xwe de bibîne. Çi pêdiviya xwe heye wê bi derfetê xwe yên tevgerê û gel çêbike. Wê di vê xalê de israr bike. Wê derfetên heyî baş bikarbîne û wan derfetan mezin bike. Da ku bikaribe pêdiviyên xwe pêkbîne. Wê têkoşînê bi temamî li ser vî bingehî pêşbixe. Ger wiha pêşxist, dibe hevalê Rêber APO yê rast. Weke din hevaltî dibe hevaltiya sexte. Hevaltiya sexte jî mirinê û wenda kirinê pêktîne. Ev hatiye fêmkirin û jiyankirin. Ger çi hatiye serê vê tevgerê, ji hevaltiya kêm hatiye serê wê. Di şoreşgertiya kêm de lingek di nava rêxistinê de ye, lingek jî nav sîstemê de ye. Hemû bela wiha hatine serê vê tevgerê.

Komploya navnetewî jî, tesfiyegerî jî hemû li ser wê şoreşgeriya kêm pêşketine. Ji ber wê ew şoreşgerî nabe şoreşgeriya vê tevgerê û milîtaniya wê. Ew nabe hevaltiya bi Rêber APO re. Divê ku ev rastî baş bê fêmkirin. Pêwîst e kadro di vir de lêpirsînê ji xwe bike. Bi rastî çiqasî li ser hêza xwe radibe, li ser hêza gelê xwe û rêxistinê radibe û wê ji xwe re bingeh digire? Çiqasî baweriya bi xwe û rêxistinê heye. Yan jî bi derveyî rêxistinê heye? Hêviya wî di wî de ye, yan di hêzên din de ye? Çareseriyê di têkoşîna xwe de dibîne, yan di Ewrûpa, Emerîka, PDK-YNK'ê de, yan jî di AKP'ê de dibîne? Li Stenbolê ye, kadroyê vê tevgerê ye, lê çareseriyê di AKP'ê de, di YE'ê de dibîne. Gelo ma wê ew hêzên derve pirsgirêka Kurdan çareser bikin? Wê demê mirov vê dipirse, tu çima tevlî rêxistinê bûyî? Tu çima têkoşînê dikî, çima tu şehîdan didî, te çima ewqas şehîd dan? Çima ewqas gundên însanên me wêran bûn? Di îşkence û kiryarên kujerên xwe nediyar pêkhatin? Divê bê zanîn ku ev hemû ji bo ku em pirsgirêkên xwe bikaribin çareser bikin hatin kirin.

Heke Kurdan nexwestiba pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bikin, wê yek ji van jî nebûya. Kadroyê vê tevgerê nabe ku berovajiyê vê bihizire. Kadro ger bi van pirsgirêkan re mijûl nebû, ew kadro ne yê vê tevgerê ye, êdî yê AKP'ê ye, yê Ewrûpayê ye. Kadro çareseriyê di kê de bibîne yê wir e, kadroyê wî ye. Ne kadroyê vê tevgerê ye. Kadroyê vê tevgerê ti demê hêviya xwe ji derveyî vê tevgerê di cihekî din de nabîne. Kadroyê vê tevgerê ti car çareseriyê di kesên din de nabîne. Ger hêza çareseriyê di derve de dît, kadrotiya wî xelas dibe.

Heke bi van fikrên xwe di nav vê tevgerê de dimîne, wê demê ew sîxûr e, sîxûrê wê hêzê ye ku çareseriya xwe tê de dibîne. Di nav tevgerê de ji wan re sîxûriyê dike. Ger ne wiha be, çima li vir dimîne? Heke tu çareseriyê di APK'ê de dibînî çima tu di nav PKK'ê de dimînî? Wê demê tu sîxûriya AKP'ê dixwazî bikî, ji bo wê tu dimînî. Tu dixwazî PKK'ê bikî xizmeta AKP'ê, ji bo wê tu dimînî. Weke din mirov nikare wateyekî bidiyê û wateyeke wê nîne. Mirov dibîne ku rewşên wiha tên jiyîn, lê yek jî nabêje ev çi ye. Ev kesayet çawa dibe kadroyê vê tevgerê. Bi vî rengî û van fikaran kes nabe kadro û pêş nakeve, tevlî rêxistinê jî nabe.

## DI ÇÊBÛN Û ROJBÛNA RÊBERTİYÊ DE QONAXA SÊYEMÎN

Ev qonax ji komploya navnetewî dest pê dike, heta vê pêvajoya ku em tê de dijîn berdewam dike. Ev dem, ji bo pirsgirêkên mirovahiyê dema çareserî peyda kirinê ye. Lewra ev çêbûn ji bo însaniyetê ye, çêbûna sêyemîn vê îfade dike. Ev çêbûn li ser bingehê çêbûna yekê û diduyan pêşketiye. Di çêbûna yekê û diduyan de aliyên ku paş de mane, di vê demê de tê derbaskirin. Tiştên kêm mane, kevin bûne, yan jî di nav xwe de şaşitiyan dihewîne, di xwe de paqiş kirin û li ser hîmê çêbûna yekê û diduyan xwe nû kirin di vê demê de esas e. Li ser wî esasî xwe kûr kirin esas e. Çêbûna sêyemîn bi temamî li ser vî esasî pêşdikeve.

Hîmê çêbûna sêyemîn bi komplo re dest pê nake. Di destpêka vê tevgerê de ev heye. Dema ku Rêber APO ev tevger pêşxist, li ser wî hîmî pêşxist. Lê belê ji bo ku bandora sosyalîzma pêkhatî hebû, têgihîştina wê ya netew û çareserkinê hebû; vê nehişt Rêber APO wê rêbertiya ku dixwaze pêşbixe. Herwiha nehişt ku Rêbertî rêxistin û şoreşa ku dixwaze pêşbixe. Şoreş û rêxistin bi vî rengî li gorî hedef û armancên Rêber APO pêşneket. Jixwe her dem li gorî hedef û armancên Rêbertiyê û rewşa di nav de, ji bo Rêbertiyê bû nakokî. Tim di nav lêgerînê de bû ka çawa vê nakokiyê çareser bike. Di hedef û xwestekê Rêbertiyê de avakirina kesayetek, civakek û jiyaneke bi temamî li ser bingehê azadiyê hebû. Lê belê sosyalîzma pêkhatî û têgihîştina wê, paradîgmaya ku li ser dewletê ava bûye, nedihişt ev hedef weke ku tê xwestin pêk bê.

Rêber APO di gava xwe ya yekem de dixwest civakek, kesayetek û jiyaneke azad pêşbixe. Ji bo vê gav avêt û kar kir. Her ku gav avêt, dît ku hinek tiştên ne rast hene. Li gorî karê dike nikare encamê bigire. Heta derveyî têgihîştinên Rêber APO pratîk derdiketin holê. Ev ji bo Rêber APO bû nakokîke girîng. Tim û tim di nav lêgerîn û lêkolînkirina çareserkirina vê nakokiyê de bû, ka wê çawa vê pirsgirêkê çareser bike.

Heke di serî de hîmê çêbûna sêyemîn nebûna, wiha ew çêbûna sêyemîn çênedibû. Berê jî min gotibû, destpêka vê tevgerê dumahiya vê tevgerê diyar dike. Heke di destpêka vê tevgerê de di hîmê wê de hedef û armancê ku Rêber APO bi çêbûna sêyemîn re daye pêşberî xwe nebûna, ne gengaz bû ew çêbûn pêkbihata. Heke

komploya navnetewî çêbûneke nû ji ya yekê û diduyan deh qat bihêztir çêkir, girêdana wê bi destpêkê re heye. Di hîmê vê tevgerê de, di hedefê wê de ew heye, lewra ew çêbû. Dema ku mirov çêbûna sêyemîn bi pêvajoya komplo re bide destpêkirin û wisa fêm bike, ev ê şaş be.

Tiştê ku çêbûna sêyemîn çêkirî çî ye? Bi awayekî wêrektir, bi pêngavên destpêkê re têkildar, bi biryareke xurt, ew hedefên ku destpêkê Rêbertiyê danîne pêşberî xwe pêkanîn e. Di bingeh de ya ku Rêbertiyê kirî ev e. Di destpêka avakirina rêxistinê de Rêbertî bi tevdîr nêzîkî sosyalîzma pêkhatî dibû. Rast e sosyalîzma heyî esas girtibû, paradîgma sosyalîzmê ya heyî ji bo xwe esas girtibû, lê belê Rêbertiyê di wê de hinek kêmanî û şaşitî didîtin. Jixwe ji ber wê bi tevdîr nêzîk dibû. Her çiqasî bi tevdîr nêzîk dibû jî, lê belê bandora wê jî hebû. Bi wêrekî û biryar nekarî bi temamî xwe ji bin bandora wê derbixe. Lewra li Îmralî hîna zêdetir bi wêrekî û biryar ew gav avêt. Tişta ku Rêbertiyê kirî ew bû. Sedem hene da ku vê gavê bavêje. Sedem çi ne? Dema ku sosyalîzma pêkhatî tesfiye bû, li wir hîna zêdetir cesaret girt û di têgihîştina xwe de hîna bi cesaret û bi biryar gav avêt. Ev gav li Îmraliyê avêt? Beriya wê jî Rêbertiyê ew gav avêtibû. Lê li Îmralî ew temam kir. Ya ku Rêbertiyê kirî ev bû.

Rêber APO bi vê çêbûnê re çi kir? Di rastiya PKK'ê de tiştê ku PKK'ê lewaz dike, tiştê ku nahêle PKK biserkeve, di PKK'ê de avêt û rastiya PKK'ê xurtir kir. Di serî de ew hedefê ku dayî pêşiya xwe û rêxistina ku dixwest pêşbixe çêkir. Di çêbûna yekê û diduyan de jî xwest ku weke daxwazên xwe rêxistinekî û milîtaniyekî pêşbixe, lê belê têgihîştina sosyalîzma pêkhatî nehişt ku ew tam pêk bê. Lewra dema bi temamî xwe ji têgihîştina sosyalîzma pêkhatî xelas kir, wê demê rêxistin û sosyalîzma ku destpêkê dixwest pêkbîne, gav avêt. Bi wêrekî ev gav avêt, ew hedef û armancên xwe pêkanî.

Di çêbûna sêyemin de tiştê pêkhatî çî ye? PKK gihîşte rastiya xwe. Rastiya PKK'ê ew bû. Tişta ku pêwîst e mirov fêm bike ev e. Lewra Rêbertiyê got: "di min de guhertin çênebû, lê kûrbûn çêbû. Di fikrên xwe de xwe pak kir." Ji çi pak kir, ji paradîgma sosyalîzma pêkhatî pak kir. Rêbertiyê got: "Rastiya PKK'ê ew bû, min di serî de jî rêxistineke wiha û têgihîştineke wiha dixwest ez pêşbixim. Niha min ew çêkir." Ji bo wê di çêbûna sêyemîn de PKK gihîşte rastiya xwe. Çima gihîşte rastiya xwe? Ji ber ku lewazî û kêmasiyên di nav xwe pak kir. Ji ber wê gihîşte hedefên xwe yên destpêkê.

Rêber APO bi kîjan têgihîştinê û felsefê ev pêşxist? Rêbertiyê got: "divê ku mirov xwe nas bike. Tiştê ku min nakuje, min xurttir dike." Dîsa Rêbertiyê çi got: "jiyana şaş hatiye hûnandin, rast nayê jiyîn." Bi vê felsefê di fikrê xwe de zelalî çêkir. Tiştê ku di fikrê Rêber APO de û wî lewaz dike çi hebe, bi vê felsefê û têgihîştinê hate avêtin. Zelalî bi xwe re çêkir. Ji bo wê PKK gihîşte rastî û heqîqeta xwe. Heqîqeta PKK'ê ew bû. Her çiqasî hîmê destpêka PKK'ê di sala 1973'an de li Çubuxê hate avêtin, PKK di sala 1978'an de bû rêxistin jî, dîsa her çiqas kongre çêbûn, berxwedan pêşket jî, bi çêbûna sêyemîn re PKK ancax bi awayekî bingehîn bû rêxistin. Gihîşt rastî û nasnama xwe.

Ji bo ku PKK bigihîje nasnameya xwe di kongreya sêyemîn de Rêber APO pêngavek pêşxist, ew pir girîng bû. Lê belê têgihîştina sosyalîzma pêkhatî nehişt ku PKK tam bigihîje rastî û nasnameya xwe. Dema ku paradîgma sosyalîzma pêkhatî di xwe de pak kir, di wê demê de gihîşte nasname, rastî û heqîqeta xwe.

Di sala 1998'an di 9'ê Cotmehê de dema ku komploya navnetewî destpêkir, Rêbertiyê berê xwe da Ewrûpayê. Sedema vê çi bû? Îflaskirina wê paradîgma modern ya kapîtalîzmê bû. İîflasa têgihiştina wê ya çep bû, yanî îflaskirina paradîgma sosyalîzma pêkhatî bû. Sosyalîzma pêkhatî beşek ji sîstema kapîtalîzmê bû. Aliyê wê yê çep bû, vê îflas kir. Îflaskirina wê jî çawa diyar bû, dema ku Rêber APO berê xwe da Ewrûpayê, wê paradîgmê îflas kir. Dema vê îflas kir, Rêber APO di lêgerîna xwe de -ku berê jî ew hebû- deh qat bi wêrekî gav avêt. Da ku paradîgmayake nû pêşbixe. Li gorî ku wê bi temamî îflas kiriye, divê ku mirov li ser wê israr neke. Divê ku mirov wê terk bike. Mesele ne ku tenê îflas kiriye tu terk dikî, alternatîfa wê çî ye, divê ku tu wê pêşbixî. Ji ber ku di destpêka de jî ji bo Rêber APO çi esas e, dema ku tiştekî qebûl nake ne tenê qebûl nake, alternatîfa wê jî pêşdixe. Di kesayeta Rêber APO de tim ev bingehîn e.

Lê li gel hevalên me çawa ye, gelek tiştan qebûl nakin û rexne dikin, lê tenê rexne dikin û hew. Tiştên qebûl nakin rexne dikin, şaşitiyan rexne dikin, lê li vir rastî çi ye? Wê dernaxînin pêş û pêşnaxin. Têkoşîna wê nakin. Tenê rexne dikin. Lê di rastiya Rêbertiyê de weke tu rexne dikî, divê tu rexnedayînê jî pêşbixî. Ango tiştê tu dibêjî şaş e û tu rexne dikî, tê alternatîfa wê jî pêşbixî û rexnedayînê jî bidî, ya rast ew e. Rexne, tiştên şaş, kirêtî qebûlnekirin e, lê rexne-

dan çi ye? Kirêtî û şaşitî rakirin e. Di şêwaz û kesayeta Rêbertiyê de ev esas e. Milîtanê vê tevgerê jî wê vê ji bo xwe esas bigirin. Wiha tenê bêje ev şaş e, ev kêm e, kirêt e, lê alternatîfa wê pêşnexe û têkoşîna wê neke, wê demê nabe milîtanê vê rêxistinê. Wê demê dibe mirovekî derveyî tevgerê. Çawa dibe mirovekî derveyî tevgerê? Yanî ne milîtan e, peywirekî wî li hemberî rêxistinê nîne, tenê ji ber ku ji rêxistinê hez dike û dilê xwe pê re ye. Dema dixwaze dijmintiyê bike çi dike? Dibêje, di PKK'ê de ev kêmanî heye, ev şaşitî heye, ev xirabî heye, PKK xirab e, yan çima PKK van tiştan ranake... Mirovekî derveyî PKK'ê wiha nêz şaşitî û kemasiyên PKK'ê dibe.

Milîtanekî PKK'ê nikare wiha weke ku dervayî rêxistinê ye nêzî PKK'ê bibe. Dema wiha nêzîk bibe nabe milîtan, dibe însanekî di nav civakê de. Niha gelek heval di vê rewşê de ne. Di be ku fîzîkî di nav rêxistinê de bin, lê şeklî ne. Di esas de derveyî tevgerê ne. Lingekî wan di nav tevgerê de ye, yek jî derveyî tevgerê ye. Em ji wan re çi dibêjin, xeta navîn. Ev kesayetên vê xetê de ti car nabin milîtanên PKK'ê. Bi vê xetê rêxistin çênabe. Rêxistin pêşnakeve û bi ser nakeve. Di vê xetê de her dem sîstem û tesfiyegerî pêşdikeve.

Di sala 1999'an di 15'ê Şibatê de, weke ku jiyan cemidî. Ji bo Rêbertiyê ew dem demek wiha ye. Ji bo tevgerê û gel jî wiha ye. Ji ber ku şoqek çêbû. Weke çawa jiyan di wê demê de hate cemidandin. Sîstema cîhanê, yanî ya kapîtalîzmê destê xwe avêtêbû qirika Rêbertiyê. Dixwest ku canê Rêbertiyê bistîne û wî bixeniqîne. Ew roj rojek bi vî rengî bû. Xeniqandina Rêber APO û PKK'ê, ya Kurdê azad, civaka azad bû. Ev roj ji bo rêxistin û gelê me rojeke weke kabûsê bû. Rojeke tarî bû, ji bo wê rêxistinê wiha da diyarkirin û got, 'roja 15'ê Şibatê di dîroka me de rojeke reş e.' Ji ber çi rêxistinê wiha diyarkir? Ji ber ku dema ku ew komploya bi dîlgirtina Rêbertiyê pêkhat, jiyan cemidî û şoq çêbû. Ji bo gel û tevgerê wê çi bibûya, ne diyar bû.

Komplogeran planek mezin dimeşandin û di planên xwe de gavên yekemîn avêtibûn, di gava yekemîn de encam girtibûn. Rêbertî dîl girtibûn. Li ser wê gavê dixwestin gaveke din biavêjin. Wê gava xwe çawa biavêtana ne diyar bû. Li ser esasê wê gavê dihatin ser tevgerê de. Destwerdan li ser destwerdanê dikirin. Peyam di pey hev de dişandin. Da tevgerê bitirsînin û wê dîl bigirin. Da ku tevgerê bi temamî bi girseya xwe bikişînin bin xizmeta sîstemê, karekî wiha dimeşandin. Vê dudilî bi tevgerê û gel re jî çêdikir. Ev fikar pêş-

diketin, gelo, wê rewşa tevgerê çawa bibe, wê li ser piyan bimîne yan nemîne? Bimîne wê çawa bimîne? Dudiliyên wiha çêdikirin. Bi hinek kesayetan re ji dudiliyê wêdatir encam derdixistin. Dihate gotin "heta vir û her tişt xelas bû." Di nav tevgerê de jî hinekan wiha digotin. Di nav gel de jî nav dostan de jî wiha digotin. Komplogeran ji xwe propogandeyekî mezin pêşdixisitn û digotin "xelas heta şeş mehan em ê wan temam bikin." Lewra tevgerê ew roj roja reş îlan kir, sedem ew bû.

Dema komploya 9'ê Cotmehê destpêkir û Rêbertî ji Suriyê derket, Rêbertiyê dikarî bê welat. Li çiyayên Kurdistanê bimîne, lê berê xwe da Ewrûpa. Lê çima nehate welat û berê xwe da Ewrûpa? Ji ber ku pirsgirêka Kurd, pirsgirêka Ewrûpayê bû. Ew pirsgirêk di bingeh de Ewrûpa çêkiribû. Heke wê ev pirsgirêk çareser bibe, pêwîst e Ewrûpa çareser bike. Weke din jî Ewrûpa digot "êdî divê ev pirsgirêk çareser bibe, heke ku PKK dest ji çekdariyê berde, em dikarin vê pirsgirêkê çareser bikin." Vexwendin hebûn ku Rêbertî biçe Ewrûpa. Gelek dewletên Ewrûpa ew peyam dişandin ji Rêbertiyê re "were Ewrûpa, heke tu bêyî Ewrûpayê em ê jî alikariyê bikin û em dikarin vê pirsgirêkê çareser bikin. Êdî divê ku pirsgirêk çareser bibe." Ewrûpayê bi vî rengî peyam dişandin. Ji milekî ve ew peyam Rêbertiyê digirt, bi rastî jî pirsgirêka Kurd pirsgirêka Ewrûpayê ye, bê Ewrûpa ew çareser nedibû. Ji ber ku xwediyê vê pirsgirêkê ew bûn. Lewra Rêbertiyê berê xwe da Ewrûpayê.

Rêbertiyê hatina Kurdistanê rast nedidît. Ji ber ku hatina Kurdistanê wê şer mezintir bikira. Wê texrîbat hîna mezintir bibana, ev dibe ku bibûya sersebeba şer hîna mezintir bibe. Rêbertî nexwest şer mezin bibe û texrîbat çêbibin. Ji ber ku pirsgirêka Kurd ji her milî ve derxistibû holê. Ji bo ku ew pirsgirêk çareser bibe, derfet û cihê wê jî çêdikir. Pêwîst bû êdî pirsgirêk bi rêka muzekereyan bihata çareserkirin. Rêbertî ew dixwest, nedixwest şer hîna zêdetir bibe. Şer mezin bibûya wê texrîbatên pir mezin çêbiban. Heke berê xwe da Ewrûpayê, ji bo wê berê xwe da Ewrûpayê.

Lê belê paşê derket holê ku Ewrûpa durûtiyê dike û di komplo de cih digire. Ne ku dixwaze pirsgirêkê çareser bike, dixwaze hîna girantir bike. Di komploya navnetewî de, di pêkhatina wê de, rewşa Ewrûpayê derkete holê. Heke pirsgirêka Kurd îro jî nayê çareserkirin sersebeba wê yek jî Ewrûpa ye. Ewrûpa û Emerîka naxwazin pirsgirêka Kurd çareser bibe. Ji ber ku dema çareser bibe wê bi

PKK'ê çareser bibe. Wê ev bi xwe re çi derxe holê, wê xeta Rêbertiyê û PKK'ê li Kurdistanê serwer bike. Wê demê Kurdistan wê ji bin xizmeta Ewrûpa û Emerîkayê derbikeve. Ji ber vê naxwazin pirsgirêk çareser bibe.

Ya diduyan jî heke pirsgirêk çareser bibe tiştê ku Ewrûpa li dijî Tirkiyê, Suriyê û Îranê bikarbînin namîne. Nikarin wan dewletan biçewisînin. Nikarin ji wan tewîzan bigirin, nikarin wan bikişînin nava siyaseta xwe. Ji bo ku wan dewletan her dem di bin çewsandinê de bihêlin, ji wan tewîzan bigirin û berjewendiyên xwe biparêzin, nahêlin pirsgirêka Kurd çareser bibe. Hîmê vê jî di sala 1921'an de Îngiltereyê li Qahîrê avêtiye. Her dem pêwîst e pirsgirêk hebe, nakokî hebin, her kes di nav şer de be û muhtacê wan be. Bi vî rengî wan bike bin kontrola xwe. Li gorî wê berjewendî û desthilatiya xwe biparêzin.

Dema ku Rêber APO dîl hate girtin, li dijî komployê wê çawa bisekine her kesî ev meraq dikir. Berê jî li dijî komployê disekinî. Dixwest ku komplo bi rêxistinê, gel, bi dostên rêxistinê û gelê Kurd bide fêmkirin. Li ser wî esasî dixwest rêxistin, gel û dostên Kurdan hemû bikevin nav liv û tevgerê. Da ku ew komplo vala derbikeve û pirsgirêka Kurd bikeve rêka çareseriyê. Ji bo vê pir kar dikir, û dixwest komployê bide fêmkirin. Lê belê çiqasî kar kir jî û xwest bide fêmkirin jî, lê rêxistinê jî tam ew bi kûranî fêm nekir. Ji ber ku rêxistinê bi temamî fêm nekir, bi gel jî tam neda fêmkirin. Dibe ku hinek kadro û welatparêz ketin tevgerê û xwe şewitandin, li dijî komplo wiha sekinîn. Ev pir girîng bû. Li dorberê Rêbertiyê xwestin wiha çemberekî çêbikin û komployê bişkînin, lê wê têrê nekir. Heke ku ew bi berxwedana rêxistin û gel temam bibûna, gengaz bû ku komplo bişkesta. Ji bo wê ew berxwedanî û çalakiya ku li dorberê Rêbertiyê ji bo Rêbertiyê biparêze çêbûyî, pir girîng e û dîrokî ye. Gelek kadro û welatparêzan xwe şewitandin. Di dîrokê de ji bo ti serokî ew nebûye. Ji bo ti pêxemberan ew çênebûye. Ne yek-didû, nêzîkî heştê-nod însanan xwe ji bo Rêbertiyê şewitandin. Di nav de tenê ne Kurd, derveyî Kurdan jî însan hebûn. Xwe ji bo Rêbertiyê şewitandin. Heger ku di vê Rêbertiyê de mirovahî û bilindbûna mirovahiyê, çareserkirina pirsgirêkên mirovahiyê nedîtibana kesî ew çalakî nedikir.

Di dîrokê de gelek serokan ji bo gelan, mirovahiyê kar kirine, van jî gelek xeterî jiyane, lê kesekî ji bo wan xwe neşewitandiye. Di

wê astê de xwedî kesekî derneketine. Heke di vê astê de xwedî derketina li Rêbertiyê heye, ev pir girîng e. Ew çalakiyên tên kirin jî çalakiyên dîrokî ne.

Rêbertiyê xwest ku li dijî komployê gel, gerîla û dostên Kurdan bike nav liv û tevgerê, lê ew tam çênebû, ji ber wê jî komployê encam girt. Rêber APO piştî ku dîl ket û şûn de li dijî komployê sekna xwe zêdetir bi kûranî pêşxist. Ji ber ku dît ku beriya wê çiqasî li dijî komployê sekiniye û xwestiye komployê pûç bike, xwestiye bi rêxistinê, gel û dostê Kurdan bide fêmkirin, bi mirovahiyê bide fêmkirin; lê ev hewldan têrê nekir. Çima wan hewldanan têrê nekiriye û sedemên wê çi ne? Rêbertî bi kûranî li ser sekinî. Wê çawa bike ku li dijî komployê bisekine, komployê bi tevgerê û gel bide fêmkirin, gel û nirxên wî biparêze. Her tiştî dike da ku komplo bisernekeve. Ji ber ku dema komployê pûç neke, wê demê li hemberî tevgerê û gel xeteriyên mezin wê çêbin. Rêbertiyê gotibû. "dema ez dîl ketim di serî de min got ez naxivim, paşê min fikira xwe guhert. Ger ez ne axivim wê rastiya komployê dernekeve holê, PKK û gelê Kurd jî wê tam vê komployê fêm nekin û nikaribin vê komployê vala derbixin, wê PKK û gel jî derbê bixwin. Ji ber wê min fikira xwe guhert." Ji wir û şûn de destpêkir ku komplo zêdetir bi kûranî hem fêm bike û hem jî bi rêxistinê, gel û mirovahiyê bide fêmkirin.

## Di Dîrokê De Gelek Komplo Hene

Di dîroka gelek tevgeran û gelan de gelek komplo hene. Komplo hene serdikevin tefsiye pêşdikeve, komplo hene pûç dibin, xizmeta serkeftinê dikin. Dîroka tevgera me de jî ew heye. Dema ku Heqî Karer bi komployê hate şehîd xistin, ew komplo mezin bû. Rêbertiyê ew komploya kir sedema ku tevgerê mezin bike. Di wê komployê de tevger mezin derket. Wê komployê xizmeta vê kir. Wê demê jî gengaz bû ku tevgera me tesfiye bibûya, ji ber ku peyamê dewletê dida ew bû. Dewletê wê demê digot "dest ji tevgerê berdin, yan jî hûn ê hemû weke Heqî Karer bên kuştin." Di hinek kadroyan de tirs çêbû, di wê demê de dev ji tevgerê berdan jî. Hinek di Ewrûpa re derketin û revîn çûn. Lewra Rêbertî ew komploya li dijî komployê zivirand. Komplo pûç kir û tevger tesfiye nebû û hîna bihêztir gav avêt.

Niha komploya ku li ser Rêbertiyê, tevgerê û gelê Kurd pêşketî, xurtir bû, berfirehtir û kûrtir bû. Ji bo wê pêwîst e ev komplo bi

kûranî bê fêmkirin. Ev komplo kê pêşxistibû? Sîstemê pêşxistibû. Wê demê tam divê ku mirov sîstemê fêm bike. Beriya vê jî Rêbertî li dijî sîstemê sekinîbû, têkoşîn kiribû, gelek gav pêşxistibû, gelek encam jî girtibû. Destkeftiyên mezin jî çêkiribû. Lê derkete holê ku her çiqasî ew gav pêşxistiye, pêşketinên mezin jî çêkiriye, lê sîstem tam nehatiye fêmkirin. Jixwe sedemeke pêkanîna komployê ew bû. Dibe ku di pêkhatina komployê de gelek sedem hebin, ji xwe hene jî. Di nav rêxistinê de sedemek jî çetegerî ye, ew şoreşgeriya nîv e, yê ku em jê re dibêjin xeta navîn û memûrgerî ye. Kadroyên navendî di demê de erkên xwe pêk naynin, ev sedeman hemû hene. Lê belê sedema komployê ne tenê ev in, ev komplo temam dikin. Di bingeh de divê sîstem baş bê fêmkirin. Pêwîst e bi temamî mirov xwe ji bin bandora sîstemê derbixe. Ji ber ku heta wê demê bandora soysalîzma pêkhatî hebû. Sosyalîzma pêkhatî jî beşeke ji sîstemê ye. Beşê wê yê çep e, di bin bandora wê de gav hatine avêtin. Ji her aliyê ve divê sîstem baş bê fêmkirin û jê qutbûn çêbibe. Da ku mirov bikaribe li dijî komployê bisekine.

Heger ku ev komplo, komploya sîstemê ye, û wî pêşxistiye; wê demê divê ku mirov sîstemê baş fêm bike û li dijî wê bisekine. Da ku mirov bikaribe berxwedaniya ku li dijî sîstemê û komployê baş pêşbixe.

Rêber APO analîzkirina sîstemê ji her aliyê ve kir, ew ji bo xwe esas girt. Ew sîstem analîz kir. Rastiya wê sîstemê ji her aliyê ve fêm kir. Ji ber wê jî alternatîfa vê zêdetir xurt kir û pêşxist. Ev lêgerîna xwe di sîstema nû de gavên ku heta niha avêtibûn, dît ku tê de hinek kêmasî û xeletî hene.  Ji ber wê alternatîfa sîstemê bihêz pêşneketiye û PKK bi ser neketiye. Lewma komplo pêşketiye. Lewra dema sîstem analîz kir, alternatîfa xwe jî hîna bihêztir pêşxist û sekina xwe li dijî komplo û sîstemê bihêztir nîşan da.

Di vê têkoşîn û berxwedana xwe de Rêber APO encam girt. Yê bi ser ket Rêbertî bû. Di têkoşîna xwe de li Îmralî li dijî komployê encam girt. Ji aliyê xwe ve li hemberî komplo û sîstemê bihêz sekinî, ji aliyê xwe ve komplo vala derxist. Ev hemû girêdayî têkoşîna Rêbertiyê bû. Rêbertiyê dît ku paradîgmaya heyî paradîgmaya sîstemê ye. Heta niha ew paradîgma alternatîfa sîstemê dîtibû, dît ku ew paradîgmaya heyî ne alternatîfa wê sîstemê ye; berovajî sîstem bi xwe ye. Di aliyê çep de sîstemê temam dike û wê bihêz dike. Temen û jiyana sîstemê didomîne. Lewra xwe ji binî ve ji wê paradîg-

mayê xelas kir. Wiha Rêbertiyê xwe ji sîtemê xelas kir. Ji her aliyê ve têkiliya xwe û sîstemê qut kir. Ji ber wê alternatîf xurtir kir û pêşxist.

Rêber APO sîstema şaristaniya navendî analîz kir û di wê analîzê de gihîşte fikrekî û paradîgmeke pir mezin. Ez dikarim bêjim, îro li cîhanê ne ti kes ne jî rêxistin, ne di wê astê de gihîştine û bûne xwedî raman. Xwe nekirine alternatîfa vê sîstemê. Îro di fikir de, di hêza fikir de Rêber APO û PKK li cîhanê ji her kesî bihêztir e û pêşketîtir e. Ti hêz ji aliyê hizir de ne gengaz e bi Rêber APO û PKK'ê bikaribin derbas bikin, nikarin. Lewra heke ev tevger tenê vê hêza hizirê bikar bîne, dikare gelek encaman bigire, ev rastiyeke vê rêxistinê ye. Heke vê sîstema fikir di pratîkê de em pêşbixin, ti hêz nikare li pêşiya vê tevgerê bisekine. Çiqas astengî çêbibin bila çêbin, çiqas êrîş çêbin bila çêbin, ev tevger dikare bi vê hizir û sîstema xwe li dijî wan bisekine. Dikare encamên mezin jî bigire.

Mirov baş bala xwe bidiyê, Rêber APO komployeke ewqas mezin, li dijî komplogeran zivirand û komplo kir sedema li dijî wê komployê, wê sîstemê alternatîfeke xurt hem di hizir de, hem jî di aliyê sîstemê de pêşxist. Ew berovajî kir û wiha vala derxist. Ew komplo bû sedem ku di PKK'ê de pakbûnek çêbibe, PKK bigihîje rastiya xwe û nasnama xwe ya destpêkê. Da ku PKK xurtir bibe û pêşbikeve. Rêbertî vê daxwaz dike û ev girîng e.

### Pêwîst e Mirov Tola Xwe Di Fikir, Rêxistin Û Çalakiyê De Bigire

Dema mirov komplo berovajî bizivirîne, mirov dikare bigihîje encamê. Heke ne wiha be wê komplo biserkeve. Ji ber ku Rêbertiyê komplo vala derxistibû û alternatîfa wê pêşxistibû ev bûn sedem ku biserneket. Ger Rêbertiyê ew sîstem analîz nekiriba, alternatîfa wê bihêz pêşnexistiba, wê komplo biserketa. Rêbertiyê bi vî şêwazî xwe hem li pêşberî xeteriyan girt, hem jî li hemberî komplogeran tola xwe hilda. Bi vî rengî tolhildaneke mezin girt.

Di nav PKK'ê de tol çawa tê hildan, pêwîst e mirov wê baş fêm bike. Wer bi têgihîştinên teng tol hildan di nav PKK'ê de nîne. Divê heyf wiha bê hildan, tiştê dixwaze te bikuje, tê nehêlî te bikuje û tê wê hewldanê pûç bikî û tê pêngavên serkeftinê bavêjî. Ger te wiha kir tu tola mezin digirî. Divê mirov tolhildanê di hizir de bigire, di rêxistinê û çalakiyê de bigire. Ger mirov wiha tola xwe girt, rast

digire. Ya ku Rêbertiyê pêkaniye ew e. Milîtanê vê tevgerê wê vê bibînin û wisa erzan, bi rêkên kurt tevnegerin.

Em dixwazin tolê hildin, em diçin çalakiyekê û em şehîd jî bikevin, em dibêjin me tola xwe girt. Ev li gorî felsefe û têgihîştina PKK'ê, pir di paş de ye. Tolhildana mezin bi hizirên mezin tê girtin, bi rêxistin û çalakiyên mezin tê girtin. Bi vî rengî mirov ber bi serkeftinê ve diçe. Ji destpêkê ve rastiya Rêber APO ev e. Ji destpêkê heta niha Rêbertiyê bi vî rengî tola xwe hildaye. Bi vê têgihîştinê tevgera PKK'ê pêşketiye û biserketiye.

15'ê Şibatê, ji bo Rêber APO, PKK'ê, gelê Kurd û Kurdê azad çûyîna ber bi kortalê ye. Yan wê tê wer bibî û bimirî, yan jî tê rabî ser piyan. Helbet ji ser keviyên kortalê rabûna li ser piyan ne rehet e, wiha rehet jî çênabe. Her kes nikare li ser keviyên kortalê rabe ser piyan. Yên ku ji keviyên kortalê de serî hildidin, rabûn û hilhatineke mezin pêktînin. Yên wisa nekin dimirin. Mirov li dîrokê temaşe bike, gelek tevger, gel, gihîştine keviyên kortalan û derbên mezin xwarine. Pir kêm ji keviyên kortalan gel rabûne. Yên hilhatine û rabûne jiyaneke mezin afirandine. Rastiyek vê jî heye, da ku mirov di kortalê de nekeve û nemire neçe, pêwîst e mirov bifire. Weke din çareyeke mirov nîne û nikare xwe xelas bike.

Ji bo Rêber APO ev pêvajo çawa ye? Pêvajoyeke di warê hizirî de, di asta mucîzeyê de ye. Weke din nikare xwe, gel û tevgera ku ber bi keviyên kortalê ve çûye, xelas bike û wan ji wê rewşê derbixe. Di rewşeke wiha de Rêber APO xwe, tevger û gel firand, nehişt ku bikevin. Di vir de encam girt. Ji ber wê komplo bi ser neket.

Di pêvajoya Îmralî de Rêber APO çi jiya? Berê jî min gotibû taybetmendiyeke Rêbertiyê ev e ku her dem bi guman e. Ti car bi tiştekî îqna nabe. Dema gavekê davêje û encamê digire, nabêje ev bes e. Dibêje, ev gav min avêt û ev encam min derxist, ev rastî derket holê, lê rastî ew e, yan na. Dibe ku rastî hîna cudatir be. Ev dihêle ku her dem Rêbertî di lêgerîn û lêkolînê de be, tim kûrbûnê bi Rêbertiyê re çêdike. Bi wê kesayeta xwe ya bi guman, li Îmralî çi çêkir? Wê çawa xwe têr bike, ev jî bi rêka analîzkirina komplo û sîstemê dibe. Lewra Rêbertî kete nav lêgerîneke bêhempa. Di encamê de Rêbertiyê ew analîz pêşxist û ew kesayeta xwe ya bi guman hindik be jî têr kir. Rêbertiyê çi got? “ez di hizirê xwe de gihîştim rastîyan, yanî min hizirandina xwe pak kir. Ew gavên ku destpêkê min avêtî, ez niha gihîştim armancên xwe. Heta niha lêgerînên min hebû, ez di

wan lêgerînên xwe de gihîştim hedef û armancên xwe. Min rastiya PKK'ê nû ava kir û pêşxist. Ez nû gihîştim rastiya xwe û PKK'ê. Tiştên ku min di destpêkê de dixwest ez ava bikim, ez êdî niha dikarim ava bikim. Ji ber ku min di hizirê xwe de zelaliyek çêkir. Tiştên nedihiştin ez wan hedef û armancên xwe pêkbînim min rakir."

Bala xwe bidinê, vê dawiyê Rêbertiyê parêzname nivîsand, beşeke jê mabû dijmin çar mehan neda, Rêbertî pir nerehet bû, dema ku dan di hevdîtinê de jî diyar kiribû "ez niha rehet bûm." Çima ew got, ji ber ku bi kedek mezin ew pêşxist. Da ku wê binivîse bigihîne, rêxistinê, gel û mirovahiyê.

Rêbertî ji bo rêxistinê, gel, hevaltiyê û mirovahiyê dijî. Karê xwe hemû ji bo wê têgihîştinê ye. Ji ber wê karek mezin pêşxist, dema ew kar û keda wî negihîştibû destê rêxistinê, mirovahiyê, Rêbertî ne rehet bû. Dema bihîst ku dijmin ew parêzname da, got "ez rehet bûm." Wek çawa ji bin barek mezin derkeve. Sedem ew e ku Rêbertî xwedî berpirsiyariye û bi wî ruhî dijî. Berpirsiyariya xwe wiha pêkanî. Heta negihîşt dest rêxstinê, her çendî nivîsî bû jî, weke ku erka xwe pêkneaniye, ne rehet bû. Dema gihîşte destê rêxistinê bi vî rengî berpirsiyariya xwe pêkanî.

Lewra rêbertiya ku hûn qebûl dikin pê re hevaltiyê dikin û hûn dibêjin em pê ve girêdayîne, rêbertiyeke wiha ye. Hûn ê ji xwe re encaman ji vê nêzîkbûnê derbixin.

Çêbûna Rêber APO ya çaxa duyemîn, ango di avêtina hîmê PKK'ê de heta kompIoya navnetewî, di hizirê Rêber APO de çi esas e? Paradîgmaya xwe dispêre sosyalîzma pêkhatî esas e. Li ser çi ew paradîgma hatiye avakirin? Li ser dewletê-desthilatiyê hatiye avakirin. Ger mirov dixwaze sosyalîzmê li Kurdistanê ava bike, divê dewletek bê çêkirin, desthilatiyek bê çêkirin. Ji bo ku mirov dewlet û desthilatiyê çêbike, divê ku mirov şer bike. Da ku mirov bikaribe li Kurdistanê dagirkeriyê bişkîne û dewleta dagirker ji Kurdistanê derbixe. Di Kurdistanê de dewletekî karkeran ava bike û desthilatiya karkeran çêbike. Mirov karibe sosyalîzmê li Kurdistanê ava bike. Hingê mirov dikare li Kurdistanê azadiyê pêşbixe. Paradîgma kevin li ser wî esasî bû. Rêbertiyê li ser wî esasî kar dikir. Rêber APO her çiqas li ser esasê vê paradîgmayê kar dikir jî û PKK li ser vî esasî hatibû avakirin jî, stratejî û tektîk li gorî wê hatibû pêşxistin. Kar hemû li ser wî esasî hatibû pêşxistin, lê Rêbertiyê bi temamî nirxê komînal ê demokratîk wenda nekiribû. Heta dikarim bêjim ew nirxan di Rê-

bertiyê de û di nav PKK'ê de xurt bûn. Heke wiha xurt nejiyaban, wê Rêber APO weke serokê sosyalîzma pêkhatî, rêxistina PKK'ê jî weke rêxistinên sosyalîzma pêkatî bibûna.

Wê demê tiştên hatîne serê sosyalîzma pêkhatî, wê bihatiba serê Rêber APO û PKK'ê jî. Heke PKK û Rêber APO piştî belavbûna sosyalîzma pêkhatî belav nebûn, berovajî di wê pêvajoyê de herî zêde gavên pêşketinê avêtin; ev girêdayî vê rastiyê ye. Her çiqasî di kesayeta Rêber APO û di rêxistina PKK'ê bandora fikirê sosyalîzma pêkhatî dihewand jî, lê li gel vê nirxê komînal û demokratîk jî pir xurt bûn.

Ji ber wê PKK weke rêxistinên komînîst û sosyalîst nebû. Lema Rêber APO weke serokê wan rêxistinan nebû, kesayet û fikirê Rêbertiyê cuda pêşket. Her ku çû rêxistin pêşket, bi taybet jî piştî sosyalîzma pêkhatî hilweşiya û her kesî dest ji sosyalîzmê berda; Rêber APO temsîla sosyalîzmê kir. PKK'ê temsîla sosyalîzmê kir, herî zêde ev di wê çaxê de pêktê. Ew jî girêdayî vê rastiyê ye.

Ji ber wê tim Rêber APO û PKK'ê ew nakokiya dijiya. Ango navbera sosyalîzma pêkhatî û nirxên komînal ên demokratîk nakokî dijiya. Rêber APO dema ku PKK ava kir hedefê ku dayî pêşiya xwe ne ku dewlet çêkirin bû, hedefê Rêber APO jiyaneke azad, kesayeteke azad û civakeke azad înşakirin bû. Lê di wê demê de sosyalîzma pêkhatî di wê îddiayê de bû bersiv dida van, ji ber vê ew paradîgma ji xwe re esas girt. Lê Rêbertiyê çiqas li ser wî esasî pratîk pêşxist, pirsgirêkên din av de jî dît. Yanî karekterê Rêber APO û hedefê ku daye pêşiya xwe û pratîka ku dihate pêşxistin hev temam nedikirin. Di navbera armanc, karekterê Rêber APO û pratîka ku pêkdihat, nakokî pêşdiket. Rêbertiyê ev nakokî dûr û dirêj jiya. Wê çawa vê nakokiyê çareser bike, ev ji xwe re esas girt. Gelo çima ev nakokî derdikete pêşberî Rêbertiyê? Sedem çi bû, çavkaniya wê çî ye? Li gorî armanc û karekterê kar kirin, hebû, lê mixabin di pratîkê de ew tam pêknedihat. Mirov dikare bêje ku heta dervayî karekter û hedefê tiştên cuda çêdibûn. Jêdera van çi bû û ji ku derdiketin, di paradîgmê de derdiketin.

Ji wê paradîgma sosyalîzmê ya ku li ser dewlet û desthilatiyê çêbûye derdiket. Lewra Rêbertiyê ev tam fêm kir, ew nakokî baş dît. Beriya wê her ev nakokî hebû. Dema dît pirsgirêk di wê paradîgmayê de ye, ew paradîgma terk kir. Paradîgmake din jî bi wêrekî pêşxist. Mînakê wê yê li ber çav mirov niha dibîne. Di parêzname-

yan de hîna bi wêrekî, ji xwe bawer gavan davêje. Ji ber ku dema ku sosyalîzma pêkhatî hebû, nedikarî wiha rehet fêm bikira û gav jî tam bi wêrekî, bi biryar û rehet biavêta. Her kesî digot sosyalîzm ew e, azadî û demokrasî wê bi rêka paradîgmayê bê. Dema mirov berovajiyê vê bikeve, wê her kes êrîş bike.

Di sala 1984'an de Rêber APO got: "rêxistinên heyî bi nav komînîst in, lê bi xwe ne komînîst in, yan divê ku xwe nû bikin, yan jî divê ku xwe tesfiye bikin." Me wê demê danezana wê civînê derxist. Rêxistinên komînîstan hemûyan êrîşî me kirin û gotin "hûn li dijî sosyalîzmê ne." Lewra wê demê ji ber wê zor bû. Dema sosyalîzma pêkhatî hilweşiya, Rêbertî di xeta xwe de di têgihîştina xwe ya sosyalîzmê, azadiyê û demokrasiyê zêdetir bi wêrekî gav avêtin. Lewma gihîşte paradîgmayeke nû. Heke Rêbertiyê ew jiyan nekiriba, wê nekarîba wan gavan jî bavêje.

Ti rêxistin û seroken din nekarîn van gavan biavêjin. Ji ber ku dema van gavan biavêjin wê nejîn. Dema sosyalîzm hebû jî, ew nakokiya Rêbertiyê hebû. Lewma dema sosyalîzm hilweşiya, bi wêrekî ew paradîgma terk kir û paradîgmayeke nû pêşxist. Ew paradîgma di destpêkê de di karekter û hedefê Rêbertiyê de hebû. Ger ew fikir di serî de bi Rêbertiyê re nebûya, ne gengaz bû di vê astê de paradîgma pêşbixe û çêbibûna.

## Divê Mirov Xwe Ji Modernîteya Kapîtalîst Rizgar Bike

Taybetmendiyê çêbûna sêyemîn çi ne? Pêwîst e mirov wê baş fêm bike. Bi giştîi xwe ew jiyana ku mirovan ber bi dewletbûnê ve dikişîne, bi taybet jî ji jiyana kapîtalîst a modern qutkirin, cewhera çêbûna sêyemîn e. Bi vê dest pê dike. Ji ber wê Rêbertî di vir de hem rexnan pêşdixe, hem jî di vir de rexnedanê li xwe dike. Ji binî ve xwe ji şaristaniya ku li ser dewletê avabûye qutkirinê esas digire. Heta wê demê di paradîgma Rêbertiyê de dewlet û desthilatî heye.

Bi çêbûna sêyemîn re wê bi temamî xwe di fikir de zelal û pak bike. Wê êdî dewlet û desthilatiyê esas negire. Wê sîstema demokrasiyê esas bigire. Sîstema xwe bi temamî li ser wî esasî pêşbixe. Ji ber wê Rêber APO dema ku paradîgma sosyalîzma ku li ser dewlet dihate avakirin terk kir û paradîgmayeke nû da pêşberî xwe, di vir de rexne û rexnedaneke mezin pêşxist. Pir kûr û fireh pêşxist. Dema mirov baş bala xwe bidiyê, di destpêka tevgerê de yanî çêbûna duyemîn de, tevgerê bi rexne û rexnedanê dest pê kir. Hîmê vê rêxis-

tinê li ser vî esasî dest pê kir û mezin dest pê kir. Şoreşa vejînê li ser vî bingehî çêbû, li ser vî esasî di çêbûna sêyemîn de jî rexne û rexnedan li gorî çêbûna duyemîn mezintirîn, kûrtirîn û berfirehtirîn pêşxist. Bi wêrekî ev pêngav hatin pêşxistin. Rêxistinê bi van rexnan û rexnedanan ji piradîgma kevin xwe qut kir û ya nû pêşxist. Di warê fikrî de gaveke mezin avêt. Bi vî rengî şoreşa zêhniyetê pêkanî. Zêhniyet, îdeolojî û felsefa heyî terk kir. Ew îdeolojî û felsefa li cîhanê heyî dewlet esas digirt û her tişt bi avakirina dewletê rave dikir û ew esas digirt. Jixwe desthilatî û koletî esas girtin jî ev bû. Ev hizirandin ti car azadiyê, demokrasiyê, wekheviyê, edaletê û aşitiyê pêknayîne. Mirov çiqasî ji bo wê kar bike bila bike, lê nikare wê esas bigire. Rêbertiyê bi rexne û rexnedanê ew paradîgma kevin da aliyekî û alternatîfa wê pêşxist. Li ser çi esasî paradîgmaya nû pêşxist? Li derveyî dewletbûn û demokrasî ji xwe re esas girt. Sîstema xwe li ser wê ava kir. Rêbertiyê prensîb û hedefên xwe ji yên dewletê û desthilatiyê pak kir. Prensîb û armancên xwe li ser esasê civakeke azadiya jinê, azadiya ekolojiyê û li ser wî bingehî demokrasiyê ava kir. Prensîbên xwe li ser wî esasî pêşxist, li ser sîstema demokrasiyê pêşxist. Ji ber wê demokrasî û sosyalîzm ji dewletê xelas kir. Paradîgmaya sosyalîzmê ya berê di heman demê de hewl dide hem li gorî demokrasî û sosyalîzmê be, hem jî li gorî dewletê be. Bi dewletê sosyalîzm avakirin ji xwe re esas digirt. Bi dewletê demokrasî û azadî pêşxist esas digirt. Prensîba sosyalîzma pêkatî ev bû. Rêber APO çi kir, demokrasî û sosyalîzm ji dewletê xelas kir.

Demokrasî û sosyalîzm ne parçeyekî dewletê ne, ne jî di nav de ye û xizmeta dewletê nake. Demokrasî bi serê xwe sîstemek e, alternatîfa dewletê ye. Demokrasî ew gelê ku derveyî dewletê maye û derveyî dewletê dijîn, sîstema xwe ya demokrasiyê ava dikin, ew in. Rêbertiyê hem sosyalîzm û demokrasî ji dewletê xelas kir, hem yekîtiya demokrasî û sosyalîzmê çêkir. Her du gihandin hev û kirin yek. Ew prensîba demokrasiyê ya azadiyê û wekheviyê bi sosyalîzmê re kir yek. Bi vî rengî sosyalîzma ku serneket û dawî kete bin xizmeta desthilatî, ji wê xelas kir, da ku sosyalîzm bikare di pratîkê de pêk bê. Nirxeke mezin ji bo sosyalîzmê çêkir. Lewra Rêbertiyê got “min erkên xwe ji bo Marks jî pêkanî. Marks ji bo sosyalîzmê kar kir, lê di îdeolojî û felsefeya Marks de ji bo ku dewlet hebû desthilatî hebû, sosyalîzm pêk nehat, min rêzdayîna xwe wiha ji bo Marks pêkanî.”

Lewra hem di hîmê çêbûna duyemîn de hem jî ya sêyemîn de çi heye, rexne û rexnedan heye. Rêbertiyê bi wê xwe afirand û gav avêt. Ev rastiya Rêbertiyê ye. Milîtanên vê tevgerê divê ku vê baş fêm bikin, rêbertiya ku ew qebûl dikin û pê re hevaltiyê dikin, gavên mezin bi rexne û rexnedanê pêşdixe û vê esas digire. Milîtanên Rêbertiyê wê ji rexne û rexnedanê birevih, wê jê acîz bibin, wê rexne û rexnedanê nejîn... Ev çawa dibe hevaltiya bi Rêbertiyê re, çawa dibe milîtantiya Rêbertiyê, ev ne gengaz e. Yê ku Rêbertiyê esas digire, wê rexne û rexnedanê esas bigire. Ji ber ku rastiya Rêbertiyê ew e. Wê her dem vê bijîn, tim bi vê xwe pak bikin, xwe nû bikin. Wê xwe xurt bikin û di xwe de hêza çareseriyê çêbikin. Rastiya Rêber APO ew e. Kes ji Rêbertiyê rexne û rexnedanê, hem jî wiha mezin naxwaze. Rêber APO bi xwe wê pêktîne. Ji ber ku dema wê pêkneyîne nikare xwe nû bike, pak bike û di xwe de hêzê çêbike, lewra vê dike.

Rêbertiyê wê erka xwe wiha pêkbîne û tê jî bêjî ez hevalê Rêbertiyê me û di heman demê de jî ji rexne û rexnedanê birevî; aciz bibî û nerazîbûnê nîşan bidî. Ger tu neçar kirin, ger ti rê li pêşiya te nema, tê wê wextê rexne û rexnedanê pêşbixî, bi vî rengî qet nabe. Li vir tu kê neçar bikî, ji tirsan be jî wê rexne û rexnedanê pêşbixe. Her kes dikare bi vî rengî rexnedanê bide. Lê ev ji bo milîtanên PKK'ê nabe. Tu milîtanê vê tevgerê yî, dema tevgerê ji te rexnedayîn xwest jixwe tê bidî. Ger te neda jixwe tu nabî milîtanê vê tevgerê, tu dibî mirovekî weke nav civakê. Ya girîng ne ku dema tevger ji mirov xwest mirov rexnedanê pêşbixe, pêwîst e mirov bi xwe rexne û rexnedanê weke prensîbekî bigire dest. Tê bêjî, heke min rexne û rexnedan pêşnexist, ez nikarim milîtaniyê bidomînim, ez nikarim şoreşgeriyê bikim. Ez ji vê tevgerê, ji vê Rêbertiyê, vê milîtantiyê qut dibim. Ez gemarî dibim, ez nabim hêza çareseriyê. Tê vê bi xwe bidî qebûlkirin, ji xwe re esas bigirî. Çawa kes ji Rêbertiyê wê naxwaze, Rêbertî cihê ku rexne û rexnedanê pêşbixe dide, yê ku Rêbertî ji xwe re esas girtibe jî, wê rexne û rexnedanê ji bo xwe esas bigire. Wê her dem vê bijî, bide jiyîn. Rastiya Rêbertiyê, ya PKK'ê ew e. Ji vê dûrketin, ji Rêbertiyê, rêxistinê dûrketin û qutbûn e, xwe gemarkirin e. Ji hêza çareseriyê ketin e.

Weke min gotî, di hîmê çêbûna duyemîn de, rexne û rexnedan heye, bi wê esasê ev tevger hatiye damezrandin. Ji ber wê derketin,

pêşketin çêbûye û şoreşa vejînê biserketî ye. Li ser vî bingehî çêbûna sêyemîn pêşketiye. Çêbûna sêyemîn weke ya duyemîn bi rexne û rexnedanê pêşketiye. Lê ji ya duyemîn kûrtir, mezintir, firehtir û ji wê pêşdetir e. Mirov nikare bi çêbûna yekê û duyemîn re muqayese bike. Ji ber ku pir bingehîn e.

Rêbertiyê zêhniyeta ku li cîhanê heyî, ango îdeolojî û felsefa heyî red kiriye. Di cihê wê de îdeolojiyek û felsefeyeke nû pêşxistiye. Li gorî wê zêhniyetek, jiyanek, kesayetek, civakek, çandek, exlaqek, pîvan, rêxistin û çalakî pêşxistiye. Ev guhertineke pir mezin e. Lewra çêbûna sêyemîn bi temamî bi vê îfade dibe.

Rêber APO bi vê rexne û rexnedanê civakê û dîrokê baş fêm dike. Di wê de digihîje rastiya dewletê. Ji ber ku di kesayeta Rêber APO de ji destpêkê de dîrok û civak ji bo xwe esas girtin hebû. Ji ber ku ew esas girtibû, gihîştibû rastiya jinê jî. Di çêbûna sêyemîn de gihîşte rastiya dewletê. Heke ne gihîştiba rastiya jinê, wê negihîştiba rastiya dewletê jî. Ji bo ku rastiya jinê fêm kir, rastiya dewletê jî fêm kir. Li wir gihîşte çi encamê, ku civaka li ser dewletê avabûye koletiyê îfade dike. Dewlet ti car azadiyê îfade nake. Ger te dewlet da pêşiya xwe, tu koletiyê û desthilatiyê didî pêşberî xwe, tu çiqasî ji bo sosyalîzmê şer û xebatê bikî bike, ango ji bo azadiyê, demokrasiyê, wekheviyê, edaletê û aşitiyê, ne gengaz e yek ji van jî çêbibe. Tu dikarî gavan biavêjî, lê belê tu nikarî yek ji wan jî pêkbînî. Ji ber ku dewlet bi xwe li dijî azadî, demokrasî, wekehevî, edelalet û aşitiyê ye. Ger te dewlet esas girt, tu nikarî van pêkbînî. Jixwe piratîka wê li Sovyetê îsbat bû.

### Di Rastiya Rêbertiyê de Rabirdû (Pêşeroj) Rastir e

Heke dewlet esas girtin hebe, civakek li ser dewletê avakirin hebe, ev tê wateya civakeke kole tê avakirin. Hedefê Rêber APO jî ne civakeke kole, civakeke azad avakirin bû. Wê demê divê civak li derveyî dewletê û li ser azadiyê bê avakirin. Ev bi rêka dewletê re ava nabe. Dema Rêbertiyê ev analîz kirin gihîşte çi rastiyê? Gihîşte rastiya civaka xwezayî. Ji wir gihîşte nirxên wê yên demokratîk û komînal. Ji ber wê Rêber APO ji bo xwe çi esas girt, dewlet da aliyekî û civaka xwezayî esas girt, nirxên wê yê komînal û demokrasî esas girt. Sîstema xwe li ser wê avakirin, ji bo xwe esas girt.

Li vir Rêber APO gihîşte çi encamê, ku rabirduya mirovahiyê rastir e. Heqîqet di destpêka mirovahiyê de ye, ne di roja me ya îro

de ye. Rastî û heqîqet di wê de ye. Jixwe berê jî têgihîştina wetedayîna dîrokê esas bû. “Em di destpêka dîrokê de ne, dîrok jî di roja me ya îro de ye.” Ev tespit ji aliyê Rêbertiyê ve hatibû kirin. Ji vir derketina rê helbet rast e. Ji ber ku rastiya mirovahiyê di destpêka dîroka mirovahiyê de ye. Rêbertiyê ew fêm kir. Lewra ew ji bo xwe esas girt û got: “rastiya mirovahiyê di destpêk û rabirdûya mirovahiyê de ye.”

Lewma Rêbertiye berê xwe bide wir, wê li wir li mirovahiyê bigere, wê rastiyê di wir de bibîne. Wê dîroka mirovahiyê ji wir dest pê bike û bigihe roja me ya îro. Wê paşerojê jî siberojê jî li ser vî esasî pêşbixe. Li ser wî hîmî dê teşedayîna wê pêşbixe. Wê wiha têkiliya îro, paşerojê û pêşerojê bi hev re çêbike. Wê dîrokê rast bike û li ser piyan bide sekinandin. Di dîrokê de ew ji rêderketinên ku çêbûne, wê bi vî rengî rast bike. Wê qutbûna di dîrokê de çêbûye, ji holê rake. Wê mirovahiyê bi kokê wê ve bide girêdan, bingehê mirovahiyê bi mirovahiyê bide fêmkirin. Ji ber ku sistema ku li ser dewlet ava bûye, bi taybet jî yê kapîtalîzmê, dîroka mirovahiyê reş kiriye û di dîrokê de qutbûn çêkiriye. Di dîrokê de ji rêderxistin û çelexwarî çêkiriye. Bîr û mejiyê însan reş kiriye. Mirovahî ji rastiya wê, ji koka wê qut kiriye. Ji ber wê însan û însaniyet din av ji rêderketinê de dijîn. Lewra careke din mirovahî bi kok û bingehê wê re kirina yek, li ser wî esasî mirovahî ji wê rewşê derxistin û mirovahî rakirin, ji bo Rêbertiyê erkeke girîng e. Rêber APO ew erka girîng pêkanî. Mirovahî bi koka mirovahiyê re da naskirin û girêdan, ew qutbûna çêbûyî ji holê rakir, ji bo însaniyetê destkeftiyeke mezin çêkir. Ev nêzîkbûn ji dîrokê re jî nêzîkbûneke nû ye.

Di roja me ya îro de heke nûnerên kapîtalîzmê êrîşî Rêber APO dikin û wî xeternak dibînin, ji ber van taybetmendiyan e. Di roja me ya îro de herî zêde kapîtalîzm çi dixwaze bike, dixwaze mirovahiyê bêdîrok û bingeh bihêle. Mirovahiyê ji rastiya xwe dûrxe, da ku bikaribe bêmejî bike, û sîstema xwe rehet bimeşîne. Rêbertiyê li dijî wê û tam berovajiyê sîstema kapîtalîzmê têkoşîna xwe meşand. Rêbertiyê di vir de polîtîkayên kapîtalîzm û sîstemê pûç kir. Wiha dawî li sîstema wê tîne. Ji ber wê Rêber APO dikin hedef. Berdevkên sîstemê Emeîrka û Ewrûpa, dibêjin: “APO û PKK pir xeter in.” Ji ber çi xeter in, ji ber wê şêwaz û têkoşîna xwe xeter in.

Kurd ji dîroka xwe, koka xwe qutbibû, diheliya û ber bi mirinê ve diçû, Rêbertiyê pêşî li vê girt, careke din têkiliya Kurdan bi dîroka

wan ve çêkir. Rêber APO bi rastiya xwe re têkilî çêkir û Kurd ji mirinê xelas kir. Bi vê derbeyeke mezin li dagirkeran da, bi demê re ew qutbûna mirovahiyê jî ji holê rakir. Mirovahî careke din bi koka xwe vegeriya û ew naskir. Mirovahî bi rastiya xwe re kir yek. Lewra Rêbertî di cihanê de bû hedef, heke ewqas hêz di komplo de cih digirtin, bê sedem cih nedigirtin. Ji ber ku Rêber APO ev cîhan red kir. Zêhniyet, îdeolojî û felsefa wê, jiyan, kesayet, exlaq... bi kurtasî her tişt red kir. Di heman demê de ev cîhan red kir. Li dijî wê cîhanê, cîhaneke din pêşxist û alternatîfa vê sîstemê ava kir. Ger mirov vê bike jixwe wê sîstem bê ser mirovan. Ji ber vê sîstem bi tundî tê bi ser Rêbertiyê.

Em li dîrokê temaşe bikin, her dem yên zêhniyetekî nû derdixin û pêşdixin dibin hedef. Her kes diçe bi ser wan kesayetên ku xwedî fikirên nû ne. Sîstem ji bo wan girtinan, kuştinan, sêdaran û şewitandinê pêktîne. Heke ku îro êrîş li ser vê tevgerê hene, ji ber wê tên bi ser de. Ji ber ku ev tevger zêhniyeta heyî ne tenê ji hinek aliyan ve ji her aliyî ve red dike.

Di dîrokê de yên ku zêhniyeta nû pêşxistîne û bûne hedef dibe ku di hinek aliyan de zêhniyeta heyî red kiribin, lê ji her aliyî ve red nekirine. Lê Rêber APO di her aliyî de sîstemê red dike. Ev xal ji ber wê gelekî girîng e. Di pêşketina tevgerê ya destpêkê û derketina wê de her kesî êrîşî ser tevgera me dikir û digotin, “tenê xwe rast dibînin û her kesî şaş dibînin, tenê xwe dibînin, ma wiha dibe.” Wê dema destpêkê her kesî wiha em rexne dikirin û bi ser me de dihatin. Da ku em bikevin gumanê, da ku em dest ji hedefên xwe berdin, em jî weke her kes bibin. Ev êrîş di destpêka çêbûna tevgerê de ji bo wê bû, lê me di rastiya xwe de israr kir. Me got “helbet em xwe rast dibînin û her kesî şaş dibînin.” Em ji xwe bawer bûn, me guh da xwe, neda kesekî din. Wan çewisandinan bandor li ser me çênekir û ji bo wê tevger derket û pêşket. Ger wiha nebûya ne gen-gaz bû ev tevger pêşketiba. Ji ber ku her kesî digot, “ma her kes şaş e, hûn tenê rast in? Ev ne gengaz e.” Me jî digot, her kes şaş e, em rast in.

Hema kêmtirî roja me ya îro nebû, îro jî dibêjin: “ev şaş in. Çawa dibe ku her kes li cîhanê cuda be û ev tevgera PKK’ê bêje ev cîhan şaş e, PKK şaş e.” Bi van nêzîkbûnan dixwazin çewisandinê li ser tevgera me û kadroyên tevgerê çêkin. Da ku wan bê biryar bikin, da ku karibin encamê bigirin. Da ku me bikişînin xet û zêhniyeta xwe. Em bikevin xizmeta wan û sîstema wan.

Ji ber ku me xwe ji xizmeta wan derxistiye, em li dijî wan sekinîne, ew dixwazin bi vî rengî careke din me bikişînin zêhniyet û xeta xwe û me bikin nav dudiliyê. Ji ber vê divê ku kadro van nêzîkbûnan baş fêm bike.

Rêber APO ji bo nirxên komînal û demokratîk ên ku mirovahiyê ji neolotîkê û vir ve, ji bo wan şer kiriye, têkoşînê dike. Ji bo demokrasiyê, wekheviyê, edaletê şer dike. Di vir de bi vê têkoşînê gelek nirxên mirovahiyê avabûne. Rêbertiyê xwe bi van nirxan re kiriye yek û ev nirx bi zanistê ve hûnand. Li ser vî esasî zêhniyeteke nû da pêşberî însaniyetê. Girêdayî wê zêhniyetê wîjdanek û exlaqek da pêşberî însaniyetê. Rêbertî gotibû “şoreşa zêhniyetê û wîjdanê.” Şoreşa zêhniyetê û wîjdanê çi îfade dike, zêhniyet îdeolojî û felsefê îfade dike. Ango di îdeolojî û felsefê de di hizir de şoreşek avakirin heye. Şoreşa wîjdan çi îfade dike, wîjdan temsîla rêxistinkirina wê ya pratîkî dike. Ango di rêxistinbûnê de, di çalakiyê de şoreş çêkirin e. Li gorî çi, li gorî zêhniyetê. Li gorî wê di exlaq de şoreş çêkirin e. Ji ber ku Rêber APO paradîgma xwe ya nû li ser çi pêşxist? Li ser sê lingan pêşxist. Felsefe yanî raman, siyaset ango pratîkbûn û yek jî exlaq e. Paradîgmaya nû li ser van hersê lingan hate avakirin. Niha li ser van her sê lingan pêşdikeve. Rêber APO ji bo xwe exlaq, siyasetê û felsefê esas digire.

Di kesayeta Rêber APO de heke mirov van hersê xalan esas bigire, mirov nirxên komînal û demokratîk yên di civaka xwezayî de ji bo xwe esas digire. Pêwist e zanist bi nirxên demokratîk û komînal yên ku di dirêjahiya dîrokê de hatine jiyîn bibe yek. Li ser vî hîmî kar bê kirin, wê mirovahiyê bikaribe bigîhêje hedefê xwe yê azadiyê. Azadî ancax li ser van esasan çêbibe.

Di nêzîkbûna Rêber APO de her dem dîrok û civak esas e. Di kongreya sêyemîn de Rêbertiyê got: “yê ku li vir tê analîzkirin ne kes e civak e, ne dem e dîrok e.” Lewra bi vê analîzê civak û dîrok ji bo xwe esas girt. Ta wê demê vê ji bo xwe esas digire û her dem xwe kûr dike. Ev Rêber APO digihîne rastiya dîrokê, civakê û mirovahiyê. Ev Rêber APO digihîne rastiya jinê, rastiya dewlet û desthilatiyê.

Bi komploya navnetewî re, êdî ew paradîgmaya ku dewletê esas digire, îdeolojî, felsefe, rêxistin, siyaset, çalakî, çand, jiyan û kesayeta wê derbeyekî mezin xwar. Li dijî komplo sekin, komplo pûç kirin, tola xwe ji komplogeran girtin, di hedefê tevgerê de serkeftin, ancax

bi li dijî sîstemê bûnê ve dibe. Te komplo fêm kir û analîz kir, te xwe ji wê sîstemê ji her aliyê ve dûrxist, te gav ji wê pêşdetir avêt, tu dikarî alternatîfa xwe pêşbixî. Wekî din ne gengaz e.

Rêber APO ji bo wê komplo kir dermanê ku komployê pê vala derxe. Ev teybetmendiyeke Rêbertiyê ye. Komplo kir wesîleya ku komployê pê pûç bike. Wiha komplo vala derket. Lê em çi dijîn? Ger em piçekî zoriyê bijîn, em dev ji her tiştî berdidin û em dibêjin "nabe." Ev jî rastiya me ye. Em tavilê xwe paş de dikişînin, dema ku em li ser erkekî bin em îstîfa dikin. Heta hinek kes zehmetiyê dikin sedema îxanetê jî. Bi vî rengî bahaneyên xwe dibêjin "filan pirsgirêk û mesele heye, zor û zehmetî heye û kes guh nade me". Van ji xwe re dikin bihane û pê diaxivin, paşê jî gav ber bi îxanetê ve davêjin û vê kiryara xwe rast û heqê xwe dibînin. Ti têkiliya yekî ji van jî bi rastiya Rêbertiyê re nîne. Rastiya Rêbertiyê zehmetiyê, pirsgirêkan, xeteriyê... dike sedemên ku karkirinê û wan ji holê radike. Xeteriya heyî mirovê bike sedem da ku rabike û pêşketinê bi xwe re çêbike. Rastiya Rêbertiyê ew e.

Milîtanên ku Rêbertiyê ji xwe re esas digirin, wê van ji xwe re esas bigirin. Wê li bihaneyan negerin û wê bihaneyan çênekin û qebûl nekirin. Wê paşê jî propagandaya wan nekin, rêxistin kirina wan nekin. Yanî ew bihane çawa li xwe daye qebûlkirin, wê li kesên din nede qebûlkirin, wê vî karî neke! Hemû bihaneyên heyî sedem in ku tu wan ji holê rakî. Rastiya Rêbertiyê ev e, yê ku milîtantiya Rêbertiyê ji bo xwe esas digire, xwediyê van nêzîkbûnan e, wê vê taybetmendiyê di xwe de esas bigire. Yanî çawa aliyê erênî dibe sedem ku tu xebatê mezin bikî, aliyê neyînî jî divê bibe sedema ku tu dîsa xebatê mezin bikî. Tê hem neyînîbûnê, hem jî erênîbûnê bikî xizmeta tevgerê. Wê demê ew tevger wê her dem serkeftinê bijî. Wê demê ti hêz nikare li pêşiya vê tevgerê xwe bigire. Ji ber ku hem aliyê neyînî, hem jî aliyê erênî tu dikî xizmeta tevgerê. Dema milîtanên wê wiha nêzîk bûn, gelo kî dikare pêşiya pêşveçûna wê tevgerê bigire?

Heke milîtanek hem aliyê erênî ji bo ku milîtaniyê bike esas bigire, hem jî aliyê neyînî ji bo ku di nav tevgerê de rabike û bike xizmeta tevgerê ji bo xwe esas bigire, ew milîtan dikare bibe milîtanekî mezin. Di nav refên PKK'ê de milîtanî wiha ye. Nabe ku weke însanên di nav civakê de ji aliyê erênî ve bandorek erênî lê bibe, ji yê neyînî ve bandorek neyînî lê bibe. Mirovek di nav civakê de

dikare wiha nêzîkî meselan bibe. Jixwe wiha jî nêzîk dibin. Lê heke milîtanek jî weke mirovê di nav civakê de bi neyînîbûnê neyînî bandor bibe, bi erênîbûnê erênî bandor bibe, ferqa wî/ê û mirovê di nav civakê de namîne. Bi vî halê xwe niha xwe milîtan dibînin, lê rastiya wan weke mirovên di nav civakê de ye.

Gelek heval di nav rêxistinê de bi vî rengî dijîn. Heke di nav rêxistinê de ewqas pirsgirêk derdikevin ji ber vê derdikevin, bi vî rengî pirsgirêk pêşdikevin. Ev vê îfade dike, taybetmendiyên ji nav civakê anîne derbasî nav rêxistinê dikin. Ger kesek van têgihîştinên ku ji civakê aniye bîne nav rêxistinê, wê ew rêxistin pirsgirêkan bijî. Ger kes dixwaze pirsgirêk çênebin, kêm bibin û bê bandor bibin, wê têgihîştinên rêxistinê di kesayeta xwe de ava bike û bide avakirin. Wê wan têgînan hakim bike. Ev jî şerê îdeolojî û rêxistinî ye. Tê çi wateyê? Tim û tim rexne û rexnedan di kesayeta xwe de pêşxistin e. Bi vê mirov dikare li hemberî wan taybetmendiyên ku ji nav civakê tên û rêxistinê girab dikin bisekine, nehêle têgihîştina tesfiyegeriyê pêşbikeve. Milîtanî ji mirov vê dixwaze û nahêle mirov weke mirovên di nav civakê de wisa bêje: “wiha nêzî min bûn, ez êşiyam, ez ketim, ez şikestim.” Ew jarbûn û bêçaretî ye. Milîtanên PKK’ê nabin mirovên jar û reben. PKK bixwe li dijî wê têgihîştinê çêbûye da ku wê rabike. Civaka xwe û însanê xwe ji wê rewşê derbixe. Kî di nav PKK’ê de cih digire, ji ber vê cih digire. Wê hem têkoşînê bike, hem jî xwe wiha belengaz bike, reben bike, bêçare bike, ev nêzîkbûn di nav PKK’ê de sûc e. Ji ber ku PKK li dijî vê çêbûye da ku van rabike. Kesayetên ku vê têgihîştinê di nav PKK’ê de pêşdixin, çawa dibin milîtanên vê tevgerê û hevalên Rêber APO!?

Mirov temaşe dike hinek piçekî zehmetiyê dibînin, yan jî astengî hebin, tavilê xwe paş de dikişînin, dest ji erkên xwe berdidin yan îstîfa dikin, yan jî direvin. Bi vî hali, xwe rast dibînin, xwe milîtan û hevalê Rêber APO dibînin. Ti têkiliya vê bi Rêbertiyê ve nîne, bi milîtantiya PKK’ê ve nîne. Milîtanê vê tevgerê dema rastî zor û zehmetiyan hat, çiqas astengî hebin jî, wê biçe bi ser wan de da ku wan rabike. Ger milîtan ew rakir, li wir pêşketin çêdibe, rêxistin pêşdikeve, mezin dibe û bi ser dikeve. Dema ev esas girt wê milîtaniyê bike. Milîtan wê weke mirovên lewaz xwe neavêje erdê. Mirovên lewaz wisa dikin, dema zoriye dibînin, tavilê xwe diavêjin erdê. Ev ti demî nabe milîtanî.

PKK Ji Bo Demokrasî Û Azadiyê Têdikoşe

Divê ku mirov xwe ji pirsgirêkên desthilatiyê dûr bixe. Ew jî bi çi çêdibe, bi zêhniyetê çêdibe. Ji bo tu bikaribî di pratîk û jiyanê de ji van pirsgirêkan dûr bikevî, pêwîst e tu di zêhniyetê de ji van dûr bikevî. Ev nêzîkbûn mirovan digihîne esasê mirovahiyê, mirov ji nexweşiyê derdixe û saxlem dike. Ji ber ku meseleya desthilatiyê di kesayeta mirovan de nexweşiyê çêdike, mirovan ji rastiya wan dûr dixe. Ji cewherê mirovahiyê dûr dixe. Ji ber wê, pêwîst e ku desthilatî û milkiyetê ji bo xwe esas negire, divê ku bi temamî xizmetê ji bo xwe esas bigire. Milîtantiya PKK'ê bi temamî li ser esasê xizmetê ye, ne li ser esasê desthilat û milkiyetê ye. Di rêveberiya PKK'ê de cih girtin jî bi temamî ji bo xizmetê ye. Ne ew cih e ku mirov lê jiyan û berjewendiyên şexsî ji bo xwe esas bigire. Lewra yê ku di zêhniyetê de xwe ji dewlet û desthilatiyê dûr nexistibe û di zêhniyeta xwe de ew paqij nekiri be, heke di rêveberiyan de cih bigire jî wê demê wê rêveberiyê bike cihê erk û milkiyetê. Wê bikin cihê desthilatiyê. Ji xebatê rêxistinê zêdetir wê ji bo xwe karan pêşbixe. Wê derfet û nirxên gel, hevaltiya tevgerê bikin xizmeta xwe.

Yê ku xwe ji zêhniyeta desthilatiyê bişo, di rêveberiya rêxistinê de bi temamî wê xizmetê esas bigire. Ti carî derfetên rêxistinê û gel naxe xizmeta xwe ya ferdî. Xwe pê mezin nake, wê wan derfetan bixe xizmeta tevger û gel. Wê tevgerê û gel pê mezin bike.

Mirov temaşe bike yê ku îdeolojî û felsefeya vê tevgerê tam fêmnekirî, di kesayeta xwe de pêkneanî, dema ku dibe rêveber tu dinêrî ji rê derdikeve. Tu dinêrî derfetên tevgerê û yên gel li dijî gel û tevgerê, ji bo xwe, ehbab û malbata xwe bi kar tîne. Li vir encamek derdikeve: Mirovê dibe rêveber wê çi esas bigire, mirovê kê bike rêveber. Divê pîvanên wê li gorî pîvanên PKK'ê pêşbikevin û li gorî yên tevgerê bin. Yanî mirov erkê bide wan kesayetên ku xwe di îdeolojî û felsefeya vê tevgerê de pêşdixin, kûr dikin da ku kar bikin. Wisa nebe û mirov her tiştî hûrûkûr di ber çavan re derbas neke, mirov wiha xweber rêveberiyê bide mirovan, ev xeteriyê û xerabiyê çêdike. Di hinek rêveberan de heke pirsgirêk tên jiyîn, ji ber vê ye. Wiha di vesazkirinan de, bi ser guhê xwe re avêtin, cidî li ser nesekinandin, pîvanê tevgerê esas negirtin, dihêle ku pirsgirêk, xeterî û şaştî derkevin.

Di sazkirina rêxistinê û rêveberina wê de, mirovê bi temamî çi esas bigire? Bi temamî wê zêhniyetê esas bigire. Divê mirov cih

bide wan kesayetên ku wê zêhniyeta nû esas digirin û li ser kûr dibin. Divê ku mirov rêveberiyê nede wan kesayetên ku xwe kûr nakin, pêşnaxin û nêzîkî rêxistinê nabin, da ku xerab nêzîkî tevgera PKK'ê nebin û xirab nebin.

Niha di vir de hinek pirsgirêk hene. PKK ne tevgereke ku desthilatiyê esas digire ye. Endamên wê û milîtanên wê desthilatiyê ji bo xwe esas nagirin. Lê di pratîka me de hinek pirsgirêk di van xalan de derdikevin. Yan jî tu dinêrî yê ku zêhniyeta vê tevgerê di kesayeta xwe de pêknayîne, bi derfetên rêxistinê desthilatiyê dike. Ji ber wê derfetên rêxistinê li dijî tevgerê û gel bikartîne. Dibe desthilatek û derdikeve, dibe axa, paşa yan jî dibe çete û wiha nêzî tevgera gel dibe. Ji rêveberiyê vî fêm dike. Ji ber ku di xwe de zêhniyeta tevgerê pêkneaniye. Yan jî ji ber ku neketiye nav zêhniyeta vê tevgerê û zêhniyeta vê tevgerê fêm nekiriye, rêveberiya vê tevgerê wekî rêveberiyeke desthilat dibîne. Ji ber wê wiha nêz dibe. Ji ber wê jî şerê desthilatiyê dike. Yan jî dibêje rêveberî cihê desthilatiyê ye. Bin navê ji neqebûlkirina desthilatiyê ji rêveberiyê direve. Erkan nagire ser milê xwe, wê jî bi çi rave dike û dibêje, "ez li dijî desthilatiyê me, ji ber wê ez naxwazim di rêveberiyê de cih bigirim." Yanî rêveberiya vê tevgerê wekî rêveberiyeke desthilat dibîne. PKK'ê rêxistineke ji bo desthilatiyê şer dike dibîne, wiha nêzîk dibe. Ev her du nêzîkbûn jî şaş in û xeter in.

PKK ne rêxistineke ku desthilatiyê ji bo xwe esas bigire, ji bo wê şer bike ye. PKK ji bo demokrasiyê û azadiyê şer dike. Ji bo jiyaneke azad, kesayeteke azad û civakeke azad pêşbixe şer û têkoşînê dike. Lewra ev tevger ne ya desthilatiyê ye, rêveberiya wê jî ne cihê desthilatiyê ye. Ne jî kes dikare PKK'ê û rêveberiya PKK'ê wek cihê desthilatiyê bibîne, ne bi vî rengî nêzîkbûn, ne jî ji erken rêveberiyê rev rast e. Ev her du jî şaş in û li PKK'ê, rêxistinê û Rêbertiyê heqaretkirin e. Ev bizanebûn be, bêzanebûn be, ji bo Rêber APO û PKK'ê dijminiyê îfade dike.

Milîtanên PKK'ê, ti caran PKK'ê cihê desthilatiyê nabînin. Yên ku PKK'ê wisa dibinin, dema ku bûn rêveber, xwe dikin desthilat û her tiştî qurbanî xwe dikin. Milîtanê/a PKK'e ne xwe ne jî rêxistinê cihê desthilatiyê dibîne, ji desthilatiyê direve, lê xwedî erkê rêveberiyê derdikeve. Ji erkên rêveberiyê rev û qaşo li dijî desthilatiyê sekin, di nav PKK'ê de heman tişt in. Yên ku van têgihîştinan dihewînin, xwe wisa didin diyarkirin ku ev her du têgihîştin pir cuda ne, li dijî hev

in, lê di esas de heman têgihîştin in. Yek xwe çep dide diyarkirin, yek jî xwe rast dide nîşandan. Yek jê dixwaze wê bişuxulîne, yek jî jixwe ve jê direve. Lê di fêmkirina PKK'ê û rêveberiya wê de, nêzîkbûna her du yan jî weke hev e. Lewra her du jî xeter in.

Yek ji ber ku wê desthilat dibîne û wiha nêzîk dibe, li wir paşatî û desthilatiyê ava dike, dixwaze koletiyê ava bike, hemû derfetên tevgerê dixe xizmeta xwe. Kêfa wî/ê çawa bixwaze wiha nêzîk dibe. Ya din jî jixwe ve ji bo ku di desthilatiyê de cih negire, rêxistin û rêveberiya rêxistinê wiha dide diyarkirin, wisa diaxive, nîqaş dike, propoganda dike, rêxistin û rêveberiya rêxistinê şaş dide nasîn, dixwaze nerazîbûnê pêşbixe. Wisa dixwaze rêxistiniyan pêşbixe, dixwaze rêxistin û rêveberiya rêxistinê bi vî rengî pûç û bêbandor bike. Di encamê de her du jî ji bo rêxistinê tiştên neyînî derdixin.

## Kapîtalîzm Mirovahiyê Tune Dike

Xwe ji jiyana ku dewlet li ser avabûye, ji kesayeta nexweş, ji civaka nexweş qut kirin, xwe gihandina saxlemiyê ye. Xwe ji texrîbatên xwezayê, civakê û mirovahiyê dûr xistin, xwe ji civakbûna bajar dûrxistin, li ser bingehê ekolojiyê, azadiya jinê û demokrasiyê civak û kesayeteke azad ava kirin e. Ji dewletê û jiyana li ser esasê dewletê avabûye dûrketin, di xwe de civakeke nû sîstemeke nû pêşxistin, bi xwezayê re yekîtî û aşitiya xwe çêkirin ji bo azadiyê esas e. Bi jinê re jiyaneke li ser bingehê azadî û wekheviyê pêşxistin pêwîst e. Zanist û teknîk ji bin xizmeta dewlet, desthilatî û şer de derxistin ji bo serkeftinê pêwist e.

Di xwe de kesayeteke li ser bingehê exlaqê pêşxistin pêwîst e. Ji ber ku ew kesayeta ku di nav civaka li ser bingehê dewletê avabûye, mirovan ji her aliyê ve dike dijminê xwezayê, yê jinê û mirovahiyê. Ew kesayet nexweşî û mirinê çêdike. Kesayeteke wiha ne xwedî exlaq e. Di roja me ya îro de sîstema kapîtalîzmê dewlet di asta herî jor de ji bo xwe esas girtiye, li dijî civakê, dîrokê, demokrasî, aşitî û azadiyê disekine. Li dijî xwezayê û jinê disekine.

Kapîtalîzm çi pêşdixe? Bi demê re mirovahiyê tune dike û dikuje. Ti carî di dîroka mirovahiyê de bêexlaqî qasî ya dema kapîtalîzmê pêşneket. Ti carî wisa rûxandin bêeman nebû ye û mirovahî ji rastî û koka xwe dûr neketiye.

Rêber APO serkeftina mirovahiyê di zarokatiya mirovahiyê de dibîne. Zarokatiya mirovahiyê çi ye? Destpêka mirovahiyê ye, ango

civaka xwezayî ye. Serkeftinê bi temamî di wê de dibîne. Serkeftinê dîsa di dîroka gelan de dibîne, di ya bindestan de, di têkoşîna wan de, nirxên ku wê têkoşînê avakiriye de dibîne. Rêber APO li serkeftinê di azadiya jinê de, di zarokan de, di kalan de, di xeyal, daxwaz û hestên wan de digere, di vir de dibîne. Rêber APO kesayeta ku dixwaze ava bike li ser van esasan dixwaze ava bike. Civaka ku dixwaze pêşbixe, li ser van esasan pêşdixe. Zarokatiya mirovahiyê ango civaka xwezayî têkoşîna gelan ya bindestan, nirxên ku di wê têkoşînê de çêbûne, li ser wî esasî azadiya jinê û fedakariya jinê, hestên zarokatiyê ku tê de bi temamî pakbûn heye, aşitî, azadî û wekhevî heye, dîsa ji ber ku di jiyana kalan de tecrûbeyek û daneheveke mezin heye, ango tecrûbe û daneheva mirovahiyê ji bo xwe esas digire. Li ser van esasan dixwaze kesayetên civakê pêşbixe. Ev îfadeya şoreşa mezintirîn ya di zêhn, wîjdan û exlaq de dike. Redkirina sîstemê ji her milî ve îfade dike, di heman demê de îfada peşxistina sîstema nû dike. Ev ji bo mirovahiyê şoreşa mezintirîn e. Ev îfada berpirsiyarî û erkên çaxa duyemîn bi awayekî kûrtir, firehtir û girantir lê xwedî derketin û dana pêşberî xwe ye. Wateya vê ew e ku ji berê zêdetir li dijî zorahiyan, astengiyan sekinîn û dijwariya têkoşînê îfade dike. Ev ji dema berê zêdetir êşan îfade dike.

Bi çêbûna sêyemîn re berpirsiyariyên me kêm nebûn, li gorî berê derfetên me jî kêm nebûn. Heta mirov nikare bi yên berê re muqayese jî bike. Ji her rexekî ve êş û berdêl zêde dibin, hem jî xeterî mezin dibin. Pê re erk û berpirsiyarî jî zêde dibe, ev wiha rehet çênebûye.

Çima ez van dibêjim? Ji ber ku gelekan wiha fêm kir, bi çêbûna sêyemîn re êdî têkoşîn pêwîst nake. Heçku ku em gihîştine hedefên xwe û êdî xeterî zêde nemane. Lewra têkoşîn zêde ne pêwîst e. Lewma keyfiyet, bêberpirsiyarî jiyîn dan pêşberî xwe. Lê ya rastî tam berovajiyê vê bû. Me cîhana heyî red kiribû, li dijî wê cîhanê em sekinî bûn. Me cîhaneke din dabû pêşberî xwe, rastî ev bû. Berpirsiyariyên me ji berê zêdetir çêbibûn. Berê me çend demjimêran kar dikir, lê li gorî çêbûna sêyemîn, stratejî û paradîgma nû pêwîst bû em bîst demjimêran kar bikin. Heke em wiha kar bikin, em dikarin encamê bigirin. Lê em weke berê kar bikin, tempo, uslub û şêwazê me weke yê berê be, ne gengaz e em paradîgmaya nû, stratejî û taktîka wê pêkbînin. Ne gengaz e em encamê bigirin.

Hin kesan ast ji ya berê nizimtir kir û paş de kişand. Şêwaz, tempo û uslub paş de kişandin. Lewra vê xeteriyeke mezin di nav me de pêşxist. Pêwîst bû şêwaz, tempo û uslubê berê red bikiriban, ji gavên berê mezintir gav bavêtan. Bi vî rengî bûya meyê zêde pirsgirêk nejiyaban. Em li dijî wan êrîşên pêşdikevin rawestiyaban, meyê xeterî zêde nejiyaba; lê ji ber ku hinek kesan asta berê jî neparastin, em beramberî pirsgirêkên cidî hatin.

Lewra paradîgmaya nû ji ya berê zêdetir çalakiyê dixwaze, xebatê dixwaze û berpirsiyarî pêkanînê dixwaze. Wiha nêzîkbûnên keyfî naxwaze.

Ya rastî Rêber APO di vê çêbûnê de çalakî û xebata xwe xurtir kir. Hem jî di mercên Îmralî de, di şert û mercên herî giran de di nav bêderfetiyê de, di nav wehşiyetê de ew pêşxist. Hizirek û lêhûrbûnek mezin pêşxist. Encama wê jî gihande tevgerê.

Lê ya bi me re pêşket çi bû? Şert û mercên me ne weke yên Rêbertiyê bûn jî, em bi temamî berovajiyê Rêbertiyê tevgeriyan. Vê hişt ku em dûrî Rêbertiyê bikevin, ji gelek aliyan ve di navbera me û Rêbertiyê de qutbûn çêbin. Komploya navnetewî xwest ji vê faydê bibîne û encamê jê bigire. Tesfiyegeriya di nav me de jî li ser wî esasî pêşket û ji vê nêzîkbûnê fayde girt. Bi alîkariya komplogeran ve, xwestin wisa encamê bigirin. Heke tesfiyegerî pêşket û me pirsgirêk jiya, sedema wê ev bû.

Rêber APO çêkirina hest, fikir, ruh û şêwazê wê ji me dixwaz e. Rêber APO di şert û mercên Îmralî de, her dem dixebite ka wê xurtkirina moralê, baweriyê û vînê çawa bide tevgerê û gel. Tim û tim kar dike da ku vîn bihêz bibe, şikandin çênebe, belavbûn, radestbûn û wenda kirin çênebe. Rêber APO vê ji xwe re esas digire.

Di şoreşgeriyê de ev erkeke bingehîn e. Yê ku vê peywirê pêkneyîne, peywirên girêdayî vê yekê jî nikare pêkbîne. Bixwaze pêkbîne jî, wê bê encam bimîne. Ji ber ku dema te di kesayeta xwe de moral ava nekir û çênekir, di însanê xwe de moral pêşnexist, tê çi bikî, însanên te wê çi bikin? Tu nikarî gavekê jî bavêjî, ew mirov jî nikarin gavekî bavêjin. Ger te moral bawerî hest, fikir, ruh û şêwazê wê çêkir, di serî de di kesayeta xwe de, wê demê tu dikarî di mirovên dorberên xwe de jî çêbikî. Ger te ew çêkir tu dikarî kar bikî û encamê ji kar û xebata xwe bigirî. Gelo di mirovekî de moral û bawerî nebe dikare kar bike? Ew kesayet karekî nake, tu bi zorê karekî lê bidî kirin jî, karê dike encamê nagire.

Îrade bi çi tê xurtkirin, dema mirov hest, fikir û ruhê xwe xurt kir, şêwazê wê pêkanî û pratîka wê xurt kir, wê demê mirov dikare bihêz bibe. Weke din vîna mirov xurt nabe. Îrade lewaz dimîne û ew îrade dişkê û radest dibe, ji bo wê diçe îxanetê.

Niha Rêbertî moral û baweriyê bihêz dike, em jî hevalên Rêbertiyê ne, her roj em bêmoraliyê, bêbaweriyê pêşdixin. Gelo ev çima wisa ye? Ev bi zanebûn û bêzanebûn li dijî Rêbertiyê sekin e. Li dijî gel û azadiyê sekin e, vê îfade dike, heke bi rastî tu hevalê Rêbertiyê yî, tê her dem îradê di xwe de xurt bikî da ku tu di derdorê xwe jî xurt bikî. Cihê ku îrade lê xurt dibe pêşketin, têkoşîn lê çêdibe û pêşdikeve. Jixwe têkoşîna me bi temamî têkoşîna îradê ye, ger te her roj îrade bihêz nekir, ew têkoşîn nameşe û wê bişikê. Binêrîn dijmin her dem kar dike da ku îradê bişkêne. Ji ber wê her dem dixwaze bêbaweriyê pêşbixe. Dixwaze bêmoraliyê pêşbixe. Lewma ewqasî şerê taybet dide meşandin. Ka wê çawa bêmoraliyê û bêbaweriyê pêşbixe, pê re îradê bişkîne. Di vir de şerek dijwar tê meşandin. Ger dijmin wê dike, tê jî îradê her dem bihêz bikî. Ger te îrade xurt kir, tu dikarî têkoşînê bimeşînî. Ger wiha nebe negengaz e têkoşîna mirov biserkeve. Mirovê binkeve.

Di şoreşgeriyê de pêngava yekemîn çî ye? Her dem îrade bihêzkirin e. Pêngavên duyemîn û yên sêyemîn hemû li ser vê tê pêşxistin. Niha tu dinêrî di gelek hevalan de moral û bawerî nîne, dibêjin em milîtan in û hevalê Rêbertiyê ne. Bi vî rengî mirov nabe hevalê Rêbertiyê, ji ber ku Rêber APO di şert û mercên Îmralîyê de jî her dem moral û baweriyê çêdike. Tim baweriyê bihêz dike. Lê şertê te ne ew in jî, çawa tu wiha dibî hevalê Rêbertiyê? Tu berovaj î, li dijî Rêbertiyê yî! Ji bo wê di nav PKK'ê de bêbawer û bêmoral mayîn, radestbûn û bêîrade bûn e. Ev suc in, ji ber ku dijmin dixwaze bi însanê Kurd û milîtanê PKK'ê van bide kirin. Dijmin her demê dixwaze îradeya me bişkîne, lewra bêbaweriyê û bêmoraliyê li ser me dide meşandin. Da ku bikaribe encamê bigire. Di nav PKK'ê de bêbawer, bêmoral mayîn, daxwaziyên dijmin pêkanîn e û bêbiryar bûn e.

Hin kes di nav vî sucî de dijîn û dibêjin "ez hevalê Rêbertiyê me, milîtanê Rêbertiyê me". Di vir de xapandineke mezin tê kirin, divê ku ev tespît hemû bên rastkirin. Milîtan wê li gorî Rêber APO xwe çêbike, wê di kesayeta xwe de radestbûnê rabike! Wê hingê dibe milîtanê PKK'ê.

Milîtanê Rêber APO wê her dem hestan di kesayeta xwe de mezin bike, hest, fikir û ruhê azadiyê wê di xwe de mezin bike. Wê tim şêwazê rêxistin û çalakiya mezin bike. Di serî de wê di kesayeta xwe de mezin bike, da ku karibe van pêkbîne. Ger mirov di kesayeta xwe de çi ava kir û di kîjan astê de çêkir, wê di pratîka xwe de jî wê pêkbîne. Ji ber wê dibêjin 'pratîk rastiya mirov e' yên din hemû axaftin in. Tiştên mirov di kesayeta xwe de çêdike, heman tiştî di pratîka xwe de jî wî dike.

Carna di pratîkê de şaşitî derdikevin, dibêjin "çawa wisa bû, min baş fêm kiribû, lê di piratîkê de şaş pêkhat." Lê ya rastî ew e ku fêm nekiriye. Ger fêm bikira di pratîkê de şaşitî dernediketin, ger rast hatiba fêmkirin wiha şaşitî di pratîkê de dernediketin. Şaş fêmkirin dibe sedema şaş pêkanînê. Tiştê mirov baş fêm nekiribe wê çawa di pratîkê de rast bike. Mirov ti demê nikare rast pêkbîne. Ji ber wê pratîk rastiya mirov e, mirovê li pratîka xwe temaşe bike, wê rastiya xwe fêm bike. Rastiya mirov pratîka mirov bi xwe ye.

## SEDEMÊN PÊŞKETINA KOMPLOYA NAVNETEWÎ ÇI BÛN?

Komploya navnetewî çima pêşket û sedemên wê çi bûn? Sedem ew bû Rêber APO ji aliyê civaka binî ve, yanî ji aliyê gel ve, ji rexê yên ku bindestiyê dijîn û zilmê dibînin ve hate qebûlkirin. Her ku çû ev qebûlkirin pêşket û mezin bû. Rêber APO û tevgera wî ji bo van gelan bû hêvî û çira vejînê. Tevger û fikirên Rêbertiyê bi demê re ji çarçoveya Kurdistanê û ji ya Rojhilata Navîn jî derket. Ber bi çarçoveya cîhanê ve bû hêviyek mezin. Bo hêviya azadiya mirovahiyê. Lewra ji bo civaka jorîn bû xeteriyek. Yanî ji bo sîstema desthilatdar bû xeteriyek. Lewra Rêber APO bû hedef, çawa ji bo gelên bindest û mirovahiyê bû hêviya azadiyê û serkeftinê, ji bo desthilatdaran û sîstema wan jî bû xeteriyeke mezin. Di encama vê yên di nav sistemê de dijîn, yên berjewendiyên wan di sîstemê de heyî, hemûyan Rêber APO û PKK ji xwe re kirin hedef. Ger bû hedef ji bo wê bû hedef. Di komployê de dewletên kû pêşengiya sîstema kapîtalîst dikin, heya dewletên dagirker, ji İİsraîlê bigirin heya Misrê, ji xayîn û hevkarên dagirkeran bigirin heya PDK û YNK'ê hemûyan cîh girt. Ji ber ku ev hemû di nav sîstemekê de dijîn. Berjewendiyên wan hemûyan yek in. Ji ber wê hemûyan dest dan hev û li dijî PKK'ê û Rêber APO sekinîn. Ji ber ku Rêber APO û tevgera wî ji bo wan hemûyan xeterî çêdikir.

Rêber APO rastiya van hemûyan derdixist pêşberî çavê gelê Kurd û mirovahiyê. Hesab ji wan dipirsî, ji ber ku rastiya wan û sextekariya wan derdixiste holê, hesab dipirsî û her roj derbeyek li wan dixist û rewşa wan eşkere dikir, êrîşî Rêbertiyê kirin. Dîtin ku nikarin li pêşiya Rêbertiyê bigirin, wê hemû ziyanê bibînin, hemûyan bi hev re xwe kirin yek û li dijî Rêbertiyê sekinîn. Ji ber van sedeman ew komploya navnetewî pêşket. Rêbertî û tevgera ku pêşketî ji bo wan xeter bû, di heman demê de rêbertiyeke mezin bû, hêviyeke bêhempa bû ji bo mirovahiyê û çareserkirina pirsgirêkên mirovahiyê. Heke Rêber APO û tevgera wî ewqasî ji bo çareserkirina pirsgirêkên mirovahiyê bûye hêvî, wê yên li dijî wî jî mezin bibin û mezin bisekinin. Ji ber wê komploya navnetewî wisa mezin pêşket. Ger Rêbertî û tevgerê ji bo wan xeteriyeke wiha mezin çênekiriba, bi vî awayî komplo pêşnediket. Ewqas hêzê di nav komployê de cih nedigirt.

Komplo li dijî çi pêşket? Li dijî fikir û jiyana azad pêşket. Li dijî kesayet, civak û jina azad pêşket, li dijî van hemûyan komplo pêşket. Ango li dijî azadiyê pêşket. Xwestin li pêşiya azadiyê bigirin. Xwestin li pêşiya hêviya azadiyê bigirin, li hemberî tevgera mirovahiyê ya ku pêşketiye bigirin û wê vala derxin. Da ku mirovahî azadiyê ji bîr bike. Ew hovîtî ji bo vê pêşket û li dijî vê pêşket. Nexwestin ku kesayeteke azad, civakeke azad û jiyaneke azad pêşkeve. Nexwestin ku jin azad bibe. Nexwestin hizirê azadiyê di nav mirovahiyê de xurt bibe û mirovahiyê bike nav tevgerê.

Kesayet Bi Nirxên Demokratîk Û Komînal Tê Avakirin

Rêber APO di nav sîstema Îmralî de, çi pêşxist? Di zêhniyeta xwe de aliyê dogmatîk çi ne? Yanî aliyên ku nahêlin Rêbertî pêşbikeve û dubarebûnê dide çêkirin, li pêşiya pêşketinê digire, rexên wî yên girtî û muhafezekar çi ne? Rexê bêencam dihêle, ne îlmî ye, rexên kevinbûyî û êdî kêr nayê û xizmetê nake, yan jî yên kêm dimînin û kevinbûyîne çî ye? Ji van rexnan hemûyan kesayeta xwe pak kir. Sedemê derketina van hemûyan çî ye? Ev hemû çavkaniya xwe ji zêhniyeta ku di bin bandora dewlet, desthilatî şer de maye digire. Hemû encamên vê zihniyeta kevin in. Rêber APO xwe ji vê zêhniyet, çand, exlaq, jiyan, rêxistin, siyaset, çalakî û kesayetê xilas kir. Kesayeta xwe li ser cewherê xwe ji nû ve ava kir. Bi nirxên demokratîk û komînal re xwe ava kir. Sîstema xwe li ser vî esasî çêkir û pêşxist. Rêber APO di vir de gavên mezin avêt û encam girt. Tiştê ku Rêbertiyê di sîstema Îmralî de kirî ev e.

Sîstema xwe li ser esasê civaka ekolojîk, demokratîk û azadiya jinê girte dest û pêşxist. Sîstema xwe bi temamî li ser wî bingehî ava kir. Di nav sîstema Rêber APO de demokrasî pergalek bi serê xwe ye û cuda ye. Derveyî dewletê ye, ne parçeyekî ji dewletê ye. Demokrasî ew civaka ku li derveyî dewletê ye. Di têgihîştina Rêbertiyê de tarîfa demokrasiyê ev e. Ev alternatîfa sîstema dewletê ye.

Rêber APO di nav sîstema Îmralî de, di wê navengê de, nav wan şet û mercan de, xwe ji nû ve çêkir. Hêza çareseriyê di xwe de ava kir û pêşxist. Rêxistin û kadroyên, milîtanên vê tevgerê, gel û mirovahî li ser vî bingehî ji nû ve xwest ku çêbike û çêdike. Ji lewra îdeolojî, felsefe, siyaset, rêxistin, têgihîştin, çalakî, exlaq, çand, kesayet, jiyan, parastina wê ya rewa û civaka wê pêşxist, kete nav têkoşîna wê de. Ev jî çawa îfade kir, got “şoreşa zêhniyet û wîjdanê.”

Ya ku mirov pir dide fikirandin jî ev e: ka Rêbertî li dijî wehşiyetê çawa li ser lingan disekine û nakeve? Lewra Rêbertiyê got. "Ez her roj dibe ku sî-çil-pêncî şoreşên zêhnî di kesayeta xwe de çêdikim, ez hêza xwe wiha ava dikim. Hêza min di vir de ye, wisa li dijî vê wehşiyetê disekinim. Da ku hûn jî nebin qurbanên sîstemê, divê ku her roj hûn jî wiha şoreşê di zêhniyeta xwe de çêbikin. Da ku sîstem li ser we bandorê neke û hûn nekevin xizmeta wê. Îro ez li Îmraliyê di nav van şert û mercan de, bin zilmê de, sîstem dixwaze min dîl bigire, lê ez teslîm nabim, ez berxwedana xwe dikim; hem jî ne tenê berxwedanê dikim, şoreşê jî pêşdixim. Ez nahêlim sîstem li ser min bandorê bike. Ez wê sîstemê pergaleke ku mirov bikaribe tê de bijî nabînim, ez wê jiyanê, jiyan nabînim. Ji ber vê dilbijandina min jê re nîne. Ez heke nehatibama vir û ev wehşiyet min nedîtiba, dibe ku min nekariba vê şoreşê pêşbixim. Ew wehşiyeta heyî bû sedem ku ez vê şoreşê bijîm û bidim jiyîn." Rêbertiyê ev ji bo xwe got.

Lewma milîtanê vê rêxistinê wê çi bikin; wê her roj weke Rêbertiyê kirî di zêhnê xwe de şoreşê çêkin. Da ku nehêlin sîstem li ser wan bandorê bike û nekevin xizmeta sîstemê. Da bikaribin tim li dijî sîstemê bisekinin û sîstema xwe pêşbixin. Lê niha hinek dibêjin "em milîtanên vê Rêbertiyê ne" lê qet di zêhnê xwe de şoreşê çênakin û her dem xwe nû nakin. Her dem li dijî sîstema desthilat û modernîteya kapîtalîst hêzê di kesayeta xwe de çênakin. Heta berê xwe didin wê sîstemê ka çawa wê sîstemê bijîn. Hinek kes vê bizanebûn dikin, hinek jî bêzanebûn dikin. Sîstem her dem di êrîşê de ye û texrîbatan dike, bandor dike û dikişîne nav xwe. Li dijî wê heke tu xurt nesekinî, ji her aliyekî ve xwe ji sîstemê qut nekî, xwe her dem nû nekî, tu nikarî li ser wî esasî li dijî wê sîstemê bisekinî. Wê demê sîstem wê te bike xizmeta xwe.

Hevaltiya bi Rêbertiyê re li ku dest pê dike, dema mirov xwe ji her aliyê ve ji sîstemê qut kir, hevaltî bi Rêbertiyê re dest pê dike. Bi wê redkirinê re dest pê dike, li ser wî esasî her dem xwe nûkirinê de dest pê dike. Yê ku ew di kesayeta xwe de pêkaniye, dikare hevaltiyê dewam bike. Lê yên ev nekiribin di niyeta wan de hevaltî hebe jî, nikarin hevaltiyê bikin. Ev nêzîkbûn bi niyetê nabe. Sîstema heyî bihêz e, hemû derfetên xwe bikartîne. Li dijî alternatîfên xwe her tim di nav êrîşê de ye. Timî civakbûnê xerab dike. Hemû zemînên demokrasiyê û nirxên komînal texrîb dike. Heke mirov

van taybetmendiyan her dem nejî, wan di xwe de xurt neke, mirov nikare li hemberî wê sîstemê bisekine û mirovê bikeve bin xizmeta wê. Ger mirov naxwaze bikeve xizmeta wê, wê weke Rêbertiyê tim têbikoşe, di kesayeta xwe de nûbûnê û hêza çareseriyê çêbike. Dive her dem mirov çekên xwe çêbike da ku timî li dijî sîstemê bisekine. Pêwîst e mirov nekeve xizmeta wê sîstemê.

Parêznameyên Rêbertiyê Haveynê Mirovên Azad e

Rêber APO di parêznameya xwe ya yekemîn de çi esas girt? Wê li Îmraliyê pirsgirêka Kurd bi kîjan rêkê çareser bibe, ev ji xwe re esas girt. Ji ber ku weke din derfetên parastina xwe pêşbixe nebûn. Parastina pêşxistî jî li ser wî esasî tenê jî pêşnexist. Navengeke wê nebû ku xwe biparêze. Rêwşeke lîncê û heqaretê hebû. Şanoyeke ku Rêbertiyê biçûk bixe hatibû hazirkirin. Dixwestin rolekî jî di wê şanoyê de bidin Rêbertiyê. Lê Rêbertî nehat vê listikê û nekete wê şanoyê. Ji ber wê Rêbertiyê parastina xwe nekir. Çi kir, got: “heke hûn dixwazin pirsgirêkên Kurd çareser bikin, bi vî awayî dibe.” Wê Komara Tirkiyê çawa demokratîk bibe, wê çawa bibe komareke demokratîk, pirsgirêkên Kurd bi kîjan rêkê wê çareser bibe destnîşan kir. Rêbertiyê ew da pêş, da diyarkirin ku heke pirsgirêka Kurd çareser nebe, Komara Tirkiyê demokratîk nabe. Berjewendiyên Tirkiyê û gelê Tirk di ku de ye, ew da pêş. Xwest ku dewletê, tevgerê, gelê Tirk û Kurdan jî bikşîne rêkên çareseriyê. Ji ber wê ew parêznama destpêkê li ser wî esasî pêşxist û wê parêznamê xizmeta vê têgihîştinê kir. Parêznama esasî bi parêznama DMME’ê pêşket. Rêbertiyê bi berxwedana xwe ew êrîşa komplogeran vala derxist, ji bo xwe derfet çêkir, wê demê parastin jî pêşxist. Jixwe parêznama DMME’ê çi îfade dike, li dijî komplo sekinê îfade dike. Ji ber wê analîzên sîstemê di wê parêznamê de pêşxist. Wê paradîgma nû li ser çi esasî pêşbixe; hîmê wê yê teorî pêşxist. Di wê parêznamê de paradîgma dewletê esas digire, rexne kir. Paradîgma sosyalîzma pêkhatî ya dewlet û desthilatiyê esas digire, li wir bi wêrekî, bi kûrbînî û radîkal rexne kir. Paradîgmaya heyî û zêhniyeta heyî rexne kir. Ji bo wê hîmê paradîgma nû di wê parêznamê de hate avêtin. Parêznama DMME’ê rolek û peywireke wiha pêkanî. Analîza sîstemê û rexnekirina hemû pratîkên heyî kir. Heman demê bi navê xwe, bi navê PKK’ê û mirovahiyê rexnedana wê pêşxist. Lewra ji aliyê teorîk, felsefîk û îdeolojîk ve hîmeke pir bihêz pêşxist.

Bi parêznama Atînayê parastina mirovê azad pêşxist. Li ser vî esasî di hedef û armancên Rêber APO de çi heye? Însanê azad pêşxistin heye, li ser wî bingehî civakeke azad pêşxistin heye. Dema tu mirovê azad pêşnexî, tu nikarî civaka azad pêşbixî. Heke Rêbertiyê piştî parêznameya DMME'ê parêznameya mirovê azad pêşxist, parêznameya xwe li ser wî esasî û bi wî navî pêşxist, ew girêdayî hedefên Rêber APO bû. Ji ber ku di hedefên Rêber APO de mirovê azad û civaka azad çêkirin heye. Ew jî bi jiyaneke azad çêdibin, jiyana azad bi çi çêdibe? Bi zêhniyetê çêdibe. Ger te zêhniyeta wê pêşxist, li ser wî esasî îdeolojî, felsefe, li gorî wan siyaset û çalakiya wê te pêşxist, tu dikarî jiyana azad, kesayet û civaka azad pêşbixî.

Lewra bi parêznameya DMME'ê bingehê wê yê teorîk, îdeolojîk û felsefîk pêşxist û li ser wî esasî vê carê parêznameya însanê azad pêşxist. Eger bala we kişandibe, di wê parêznamê de çi pêşxistiye, şemaya rêxistinê pêşxistiye. Ango li gorî wê îdeolojî, felsefeyê, pêwîst e rêxistineke çawa pêşkeve, şema û çarçoveya wê pêşxist. Lê hîna hundirê wê tije nekiribû, tenê şemaya wê çêkiribû. Mirov dema avahiyekî çêdike di serî de tu bingehê wê çêdikî, paşê tu şemaya wê çêdikî, tu piştî van lêkirina avahiyê didomînî. Rêbertiyê ew gav avêt. Mirov bala xwe bidiyê gav li ser gavê davêt. Li gorî wê îdeolojî, felsefe û rêxistinek çawa dixwaze pêşbixe, di parêznameya Atînayê de ew diyar kir û çarçoveya wê danî.

Piştî wê Parastina Gelekî pêşxist. Ew gava jî li ser gavên din temam kir. Ango civakeke azad çawa dixwaze pêşbixe, li ser însanê azad, hizir û felsefa azadiyê esas digire. Civakeke çawa dixwaze pêşbixe, di wê parêznamê de parastina civaka azad pêşxist. Hem parastin û çêkirina wê, hem wê çawa pêşbikeve diyar kir. Wê çawa bê pêşxistin ew pêşxist. Di vê parêznamê de ew gava di aliyê teorî de di aliyê îdeolojîk, felsefîk de bi DMME'ê re avêtibû, lê kûrtir kir. Ew gavên ku di aliyê rêxistinê de avêtîbûn jî, kûrtir kir. Sîstema di aliyê rêxistinî de û hem jî di aliyê sîstemê de, dixwaze pêşbixe li ser çi esasî dixwaze pêşbixe ew pêşxist. Hem di aliyê îdeolojîk û felsefîk de kûrbûnek çêkir, hem jî di aliyê rêxistinî û siyasî de pergala xwe pêşxist û zelal kir. Li gorî xwe dixwaze pergaleke çawa, rêxistineke çawa pêşbixe, ew pêngav pêşxist, ew kûrtir kir.

Paşê di notên hevdîtinê de jî kêmaniyên wê temam kir. Ger bala hevalan kişandibe, sîstema KCK'ê di Newroza 2005'an de îlan kir.

Heta wê demê ew pergal îlan nekiribû. Ji ber ku heta wê demê bi parêznama, bi hevdîtinan pergala xwe pêşdixist. Dema ku temam kir û zelal kir, wê demê îlana wê jî kir. Di kîjan rojê de, di Newrozê de ew îlan kir. Ji ber ku Newroz ji bo Kurdan rojeke dîrokî ye, di wê roja dîrokî de îlan kir.

Di kesayeta Rêbertiyê de her dem bi dîrokê re têkilî çêkirin bingehîn e. Roja ku tê de dijî, her tim bi dîrokê ve dide girêdan. Mirov vê di hemû nêrînên Rêbertiyê de dibîne. Dema ku li ser îro disekine, her dem girêdana wê bi dîrokê ve çêdike. Mirov di Rêbertiyê de ji dîrokê qutbûnê nabîne. Her dem dîrokê esas digire û têkiliya îro bi roja derbasbûyî û bi paşerojê re çêdike. Di kesayeta Rêbertiyê de ev esas e. Di hemû analîzan de mirov dikare vê taybetmendiyê bibîne. Ji ber wê sîstema xwe di Newrozê de îlan kir. Newroz ji bo Kurdan çi îfade dike, rojeke nû îfade dike, dîrokeke nû îfade dike. Sîstema Rêber APO pêşxistibû jî nû bû. Di rojeke wiha de îlankirin guncav e. Çima weke din îlan nekir û di Newrozê de îlan kir? Ji ber wê taybetmendiyên Newrozê îlan kir, ji ber ku Newroz jî rojeke nû îfade dike, azadiyê îfade dike. Di dîroka Kurdan de çaxek û serdemeke nû îfade dike. Ji ber wê Rêbertî fikreke nû, sîstemeke nû pêşxist. Lewra di Newrozê de îlan kir, têkiliya wê bi Newrozê re da çêkirin, di heman demê de bi dîrokê re jî da çêkirin.

Gelo çima Rêbertiyê berê ew sîstema xwe îlan nekir? Ji ber ku berê sîstem ji her aliyî ve zelal nekiribû. Dema bi parêznameyan û notên hevdîtinê zelal kir, temam kir, sîstema xwe îlan kir. Ew jî ancax 2005'an de temam bû. Di Newroza 2005'an de temam kir. Lewra ala wê jî da diyarkirin. Heta wê demê bala xwe bidinê îlan nekir, dema temam kir û îlan kir berpirsiyariya wê jî da ser milê xwe.

Yên ku Rêber APO esas digire wê van rastiyan baş fêm bikin. Wiha tu tiştan pêşbixî û berpirsiyariya wê negirî ser milê xwe, nêzîkbûnên bi vî rengî nabe. Tu dinêrî gelek heval hinek gavan davêjin, hinek pratîkan pêşdixin, hinek nîqaşan û rexnan pêşdixin, lê berpirsiyariya wê jî nagirin ser milê xwe. Ger baş be digirin ser milê xwe û wiha lê xwedî derdikevin, lê ger ne baş be, xwe nêz jî nakin û nabêjin min ev pêşxist, ez sebebê van tişta me! Ji ber çi wer nêzîk dibin? Ji ber ku berpirsiyartî girtin nîne. Di kesayeta Rêbertiyê de bi ruhê berpirsiyariyê nêzîkbûn pir girîng e. Dema mirov çawa dibêje berpirsyartî, Rêbertî tê hişê mirov. Di kesayeta Rêbertiyê de tu nikarî çirkeyekî jî bêberpirsyartî jiyînê bibînî. Di

her kêliyeke jiyana xwe de berpirsyar tevdigere. Li gorî berpirsyariya xwe çi pêwîst be, li gorî wê dijî, dixebite. Kesên milîtanên PKK'ê ne, hevalê Rêber APO ne, pêwîst e her çirkeyekî berpirsyariya xwe bijîn û li gorî wê kar bikin. Lê tu temaşeyî rewşa hinek kesayetan dikî gelekî dûrî wî ruhî ne û bêberpirsyar dijîn. Ev taybetmendî berovajiyê Rêbertiyê ye û divê tavilê mirov vê ji ser xwe bavêje. Hevaltiya bi Rêber APO re tê kirin, ji mirovan berspirsiyartiyê dixwaze û li gorî wê jî tevgerînê dixwaze.

Tişta ku Rêbertî nikaribe berpirsiyariya wê bike, ti car Rêbertî hilnade ser milê xwe. Lê dema berpirsiyariyek da ser milê xwe, çi dibe bila bibe pêwîst e pêkbîne. Wê ji xwe re esas digire. Lê em çawa nêzîk dibin, tiştên em nikarin bikin jî em didin ser milê xwe û dikevin bin wê berpirsiyariyê. Mixabin, em pêk jî nayînin. Rastiya me ev e û em vê jî xwezayî dibînin. Bi vî rengî bi Rêber APO re hevaltî nabe, Rêber APO vê hevaltiyê red dike. Heke kes wiha hevaltiyê bike, wê demê hevaltiya sexte dike. Hevaltiya sexte jî Rêbertî ber bi ku de bir? Ber bi Îmraliyê de bir. Lewra ev ne hevaltî ye, ne girêdan e. Divê mirov vê baş fêm bike.

Rêbertiyê bi rêka van parêznaman zêhniyeta xwe gihande her kesî. Tam zelalî û kûrbûn da çêkirin. Şêwazê wê zêhniyetê jî pêşxist. Wê vê carê çi bike? Wê aliyê wê yê pratîk bixwaze temam bike. Weke çawa destpêkê kirî. Destpêkê jî çi kir? Manîfesto pêşxist, Rêya Şoreşa Kurdistanê, pişt re ew rave kir. Di pratîkê de ji bo tevgerê û kadro çi pêwîst e ew pêşxist. Pêwîstiya tevgerê û kadro wiha pêkanî. Niha jî çi dibêje di hevdîtinan de "ev jî manîfestoya dawiyê ye". Yanî ya vê paradîgmayê ye. Manîfestoya destpêkê ya sosyalîzma pêkhatî bû. Ev jî manîfestoya paradîgma nû ye. Nav jî lê dike: "Manîfestoya Civaka Demokratîk a Komînal." Bi vî rengî li ser pirsgirêkên teorîk disekine. Ji ber wê dibêje ev parêznama min ya dawiyê ye. Ger bixwaze wê rave bike. Di aliyê jinê, çandê, heke derfet dît wê bixwaze pêşbixe, ji ber ku şert û mercên ku niha Rêbertî di nav de pir zor û zehmet in.

Gengaz be ne gengaz be Rêbertî dibêje "êdî pêwîst e rêxistin û kadroyên rêxistinê û rewşenbîr vê manîfestoyê bigirin dest û wê kûr bikin. Ango wê rave bikin. Min di vir de berpirsiyariya xwe pêkaniye, heke derfet çêbûn, ez ê pêkbînim. Lê belê dibe ku ew derfet nebin, divê ku ravekirina wê tevger, kadro û rewşenbîr bikin."

Bi vê parêznama xwe ya dawiyê di aliyê fikir de Rêbertiyê teqandinek pêkanî, ew gavên ku bi parêznaman avêt, gihand asta herî jor û bendên li pêşiya zêhniyetê rakirin. Di vê parêznamê de herî zêde li ser çi disekine, herî zêde li ser felsefê û zanestên civakî disekine. Ew ji rêderketinên ku di zanista civakê de çêbûne, rast dike. Di felsefê de sererastkirinê çêdike. Rêbertiyê pêdiviya kadro û rêxistinê û lewazî dît. Da ku wê lewaziyê rake, giranî da çi? Di parêznameya dawiyê de giranî da felsefê û zanista civakî. Da ku pêwîstî û lewaziyên ku kadro dijîn rake, hem jî wan tevahî ji rêderketinên çêbûne rast bike.

Di parêznameyên din de jî ew têgihîştinên çeloxwarî û belovajî rast dikir; di vir de ew kûrbûna hîna zelaltir kir û biryar hîna xurtir kir. Ger mirov bala xwe bidiyê û bixwîne, mirov dibîne çiqasî bi biryar û wêrekî wan ji rêderketinan rast dike. Ji bo wan ji rêderketinan rast bike, herî zêde li ser çi disekine, li ser şêwazê zanista civakî disekine. Giraniyê dide wê beşê, ji ber ku di wir de ji rê derketin pêşketiye.

Bi van parêznaman Rêber APO çi pêşxist, Sosyolojiya Azadiyê pêşxist. Bi vî rengî nav li sosyalîjiya xwe kir. Ya Marks, Engels wan jî sosolojiya azadiyê ye, lê di sosyolojiya wan ya azadiyê de çiqas azadî hebe, ewqas jî koletî heye. Ji ber ku di fikir û sosyolojiya wan de dewlet û desthilatî heye. Rêbertiyê di têgihîştina sosyolojiyê de jî şoreşek kir. Berê jî Rêbertiyê hinek şoreş pêkanîbû. Di mesela jinê de, şehadet û qehremaniyê de, di zanista derûniyê de jî şoreşek pêkanîbû. Kesên dervayî rêxistinê van destnîşan dikin û dibêjin. Niha jî di zanista sosolojiyê de şoreşek pêkaniye.

Rêbertî di parêznameyên xwe de felsefeke nû destnîşan dike, şewaz û ji rê derketinê wiha rast dike.

Rêber APO bi çêbûna sêyemîn re li cîhanê paradîgmayeke nû pêşxist, li ser wî esasî serokatiyek û rêxistinbûneke nû pêşket û pêşxist. Ger bala hevalan kişandibe, di Parastina Gelekî de çi pêşxist, wê modela rêxistinê çi be, êdî sîstem wê li ser çi esasî ava bibe? Rola rêxistinê di avakirina sîstemê de wê çawa be, Rêbertiyê ev hemû zelal kirin. Ji ber wê hem têgihîştineke rêbertiyê ya nû, hem jî yê rêxistinê ya nû di vir de pêşxist.

Rêbertiya ku pêşxist, bi temamî pêşengtiyeke civaka binî esas digire. Serokatiya gelan û sekina gelan a demokratîk ji bo xwe esas girt. Rêbertiyê li ser van esasan pêşengtiyeke xwezayî pêşxist. Ew

serokatiya xwezayî ya ku ji rê hatibû derxistin, ji gel dûr ketibû, ji alî Rêbertî ve hate sererastkirin. Serokatiya gelan ji tegihêştina desthilatiyê û koletiyê xilas kir. Serokatiyeke xwezayî pêşxistin. Rêbertiyê serokatiyek bi temamî gelên bindest esas digire, nirxê wan esas digire pêşxist. Li ser van nirxan kesayeta xwe ava dike û pêşdixe. Di vir de jî belovajîkirina heyî rast kir.

Girêdayî vê di meseleya rêxistinê de jî ji rêderketin û derxistinên hatî kirin, rast kir. Rêxistina ku Rêbertî niha pêşdixe li ser wî hîmî pêşdixe. Ji vê re got, “ji nû ve avabûna PKK’ê.” PKK li ser çi ji nû ve ava dibe? Li ser paradîgmaya nû ava dibe. PKK’ê paradîgmaya kevin terk kir û li ser ya nû xwe ji nû ve danasîn. PKK bi paradîgma nû xwe pak dike, xwe digihîne rastî û bingehê xwe, xwe pê re dike yek. Ev ji nû ve avakirina PKK’ê ye. Yanî xwe ji zêhniyeta dewletê û desthilatiyê xelas kirin e. Di zêhniyeta xwe de sîstema demokrasiyê kir hedef. Prensîbên xwe bi ekolojiyê, azadiya jinê û demokrasiyê ve girêda. Civakek û sîstemek li ser wan esasan pêşxist. Rêbertiyê ev ji xwe re esas girt, li ser van esasan û prensîban ji nû ve xwe rêxistin dike.

Lewra Rêbertî û rêxistina ku niha pêşdixe li ser van esasan tê avakirin. Bi pêşengiya vê Rêbertiyê, rêxistin û sîstema KCK’ê pêşdikeve. Rêbertî bi vê têkoşîna xwe ya şaristaniya demokratîk, sosyalîzma demokratîk, serokatiya gelan ya bindestan pêşxist. Ev bi temamî encama çêbûna sêyemîn bû. Pêvajoya di roja me ya îro, em di nav de ne ev e.

## ŞÊWAZÊ RÊBERTIYÊ

Şêwaz çî ye? Pêwîst e mirov beriya her tiştî vê fêm bike. Şêwaz, rêxistin e û pratîk kirin e. Ev dikeve di nav meseleyên şêwaz de. Xwe li gorî hedefê rêxistinkirin, li ser wî esasî di pratîkê de gav avêtin e, şêwaz ev e. Lewra şêwaz li gorî hedefê, xwe birêxistinkirinê îfade dike. Şêwaz serkeftinê û binkeftinê îfade dike. Bi şêwaz mirov hem dikare biserkeve, hem jî dikare binkeve. Yê serkeftin û binkeftinê diyar dike û çêdike şêwaz e. Şêwazê şaş bi mirovan dide wendakirin, mirov bin dixe. Şêwazeke rast, mirovan pêşdixe û bi ser dixe. Serkeftinê bi dest mirov dixe.

Hizireke rast, zêhniyeteke rast ji bo mirov serkeftinê girîng e. Lê belê ev bi tena xwe têrê nake. Zêhniyet çiqas rast dibe bila bibe, heke mirov ew bi şêwazeke rast pêşnexist, mirov qet nikare encamê bigire. Ew zêhniyet nabe hêz, mirov nagihîne serkeftinê. Qasî girîngiya zêhniyetê şêwaz jî girîng e. Divê ku zêhniyet û şêwaz hev temam bikin, heke hev temam nekin, mirov nikare encamê bigire. Mirov çiqas zêhniyeteke rast pêşdixe, pêwîst e li gorî wê şêwaza rast jî pêşbixe. Ew şêwaz divê ku xizmeta wê zêhniyetê bike, heke xizmeta wê zêhniyetê nekir, paş de ma û berovajiyê wê ket, ew zêhniyet nikare di jiyanê de xwe bike hêz û bijî.

### Tempo Çî Ye?

Tempo, leza meşa mirov e. Leza ku mirov pê kar dike ye. Leza ku pê dixwaze bigihîje hedef û armancên xwe ye. Dem û leza wê ye. Tempo vê îfade dike. Yanî tê di nav çiqas dem de bigihîjî hedefên xwe. Yek jî helbet leza wê destnîşan dike. Di nav çiqas dem de mirov wê pêngav û hedefa xwe pêkbîne, tempo ew e. Çawa şêwaz serkeftinê û binkeftinê diyar dike, tempo jî serkeftin û binkeftinê diyar dike. Pêwîst e tempo, xizmeta hedef û armancê de be. Ger mirov hedefek daye pêşberî xwe, wê di çiqas dem de bigihîje hedefên pêwîst, divê wê pêkbîne.  Divê ku mirov bi vî rengî kar bike û têkoşînê bimeşîne. Heke mirov wiha kar nekir, nikare encamê karê xwe bi dest bixe. Hedefên ku mirov di salekî de pêkbîne mirovê di pênc salan de pêkbîne, bi vî rengî mirov wenda dike. Pêngava mirov davêje pêwîst e di dema xwe de bê avêtin. Divê ku pêngav li gorî armancê be da ku bikaribe encamê bigire.

Uslub Çî Ye?

Uslub şêwazê jiyanê ye. Xîtabet e û nêzîkbûn e. Ev jî binkeftin û serkeftinê çêdike, xizmeta vê dike. Uslubê rast xizmeta serkeftinê dike, uslubê şaş binkeftinê çêdike. Uslub wekî ku gelek heval dizanin, ne tenê axaftin û xîtabet e. Axaftin û xîtabet jî di nav uslub de ye, lê uslub ji wê berfirehtir e. Uslub şêwazê jiyanê û nêzîkbûna ji pirsgirêkan re ye, zimanê wê ye. Pêwîst e uslub wiha bê fêmkirin, ger wiha hate fêmkirin, rast tê fêmkirin.

Tempo û uslub parçeyên şêwaz in ku şêwaz temam dikin. Divê tempo û uslub li gorî şêwazê mirov be. Da ku di şêwaz de bikare encamê bigire. Pêwîst e wê temam bike û xizmeta wê bike. Di rastiya Rêber APO de şêwaz, tempo û uslub hev temam dikin. Ev bi hev ve girêdayî ne û hev temam dikin. Ji van hemûyan re em dibêjin, şêwaz. Ango uslub, tempo dikevin nav şêwaz, dema me got 'şêwaz' uslub û tempo jî di nav de ye, şêwaz îfadeya van hemûyan e. Ji bo serkeftinê zêhniyeteke rast pêwîst e, ev teqez e. Dema zêhniyet ne rast be, felsefe û îdeolojî rast nebin, teorî rast nebe ti car mirov nikare encamê bigire. Lê ev bi tena serê xwe têra encamê nake. Felsefe û îdeolojî çiqas rast dibin bila bibin, heke bi şêwazeke rast tempo û uslubeke rast nehate pratîzekirin, ne gengaz e encam bê girtin.

Lewra ji bo mirov zêhniyeteke rast çiqas pêwîst e da ku encamê bigire; ji bo serkeftinê û encamê şêwaz, uslub û pempo jî pêwîst e. Wê demê mirov dikare bigihîje hedef û armancên xwe. Heke zêhniyet rast be tempo, uslub û şêwaz kêm û şaş bin, ew zêhniyet vala derdikeve. Ew îdeolojî û felsefe vala derdikeve. Qîmeta wê namîne. Yê ku zêhniyetê xurtir dike şêwaz e, ji ber ku mirov wê di pratîkê de dike hêz û di nav jiyanê de pêktîne. Lewra şêwaz ewqas girîng e.

Li gel serkeftinê zêhniyet bi rêxistinkirin, di pratîk û çalakiyê de ew pêkanîn; hizir, şêwaz, tempo û uslub di nav wê de ye. Dema wiha kar bû, mirov dikare encamê bigire.

Uslubê Rêbertiyê hem balkêş e, hem jî bi bandor e, dest davêje çi bidest xwe dixe. Di uslubê xwe de vê esas digire. Nêzîkbûna wî ya ji pirsgirêkan û mirovan re li ser vî esasî ye, bandor dike û encamê digire. Xîtabet, ziman, axaftin û jiyana Rêbertiyê ji bo wê ye, hemû nêzîkbûnên xwe li gorî encam girtinê eyar dike. Da ku bikaribe teqez encamê bigire. Mînak bala xwe bidinê, di uslubê Rêbertiyê de huner heye, weke hunermendan e.

Taybetmendiya hunermendiyê çî ye? Di hunermendiyê de ziravî heye. Ger te ew pêkanî tu dikarî encamê bigirî. Di kesayeta Rêbertiyê de ew esas e. Pir hesas û baldar nêzîk dibe. Hedefê wî bi destxistine, wê çawa bike ku encamê bigire. Jiyana xwe ji bo wê bi rêxistin û eyar dike. Nêzîkbûn û axaftinên xwe hemûyî li gorî wê ayar dike. Wiha dike da ku bikaribe bandorê bike û encamê bigire. Lewma Rêber APO bi kê re rûniştiye û axiviye li ser bandor kiriye. Ev zarok be, jin be, zilam be, extiyar dibe û dostek dibe, heta mirovekî/ê dijmin be jî, bandorê li ser dike.

Heke Rêber APO guh nedaba uslubê xwe, nikarîbû uslubeke rast bimeşandiba û eger nemeşandiba ma dikarî li ser Suriyê bandorê bike? Ne gengaz e! Bi uslubê xwe bandor li ser Suryê kir. Ango bi jiyana xwe, axaftinên xwe bandor li ser Suriyê kir. Hesasiyetên Suriyê li ber çav girtin, lewra xwe da qebûlkirin, bi vî rengî encam girt.

Ger bala we kişandibe gelek heval uslub qet cidî nagirin. Ji ber wê jî nikarin encamê bigirin. Wenda dikin, heta bi uslub û nerazîbûnan pêşdixin, pirsgirêkan çêdikin, diçin pirsgirêkan çareser bikin, tu dinêrî pirsgirêkên heyî kûrtir û mezintir kirin. Li gel pirsgirêkên heyî pirsgirêkên nû çêdikin. Di vir de çi derdikeve holê, pirsgirêkên wan yên uslub cidî ne. Di nav gel de gotinek heye dibêje, “zimanê xweş mar ji kunê derdixe” divê ku heval vê şaş fêm nekin û pêkneyînin, xwe nekin şerbet. Li gorî dilê her kesî şerbet dayîn tiştekî dîtir e, ti têkiliya wê bi uslubê rast re nîne, uslubekî pir gemarî ye. Her kesî îdare dike, bi ya dilê her kesî dike. Daxwaziyên her kesî pêkanîn e, bi kêmanî û qelsiyan re jiyîn e. Tenê ji bo ku neyê rexnekirin, nerazîbûna kesan li hemberî xwe çênekirin e. Dev ji her tiştî berdan e, dibêje “çi dibe bila bibe.” Dema mirov derfet û erka rêxistinê bide kesayetên wiha, çawa bixwaze wê kesan pê bide jiyîn, ji vî uslubî re dibêjin, ‘şerbetgerî.’ Ev ne uslubeke xweş û rast e.

Uslubê xweş û rast yê ku rêxistinê û mirov bihêz dike û dike hêza çareseriyê. Gavên serkeftinê û pêşketinê çêdike, usluba rast ew e. Her milîtanê vê tevgerê wê vî uslubî ji bo xwe esas bigire, ne şerbetgeriyê, ne îdare kirinê. Mirov di uslubê Rêbertiyê de şerbetgeriyê nabîne, ne gengaz e mirov bibîne jî. Rêbertî şerbetgertiyê nake, lê li ser her kesî bandor dike û her kes bi vî şêwazî destxist û kir xizmeta tevgerê. Ev bi uslubekê xwe kir. Bi uslubê rast yê ku pêşketin, serkeftin, derfetan çêdike çêkir. Uslubê rast ew e. Mirovê ku fêm bike ka kes uslubê rast dimeşîne yan na, mirovê di vir de fêm

bike. Heke nêzîkbûna wî/wê ji jiyan, tevger, axaftin wê/î bandorekî erênî çêdike, ecamekî baş derdixe, serkeftinê, moralê, navengê, baweriyê û zanebûnê çêdike, wê demê ew uslub rast e. Yên ku van pêknayîne û van xirab dike û paş de dikişîne, lewaz dike, tesfiyê, wendahiyê û belavbûnê çêdike, wê demê ew uslubeke şaş e. Ne uslubê vê tevgerê ye, ne yê Rêbertiyê ye. Mirov dinêre di hevalan de bê uslubiyek mezin heye, weke bîberê tûj e, weke jîjoya ne, ger biçin ku bi kê re kar bikin, bijîn, tu dinêrî însanan dişkîne û davêje. Di mirovên kêleka xwe de ne moral ne bawerî ne hevaltiyê dihêle. Li ser ya xwe israr dike û xwe rast jî dibîne. Di vî uslubî de rastî nînin. Di uslubê wan de kuştin û birîndarkirina însanan, bûna jîjo û tîrê xwe avêtin heye. Ev uslubeke ne rast e, ne uslubê vê tevgerê ye.

Yên uslubê vê tevgerê yê rast bimeşînin, hêza çaresriyê çêdikin. Her kesî dide meşandin û ji her kesî hez dike. Mirov ji wan kesayetên ku nabin hêza çareseriyê hez nake, yên weke jîjoyan tîrê xwe davêjin mirovan, mirov jê hez nake. Ew ne mirovên vê tevgerê ne. Fena bîberê tûj in tu kes nikare nêzî wan bibe, kesayetên wiha nayên hez kirin. Yên wiha tesfiyê çêdikin. Ev her du uslub jî ne yên vê tevgerê ne.

Uslubê tevgerê uslubê Rêbertiyê ye, her kes wê vê ji xwe re esas bigire. Ango wê li jiyan, tevger, axaftin û nêzîkbûna xwe şiyar be. Da ku mirovan nexînin û wan lewaz nekin, wan nedin revandin, bê moraliyê, bê baweriyê bi wan re çênekin. Divê her dem di însanan de daxwaziya kar, hevaltiyê çêbikin. Wê vê esas bigirin. Wê di mirovan de her dem li pêşketin û hêza çareseriyê esas bigire. Heke ev çêkir, serkeftin esas girt, wê demê ew uslub, uslubê vê tevgerê ye.

Di tempo de jî wê Rêbertiyê esas bigire. Ango wê di demê de gavan bavêje. Di demê de hedefê ku dayî pêşberî xwe wê gavên xwe li gorî wê bavêje. Nikare wiha li gorî xwe keyfî nêz hedefan bibe, ev bi mirovan dide wendakirin. Ger te hedefek di demê de pêkanî tu dikarî encamê bigirî, wiha nebe tê wendahiyan bijî. Wendahî biçûk be mezin be ferq nake, tê wenda bikî. Gotinek heye dibêje, “her tişt di dema xwe de xweş e.” Ew bêsedem nehatiye gotin. Lewra di şoreşgeriyê de jî di demê de dema te tişt kirin û li gorî wê te xwe birêxistin kir, tu wiha tevgeriyayî, te jiyan kir, kar kir, tu rast kar dikî û encamê digirî.

Di pratîkê de gelek tişt derdikevin, tu dinêrî bêxîret e, keyfî ye, bêdispilîn e, bê prensîb e, bêrêzik e, ji bo wî/ê bibe jî nebe jî dibe.

Îro jî dibe siba jî dibe, nebe jî dibe, ji bo wê/î ferq nake. Di gelek hevalan de ev nêzîkbûn heye. Karê ku îro bikin, dihêlin piştî hefteyekî dikin, dibêje "tiştek nabe." Têgihîştineke wiha bi hinek kesayetan re heye. Yan jî di çalakiyên leşkerî de hedefek li pêşiyê ye, divê ku heme bike, lê tu dinêrî li gorî kêfa xwe nêzîk dibe, nehişyar nêzîk dibe. Yan dereng nêzîkî hedefa xwe dibe, yan jî zû nêzîk dibe, ji bo wê dijmin pê dihese tevdîran digire û wendahî çêdibin. Tu nema dikarî xwe bigihînî wî hedefî û rakî. Ji ber wê tempo pêwîst e. Ya rastî di kesayeta Rêbertiyê de tempo pir bi lez e, di demê de karê xwe pêktîne. Ji ber wê encam digire. Ji ber wê dijmin her dem li paş dima. Dijmin nedikarî xwe bigihîne tempo û leza Rêbertiyê. Lewra tim însiyatîf di dest Rêbertiyê de dima. Vê bi çi çêdike? Bi têkoşîna xwe çêdike, her dem di pêş de diçe da ku dijmin negihîjê, da ku dijmin paş de bimîne û Rêbertî karibe di pêş de be. Da ku dijmin negihîjê û însiyatîfê di dest xwe de bigire. Tempo vê bi mirov dide jiyîn.

Bala xwe bidinê yên ku xwedî însiyatîf in xwedî tempo ne û tempoya wan bi lez e. Yên ku di demê de gavan davêjin, li gorî hedefê gavan davêjin bi însiyatîf in. Di kesayetên wiha de asta biryarê bihêz e. Lê belê yên li gorî hedefê di demê de karê xwe nakin, gavan navêjin û di kesayetên wiha de însiyatîf nîne û asta biryara wan lewaz e. Ji ber wê di encam girtinê de lewazî heye. Tişta ku mirovan dike xwedî însiyatîf, biryar û serkeftin tempo ye. Yên dixwaze di tempo de dijmin li paş xwe bihêle û bedelan kêm bidin, dixwazin di demê de encaman bigirin, divê ku li gorî wê xwe ayar dike û kar dike. Wiha keyfî, bêprensîb, bêbiryar, nêzîk nabe. Di kesayetên wiha de disîplîn, îrade, girêdana bi hedefên xwe pir xurt e. Her tiştê xwe li gorî wê çawa hedefê xwe pêkbîne esas digire, her tiştê xwe li gorî wê plan û bi rêxistin dike. Rêbertî li ser wî esasî dijî, kar dike û tevdigere. Di liv û tevgera xwe de lê şiyar dibe. Lewra serkeftî ye û xwedî biryar e û asta pratîkbûna ku di nav de ye bihêz e, encamê digire. Yê ku tempoya wan nebe, ti demê nabin xwedî însiyatîf, asta biryarê jî li gel wan çênabe. Kesayetên wiha wê wenda bikin, wê bi rêxistinê jî wendakirinê bidin jiyîn.

Tevlîbûna Ji PKK'ê Re, Tevlîbûna Ji Rêber Apo Re Ye

Tevlîbûn, bûna milîtanê PKK'ê û Rêber APO ji mirov çi dixwaze? Ne tenê tevlîbûna îdeolojî û felsefê ye. Şert e ku tevlî her du yan jî

bibe. Tenê wisa tevlîbûna felsefê û îdeolojiyê bûn, lê tevlî şêwaz nebûn, tevlî xeta Rêbertiyê nebûn e. Divê tevgrê de tevlîbûn, mirov tevlî fikir û xeta Rêbertiyê dibe. Di destpêka tevgerê de jî wiha bû, niha jî wiha ye. Ji vir û şûnda jî wê wiha be. Em hemû tevlî xeta Rêbertiyê bûn. Ji ber ku ev tevger tevgera Rêbertiyê ye. Çawa her kes bi tevgerên pêxemberan bawer dibin û tevlî dibin, di heman demê de tevlî wî pêxmberî dibin. Tevlî felsefe, îdeolojî, jiyan û pratîka wî dibin û wî ji xwe re esas digirin; tevlîbûna PKK'ê jî wiha ye. Weke tevgerek pêxemberiyê ye. Ev tevger jî tevgereke Rêbertiyê ye. Yên tevlî dibin jî, wê tevlî vê Rêbertiyê bibin. Wê demê mirov dikare bêje tevlî PKK'ê dibin.

Di serî de ev tevger wiha çêbû û rastiya xwe ev e. Jixwe ve tevger çênebû. Ev tevger di serî de tevgerek Rêbertiyê ye. Şekilgirtin û pêşketina wê bi temamî li ser wî esasî ye. Lewra tevîbûn tevlîbûna ji Rêbertiyê re ye. Tevlîbûna PKK'ê tevlîbûna ji Rêber APO re ye. Dema mirov tevlî rastiya Rêber APO dibe, heman demê mirov tevlî rastiya PKK'ê dibe. Divê ku tevlîbûn wiha bê fêmkirin. Bi vî rengî mirov dibe milîtanê PKK'ê. Tevlîbûna ji Rêber APO jî, ji her aliyê ve tevlîbûna rastiya Rêbertiyê ye. Ne ku mirov hinek aliyên wê ji bo xwe esas bigire û tevlî bibe, wê demê mirov tevlî nabe. Ew tevlîbûnek çawa ye, tevlîbûnek li gorî têgihîştina xeta navîn e. Xeta navîn jî sîstemê dijî û dide jiyîn. Ti têkiliya vê bi tevlîbûna ji PKK'ê re nîne.

Hinek dibêjin em tevlîbûn, lê çawa tevlî dibin? Di rastiya Rêbertiyê de kîjan aliyê ji bo xwe baş dibînin, tenê tevlî wan dibin û dibêjin "em tevlî Rêbertiyê bûn, tevlî PKK'ê bûn." Yên wiha di kesayeta xwe de du kesayetan dijîn. Yek, kesayeta Rêbertiyê ye, ya din jî ya sîstemê ye. Di pratîka wan de ya derdikeve, têgihîştina xeta navîn e. Hem xizmeta dijmin dikin, hem jî ya partiyê dikin. Dawiya wan çi ye, qutbûn e û îxanet e. Li pratîkê temaşe bikin hûn ê rehet bibînin. Lewra di tevlîbûnê de mirovê hemû aliyên Rêbertiyê ji bo xwe esas bigire. Da ku mirov bikaribe rast tevlî bibe.

Divê di tevlîbûnê de mirov îdeolojî, felsefe û şêwazê Rêbertiyê ji bo xwe esas bigire. Hinek kes tevlî îdeolojî û felsefê dibin, lê tevlî şêwazê Rêbertiyê nabin. Hinek şêwazên Rêbertiyê ji bo xwe esas digirin, lê îdeolojî û felsefa Rêbertiyê ji bo xwe esas nagirin. Yê ku îdeolojî û felsefê de tevlî dibin û di şêwaz de tevlî nabin, dibin oportunîst û geveze. Yê ku di şêwaz de tevlî dibin, lê di îdeolojî û felsefê de tevlî nabin, dibin çete. Ger di nav PKK'ê de têgihîştinên xeta na-

vîn, nêzîkbûnê memurwarî xurt derdikeve, ji ber vê ye. Bingehê wê yê civakî û dîrokî heye. Heke tevlîbûn jî rast çênabe ew derdikeve pêş. Mirov bala xwe bidiyê yan çetetî ye yan jî mamurwarî ye, xeta navîn e, yan jî dibe oportonîst û geveze. Yan jî mirov lê temaşe dike wer çors e, mirov tê de zêde tiwaniyan nabîne. Di nav PKK'ê de bi vî rengî têgihîştin derdikevin. Ev hemû girêdayî pirsgirêkên tevlîbûnê ne, ger tevlîbûn rast çênebe, encam jî wiha derdikeve holê.

Heke mirov hem tevlî zêhniyetê hem jî şêwaz nebe, wê demê weke mirovek di nav civakê de tevlî PKK'ê dibe. Ev tevlîbûnek xeternak e, ev bi PKK'ê jî xeteriyan dide jiyîn. Ya ku wendahiyan çêdike ya tesfiyê pêşdixîne, ev e. Ya ku hêviyê dide dijmin jî, ew tevlîbûne. Ya xerab jî ew e ku tevlîbûneke gelemperî çênake. Mirovek li dervayî PKK'ê bimîne ti ziyanê nade PKK'ê, bi temamî tevlî bibe jî ziyanê nade, lê ger mirov li gorî xwe tevlî bibe, wê demê ziyanê dide PKK'ê. Di vir de PKK ziyanê dibîne, yê ziyanê jî dide ew tevlîbûn e.

Mirovên di nav civakê de çawa nêzî PKK'ê dibin, temaş e dikin kîjan aliyê PKK'ê xweşiya wan diçe qebûl dikin û wiha tevlî dibin. Weke din tevlî nabin. Niha bala xwe bidinê di kesayeta gelek milîtanên me de jî ya ku bi giranî derdikeve ew e. Ev têgihîştin tê çi wateyê? Têgihîştina ku di nav civakê de ye dixe nav rêxistinê, wê xurt dike. Ev jî her dem tesfiyegeriyê çêdike. Heke di nava PKK'ê de têgihîştina tesfiyegeriyê pêşdikeve, ji ber vê çêdibe. Jixwe zemînê ku dagirkeriyê li Kurdistanê avakiriye, zemînekî hatiye xerabkirin, parçe-parçe bûye, lewaz e, bêtaqet e, ji xwe bêbawer e û her dem berê xwe dide derve, ji ber ku ji xwe bawer nake û tim dikeve bin bandoran. Dema ku êrîş jî li hemberî rêxistinê bihêz dibin, ew têgihîştinên me gotî hîna zêdetir dibin.

Hîmê tesfiyegeriyê ji vir derdikeve. Bingehê wê pir bihêz e, texrîbat di civakê de pir zêde ye, êrîş jî li ser PKK'ê pir xurt in, ev her dem tesfiyegeriyê çêdike. Ger mirov tim şerê îdeolojî û rêxsitinî bihêz neke, rexne û renxedanê pêşnexe, mirov nikare xwe ji tesfiyegeriyê xilas bike. Dema mirov vê çeka rexne û lixwerexnegirtinê lewaz bike, her dem wê tesfiyegeriyê bijî.

Lewma tevlîbûn pêwîst e, ne li gorî xwe be. Ne jî dema ku hate hesabê mirov be. Pêwîst e ji her aliyê ve rastiya Rêbertiyê ji bo xwe esas bigire û wisa tevlî bibe. Bêşert û hesab divê mirov tevlî bibe da ku tevlî rastiya Rêbertiyê bibe û wê milîtaniyê di kesayeta xwe de

ava bike û bikaribe wê bide avakirin. Hinek kes wisa keyfî nêz dibin û kîjan tişta tê hesabê wan, wê esas digirin. Paşê dibêjin "ez tevlî bûme." Kesayetên ku di zêhniyetê de tevlîbûnê çêdikin, dema diaxivin mirov dibêje qey partiyî ye û hevalek baş e, lê ji ber ku di şêwaz de tevlîbûna Rêbertiyê esas nagire, dema tê jiyanê mirov dinêre kesayetek din tê pêşberî mirov. Ti têkiliya wê bi rêxistinê re nîne, mirov dibêje qey mirovek di nav sîstemê de ye.

Yan jî hinek kesayet di şêwaz de tevlîbûnê çêdikin, lê zêhniyeta wê esas nagirin, dema ku kar dikin mirov dibêje hevalek fedekar e, karê rêxistinê dike û durust e. Lê dema tu li zêhniyeta wan kesan dinêrî, zêhniyat wan a axa û began e. Sedema vê ew tevlîbûna me gotibû ye, ji ber wê wer dibe.

Tevlîbûna rast hem ya zêhniyetê ye hem jî ya şêwazê ye. Ango tê hem tevlî îdeolojî û felsefa Rêbertiyê bibî, hem jî tevlî rêxistina wê û pratîka wê bibî. Wê demê tu rast tevlî dibî. Dema tu bi vî rengî tevlî bûyî, wê demê tu kesayeta Rêbertiyê ji xwe re esas digirî. Kesayeta rêxistinê di kesayeta te de çêdibe, pratîka te wê demê dibe pratîka rêxistinê û dikeve xizmeta rêxistinê.

### Rêbertî Hêza Îdeolojîk Û Rêxistinî Dike Yek Û Bi Vî Awayî Bi Ser Dikeve

Li gel Rêber APO çiqasî îdeolojî û felsefe girîng be, ewqasê jî rêxistin girîng e. Ti carî bi tenê îdeolojî yan jî rêxistinê esas nagire. Herduyan esas digire. Hêza herduyan dike yek, wiha encamê digire. Heke mirov hêza îdeolojî û rêxistinê neke yek, bikar neyîne, mirov nikare ti pirsgirêkan çareser bike. Pirsgirêk wiha çareser dibin. Dema ku mirov hêza îdeolojî û rêxistinî kir yek, ti hêz nikare mirov bisekinîne. Hêza Rêbertiyê di vir de bû, ji ber vê ti hêzê nekarî li hemberî wî bisekine, ji ber vê Rêbertiyê encam digirt. Sedem ew bû. Mînak, Yalçın Küçük hatibû qada Rêbertiyê, ji bo hevdîtinan, ji Rêbertiyê re digot: "min fêm kir hêza te di ku de ye, tu îdeolojî û rêxistinê dikî yek û tam mafê wê didiyê, ji ber wê tu encaman digirî." Rêbertî digot: "rast e, çavkaniya hêza min ew e, ez wiha encamê digirim." Ji ber vê her milîtanê vê esas bigire, heke dixwaze pirsgirêkên rêxistinî û siyasî çareser bike, wê wiha çareser bike. Weke din ne gengaz e di bin barê pirsgirêkan de derkeve û wan çareser bike, yan jî encamê bigire.

Hinek heval wiha fêm dikin ku Rêbertî tenê îdeolojî û felsefê girîng dibînin, lê ne wiha ye. Li gel Rêbertiyê rêxistin jî weke îdeolojiyê girîng e. Heta ji bo ku pirsgirêkên rêxistinî li Kurdistan, ji bo mirovê Kurd civaka Kurd çi îfade dike bide fêmkirin, Rêbertiyê digot: “ hûn bi dayîka min bileyzîn dibe ku ez qebûl bikim, lê hûn bi rêxistinê bileyîzin, ez ti carî vê qebûl nakim û ez ê we nebexşînim.” Li gel Rêbertiyê tê zanîn dayîk di navenda her tiştî de ye, ji dayîkê giringtir tiştek nîne. Hemû pirsgirêkên mirovahiyê û azadiyê dixwaze di azadkirina jinê de çareser bike. Di kesayeta dayîkê de dixwaze çareser bike, hinde giringiyê dide dayîkê. Lewra ew rêbertiya hinde giringiyê dide dayîkê û dibêje “hûn bi dayîka min bileyîzin dibe ku ez qebûl bikim, lê bi rêxistinê bileyîzin ez ti car qebûl nakim”, li vir mebest çî ye? Rêxistin ji bo mirovê Kurd, civaka Kurd gelekî girîng e. Ji ber ku mirovê Kurd her tiştî bi rêxistinê bi dest dixe. Wekî din nikare tiştekî jî bi dest xwe bixe û biparêze. Tiştê ku bi dest dixe pê parastina xwe dike. Pêşketin hemû bi rêka rêxistinê çêdibin. Hela hela dema ku mirov bibîne dagirkeriyê civaka Kurd çawa parçe parçe kiriye, ji civakbûnê derxistiye û mirina Kurd pêkaniye wê demê girîngiya rêxistinbûnê tê fêmkirin. Ji ber ku bi rêxistiniyê pêşî li vê malwêraniyê hatiye girtin, her tiştek bi rêxistinê hatiye destxistin û bê rêxistin li Kurdistanê pelekî darê jî naheje. Hingê, mirov dizane ku rêxistin ji bo mirovê Kurd, civaka Kurd çi îfade dike. Rêber APO ji bo vê rastiyê bi mirovê Kurd û civaka Kurd bide fêmkirin ewqas giran diaxive. Rêber APO çi dibêje: “yek ji taybetmendiyên min ew e ku ez têkoşerekî rêxistinê me.” Ango di nav xeta rêxistinê de şerekî taybet dimeşîne. Ti carî paş ve gav navêje û çavên xwe li kêmasiyan nagire. Qet nabêje “tiştek nabe!” di meseleyên rêxistinî de pir hesas û nazik tevdigere.

Her îdeolojî û felsefeyekê rêxistina xwe û milîtanê xwe çêkir, dikare bi serkeve û encamê bigire. Bê rêxistin ne gengaz e ku ti îdeolojî û siyaset bi ser keve. Yê ku çarenûsa îdeolojiyekê û siyasetekê diyar dike çî ye, rêxistina wê ye. Çarenûsa wê rêxistinê jî çi tayîn dike, milîtanê wê. Rêxistin bi çi ava dibe, bi milîtanan û mirovan ava dibe. Te milîtan li ser çi ava kir, tu yê rêxistinê jî li ser heman tiştî ava bikî. Rêxistin jî wisa dibe. Ji ber vê her milîtanê vê tevgerê îdeolojiyê çiqasî esas digire, wê rêxistinê jî ewqasî esas bigire. Wê hêza herduyan bike yek û bi kar bîne da ku bikaribe encamê bigire.

Li Kurdistanê rêxistin, di civaka jêr de gav avêtinê îfade dike. Weke din li Kurdisatnê ne civakbûn ne jî mirovbûn ne gengaz e çêbibe. Rêka wê di rêxstinîbûnê re derbas dibe. Te çiqasî di rêxistinbûnê de gav avêt, tu di civakbûn û mirovbûnê de jî ewqas gavan diavêjî. Civakbûn û mirovbûna xwe bi dest dixî. Li derveyî vê li Kurdistanê ne gengaz e ku civakbûn û mirovbûn çêbibe, pêşkeve û mezin bibe. Lewra yê ku dixwaze mirovbûn û civakbûna xwe wenda neke, wê çi esas bigire? Wê rêxistinbûnê esas bigire û wê xwe birêxistin bike. Wê nehêle rêxistina ku tê de cih digire qels û lewaz bibe. Wê vê esas bigire. Mirovekî dema xwe birêxistin kir, ew dikare karê rêxistinî bike. Mirovê rêxistinê, mirovek e ku xwe birêxistin kiriye. Ji yê/ya wiha re dibêjin mirovê rêxistinê.

Mirovek tenê bi fîzîkî ketibe nav rêxistinê nabe mirovê rêxistinê. Kengî xwe bi rastiya wê rêxistinê bi rêxistin kir, hingê dibe mirovê wê rêxistinê. Niha gelek heval dikevin nava rêxistinê û dibêjin, “em bûn mirovê rêxistinê.” Wiha mirov nabe mirovê rêxistinê, ew îmkanekî dide te, da ku tu xwe bikî mirovê rêxistinê. Dema ku tu gihîştî rêxistinê, ketî nava rêxistinê tu wê derfetê bi dest dixî. Tê bibî mirovê rêxistinê yan nebî, ew dimîne li ser kar û têkoşîna te. Heke te xwest tu bibî mirovê rêxistinê û te bi rastiya wê rêxistinê re xwe kir yek, wê demê tu dibî mirovê rêxistinê. Wiha nebe tu şeklî din ava rêxistinê de dimînî. Yê ku şeklî dimîne jî her dem zirar û ziyanê dide rêxistinê. Her dem bi rêxistinê dide wendakirin. Aqûbeta kesayetên wisa qutbûn û îxanet e. Wekî din rê nîne. Heke ku yek naxwaze bikeve vê rewşê, wê bi rêxistinê re xwe bike yek, wê rastiya wê di xwe de pêkbîne. Wê demê ew mirov dibe mirovê rêxistinê û karê dike jî dibe karê rêxistinê û dikeve xizmetê. Wiha nebe karên ku tê kirin li gorî xwe dibe, nabe yê rêxistinê û nakeve xizmeta rêxistinê.

Li cem me di vî warî de çi têgihîştin heye? Em mîna Rêbertiyê hesas nêzîkî rêxistinê nabin û li cem me ew nêzîkatiya nazik nîne. Li ser rêxistinbûnê sekinandin û dîsa hesas nêzîkbûn li cem me nîne. Ji ber ku em ji bo pêşxistina rêxistinê tênakoşin. Lewma, em di rewşeke paşvemayî de dimînin û heta di hinek meseleyan de em ne li gorî rêxistinê ne. Ji ber vê kesayeteke rêxistinî li ba me pêş nakeve, bihêz nabe. Ev dibe sedem ku li ba me rêxistin xurt nebe, bi sernekeve, di şexsê me de her tim rêxistin bi pirsgirêkan re rûbirû bibe û ziyanê bibîne.

Kesayeta di nava PKK'ê de hêza xwe ji ku digire? Ji îdeolojî û rêxistinê digire. Wekî din hêza kesan nîne, kes lewaz e, belengaz e, bêçare ye û tiştekî bike nîne. Ger tiştekî bike jî wê bi hêza îdeolojî û rêxistinê bike. Ger di vê xalê de xwe temam kir, dikare şoreşgeriyê bike û pirsgirêkan çareser bike. Dikare biserkeve û pêşbikeve, wekî din nikare tiştekî bike. Divê, her milîtanek vê baş fêm bike: li pişta wan ti hêz nîne, hêza wan îdeolojî û rêxistina wan e. Ger di vir de xwe bihêz nekin, hêza îdeolojî û rêxistinî bikar neynîn û herduyan nekin yek û heqê wan nedinê, milîtaniya wan kesan wê kêm be. Milîtanê ku kesayeta wî/wê her tim bi pirsgirêk be, ji bo rêxsitinê jî xeter e.

Di rastiya Rêber APO de teorî û pratîk bi hev re ye. Rêbertiyê ti carî negotiye "hela ez bifikirim, paşê bikim, yan jî ez bikim û paşê bifikirim." Nêzîkbûneke wiha li gel Rêbertiyê nîne. Herduyan bi hev re pêktîne. Yekî nade pêş yê din. Ji ber vê di kesayeta Rêbertiyê xwe pratîzekirin xurt û bilez e. Ez dikarim bêjim diyalektîka teorî û pratîkê pêkanînê de li ser Rêbertiyê zêde kes nîne. Ji ber ku tu yê hem bifikirî hem jî bikî, ango hem bikî hem jî bifikirî. Tê van bi hev re pêkbînî û bidî pêkanîn. Ji ber ku ev her du têgîn jî bi hev re ne. Ev ne rehet e, lê belê gengaz e. Mîna çawa Rêber APO dike.

Lê ev di kesayeta me de çawa derdikeve? Em dibêjin "Ka ez bikim, ez ê paşê bifikirim, yan jî ez bifikirim û paşê bikim." Herî zêde di kesayeta me de ev heye. Em yekê li ser ya din re digirin. Lewma em nikarin di demê de diyalektîka teorî û pratîkê bi hevre pêkbînin. Wiha em nikarin zêde encamê bigirin. Heke Rêbertî encamên bihêz digire, girêdayî vê şêwazê ye. Şêwazê di nav PKK'ê de pêk tê û milîtanê wê esas bigire çî ye? Wê wekî xwe nêzîk nebe, wê xwe ji wê şêwazê xilas bike. Pratîk û teoriya xwe bike yek, pêwîst e pratîk û teorî bibin yek, hev temam bikin. Yên ku ev pêkanîn, dikarin encamê bigirin, yên vê pêkneynin nikarin zêde encamê bigirin; yan jî kêm encamê digirin. Ger em zêde encaman nagirin, yan jî kêm digirin û Rêbertî encamên bihêz digire, ji ber vê sedemê ye.

## Di Nav Refên PKK'ê De Erk Û Berpirsiyarî Pîroz İn

Di kesayeta Rêbertiyê de nêzîkbûna ji erk û berpirsyartiyê re pir nazik û hesas e. Xwe temamî tevlî kirin li gel Rêbertiyê esas e. Erkê ji bo xwe pîroz dibîne. Divê mirov pir şiyar be, da ku tiştên pîroz gemar neke. Dibe ku dema mirov bi şiyarî nêzîkî tiştên pîroz nebû,

gengaz e ku mirov şaş nêzîkî bibe û wan gemar bike. Mirov wê demê dibe lanetî.

Di nav PKK'ê de erk û berpirsiyarî pîroz e. Mirov hesas nêzîkî tiştên pîroz dibin ku kêmasiyan nekin û nebin lanetî. Milîtanên PKK'ê jî wê di erk û berpirsiyariya xwe de ji bo ku zirar û ziyanê nedin pîroziyê û nebin lanetî, wê pir hesas, şiyar û bi zanebûn nêzîk bibin. Wê tam heqê erk û berpirsiyarên xwe bide. Wê wiha qels erk û berpirsiyariyan negirin dest. Lê, gelek heval xwedî erk û berpirsiyariyên xwe dernakevin, lewra bindekivin. Dema erk pêk nayê, yan jî kêm û şaş pêktê, tevger zirar û ziyanê dibîne. Ya rastî Rêbertî ti carî wihan nêzîk nabe. Bi hemû hêz, zanebûn û mejiyê xwe tevlî erk û berpirsiyariyê dike. Ji ber wê encamê digire. Heke em encaman nagirin, sedemeke wê heye. Em besît, li gorî xwe nêzîkî erkan dibin, em erkên xwe di demê de pêknayînin. Di dema wê de em bi berpirsyariyên xwe tevnagerin. Dijmin di me de felsefeyek pêşxistiye, çî ye ev felsefe? Ev, felsefeya 'dev jê ber de, tiştek nabe, ne girîng e; îro jî dibe, sibe jî dibe" ye. Ev felsefeya, dijmin daye Kurdan. Bi wê felsefê Kurdan dikuje. Di felsefeya Rêber APO de ti caran dev jê berdan, 'tiştek nabe' nîne. Li gel Rêbertiyê wateya her tiştekî heye.

Ger bala hevalan kişandibe, di parêznameyên dawiyê de vê xurttir dinivîse û rave dike. Hêza watedayînê bikartîne. Di felsefeya Rêbertiyê de tiştekî bêwate nîne. Wateya her tiştî heye, dema te mane dayê tu dikarî wê demê fêm bikî û bigihîjî encamê. Lê dema mirov maneyê nedê, encam jî nayê girtin. Lewra di felsefeya me de dev jê berdan û bêwatebûn nîne. Milîtan wê di ziraviyan de baldar be, divê gotina"tiştek nabe" neyê gotin. Wê seranser nêzî erka xwe nebe. Weke hûnermendan wê hûrûkûr nêzî xebata xwe bibe. Heke hûnermendek bi baldarî nêzî kare xwe nebe ziyanê çêdike. Ji ber vê yekê jî hunermend bi awayekî pir zirav û hişyar tevdigere, da ku lekeyek negihîje karê ku dike û biserkeve. Divê milîtanên PKK'ê jî di mijara erk û berpirsiyariyên xwe de mîna hunermendan tevbigerin. Nêzîkbûnên seranser û gelemperî nabin. Divê erk bi hemû jêhatiyên xwe ve baş were fêmkirin, da ku mirov baş fêm bike û bikaribe heqê wê bidiyê.

Li cem me, nêzîkbûnên seranser û gelemperî hene. Em hesas nêzîk nabin, ji ber wê em çors in, ji destê me zêde tiştek çênabe, em bi vî rengî encamên pêwîst jî nagirin. Dibe ku hinek encam bidest me

dikevin, lê belê ev gelek kêm in. Mirov bala xwe bidiyê, gelo ka kîjan hevalî/ê erka xwe di demê de û tam pêkaniye? Hevalên bi vî rengî nêzîkî peywirên xwe dibin zêde nînin.

Lewra dema mirov li hêzên leşkerî dinêre çalakiyên tên kirin, ne weke tê xwestin in, nîvçe ne. Li gorî plansaziyê, ji siseyan yek pêkhatiye. Çima pêknehatiye? Ji ber ku xwedî erkên xwe derneketine. Sedem jî nêzîkbûna wan a gelemperî ye. Mirov dikare bêje ziraviyên wê hemû amade nekirine, lewra li gorî wê nêzîkî çalakiyê nebûne, sedem ev e ku encam bi vî rengî ye. Li vir ya diyar dibe bêberpirsiyarî ye.

Niha di kesayeta gelek hevalan de tiştê heye xwe berpirsiyar nedîtin e. Ji ber ku bi awayekî giştî li meseleyan dinêrin, hûrûkûr li ser mijaran ranawestin. Ji ber vê xwe tam tevlî nakin û di nav karê xwe de xwe nahelînin. Lê di kesayeta Rêbertiyê de, erk pîroz e. Ji ber wê jî ji bo ku lanetî nebe xwe di nav karê xwe de dihelîne. Çi dibe bila bibe, vê erkê û berpirsiyariyê tam pêktîne. Erkeke ku mirov tam fêm kir û xwe tevlî kir, mirov dikare pêkbîne. Ya me, em xwe tevlî dikin ger bû, bû, ger nebû nebû. Wiha israr kirin jî nîne, ango vê erkê min da pêşberî xwe divê ku ez pêkbînim, heke pêknayê çima pêknayê, şaşitî û kêmanî di ku de ye, li ser sekinandin û ew fêm kirin, dana fêmkirin nîne. Bû bû, nebû nebû, ev şêwazê me ye. Ti têkiliya vê bi şêwazê Rêbertiyê re nîne. Di şêwazê Rêbertiyê de erk di dema wê de tam pêkanîn e. Yan divê mirov erkê negire, yan jî ger girt divê tam wê fêm bike û di demê de pêkbîne. Çi dike bila bike, teqez wê erka xwe di dema wê de pêkbîne. Heta ku mirov wê erkê pêkneyîne, divê nikaribe bijî. Şêwazê Rêbertiyê ev e.

Divê mirov şêwazê xwe wiha lêpirsîn bike. Bi rastî em çiqasî erkan pîroz dibînin? Em çiqasî berpirsiyariyê dijîn û pêktînin? Em pêktînin yan pêknayînin, em pê dileyîzin yan jî bi rastî em heqê wê didinê? Pêwîst e em lêpirsîna vê bikin û di vî aliyî de jî em xwe nas bikin. Di nêzîkbûna me de seranserî heye. Heta dema ku piçek zor û zehmetî derdikevin pêşberî me, em hema dest ji her tiştî berdidin û em wisa rehet dibin û li ser jî israr nakin. Gelek kadro naxwaze erk rake, xwêdî berpirsyartiyên xwe dernakeve. Hinek kadro neçar tên hîştin ku erkan bigirin. Di nav PKK'ê de bi zorê erk û berpirsiyarî pêknayên, bidil pêk tên.

Gelek kadroyên me tu ji wijdanê wan re bihêlî, wê heta dawiyê bêberpirsiyariyê bijîn. Gelek erk wê li holê bimînin, wê ji bo xwe ge-

lek bihana çêbikin û bêjin, 'ez ne hazir im.' Yan jî 'ez nizanim, gelek lewazî û kêmasiyên min hene', dîsa 'li hemberî min nêzîkbûnên şaş çêbûn û nerazîbûna min çêbû' tên gotin. Bi kurtasî, wê li gorî xwe gelek bihaneyan çêbikin da ku ji wê erkê û berpirsiyariyê birevin. Dema rêxistinê bihane qebûl nekirin jî neçar dimînin erkan digirin, lê îcar jî bêdil dikin. Ji ber wê jî nikare zêde ji rêxistinê encam bigire û serkeftinê pêkbîne. Di kesayeta xwe de wiha rêxistinê vala derdixe û zirar û ziyanê dide rêxistinê. Di nav PKK'ê de cih girtin, xwe berpirsiyar dîtin bixwe ye, di asteke herî bilind de berpirsiyarî pêkanîn e. Ji hemû erkan re xwe amade kirin e. Tu nikarî bêjî "ez ne hazir im!" Wê demê tu di nav PKK'ê de li çi digerî? Tu hatî nav PKK'ê da ku tu erkan pêkbînî û berpirsiyariyan rakî! Ji ber wê tu hatî nav PKK'ê, PKK'ê ji ber wê tu qebûl kiriye. Hem tê ji bo tevlîbûnê werî, hem jî dema rêxistinê erk da pêşiya te, tê bibêjî: "ez ne hazir im, kî hazir e bila ew bike." Di vî kesayetî de şoreşgeriyeke keyfî heye. Di kesayetên wiha de berpirsiyartî û cidiyet nîne. Beriya her tiştî di nav PKK'ê de berpirsiyartî û cidiyet esas e. Ger berpirsiyartî û cidiyet tunebe, tiştek pêknayê û nabe. Ger di mirov de berpirsiyartî û cidiyet nebe, ew însan kêrî tiştekî nayê û ti karî jî ji bo rêxistinê nake.

Lewra milîtanê PKK'ê ji bo her demî û her erkî hazir e, divê ji bo her tiştî xwe hazir bike. Dema erkek derket pêşberî wî, nabêje ez ne hazir im. Dema ku te got ez ne hazir im, erkên rêxistinê bêxwedî dimîne. Ger tu ji bo erkan ne amade yî, wê demê tu di nav rêxistinê de li çi digerî? Ger tu ne hazir bî jî, dema ku erk derket pêşberî te tu yî xwe amade bikî. Tu nikarî erkê red bikî, erk red kirin, rêxistin red kirin e. Meşa li gorî rêxistinê meş red kirin e. Ez mînakekî ji xwe bidim, min heta niha di nav rêxistinê de erkek jî red nekiriye û min negotiye ez ne hazir im, ez nikarim bikim. Rêxistinê çi erk daye min, min ew pîroz dîtiye. Ger ez ne hazir bim jî, min xwe amade kiriye. Ez ji bo wê hatime nava PKK'ê. Ji bo ez erkan pêkbînim, ez hatime nav rêxistinê. Rêxistin pêdiviya xwe bi kê pêk tîne? Bi milîtan û kadroyên xwe pêktîne. Berpirsiyariyeke mirovên li derveyî rêxistinê jî nînin ku erkên vê rêxistinê pêkbînin. Ji ber ku ne milîtanên vê rêxistinê ne.

Hinek kesayet hene dema ku dilê wan bixwaze erkan pêktînin, dema dilê wan nexwaze pêknayînin. Lê belê milîtanê vê rêxistinê ne wiha ye! Ne li ku dilê wî bixwaze erkan pêktîne, jixwe erkên rêxis-

tinê pêktîne, ji ber wê hatiye nav rêxistinê. Dema pêdiviya rêxistinê derket û erk da milîtanekî, wê demê ew milîtan pêktîne. Nikare jê bireve û bêje ne li gorî min e, besît e û ez ji bo wê ne hazir im. Ev nêzîkbûn hemû çewt in û li derveyî xeta rêxistinê ne. Mirovekî rêxistinê nikare van gotinan bike. Mirov temaşe dike hinek hevalên me rehet diaxivin, lê dema tiştek ne li gorî dilê wî/ê be dibêje, ez ne hazir im, bila yek din bike, ez nakim. Rixmî vê nêzîkatiyê xwe jî mirovê rêxistinê û mafdar dibîne.

Ev nêzîkbûneke ne ciddî, keyfî ye. Lê ya rastî di kesayetên rêxistinî de bêberpirsiyartî û keyfî nêzîkbûn nabe. Divê xwedî cidiyet û disîplîn be, erkan pêkbîne. Dema kes erk pêkanî pîroz dibe. Dema pêkneanî lanetî dibe.

Niha hinek hene dibêjin, mirov nikare Rêbertiyê wisa zû zû, bi kûranî û baş fêm bike, ev tişt zehmet e. Heta hinek dibêjin ez nikarim Rêbertiyê fêm bikim. Vê rehet dibêjin. Di nav rêxistinê de cih digirin milîtanê PKK'ê ne, lê dibêjin: "em Rêbertiyê fêm nakin! Ez nikarim fêm bikim û ji bo min pir zor e." Heke tu nikarî Rêbertiyê fêm bikî, karê te di nav PKK'ê de çî ye? Hevaltiya te ya bi Rêbertiyê re çawa dibe hevaltî, ma ev ne hevaltiyeke sexte ye? Ev hevaltiyeke sexte ye, wê demê pê re durûtî heye. Ne ku nikare Rêbertiyê fêm bike, naxwaze fêm bike. Ya rastî ev e. Naxwaze fêm bike û nayê hesabê wî/ê dibêje, ez nikarim fêm bikim, zor û zehmet e. Hindik be jî xwe naêşîne da ku fêm bike, dibêje ez nikarim fêm bikim! Fêrî tiştên hazir bûye. Li malê her tişt ji dayîk û bavê xwe xwestiye û hatiye nav rêxistinê, icar jî her tiştî ji rêxistnê hazir dixwaze. Divê ku her tişt hazir be, xwe qet neêşîne û kedekî nede da ku tiştekî fêm bike. Pêwîst e her tiştî weke xwarin û vexwarinê bidinê da ku bixwe. Ev bêkesayetî ye, ev kesayet ne kesayeta rêxistinê ye. Ev kesayet nikare hevaltiyê bi Rêbertiyê re bike û bibe endamê rexistinê.

Kesayeta rêxistinî xwedî ked e, ked dayînê ji xwe re esas digire. Di nav rêxistinê de her tişt bi kedê dibe, bê ked tiştek çênabe. Ger mirov bixwaze Rêbertiyê fêm bike, ev bê ked nabe, wisa hazir nabe. Kesekî tiştekî hazir bide te nîne. Tê bixwazî fêm bikî, dema te xwest tê fêm bikî. Mirovê ku Rêbertiyê fêm nake naxwaze fêm bike, loma fêm nake. Ev çi îfade dike, "ez tevlî Rêbertiyê û rêxistinê nabim." vê îfade dike. Heke tu fêm nakî, tu çawa tevlîbûyî, wê demê tu nikarî tevlî bibî. Van gotinan rehet jî dibêjin. Gelek kes nizanin çi diaxivin, nizanin wateya axaftina dikin çî ye. Yan jî dizanin dîsa jî wisa diaxi-

vin. Rêbertî ne fêm kirin, rêxistin ne fêm kirin e û ne tevlîbûn e. Heke ku tu tevlî Rêbertiyê nabî, tu di nava vê rêxistinê de li çi digerî? Wê demê tu sîxur î, tu hatî da ku texrîbatan bikî. Weke din wateyeke vê hatinê nîne. Yê ku dibêje ez Rêbertiyê fêm nakim, di nav rêxistinê de dixwazî bizanebûn be yan bê zanebûn be, fikirê dijmin dijî. Zêhniyet, çand, exlaq û kesayeta dijmin dijî. Jiyana wî dijî. Înkarê, durûtiyê û xapandinê dijî.

Kesayetên ku ji sîstema dagirkeriyê, modernîteya kapîtalîzmê fikrên gemarî girtine, sîstemê dijîn û naxwazin xwe jê qut bikin û dikevin nav sîstema Rêbertiyê û dibêjin 'ez Rêbertiyê fêm nakim.' Mirov nikare wateyeke din bide vê nêzîkbûnê, wateyeke wê jî nîne. Tu Rêbertiyê fêm nekî, tu çawa xwe milîtanê vê tevgerê dibînî û xwe hevalê Rêbertiyê dibînî? Lê gelê me Rêbertiyê fêm dike, mirovên ne Kurd û Kurdistanî fêm dikin, mirovên ku perwerdeya rêxistinê nedîtîn û ji derfetên rêxistinê feyde nekirîn, fêm dikin. Tu milîtanê vê rêxistinêyî tu çawa fêm nakî? Divê ev pirsgirêk çareser bibe. Niha gelê me temaşe bikin, ne xwendevan in, ne jî wiha di nav perwerdeya Rêbertiyê re derbas bûne, lê belê Rêbertiyê baş fêm dikin û li gorî hêza xwe jî dibin bersiv û pêk jî tînin. Li dayîkan binêrin, li gel binêrin mirov vê baş dibîne.

Hevala Elefteriya hebû, jineke Yewnanî bû ne Kurd bû ne jî Kurdistanî bû, rojekî jî perwerda me nedîtibû, ne kadro bû, me tiştek nedabûyê, me ti derfetên vî gelî jî nedabûyê, lê ji bo Rêbertiyê xwe şewitand. Zilma li ser Rêbertiyê, gelê Kurd û rêxistinê dît qebûl nekir û çalakî kir. Got "ez vê qebûl nakim." Wê ev Rêbertî ev gel û tevger dît û fêm kir, got "ez nikarim van nêzîkbûnan û heqaretan qebûl bikim." Li Rêbertiyê, gel û tevgerê xwedî derket. Xwe ji bo wê şewitand. Wê demê fêm dike loma xwe dişewitîne, ger wiha nebe wê çima xwe bişewitîne. Xwedî du zarok bû jî. Bi yekî Kurd re zewicî bû, bi wê hinekî rêxistin naskiribû. Wisa Rêbertî nas kiribû, lê çawa li Rêbertiyê xwedî derket! Xwe şewitand. Lewra heke mirov bixwaze mirov fêm dike. Heke Elefteriyayê fêm kir, her mirovekî Kurd dikare fêm bike, hela kadroyê vê tevgerê be, divê kadro ji her kes zêdetir fêm bike. Fêm kirin jî kirin e. Yê ku fêm neke nake, yê nexwaze fêm bike fêm nake. Bi awayekî xwezayî mirovek piçek aqil pê re hebe, xwe piçekî jî biêşîne, dikare fêm bike. Dibe ku bi kûranî fêm neke, lê dikare fêm bike.

Heke me ti derfet neda Elefteriyayê û wê ew çalakî kir, wê kadro lê temaşe bike û li gorî wê xwe ber çavan re derbas bike. Milîtanên PKK'ê wê vê bibînin, Elefteriyayê ancax dikarîbû ev bikira. Elefteriya ne kadro ye ku erk û berpirsyariyên cûda bide pêşiya xwe. Milîtanê vê tevgerê divê, pîvanên ku bide pêşberî xwe ji vê zêdetir, bihêztir û mezintir be. Wê demê mirov dibe kadro û dibe hevalê Rêbertiyê yê rast. Yên din hemû çîrok û tewş in.

Elefteriya welatparêzeke ne Kurd û Kurdistanî ye, ne kadro ye, me tiştek jî nedayê û di wê astê de erka xwe pêktîne, tu hem Kurd î û Kurdistanî yî hem jî kadroyê vê tevgerê yî, te ji vî gelî û rêxsitinê derfet girtine, rixmî van hemuyan tê di wê astê de nejî û kar nekî. Bi vî rengî jî xwe milîtan bibînî. Ev pirsgirêk e û divê bê çareser kirin. Di vir de divê ku lêpirsîn çêbibe, wiha erzan xwe kadro dîtin nabe. Kadroyê vê tevgerê wê herî kêm di asta Elefteriya de bijî, û pratîk bike. Ger ji vê kêmtir kir, ew nabe kadro. Ji ber ku kadro ye dema nizimtir ket, ne dibe kadro, ne jî dibe welatparêz. Lewra pîvanên me wer saxlem in. Divê her kes li gorî xwe pîvanan çêneke, her kes li gorî pîvanên xwe nirxandinan neke. Pîvanê vê rêxistinê hene û divê li gorî wê nêrîn û nirxandinên bên kirin. Wê demê nirxandinên wî/ê rast in.

Kesekî ji Elefteriyaê nexwest wê çalakiyê bike? Na kesî jê re negot, bi xwe re nîqaş kir û li hemberî Rêbertî û gelê Kurd berpirsiyariya xwe wiha pêkanî. Lewra divê em li vir encamê derxin. Milîtanê PKK'ê wê vê bibîne. Heke ku însanekî ne Kurd û Kurdistanî bi xwe re nîqaş bike û pêdiviya destnîşan bike û xvê berpirsiyar bibîne; milîtanekê wê zêdetir bi xwe re nîqaş bike, pêdiviyên tevgerê tesbît bike û pêkbîne. Ji ber ku Elefteriya wiha dike û tu milîtan î pêwîst e ji Elefteriyayê zêdetir bikî. Milîtanî ji mirovan vê dixwaze. Tê bêjî, bila rêxistin ji min re bêje, rêxistinê jî ji min re negotiye. Însanên bi vî rengî gevezetiyê dikin û vala-vala daxivin. Yê ku xapandinê esas digire wiha dike. Kadroyê rêxistinê wiha naxive. Niha li vir em fermanekî bidin kê/î wê tavilê pêkbîne, ji tirsê be, ji hezkirinê be pêktîne. Tu ji kê re bêje wê pêkbîne. Qîmeta vê nêzîkbûnê nîne. Milîtan ne kesayetekî ku bi talîmat û fermanan kar pêktîne ye. Milîtan yê ku li gorî pêwîstiyên tevgerê tevdigere ye. Yê ku pêdiviya tevgerê her dem destnîşan dike û li gorî wan pêdiviyan di pêkanînê de israr dike û di pratîkê de pêkanînê dide pêşberî xwe ye. Ferq û cudatiya milîtanekî û welatparêzekî di vir de ye.

Wetapêrêz bi fermanan tevdigerin, milîtan bi talîmatan tevnagerin. Jixwe tu endamê vê rêxistinê yî dema ku te talîmat girt, jixwe tê pêkbînî, tu nikarî bêjî ez nakim. Ev, mirov nake milîtan. Talîmatê vê tevgerê gelek mirovên derveyî vê tevgerê pêktînin û bi vê nabin kadro. Tu jî milîtanê vê tevgerê yî û tu bi vî nabî kadro. Tu bi çi dibî kadro, dema ku tu li gorî hedefên vê tevgerê meşiyayî û te pêkanî, te pêdiviyên rêxistinê destnîşan kir û te dan pêşberî xwe û pêkanî; wê demê tu dibî kadro. Yê ku mirov dike kadro ev e. Yê ku vê esas digirin ti car li benda kontrolê û fermanan namînin. Kadro bê talîmat û kontrol tim kar dike. Ji ber ku li gorî pêdiviya tevgerê tevdigere. Pêdiviyên rêxistinê jî bi dawî nabin, te yek pêkanî yê din destpêdike. Wê demê tu her dem li ser xeta rêxistinê û taktîkên wê dimînî. Tim tu di xizmeta tevgerê de dimînî. Yê ku bi venêrîn û talîmatan kar dikin, li ser xeta rêxistinê namînin. Ew weke memûran kar dikin. Dema talîmatek hat kar dike û dema ku ferman nehat kar nake. Li kêfa xwe dinêre, memûr wiha dikin. Milîtanê vê tev-gerê nikare wiha bike.

Dema bû rêveber û venêrîn li ser çêbû kar dike, yan jî mirov bala xwe didiyê dema ku rêveber ne hazir be, defê lêdide û dîlanê dike. Wekî memûran nêzîk dibin. Ti têkiliya vê bi milîtaniyê re nîne. Milîtantiya vê tevgerê ne milîtantiyeke bi vî rengî ye.

Ma îro kes talîmatan dide Rêbertiyê û dibêje ka vê bike, kes nabêjê. Lê Rêbertî ji bo xwe talîmatan diafirîne, ji bo xwe emran çêdike. Ma kes li ser kontrolê dike, kes nake lê xwe bi xwe kontrol dike. Bi çi çêdike, bi hedefê vê tevgerê û xeta wê çêdike. Lewra rêxistinbûn ew e, milîtantî û hevaltiya Rêbertiyê ew e. Hevaltiya Rêber APO vê ji mirov dixwaze. Mirovê bi xetê xwe kontrol bike, bi xetê emran dide xwe. Wê demê mirov ji xetê dernakeve û ji hedefê tevgerê û armancê wê dûr nakeve. Her tim wê xizmeta tevgerê bike. Yek ji te re bêje rûne jî, tu nikarî rûnê. Niha ji Rêbertiyê re kî bêje rûne jî rûnanê, nikare rûnê. Ji ber ku li gorî pêdiviyên rêxistin û tevgerê tevdigere. Ji ber wê her tim di nav kar û xizmetê de ye.

Rêbertiya ku hûn qebûl dikin, pê re hevaltiyê dikin wiha ye, rêxistina ku hûn pê re ne wiha ye. Hûn ê vê ji xwe re esas bigirin. Mînak carna tu dinêrî heval dibêjin: 'kesî ji min re tiştek negot, ji ber wê min nekir.' Her kes dikare pîştî jê re hate gotin bike. Ti qîmeta vê nîne. Mirovên di nav civakê de wisa tevdigerin. Milîtan wiha tevnagere û her dem bi berpirsiyarî dijî. Kemasî û şaşitî çi ne?

Wê çawa van kêmasiyan rabike? Pêdivî bi çi heye, wê çawa pêkbîne, derfetên pêwîst çawa dikare pêkbîne? Her dem di lêgerîn û lêpirsîna vê de ye. Tim di nav çalakî û karê wê de ye. Milîtantî ev e.

Tiştên divê bê kirin ber çavan e. Lê hûn encamê jê dernaxin. Ji ber ku hûn rêxistinê najîn. Ger hûn rêxistinê bijîn, hûn ê ji her tiştî encamê derbixin û wate bidin her tiştekî. Hûn ê lêpirsînê bikin, li gorî xeta rêxistinê hûn ê her dem lêpirsînan ji xwe bikin. Ev ê we di nav kar, xebat û xetê de bihêle. Lewra şêwazê di nav PKK'ê de bikar tê ew şêwaz e.

Hevalên di zindana Amedê de ti têkiliya wan bi rêxistinê re nebûn, bi salan dijmin têkiliya wan qut kiribû. Wan hevalan nedizanîn ka derve rêxistin heye tineye, xebat heye tuneye, çi pirsgirêk hene, nedizanîn. Derfetên rêxistinê jî nebû ku ji wan re pêşketinan ragihîne, derfetên rêxistinê nebû ku ji wan re derfetên madî û hwd... jî rêbike. Rojekê jî wan hevalan negot, çima rêxistinê bi me re têkilî çênekir û parêzer negirtin, em bi vî rengî tenê hiştin... Ji ber ku di hizir û dil de rêxistin dijiyan. Dizanîn ku derfetên rêxistinê nîne ku ji wan re peran bişîne û wan re têkiliyê çêbike. Ji ber wê ti demî rexne nekirin û bi ruhê berpirsiyariyê tevgeriyan. Di kesayeta wan de berpirsiyartî pir xurt bû. Tiştek ji rêxistinê nexwestin, heta dijmin dixwest di kesayeta wan de rêxistin û gel dîl bigire, da ku rêxistin û gel radest nekin xwe helandin. Xwe kirin çerm û hestî. Da ku şerefa rêxistin û gel nekin bin lingan. Negotin rêxistinê tiştek neda me, xwedî li me derneket, em ê çawa xwedî li vê rêxisitnê derkevin. Kesî ji wan re negot bila dest bi rojiya mirinê bikin û xwe bişewitînin. Me ji wan tiştek nexwest, tenê me digot bila xwe biparêzin bes e. Lê wan rewşa rêxistin û gel dan ber çavan û derdor dan ber çavan û ne ku tenê xwe biparêzin, partî û gel jî biparêzin.

Dîtin ku rêxistin ne dikare bi wan re têkiliyê deyne, ne jî dikare têkoşînê berdewam bike. Divê berpirsiyariyê hemû bidin ser milê xwe. Ji wan çi berpirsiyartî tê xwestin divê ku pêkbînin. Dîtin ku berpirsiyariyeke mezin hem ji wan hem jî ji rêxistinê tê xwestin, dîtin ku dijmin dixwaze îradeya wan ji wan bistîne. Li dijî wê gotin "gelo em çawa bikin ku li pêşiya vê bigirin, ji me çi tê xwestin." Fikirîn bi xwe re nîqaş kirin û gihîştin biryareke ku dest bi rojiya mirinê û parastina rêxistinê bikin. Li pêşiya vê siyaseta dijmin bigirin.

Kesî ji Zîlanê nexwestibû ku çalakiyê li Dêrsimê bike. Lê wê bi xwe dît ku dijmin êrîşan dibe ser Rêbertiyê û ji bo Rêbertiyê tine bikin li Şamê teqînek pêkanî. Dît ku ev îmhakirina gel û tevgerê ye, wê jî çi kir, çû xwe di leşkeran de teqand. Got hûn wiha me îmha bikin, em ê jî we îmha bikin. Ji gel re çi got, "dijmin dixwaze serokê we îmha bike û divê ku hûn li hemberî îmhayê wiha bisekinin. Weke din hûn nikarin li hemberî dijmin bisekinin."

Lewra di nav PKK'ê de milîtanî li ser vî esasî ye. Wê demê milîtantiya di nav PKK'ê de bi temamî xwe bi hedefên PKK'ê ve girêdan û xwe kirina bin xizmeta wê de ye û pêdiviyên tevgerê pêkanîn esas girtin e. Milîtantî li ser vî bingehî ye. Kesayetên bi vî rengî mirov dizane milîtanê vê rêxistinê ne û mirov bi wan piştrast e. Lê yên bi ferman û venêrîna kar dikin, di kesayetên wiha de berpirsiyarî û cidiyet nîne. Ti demî hedefê vê rêxistinê nakin yê xwe, erkên vê Rêxistinê ji bo xwe pîroz nabînin. Ew kesayet xeternak e û biçe ku jî xeter e, di kîjan erkê de be jî bila bibe xeternak e. Hûn ê bi van pîvanan bizanibin ka tevgera şexs li gorî PKK'ê ye yan na, bi vî rengî hûn ê kesayetan rehet binasin.

Li hemberî van kesayetên ne li gorî pîvanên PKK'ê ne, hûn ê weke wan mirovên dev ji xwe berdidin nebêjin "kes agahî û ferman neda me; me didît, me fêm dikir û em li dijî nesekinîn." Piştî buyer qewimîn bila kesek van axaftinên wiha erzan neke! Her tim mirov nayê agahdarkirin. Ji lewra divê tu rastiya rêxistinê fêm bikî, tu li gorî wê çi yê rêxistinê ye, çi ne yê rêxistinê ye, çi dikeve xizmeta wê, çi jî ziyanê didiyê van tev ji hev derbixî. Tê li dijî yên derveyî xeta rêxistinê têbikoşî, erka te ev e. Kadro wiha ye, milîtantî jî rastiyeke wiha ferz dike. Niha heke ez bêjim va ji te re agahî ev, rewş wisa ye, tê bi vî rengî tevbigerî, wê demê milîtantiya te li ku ma? Mirovekî ji rêzê jî dikare milîtantiyeke wiha erzan bike. Lê milîtantî ne ev e.

Milîtantiya PKK'ê bi temamî xwe ji modernîteya kapîtalîzmê qut kirin e. Ji har aliyê ve xwe qut kirin e, ew ji xwe dûrxistin û jê nefret kirin e. Kesayetên wiha dikarin li hemberî sîstemê têbikoşin. Nahêle sîstema desthilatdar bandorê li ser bike. Yê ku xwe ji modernîteya kapîtalîzmê qut nekiribe û jê nefret neke, nikare li dijî wî jî şer bike. Şer bike û li hember bisekine jî dîsa bêfayde ye. Kesayetên wiha ne durust in û bi wan re durûtî heye. Wê hem kapîtalîzmê bijî, xwe jê qut neke, tenê ji hin aliyan ve xwe qut bike, lê ji binî ve xwe qut neke, xwe di bin bandora wê de bihêle, wê jê nefretê neke

û paşê jî wê bêje “ez li dijî wê disekinim û ez ê bisekinim.” Ev ne gengaz e, kesayetên wiha ti car nakevin nav rastiya Rêbertiyê û wê nasnakin. Nikarin pêdiviyên tevgerê destnîşan bikin û pêkbînin.

Lewra yê ku dixwaze bikeve nav sîstema Rêbertiyê û pêdiviya wê sîstemê pêkbîne wê çi bike? Divê bi temamî xwe ji modernîteya kapîtalîst xilas bike, qut bike û jê nefretê bike. Wê nefreta xwe bigihîne hizirandinê, rêxistin û çalakiyê. Wê demê bi rastî dikare li dijî wê bisekine û sîstema Rêbertiyê pêşbixe. Bi temamî wê kesayet û jiyana xwe li ser vî esasî veguhezîne. Wê demê dikare encamê bigire.

### Îrade Bi Hestan, Zanebûnê Û Ruh Bihêz Dibe

Di şêwazê Rêbertiyê de hestên ku berovajî bûyî rastkirin esas e. Li ser vî esasî hestên azadiyê pêşxistin bingehîn e. Ji ber ku sîstema heyî di hestan de berovajî kirinê û ji rê derxistinê çêdike. Hestên di xizmeta aşitî û demokrasiyê de kor dike. Hestin din pêşdixe û digihîne ajoyan. Ajoyan di wan de pêşdixe. Herî zêde jî ajoyên cinsî pêşdixe. Spor, huner hwd... hemûyan ji rê derdixe û hestan dikuje û ajoyan di şûnê de pêşdixe û mirovan ber bi lawirbûnê ve dikişîne. Mirovan kor dike û dikuje.

Ji ber wê di kesayeta Rêbertiyê de ew hestên ku dagirkeriyê, sîstema kapîtalîzmê ya modernîteyê kuştî, careke din vejînandina wan li gel Rêbertiyê esas e. Li cihê wan hestên ku ji rê hatine derxistin, hestên xwe pêşxistin û rastkirin esas e. Lewra hinde hestên Rêbertiyê yên mezin û xweşik pêşxistin bingehîn e. Hestên mezin û xweşik kîjan in, yên ku xizmeta aşitiyê û azadiyê dikin, xizmeta wekheviyê dikin in. Derveyî van hestan, hest ji bo me nabe, divê ku em van hestan di xwe de mezin bikin. Divê ku em tim van hestan pêşbixin da ku ji rê derketin, korbûn pê re çênebin. Ji ber ku sîstem her dem bi hestan dileyîze. Her dem xîtabê ajoyan dike, hestan ber bi ajoyan ve dibe. Ji bo ku sîstem nikaribe di kesayeta me de wê ji rê derxistinê pêkbîne û çêbike, pêwîst e, em li ser hestên xwe jî serweriya xwe çêbikin. Em hestan terbiye bikin. Wan ajoyan bikin hest û wan hestan têxin xizmeta azadiyê û wekheviyê. Di kesayeta Rêbertiyê de ev esas e. Bala xwe bidinê dema Rêbertî hate girtin got: “min hestên xwe yên berê kuştin û hinek hestên din li gel xwe pêşxistin.” Di bin şert û mercên dîlbûnê de ev kir. Li gorî wê divê ku hest pêşbikevin. Mirovek li derve be û yek dîl be cuda

ne. Heke wan şert û mercên zindanê li ber çavan negire, wê şaşitiyên mezin bike. Divê ku mirov wê ferq û cudatiya di navbera dîlbûnê û derve re bigire ber çav.

Ger tu di zindanê de yî tu bêjî ez li der ve me, wiha nêzî meselan bibî, ev ê bi te re şaşitiyan çêbike. Rêbertî piştî hate girtin, li zîndanê di hinek hestên xwe de guhertin çêkir û dîsa hinek hestên nû jî pêşxist. Ji ber ku di paradîgmayê de guhertin çêkir. Ew hestên li gorî paradîgma kevin cuda bûn, li gorî ya nû pêwîst bû hestan cuda pêşbixe. Ji ber wê digot "min di hestên xwe de hinek guhertin çêkirin, min hinek kuştin û hinekên nû pêşxist."

Heke mirovek li ser ajoyên xwe kontrolê çêbike, li ser hestên xwe giraniyê çêbike dikare wê bike. Wiha nebe dibe dîlê hest û ajoyên xwe. Di PKK'ê de xaleke girîng jî ev e ku tê li ser hest u ajoyên xwe kontrolê çêbikî. Tê ajoyan bikişînî hestan û hestan bikî xizmeta azadiyê. Wê demê hestên te û ajoyên te, te nade meşandin, berê te nade cihên şaş. Ango tê xwe terbiye bikî û li ser xwe kontrolê çêbikî. Wê demê tê ajo û hestên xwe kontrol bikî. Tu wiha nekî tu nikarî, ger te wiha nekir wê demê hest û ajoyên te wê li ser te serwer bin. Jixwe pergal her roj xîtabê wan dike, ji rê derxistinê pêşdixe. Wê demê bi temamî hestên te wê te bibe pergalê. Wê te bike bin xizmeta pergalê, heke tu naxwazî bikevî bin xizmeta pergalê, di vir de pêwîst e tu kontrolê çêbikî. Da ku ew ajo ziyanê nedin te û hestên te nebin xeternak û xizmeta armanca te bikin.

Hest çî ye? Pêwîst e mirov wê jî baş fêm bike, heyecan e, kîn e, nefret e, ezm e, şermkirin e, hezkirin e, bengînî û şerkirin e. Hest ev in. Tu van hemûyan komî ser hev bikî dibin îrade. Yê ku li ser hestên xwe serwerî kir xwedî îrade ye. Yê ku ev nekir bêîrade dibe. Her kes dikare berê wî/ê bide aliyekî. Lewra di nava tevgerê de tesfiyeger derdikevin, tu temaşe dikî hema rehet bandorê li ser hinekan dike. Ji ber ku îradeya wan lewaz e, kesayetên wiha bi wan re îrade nîne. İiradeya rêxistinê li gel xwe çênekiriye, îradeya xwe û ya rêxistinê nekiriye yek. Ji bo wê tesfiyeger wiha rehet bandorê li ser îradeya wan dike û berê wan didin derveyî rêxistinê. Paşê jî dibêje "bi min leyîstin, min nedizanî, min fêm nekir." Tu têyî lîstikê, ji ber wê bi te dileyîzin. Çima bi yekî din naleyîzin! Çima heta roja me ya îro tesfiyegerek nêzî min nebûye? Ger nêzî min bûne jî, lê qet nikaribûne bi min bileyîzin. Ji ber ku min ew zemîn di xwe de kuştiye, nikarin bi min beleyîzin. Ne gengaz e, newêrin bikin jî. Ji

ber ku min îradeya xwe û ya rêxistinê kiriye yek. Hestên xwe û bi yên rêxistinê re kiriye yek, min hestên rêxistinê kirine yên xwe. Min heyecana rêxistinê kiriye ya xwe, ji her milî ve ez rêxistinê ji bo xwe esas digirim. Ji ber wê têgihîştineke derveyî rêxistinê, nikare bandorê li ser min bike.

Lewra dema mirov îradeya xwe ya rêxistinê neke yek, wê demê têgihîştinên derveyî rêxistinê rehet bandorê li ser mirov dikin. Sîstem rehet dikare bandorê li ser mirov bike. Ger li ser hevalan bandor dibe, ji ber wê bandor dibe. Mirov bala xwe bidiyê, Rêbertî û rêxistin bi salan ji wan re dibêjin û kar dikin ji bo bandorê li wan neke, lê tavilê bandora sîstemê ya kêrnehatî, tesfiyeger rehet li ser wan dike. Ev rastiyekî îfade dike. Ewqas sal e bandora vê rêxistinê û Rêbertiyê li ser nabe, bandora şehîdên vê rêxistinê û nirxên wê li ser serwer nabe û lê, hema tesfiyegerek derdikeve bandorê li ser dike! Ev tê wê wateyê ku bi vê rêxistinê re nebûye yek. Rast e di nav rêxistinê de ye, dibe ku ji bo rêxistinê hinek kar kiribin jî, lê bi rêxistinê re tam nebûye yek. Hinek aliyên ve xwe bi sîstemê girêdaye, lewra tesfiyeger dikarin li ser bandorê bikin. Divê mirov van aliyan baş bibîne û fêm bike.

Ji ber wê hûn ê xwe ji bin bandora sîstemê derbixin. Hûn ê bi wêrekî biçin bi ser wan taybetmendiyên xwe de, bi temamî sîstemê di kesayeta xwe de bikujin. Pergal û têgihîştinên wê bi çi rengî dibin bila bibin, divê ku li ser we bandorê neke, da ku hûn bikaribin milîtantiyê bikin. Heke di Rêbertiyê de îrade ewqas xurt e, ji ber ti îrade nikare li ser ya wî hûkum bike û nikare îradeya Rêbertiyê bişkîne, lewaz bike. Di kesayeta Rêbertiyê de hestên azadiyê pir mezin in, ji ber wê ye. Ji ber ku hemû hestên xwe li gorî azadiyê pêşxistiye. Îradeya xwe bihêz kiriye û kes nikare bişkîne, pê bileyîze û lewaz bike. Nikarin li ser hesaban jî bikin. Her ku dixwazin îradeyê lewaz bikin, bişkînin û dîl bigirin, Rêbertî hîna xurttir li hemberî wan derdikeve. Ji ber ku hestên xwe yên azadiyê bihêztir dike, ji ber wê ye.

Rêbertî li hemberî vîn şikandinê wiha disekine û wiha vîna xwe diparêze. Heke yek bixwaze îradeya te bişkîne û tu vîna xwe bihêz nekî, tu nikarî li dijî wî bisekinî. Vîn bi çi awayî bihêz dibe, dema te kîn nefreta xwe, hezkirina xwe bihêz kir, tu dikarî îradeya xwe jî bihêz bikî. Vîn li ser hestan, zanebûnê û ruh bihêz dibe. Weke din bihêz nabe. Ger te çiqasî hestên azadiyê di xwe de bihêz kirin, hizir û ruhê wê bihêz kir, wê demê vîna te bihêz dibe, kes nikare wê îra-

deyê bişkîne. Ger te ew bihêz nekir û hestên din hewand, bûyî xwedî hizir û ruhekî din, wê demê sîstem rehet dikare li ser te bile-yîze û li ser te bandorê bike, encamê bigire û te dîl bigire. Rehet dikarin te bişemitînin.

Pêwîst e, hest û hizir her dem hev pêşbixin û hev bihêz bikin. Hest hizirê, hizir jî hestan divê ku bihêz bike. Divê ku hev wiha temam bikin. Ger ev pêkhat, ev çi derdixe, rêxistinê û rêxistinbûnê pêşdixe. Rêxistinbûn jî çi pêşdixe, çalakiyê pêşdixe. Heke hest û hizir bigîhên hev ne gengaz e di wir de gavên bi rêxistinîbûnê tu nevêjî. Ne gengaz e ku te gavên rêxistinî avêt tu çalakiyê li pêş nexî. Ev hemû li pey hev tên û hev temam dikin. Hest û hizir û rêxistinê, rêxistin çalakiyê û çalakî careke din hest û hizirê pêşdixe. Ev wiha hev temam dikin. Lewra di kesayeta Rêbertiyê de ji ber ku ev hev temam dikin, Rêbertî her tim encamê digire. Ji bo wê encamê digire.

Di kesayeta me de ev wiha pêk nayê. Yan hizirê me cuda ne, yan hestên me cuda ne, ruhê me cuda ye, yan jî em van di hinek aliyan ve dikin yek û di rêxistinîbûnê de hinek gavan diavêjin, lê di çalakiyê de navêjin. Em van nakin xizmeta hev de. Di navbera van de têkiliyê çênakin û nagihînin hev, ji ber wê di pratîka me de zêde encam nayên girtin. Di kesayeta me de ji ber ku hestên wiha mezin nînin û hestên besît hene, hizirên besît hene, ji ber wê ruhek û kesayetek besît çêdibe. Ji ber wê jî di rêxistin û çalakiya me de zêde encam dernakeve. Sedem ew hestên besît in. Ên ku bi xwe re kesayeteke besît çêdike. Ji ber wê di rêxistin û çalakiyê de jî paşdemayîn û binkeftin çêdibe. Wendakirin çêdibe.

Kesayetên hest û hizirên xwe mezin bin, rêxsitinîbûn û çalakiya wan jî mezin dibe. Yên rêxistin û çalakiya wan mezin be, hest û hizirên wan jî mezin dibin. Hedefê mirov çiqas mezin be, di kar û pratîkê de jî mezin kar dikin. Dema mirov bixwaze mirovekî baş nas û fêm bike, divê mirov li hedefê pêşberî bibîne, hedefê wî çî ye, çiqasî hedefên mezin yan biçûk dide pêşberî xwe, ev rastiya kes nîşan dide. Wiha hedefên mezin dayîna pêşberî xwe, lê besît karkirin, tê wateya durûtiyê. Heke mirovek hedefeke besît dide pêşberî xwe, wê demê naxwaze ku kar mezin bike, keyfiyetê esas digire, naxwaze xwe biêşîne ku karê mezin pêşbixe.

Rastiya Rêber APO mirov fêm bike, ji bo her kesî pîvan e. Her dem hedefê mezin digire dest. Da ku rêxistin û çalakî jî mezin bibin. Ti car Rêbertî hedefên biçûk û besît nedane pêşberî xwe, rehetî

nedaye pêşberî xwe. Tim hedefên mezin dane pêşberî xwe, da ku rêxistin û pratîk mezin çêbibe, karibe pirsgirêkan çareser bike. Da ku encamê bigire. Milîtanê PKK'ê wê vê bibîne û fêm bike. Wê vê ji bo xwe esas bigire.

## Hest Û Hedefên Mezin, Mirovan Ber Bi Hezkirineke Mezin Ve Dibe

Mirov temaşe dike milîtanê vê tevgerê ye, lê hestên azadiyê tê de lewaz in, di hestên wî de çi heye? Eşq heye û hezkirin heye. Ne eşqê azadî, gel, welat û hevaltiyê ye. Eşqê çî ye, xort be ji jinekê hez dike, jin be ji xortekî hez dike. Jê re jî dibêje 'eşq, hezkirin û tercîh.' Tu dinêrî du rojan de hev dîtine û ji hev hezkirine û bûne evîndarê hev. Roja sisiyan jî reviyane. Ji vê re jî dibêjin 'hezkirin û eşq.' Ti têkiliya vê bi hezkirin û eşqê re nîne. Di vir de ajo hene, hest jî nîne. Wê çawa ajoyên xwe têr bikin, li pey vê ne. Ji jinekê hezkirin, yan jî ji zilamekî hezkirin rehet dibe? Ne wiha rehet e. Binêrin analîzên Rêbertiyê dibêje " ez nikarim zû zû wiha rehet ji yekê hez bikim. Hinde min xwe pêşxist, nirx ava kir û pêşketin çêkir jî, lê hîna xwe di wê astê de nabînim ku mirovek ji min hez bike." Rêbertî wiha erzan nêzî hezkirinê nabe. Hîna jî Rêbertî dibêje "ez ji xwe bawer nakim ji jinekê hez bikim, jinekê wiha ez nabînim ku jê hez bikim. Yan hevalekî xort ez nabînim ku jê hez bikim û rêzê bidimê." Pîvanên Rêbertiyê pir li pêş de ne. Pir bihêz in.

Dibêjin PKK û Rêber APO pîvanên mezin ji bo xwe esas girtine. Pîvan her tim mezin kirine. Tu di Rêbertiyê de nikarî lewazbûna pîvanan û yan jî pîvanên heyî paşdekişandinê bibînî. Her dem pîvanên heyî bihêz û mezin dike. Yê ku bi Rêbertiyê re hevaltiyê dike, wê vê ji bo xwe esas bigire. Wê her dem di xwe de pîvanan mezin bike û di xwe de pîvanan kêm û besît neke, paş de nekişîne. Rêbertiya ku em qebûl dikin rêbertiyeke wiha ye. Pîvanan her dem mezin dike. Heke Rêbertî her dem encamê digire, ji ber wê digire. Hinde di bin berpirsiyariya wî de pêşketin çêdibin, ji bo wê pêşdikevin û dibin sedema jiyanê.

Min gotibû, hinek dibêjin em ji hev hez dikin û roja diduyan direvin. Diçin dijmin, ji vê re dibêjin hezkirin. Di vir de hezkirin nîne, îxanet heye. Mirovekî rêxistinê, mirovekî ku azadî ji bo xwe esas girtibe, wê hemû têkilî û gavên xwe li gorî wê pêşbixe. Têkiliya wî, gavên wî xizmeta çi dike, wê vê her dem lêpirsîn bike. Însanê

rêxistinê dema têkiliyekî jî pêşdixe û gavekî diavêje, wê bizane di hedefê wî de çi heye? Ew gava diavêje xizmeta hedefên wî/ê dike yan nake. Çiqasî nêzîkî hedefê dike û yan jî dûr dixe, yan wî hedefê dike xeteriyê, pîvan wê ev bin. Heke têkiliyek, gavek hîna zêdetir mirov nêzî azadiyê dike, wê demê ew gav û têkilî rast in û di cih de ne. Na heke te dûrî azadiyê dixe û paş de dikişîne, hela-hela te dibe îxanetê ew teqez şaş e.

Rêber APO jî dibêje, “min bi Fatima re deh salan têkilî meşand û min xwest ez bikim xizmeta azadiyê, min dît ku Fatima min dikişîne pîvanên kevneşop, dixwaze min bikişîne îxanetê. Ji ber wê min ew têkilî qut kir. Ji ber ku min dît wê têkiliyê ez berdewam bikim, bi vî rengî ez ê xelas bibim û ez ê vî gelî û tevgerê xelas bikim. Min tercîh kir, yan ez ê bibim zilamekî klasîk û tiştên ku Fatima dixwaze bikim, yan jî min ê ew terk bikira. Min tercîha xwe di milê azadî û gel de kir û di aliyê rêxistinê de kir. Ne di aliyê têkiliyeke kevneşop de min kir. Ji ber ku min dît wê min ji hedefê min dûr bixe, heta ne tenê dûrbixe; gengaz e min bibe îxanetê. Ez jî mirovekî girêdayî hedefê xwe bûm, her têkiliyeke xwe min li gorî hedefên xwe pêşdixist, min dît ku ev têkilî xizmeta wan hedef û armancên min nake û xeteriyê çêdike, lewra min terk kir.” Heval van di analîzan de dixwînin. Ji bo wê milîtanê vê tevgerê wê di têkilî û gavên xwe de vê esas bigirin. Nikare wiha bêhesab gavan bavêje û têkiliyan pêşbixe. Tu dixwazî jineke bi zilamekî re be, dixwazî bila bi gundekî re be, bi bajarekî re be, dixwazî bi mirovekî re be, hemû gavên xwe û têkiliyên xwe li gorî hedefê û di bin xizmeta tevgerê de wê bavêje. Gavên ku davêje wê di bin xizmeta hedefê de bin. Dema dît ku gavên davêje xizmeta hedefê nakin, wê tavilê terk bike.

Tu dinêrî gelek heval vala vala digerin. Ji xwe hedef û armancên wan nîne. Di naverastê de ji xwe re digerin. Wê çi bike, çi neke ne diyar e, wê fesadiyê bike û texrîbatê bike. Mirovek rêxistinê gavekî xwe jî bê armanc û erk navêje. Niha tu min bikujî jî ez bê erk gavekî jî navêjim. Teqez karekî rêxistinî heye ji bo wê diçim, karê xwe dikim û dizivirim cihê xwe. Cihê ez diçimê ji bo karên rêxistinî diçim. Ez bê karekî rêxistinî naçim cihekî jî. Min bikujin jî ne gengaz e ez têkiliyeke ku xizmeta armanc û hedefê neke pêkbînim. Ger ez nêzî kîjan têkliyê dibim ez hedef didim ber çavên xwe û wiha nêz dibim. Ger ez ji yekî hez dikim jî, wê hezkirinê ji bo wî hedefî dikim. Weke din ez hez nakim. Dema xizmeta wî hedefî bike ez hez dikim,

ger xizmeta wî hedefî neke ez heznakim. Hevaltiya min li ser çi esasî ye? Li ser hedef û armancê rêxistinê ye. Weke din kesî nasnakim. Ez nabêjim ez berê nasdikim, me berê bi hev re kar kiriye, naskirinekê wiha nîne. Naskirina min li ser hedefê vê rêxistinê û xeta vê rêxistinê ye. Nêzîkbûna min jî bi temamî li ser van pîvanan e ji ber ku ez mirovekî rêxistinê me. Ger ez bizanim mirovê pêşberî min, wê gavekî pêş de biavêje, heke pêwîst be, ez lihevkirinê jî dikim. Ango hemû nêzîkbûn, têkilî û gavavêtin divê di xizmeta armancê de bin. Ger xizmeta armancê kir wê demê mirov berdewam dike. Dema ku xizmet nekir mirov terk dike. Car caran tu wan pêşdixî û kar dikin, lê piştî wê tu dibînî berovajî xizmetê dikin. Wê demê tê terk bikî. Ger te terk nekir gava yekê çiqasî rast be, ya dawiyê ewqasî şaş e û berovajî dibe. Te gava yekemîn de çiqasî encam girtibe jî, dawiyê de ji holê radibe.

Di meselê partîbûnê de ev hemû pir girîng in. Her hevalek wê van diqet bike. Dibêje “ez tercîh dikim, ez naçim perwerdê.” Rêxistin dibêje tê bê perwerdê, ew dibêje ez tercîh dikim, ez naçim. Dibêje ez tercîh dikim ku filan jinê yan jî zilamî re têkiliyê pêşbixim. Dibêjin ti têkiliya xwe bi rêxistinê re nîne û ev meseleyeke şexsî ye û têkiliyeke di navbera du kesan de ye. Tu têkilî din av rêxistinê de şêxsî nabe, û hemû têkilî bandorê li ser rêxistinê dikin. Tu têkiliya vê bi rêxistinê re nîne, dibêjin “çima hinde li ser tê rawestandin û tê nîqaş kirin.” Tu di nav vê rêxistinê de yî û tu parçeyekî vê rêxistinê yî her têkiliyekî te, axaftin, hemû liv û tevgera te têkiliya xwe bi rêxistinê re heye. Ev rêxistin rêxistineke siyasî û îdeolojîk e, her gavên te, her liveke te û axaftineke te wateyeke xwe heye. Çawa tu dibêjî bêwate ye? Bi vê çi dike, dibêje ez di nav vê rêxistinê de me, lê ez ne mirovê wê me. Ji ber ku têkiliya me du kesane û di navbera me de ye. Ti têkiliya rêxistinê pê nîne, ango em ne mirovê rêxistinê ne. Lê belê dawiyê de dibêje “ez mirovê rêxistinê me û têkiliya min jî têkiliyeke rast e”. Mirov hinde xwe naxapîne. Dibêje têkiliya ku ez pêşdixim ziyanê nade rêxistinê û kesayeta me. Têkiliya ku ez pêşdixim azad e. Li ser hîmekî azad e.

Rêber APO bi dehan salan kar kir ku têkiliyeke azad pêşbixe lê nikarî. Rêber APO ger pêşnexist wê kî pêşbixe. Tê çawa pêşbixî û çi hêza te heye. Heke ku bikarîba wê Rêber APO bikira. Di nav me de asta kê wekî ya Rêbertiyê ye? Ku bikaribe di van şert û mercan de têkiliyekî wiha pêşbixe. Ger pêşbixîstiba wê Rêbertî pêşbixistiba. Ji

ber wê pêwîst e, kes xwe û me nexapîne. Bihîstiye tercîh kirin heqekî demokratîk e, lê belê tercîh çiqasî demokratîk e wê nizane. Ji bo ku tercîheke demokratîk be çi pêwîst e, wê nizane. Tenê bihîstiye ku tercîh mafekî demokratîk e. Hem jî di nava PKK'ê de vê tercîhê pêşdixe û dibêje "ez hevalê Rêber APO me." Yê ku hevaltî bi Rêber APO re kirî, wê tercîhên Rêbertiyê ji bo xwe esas bigire. Wekî din tercîhekî ji bo xwe nabîne. Em ne zarok in, tu me bixapînî. Di vê rêxistinê de tercîh, tercîhên Rêber APO ne. Yê ku di vê rêxistinê de milîtantiyê dikin wê tercîhên Rêber APO ji bo xwe esas bigirin. Ji ber ku hatiye tevlî Rêbertiyê bûye, tevlî tercîh û xeta wî bûye. Tevlî ruh û hestên wî bûye. Tê bêjî ez hevalê Rêbertiyê me û tê tercîhên din pêşbixî û bêjî ev rast e û wan heq bibînî, wiha nabe. Pêwîst e yên wiha xwe ji xapandinê derbixin û xwe rast bikin.

Tercîhek çiqasî rast e û nerast e, pîvanê wê çî ye? Ger tercîh li gorî yê Rêbertiyê bin rast e, ne wiha bin şaş e. Wiha dibe, ger ne wiha be li dijî vê tevgerê ye. Tercîhek rast e, nerast e, pîvanê wê dîsa çî ye, têkiliya wê bi dîrokê re, bi çandê re, bi exlaq re, bi gel re, bi rêxistinê re, bi hevaltiyê re, bi îdeolojiyê re, têkiliya wê û siyasetê re tê binêrî. Ger ew tercîha li gorî rastiya vê tevgerê ye û xizmeta vê tevgerê û hedefê wê dike, ew tercîh rast e. Wiha nebe ew tercîh şaş e. Tercîhek bi serê xwe tenê nabe demokratîk. Yê ku keyfî nêzîk dibin wiha nêzîk dibin û dibêjin wiha rast e. Têkiliya wê bi Rêbertiyê re çî ye, qet nîqaş nake. Lewra ev nabe. Li vir pîvan ji bo milîtanekî pîvanên Rêbertiyê ne. Ji ber ku hatiye tevlî Rêbertiyê bûye, tevlî Rêbertiyê bûn tevlî hestên wî bûne, tevlî hizirê wî, rêxistina wî û şêwazê wî bûne. Di Rêbertiyê de jiyana rast, rast nêzîkbûnê û watedayînê dixwaze.

Rêbertî derveyî jiyana azad jiyaneke din nasnake. Di jiyana azad de israr dike. Tenê wê jiyanê dibîne, derveyî wê jiyana heyî jiyan nabîne û jê nefret dike. Ji bo wê jî her tişt divê xizmeta jiyana azad bike. Tiştê ku xizmeta jiyana azad nake, qebûl nake û wê kirêt dibîne, şaş dibîne û xirab dibîne. Hemû şerê Rêbertiyê, şerê jiyana azad e, ji bo wê dijî. Hemû derfetên xwe ji bo wê xerc dike. Di ber de canê xwe jî dide. Li derveyî vê jiyan û mirine ji bo xwe heram dibîne.

Lê tişta ku li cem me heye çî ye? Em her tiştî dijîn, bi her tiştî re dijîn, em vê jî xwezayî dibînin. Xizmeta azadiyê jî, xizmeta koletiyê jî, xerabiyê jî bike, wendakirinê jî çêbike, em van hemûyan normal

dibînin. Ango têgihîştineke me ya jiyanê nîne, lewra şêwaz bi me re nîne. Bêşêwazî bi me re heye, ji ber wê di gelek hevalan de ya ku tê dîtin, bêşêwazî ye. Ji ber ku şêwaz rêxistinbûnê îfade dike, li ser wî esasî pratîkbûnê hedef dike. Berpirsiyariyê, cidiyetê û disîplînê îfade dike. Ger di mirovek de her cure jiyan hebe, mirov dizane di wî de bêrêxistinî tê jiyîn. Bêberpirsiyatî û bê cidiyetiyê dijî. Belavbûnê, bêşêwaziyê îfade dike. Di kesayetên wiha de şêwaz nîne. Ew mirov pir xeternak e. Ji bo her tiştî vekiriye, di kesayetên wiha de her tişt derdikeve. Kesayeta rêxistinî ne kesayeteke wiha belave ye. Kesayeteke xwe birêxistin kiriye, xwedî cidiyet in, bi ruhê berpirsiyariyê tevdigerin û bi disîplîn in, xwedî hedef û armanc in. Xwedî kar e, bi plan û bername ye.

Nêzîkbûna milîtanên PKK'ê ji jiyanê re li ser bingehekî azad e. Li derveyî vê jiyana azad, li jiyaneke din nahizire. Fikir û lêkolîneke wisa jî nabe! Milîtan di xeta jiyana azad de timî gavan diavêje, her ku gavek avêt dibêje, "gelo ez çiqas nêzî jiyana azad im? Gavên min avêtine ez nêzî jiyana azad kirime, yan jî min dibe cîhekî din?" Lêpirsîn û muhaseba vê bi xwe re dike. Gelo çima vê lêpirsînê bi xwe re dike? Ji ber gengaz e mirov xwe bixapîne û bêje, "Ez ji bo azadiyê gavan diavêjim." Lê dibe ku mirov ji bo koletiyê jî gavan biavêje!

Niha gelek di nav me de xwe dixapînin, dibêjin em gavên azadiyê diavêjin û dikevin nav têkiliyeke şexsî. Ji vê re jî dibêjin gava azadiyê. Ezezîtiyê esas digirin û dibêjin ev gava azadiyê ye. Di ezezîtiyê de azadî nîne. Di ezezîtiyê de gemarî pêşdikeve, cudatî pêşdikeve, li wir cudakarî, têgihîştina desthilatiyê pêşdikeve. Azadî pêş nakeve, di wir de ezezîtî, koletî pêşdikeve.

Divê Em Ji Bo Çi Bijîn?

Di kesayeta Rêbertiyê de jiyana rast pir girîng e. Mirovê çawa bijî û çawa nejî her dem divê lêpirsîna wê hebe. Wê çi re bêje rast, wê çi re bêje şaş çî ye, her tim lêpirsîna wê heye. Ji bo mirov jiyan çi îfade dike, mirov wê çawa bijî, divê çi neyê jiyîn, her dem lêpirsîna vî li gel Rêbertiyê heye. Gelek dahuranên Rêbertiyê li ser vê mijarê hene. 'JIYAN DIVÊ ÇAWA BE?' ev ji bo vê bû. Niha em dibînin ku ev tê bikaranîn, ji aliyê kesên ku dixwazin jiyaneke şexsî bijîn. Em dibêjin pêwîst e, em ji bo çi bijîn û jiyaneke çawa bijîn. Em vê pêşdixin. Da ku em li pêşberî vê bikaranînê bigirin. Ger em gihan watedayîna sedemên jiyanê, em ê bikaribin bijîn.

Niha gelek kes ji xwe napirsin ka wê ji bo çi bijîn. Rêbertiyê xirab bikartînin. Rêbertî dibêje, em ê çawa bijîn, ew jî dikevin derdê jiyana xwe ya şexsî. Zêdetir bi jiyana xwe ya şexsî dibilin û bi awayekî kêfî tevdigerin. Ji ber vê ji rêxistin û gel derfetan dixwazin. Li şuna ku em pêşî li vê sûîstîmalê bigirin, em zêdetir li xwe difikirin.

Milîtanê PKK'ê wê baş zanibe ku ji bo çi dijî. Li gorî vê jî wê fikra çawa bijî wê pêşbixe. Da ku şaş nejî. Di milîtantiya PKK'ê de wer jiyankirin nabe. Jiyaneke milîtanê PKK'ê heye. Jiyana milîtanê PKK'ê, jiyana Rêber APO ye. Di jiyana Rêber APO de, tu ezezîtiyê nabînî, tu ligorîxwebûnê nabînî. Milîtanên vê rêxistinê bi temamî ji bo mirovahiyê, rêxistinê, hevaltiyê, axê û gel dijîn. Jiyeneke ji bo nirxên mirovahiyê heye. Jiyana xwe hemû li ser vî esasî bi rêxistin dikin. Di nav de cidiyet û berpirsiyarî heye. Bêhnekî jî dema xwe vala derbas nake. Rêber APO wiha dijî û wiha kar dike. Her kêliyeke jiyanê divê nirxek bê avakirin. Rêbertî ji bo hevaltiyê, gel û mirovahiyê dijî. Jiyana rast ev e. Ango jiyana ku her roj koletiyê lewaz dike, desthilatiyê lewaz dike û azadiyê û demokrasiyê pêşdixe ev e. Edaletê pêşdixe, jiyan ev e. Li derveyî vê em jiyaneke din qebûl nakin. Lumpenîzmê, serseritiyê, serxweşiyê em qebûl nakin û van şêwazê jiyanê jî nabînin. Xwe belav kirin, ezezîtî ne jiyan e. Ev tiştekî li derveyî qerekterê mirov e.

Mirov temaşe dike di hinek kesan de heta dawiyê jiyaneke ferdî ji rêxistinê dixwazin, dema ku rêxistin vê daxwaza wan qebûl nake, diçe cem dijmin. Dibêje "rêxistin çima nahêle ez çawa ku dixwazim bijîm û çima min naşîne Ewrûpayê, çima derfetan nade min ku ez pê bijîm." Hinek kesayet ji bo jiyaneke şexsî da ku bi derfetên rêxistinê bijîn, ji bo xwe qadan, peywiran û cihan çêdikin. Hinek rêveberiyên me jî ji bo hinekan derfetan çedikin. Ev suc e û bi Rêbertiyê re îxanet e. Bi gel û vê tevgerê îxanet kirin e. Rêxistina PKK'ê ne cihê van nêzîkbûnan e. Di vê rêxistinê de qasî tu nemîrî tê bixwî, wekî din tê kar bikî. Felsefeya "hirqek û loqmeyek" esas e. Li derveyî vî, her tiştên din hemû heram in. Jiyana Rêbertiyê li ser vê felsefê ye û li ser vî esasî ye. Li derveyî vê di vê tevgerê de jiyan nabe, rastiya Rêbertiyê ev e. Nêzîkbûna jiyanê divê li ser vî esasî be.

Lê belê ji ber ku em şaş dijîn, li cem me jiyan pêşnakeve û bihêz nabe. Jiyan di me de xweşik û balkêş nabe; nagihîje hedef, armanc û wateya xwe.

Di têkoşîna Rêbertiyê de mirovê azad çêkirin û ji bo wê têkoşîna wî kesayetî pêşxistin esas e. Ji ber ku bi her kesayetê tu nikarî mirovê azad çêbikî û pêşbixî. Yê ku mirovê azad çêbike û pêşbixe, ew kes e ku di serî de xwe azad kiriye. Ancax kesayeteke wiha dikare mirovê azad û civakeke azad pêşbixe. Lewra hedef û têkoşîna Rêber APO ji bo mirovên azad e û ev armanceke esasî ye. Rêbertî di têkoşîna xwe de analîzkirina mirovan esas digire. Bi vê hêza pêşketina kes esas digire, tiwaniyên kes esas digire; vîn û nasnameya kes digire dest û li ser vî bingehî pêşdixe. Lewra dema ku te ew pêşxist ew mirov dibe xwedî vîn û nasname. Wê demê mirov dikare ji xwe bawer be, li ser piyên xwe bisekine. Dikare xwe bimeşîne û xwe rêvebibe. Dikare xwe kontrol bike. Dikare xwe bimeşîne, ji hemû xeteriyan dikare xwe biparêze. Heke ku Rêber APO hinde li ser meseleyên kesayetê disekine û tehlîlan pêşdixe, hedef û armanc ev e. Ji ber ku mirovên Kurd tenê azadiya xwe wenda nekirine, her tiştê xwe wenda kirine. Mirovahiya xwe wenda kirine. Ji ber nêzîkatiyên desthilatdaran mirov e, ne mirov e diyar nake.

Dijmin mirovên Kurd xistiye wê rewşa ne mirovane, divê ku em di wê kesayetê de însaniyetê çêbikin, di şexsê wî însanî de jî însanekî azad pêşbixin. Ev zortirîn kar e. Li Kurdistanê dema te ew kar pêşxist tu dikarî azadiyê pêşbixî. Tu dikarî civakeke azad pêşbixî, weke din ne gengaz e mirov qala civakeke azad bike.

Di nav wê civaka ku mirov hatiye xistin û belawela bûyî de, di serî de divê ku ferd bê rakirin û ew kesayet bê rast kirin. Di wê kesayetê de divê azadî pêşbikeve. Ev jî bi rêka analîzên kesayetê dibe. Dema te ew kir tu dikarî rastiya wî lê bidî fêmkirin. Wê demê tu dikarî hêz, tiwaniyên wî/ê derbixînî holê. Li ser wî bingehî ew kesayet êdî dibe xwedî îrade û nasname. Lê ger te hêza kesî dernexiste holê, pê re tiwanî çênabin, li gel wî nasname çênabe. Ew mirov nikare ji xwe bawer be. Nikare li ser hêza xwe bimeşe. Ew ê teqez çavên xwe berde vir-wir. Wê xwe bike milkê kesekî/kesekê. Di mirovê wiha de jî azadî pêşnakeve.

Ger te li cem mirovê xwe azadî pêşxist, tu dikarî li Kurdistanê koletiyê bişkînî. Ger Rêber APO ewqas li mesela kesayetê girîng dît û wiha nêzîkî însên bû, sedem ev bû. Ji bo kesayeteke di her şert û mercî de dikare xwe îdare bike, xwe bimeşîne ava bike tevdigere. Ji bo mirov zû zû nekeve û kesên dîtir li ser nelîze, îradeya wî/ê neşkîne tevdigere. Dema te ev kir, wê demê li Kurdistanê tu dikarî mi-

rovê azad çêbikî. Kesayet ancax dikare bi vî awayî pêk bê, wekî din negengaz e kesayet pêk bê. Rêber APO kesayetê wiha digire dest.

Rêber APO wiha nêzîkî însên dibe û wiha wan digire dest. Lê em çawa nêzîk dibin û digirin dest? Em mirovên xwe ji bo xwe wekî bar dibînin, em hevalên xwe ji bo xwe wekî bar dibînin. Meyla me zêde ji bo hevalên me nîne. Em dixwazin her kes wek me be, yê ku weke me bû em qîmetê didinê û yê weke me nebû em dibêjin bêkêr e. Yan em didin revandin, yan jî ji gel xwe dişînin cihekî din. Tiştê em dikin ev e. Ya rastî ne gengaz e tu vê di Rêbertiyê de bibînî. Di nêzîkbûna Rêbertiyê de her însanek nirxek e, bi hemû lewazî, kemanî, hemû sucan ve jî kes nirx e. Tiştên divê bên kirin, hemûyan dike, da ku wî/wê kesî ji wan lewazî û kêmaniyan derbixe. Ji bo wî bike nirxekî mezin her tiştî dike. Wê çawa hêza ferd derxe holê, da ku ew mirov bikaribe li ser xwe bisekine û bikeve xizmeta rêxistin û gel de; wê esas digire. Mînak Rêbertiyê her dem digot: “ hevalên ku hûn nikarin pê, ji min re bişînin.” Hevalan jî dişandin. Kî lewaz be û bipirsgirêk be, hemû dişandin qada Rêbertiyê. Ew mirovên ku ji bo wan dihate gotin ‘lewaz in, nikarin û pirsgirêk in’, diçûn qada Rêbertiyê û du-sê mehan diman û paşê bi moral û bawerî dihatin. Pêşketin bi wan re çêbibû. Ji ber ku Rêbertiyê nedigot ev kêr nayê. Nabêje, ‘çima ez xwe ji bo van diêşînim, ez li rehetiya xwe binêrim.’

Rêbertiyê xwe diêşand da ku ferd ji wê rewşê derbixe, wiha nêzîk dibû. Yê me jî tam berovajiyê vê ye, em dixwazin her tişt wekî ku em dixwazin be; ger nebû jî em dibêjin kêr nayê. Yan em bi nêzîkbûna xwe didin revandin, yan jî em dişînin cihekî din û dibêjin “ev hevalê baş min ji we re şandiye.” Di vir de bêberpirsiyariyeke mezin heye. Lê Rêbertî her dem lewazî jiholêrakirinê esas digire. Rastiya Rêbertiyê û PKK’ê ev e. Lê belê em naxwazin yên ku serê me biêşînin hebin. Ango divê kes lewaz nebe. Em dixwazin her kes xurt be û weke me be. Em xurt in nexurt in, em rast in ne rast in, ev jî ne girîng e, lê divê ku hemû weke me bin. Dibê qey her kese ku hatiye nav rêxistinê, ji bo me hatiye nav rêxistinê. Tu dibêjî qey ferd hatiye weke me be, kesek nehatiye ku weke me bibe. Her kes hatiye weke rêxistinê bibe! Tevlî rêxistinê bûye, tevlî me nebûye. Her kes dê bixebite ka çawa bike ku rastiya rêxistinê re xwe bike yek. Ne ku bi rastiya rêveberan re, kesan re xwe bike yek. Ji ber vê sucê mezin di rêxistinê de çî ye? Tu dinêrî dibêje: “divê tu weke min bî” vê ferz dike. Dema ku te ev ferz kir, rastiya her kesî heye û her kesê bêje

“tu were ser rastiya min, çima ez ê bêm ser ya te.” Heke di navbera kesan de pirsgirêk derdikevin jî sedem ev e. Her kes dibêje “tu were ser a min.” Ji ber van li gorî xwe bûna di navbera wan de pirsgirêk pêşdikevin, lê yên wiha pir kêm in. Herî zêde nakokiya di navbera hevalan de derdikevin nakokiyên şexsî ne. Têgihîştinên wan kesan e û pîvanên wan bi xwe ne. Yek ya xwe li ser yê dinê ferz dike. Ji ber wê bi hev re îdare nakin. Mafê kesî nîne ku mirovê hatiye nav rêxistinê bikişîne têgihîştinên xwe yên şexsî. Ev li rêxistinê dizî kirin e û diziyeke mezin e. Li vir wê kes têgihîştinên xwe li ser kesî ferz neke. Wê têgihiştina rêxistinê bide pêşberî her kesî. Kesê ku tevlî rêxistinê dibe, tevlî têgihîştina wê dibe, tevlî ya şexsan nabe. Mafê ti kesî nîne wan kesên tevlî rêxistinê dibin bikişînin ser xeta xwe. Ev di nav rêxistinê de tê maneya diziyê. Ev bê exlaqiyeke mezin e. Mirovê hatiye tevlî rêxistinê bûye re, tu dibêjî “tevlî rêxistinê nebe tevlî min bibe, bibe milkê min, xwe weke min bike.” Ev di nav rêxistinê de mirovên rêxistinê jê dizîne. Ev dizî ye, bê exlaqî ye.

Di nav PKK’ê de kes nikare mirovê wê weke xwe bike. Bixe xizmeta xwe, ev sucekî pir mezin e û giran e. Erka kê çi dibe bila bibe, nikare mirovekî vê tevgerê bike xizmeta xwe, divê bike xizmeta tevgerê. Wê neke xizmeta xwe. Wê weke xwe neke û wê vê ferz neke. Mixabin hinek vê dikin, dibêjin “yan tê weke min bî, yan jî tê li vir nemînî” ji ber ku nayê ser rastiya wî, ji wir dişîne cihekî din. Yan jî gelek tiştên ne rast derbarê wê/î de dibêje. Yanî ku tu li ser cidî nesekinî, tu bêjî heval in, rêveber in û agahiyan didin, tu bi ya wan tevbigerî tê bikevî xeletiyên herî mezin. Bê exlaqiyeke wiha heye, çandeke wiha heye. Ev ne exlaqê vê tevgerê ye, ne jî çanda wê ye.

Lewra divê ti kes ti kesî tevlî xwe neke, tiştekî li ser yekî din ferz neke. Divê her kes heval û nirx bê dîtin. Divê her kes wê hevalê xwe çawa bilindtir bike, li ser vê bifikire. Vê têgihîştinê ji xwe re esas bigre. Di nav PKK’ê de nêzîkbûn û şêwaz ji bo milîtanan ev e. Çawa Rêbertî nêzîkî mirovan dibe wê wiha nêzîk bibe, ne li gorî kêfa xwe. Rêber APO di vê tevgerê de qasî ez dizanim, tenê du kes qewitandiye. Yê ku ez dizanim du sê însan hene, dema ji Akademiyê şandiye welêt silav nedaye wan û gotiye “biçin!” Teqez hatiye rûyê her hevalî, hatiye serê wan û bi coşeke mezin ew şandine welêt. Bi wan re axiviye. Tenê du-sê kes hene wiha Rêbertiyê rû nedaye wan, bi wan re xwarin nexwariye û ew rênekiriye û neçûye rûyê wan.

Ev Rêbertî ji bo mirov û gelê xwe dijî. Li gel vê Rêbertiyê nirxê herî mezin însanê wî ye, hevalê wî ye. Ji wê mezintir ti nirx nîne. Ji ber ku her tiştî bi wan mirovan çêdike. Ger te ew mirovan çawa çêkirin, tê di pratîkê de wê bibînî û wiha encamê bigirî. Serkeftina te jî girêdayî hevalê te û mirovên te ye. Heke ku tu dixwazî bi serkeftî bî, pêwîst e, tu hevalên xwe pêşbixî. Hevalê te li gorî xwe be, nav şaşitî û kêmaniyan de be û di nav xerabiyê de be, tu nikarî serkeftinê bijî. Ev ne gengaz e. Heke Rêbertî hinde li ser perwerdê hevalan û gel disekinî sedem ev bû. Ji ber ku dizanî dema ku vî gelî vî kadroyî ji vê rewşê dernexe nikare biserkeve. Ji ber vê bi şev û roj kar dikir. Serkeftina Rêbertiyê di pêşxistina gel û kadro re derbas dibe. Ji ber wê, kadroyê vê tevgerê wê vê ji xwe re esas bigire û wê kesek vir de wê de neke û nede revandin. Wê neşîne vir-wir. Ger lewaz e, wê li gel xwe bihêle û li ser bisekine, ji wê lewaziyê derbixe û paşê bişîne, ya rast ev e. Tu dinêrî bê exlaqiyek çêbûye, dema tu dibêjî filankes bişîne, tavilê dişîne. Dema dibêjî hevalan rêke perwerdê, tavilê ji kê neraziye wan dişîne perwerdê da ku xwe ji wan xelas bike. Ji bo ku serê xwe rehet bike, rêxistinê vala derdixe, lê tenê bila ew rehet be bes e. Di hedefa kesên wiha de ne pêşketina rêxistinê û ne jî serkeftina rêxistinê heye. Tenê ev heye wê çawa rehet be, bi vî rengî rojên xwe derbas bike.

Di kesayeta Rêber APO de jiyîn jî mirin jî ji bo hevaltiyê ye. Di rastiya Rêbertiyê de hevalên xwe pêşxistin esas e. Lê ya ku di kesayeta me de heye çî ye? Hevalên pê re pir di paş de ne û yek caran jî berovajî ye, li gel me tiştek nabe. Yanî heval e, ne heval e, dijmin e, ji bo me ferq nake, di nêzîkbûna me de ferq û cudatî li gorî rewşê çênabe. Hevalê xwe weke dijminê xwe dibîne, çiqas di nav kêm û kurtiyan de be jî ji vê rewşa hevalên xwe aciz nabe û nabêje ez ji vê rewşê derbixim. Nabêje dema ez dernexim wê ev kêmasî û şaşitî ziyaneke mezin bide rêxistinê, em ê ziyanê bibînin. Ger ne li gorî kêfa wî be silavê jî nade û vê xwezayî dibîne. Di nav PKK'ê de wiha dike, heke tu di nav PKK'ê de bi hevalekî xwe re neaxivî û hevaltiyê nekî, ew çi îfade dike? Dijminiyê îfade dike. Tu nehatî nav PKK'ê da ku dijminiyê bikî, tu hatiyî da ku tu hevaltiyê bikî. Tu hatî bi van hevalan hemûyan re hevaltiyê bikî. Hêza xwe û wan bikî yek, da ku tu bikarî encamê bigirî, tu ji bo wê hatî. Tu nehatî ku tu biqehirî û paşê pê re neaxivî, nêzîk nebî, xwe li ser yê dîtir ferz bikî... Ev di nav rêxistinê de tê maneya fesadiyê. Ev ezezitiya xwe li ser PKK'ê ferz

kirin e, ev jî çî ye? Li ser PKK'ê bêrêxistinî ferz kirin e. Ji ber ku ezezîtî bêrêxistiniyê îfade dike, di wê de israr kirin, her kes kişandina wê, li dijî rêxistinê sekinandinê îfade dike.

Di nav rêxistinê de kesek nikare wiha ezezitiyê bijî û pêşbixe. Nikare wê qebûl bike. Dibêje "ez wiha me, rastiya min wiha ye, min bi vî rengî qebûl bikin." Rastiya her kesî heye, lê bêjî "ez bêhnteng im, min wiha qebûl bikin." ti kes te wisa qebûl nake. Her kes bêhnteng e, wê demê di nav rêxistinê de pêwîst e em bi vî rengî her kesî qebûl bikin! Wê demê rêxistin li holê namîne, wê bibe şorbe.

Kes nehatiye rêxistin wiha wan qebûl bike, her kes rastiya vê rêxistinê qebûl kiriye û hatiye nav rêxistinê. Divê vê ji bîr neke. Yên ku hatine nav vê rêxistinê, hatine nav rastiya wê. Ne ku rêxistinê bikişîne nav rastiya xwe. Ezezîtî tê vê maneyê ku rêxistin kişandina nav rastiya xwe ye, dibêje "bila rêxistin weke min be, bila min wiha qebûl bike." Ev pir xeter e, rêxistin ti carî kesî wiha qebûl nake. Rêxistin li ser esasê xwe mirovan qebûl dike. Yê ku tevlî vê rêxistinê dibe di nav de dijî, wê rastiya rêxistinê ji bo xwe esas bigire. Nikare bêje rastiya min ev e bila rêxistin qebûl bike. Ev dibe suc. Heke bêzanebûn vê dike bila terk bike, na heke bi zanebûn dike ev dibe sucekî mezin.

## Têkoşîna PKK' ê Ji Bo Mirov Bibin Xwedî Îrade Û Fikrê Azad e

Di rastiya Rêbertiyê de ji gel hezkirin, rêzdana gel, hêza gel derxistina holê, gel li ser vî esasî kirina xwedî îrade esas e. Hemû têkoşîna Rêber APO ji bo ku çawa gelê Kurd bike xwedî îrade ye. Têkoşîn hemû ji bo vê ye. Hêza xwe hemû ji bo ku çawa hêza gel, tiwaniyên wî derbixe holê ye. Wê çawa bike ku ev gel bibe yê xwe û ji bo xwe têbikoşe. Xebata Rêbertiyê hemû ji bo vê ye. Da ku di her mercekî de ev gel bikaribe temsîla xwe bike. Da ku bikaribe azadiya xwe bijî. Têkoşîna Rêber APO hemû li ser vî esasî ye. Di nêzîkbûna Rêbertiyê de tu nikarî bêrêziyê bibînî, yan bi çavekî besît li gel binêre û wî biçûk bibîne, nezan bibîne. Di rastiya Rêbertiyê de ti carî mirov nikare nêzîkatiyên serwer û desthilatdaran ên ku gel weke kole dibîne, bibîne. Rêber APO ji van têgihîştinan nefret dike. Ji ber ku hemû têkoşîna xwe li dijî desthilatî û koletiyê ye. Li jiyana Rêbertiyê binêrin, her ku firsend dîtiye çûye nava gel. Heta car bi car ewlekarî jî kiriye xeteriyê û çûye nav gel û di nav gel de maye.

Di nav gel de civîn pêkaniye, propoganda kiriye û gel rêxistin kiriye. Hevalên Başûrê Rojava vê dizanin. Rêxistinkirina wî beşî hemû Rêbertiyê kiriye. Di wî beşî de ti welatparêzê me nînin ku tevlî civînên Rêbertiyê nebûne. Yê ku kêm tevlê bûye, carekî tevlî civîna Rêbertiyê bûye. Hinek hene dibe ku bîst, sî, çil carî ketine civînên Rêbertiyê. Rêber APO xebata wir hemû bi gel dida meşandin. Erk daye wan û gotiye bikin û li ser 'erk'ê jî ew perwerde kirine û bi wan kêmasî û şaşitiyên wan daye fêmkirin, ew perwerde kirine. Xebatê Başûrê Rojava hemû gel bi xwe pêşxist, ne kadro pêşxist. Heta Rêbertiyê kadro li wir dişand nav gel, da ku gel nas bikin û yekîtiya xwe bi gel re çêbikin. Ji ber ku gelek heval ji gel qut bibûn û berovajî ketibûn. Wiha dişand nav gel, da ku gel fêm bikin û careke din têkiliya xwe bi gel re çêbikin, gel nas bikin. Da ku di kesayeta wan de aliyên gel yên gelêrî pêşbikeve. Da ku nebin belayê serê wan.

Kadro diçûn nav gel, lê ji ber ku ji gel qutbibûn, xwe ji gel mezintir didîtin, bi çavekî din nêzîkî gel dibûn û gel dihate gel Rêbertiyê û giliyê wan dikir. Lê Rêbertiyê ji gel re digot "hûnê giliyê wan nekin, min şandine nav we, da ku hûn wan terbiye bikin."

Li vir ne ku Rêbertî li hemberî kadro bêrêzî dikir, da ku kadro di nav gel de nizim bike, na, ji aliyekî ve dixwest têkiliya gel û kadro çêbike, ji ber ku berê kadro qutbibû, ji aliyekî ve dixwest kadro bi gel bide nasîn, da ku kadro xwe nas bike, da ku tevgerê, pratîkê nas bike. Nêzîkbûna Rêbertiyê ji wê qadê re weke qadeke pratîkê bû û kadro li wir hazir dikir. Dikişand perwerdeyê û dişand nav gel, careke din dikişand perwerdê, dema didît ku piçekî dikare kar bike dişand welêt. Rêbertî ji bo gel bixwe bawer be, gavan biavêje tevdigeriya. Ev esas digirt. Ti car ne got hûn nikarin bikin. Di axaftinên Rêber APO de ti car "hûn nikarin, tu nikarî..." nîne. Her tim digot "tu dikarî." Nêzîkbûnên Rêbertiyê li ser wî esasî bûn.

Gelek heval hebûn, nedikarîn bêne welat, lê Rêbertiyê digot "hûn dikarin." Ji wan nedipirsî tu dikarî biçî yan na. Yan jî tu dikarî taburekî an jî desteyekî bimeşînî yan na ev ti car nedipirsî. Digot "tu dikarî biçî welêt? Bersiva ferdan jî "belê serokê min." bû. "Tu biçî welêt tu dikarî desteyekî bimeşînî?" dipirsiya, hevalan jî digot: "belê serokê min." Rêbertiyê jî dizanî ku şer nekirine û tecrubeya wan ya şer nîne, nikarin hêjmareke zêde hevalan bimeşînin. Lê belê ya girîng ne ew bû, dixwest baweriyê bide wan, gavan bi wan bide

avêtin. Ew şêwazek e û uslubek e. Jixwe dijmin her roj çi digot: 'hûn nikarin, dest jê berdin.' Tiştê ku her dem dijmin digot ev bû. Tu jî bêjî 'tu nikarî', jixwe ew dibêje 'ez nikarim.' Dijmin wê bêje "tu nikarî" tê bêjî 'tu dikarî.' Tê wê têgihîştinê bidiyê û wê gavê pê bidî avêtin. Mirovên di nav dudiliyê de, tê dudiliya wan rakî, moral û baweriyê bidî wan. Ev şêwazek e, Rêber APO bi vî şêwazî kar dikir, bi vî şêwazî gav bi van mirovan dida avêtin.

Lê hevalên me çawa nêzî mirovan dibin dibêjin "tu nikarî, tu lewaz î, tu nizanim çi yî..." Li pêşiyê digire û hezar astengan li pêşiyê çêdike da ku nikaribe gavan biavêje. Jixwe mirovê me jî ji bo wê hazir in, dijmin kiriye vê rewşê ne baweriya xwe bi xwe ma ye, ne jî hêzê di xwe de dibîne. Tu çawa bibêjê 'tu nikarî' ew ê bêje 'temam ez nikarim.' Ger tu bêjî 'tu mirî yî, wê bêje 'erê ez mirime.' Ev ne ti uslub e, tê vî uslubî bişkînî. Tê bêjî 'tu zindî yî, tu dikarî,' da ku ew gavan biavêje. Te hêz dayê, wê demê gavan diavêje. Rêber APO ew pêşketin bi wî şêwazî pêşxist.

Mînak ez di sala 1991'î li Heftanînê bûm, gelek tevlîbûn ji Başûrê Rojava çêdibûn. Dihatin hinek ji wan belabûn, wê demê şervan jî zêde dihatin. Me digot em yên bipirsgirêk bişînin û bila paş de biçin. Me dişandin û me didît ku Rêbertiyê careke din ew ji me re dişandin. Min ji hevalan re got, hela werin em li ser vê bisekinin ka çima Rêbertî van careke din dişîne gel me? Wê demê di vir de tiştek heye? Paşê min ji Rêbertiyê re got. Rêbertî keniya. Got: "tabî hûn rêkên kurt û yên rehet didin pêşberî xwe, ez ne weke we me. Dibe ku ew mirov lewaz û bipirsgirêk bin, lê dorberê wan malbat û mirovên wan hene, dema te ew şand, tu wan hemûyan girêdidî û wan bidestdixî. Ez wiha kar dikim. Min bi têgihîştin û şêwazê we kar bikira, ti car pêşketin çênedikir." Yek hatibû di bin dara gûzê de li ser kaniyê xwe dirêj kiribû û digot: "zehmet e." Min gotê: "çima?" Digot: "Apê Şewket ez xapandim." Min gotê: "çawa tu xapandî?" Got: "Apê Şewket gotiye min dema tu çûyî derbasî Başûr bûyî li Çiyayê Spî heta tu digihîjî Heftanînê darên porteqalan, mûzan, mandelînan hene... Ez hatim ti darê porteqal û mûzan nînin, li vir dar nînin. Av nîne em vexwin!" Min jê re got: "Apê Şewket xerab nekiriye, dîtiye ku tu yê porteqal û mûzayî, ji ber wê gotiye porteqal û mûz hene, da ku tu wê gavê biavêjî û bigihîjî vir. Dema tu gihîştî vir tu neçarî bimeşî, ji ber ku weke din rêk nînin. Ne ku tiştek xirab kiriye."

Ev rast e, li vir em însanan dernaxin ku em derewan li wan bikin, ev ne nêzîkbûna me ye. Rêbertiyê qet derew nedikir û ew çand rast jî nedidît. Derewkirin û xapandin çanda desthilatdaran e. Rêbertî bawerî dida mirovan. Gavên pêşketinê bi wan dida avêtin. Apê Şewket jî li gorî xwe wiha mirov derdixist û dişand. Li vir min çima û ji bo çi ew mînak dan, ji bo ku heval şêwaz fêm bikin. Di şêwazê Rêbertiyê de gel rakirina ser piyan esas e. Vîn, tiwanî, hêza şexs derxistina holê esas e. Dema te vîna mirovan derxiste holê, dibe îrade û dikare xwe îdare bike û bimeşîne. Dema mirov ew çêkir xeterî ji bo wî gelî namînin, heta tu wê çênekî xeterî ji bo gel heye.

Di nêzîkbûna desthilatdaran de çi heye, li dîrokê binêrin, bê îstisna hemû desthilatdar çawa nêzîkî civaka jêrîn bûne, her dem gotine “hûn guhê xwe bidin me. Ger me ji we re çi got û çi xwest wê pêkbînin. Li derveyî vê dest nevêjin tiştekî din, nehizirin, em ji bo we dihizirin ji me bawer bikin.” Desthilatdaran her dem ev şêwaz û uslub ji xwe re esas girtine. Da ku bikaribin desthilatiya xwe bimeşînin. We dîtiye desthilatiyekî gotiye xwe zane bikin, xwe birêxistin bikin, ji bo xwe kar bikin, guh nedin kesekî, ne gengaz e vê bikin. Wiha bikin nikarin desthilatiya xwe berdewam bikin. We dîtiye axayekî ji gundiyan re gotiye “xwe zane bike, ji bo xwe şiyar be, ji bo xwe bike.” Axa her tim dibêje, “guhê xwe bide axayê xwe, ger axayê te çi ji bo te got wiha bike, axayê te ji bo te her tiştekî dike û jê bawer be.” Nêzîkbûna axa jî ev e, ya beg jî ev e, ya serokeşîr jî ev e, ya burjuwaziyan jî ev e, da ku bikaribin desthilatiya xwe bimeşînin vê dikin.

Her dem yê desthilat bi çavekî besît li civaka jêrîn dinêrin. Civakê ji rêzê û nezan dibînin. Hinekê xwe pê dikin. Ti carî milîtanên PKK’ê wiha nêzîkî gel nabin. Lê mixabin di uslubê gelek kesan de nêzîkbûnên ku derdikevin ev e. Uslub û şêwazê dimeşînin bi vî rengî ye. Gelek kadro dibêje “ez kadro me, ez dizanim, tu çi yî, tu kî yî. Dengê xwe neke, tenê guhê xwe bide min. Ez ji te çi bixwazim guhê xwe bide min.” Ev tê wateya gel divê dest neavêje tiştekî û têkelî tiştekî nebe. Tiştê diaxivin ev in. Ti têkiliya vê bi Rêbertî û PKK’ê re nîne. Ev şêwaz yê desthilatdaran e ne yê PKK’ê û Rêbertiyê ye. We rojekê di uslubê Rêber APO de ev dîtiye, ne gengaz e. Rêber APO bi kê re rûniştiye bawerî, moral û zanebûn dayê. Hêza wî bi wî daye nasîn. Ew mirov dema ji gel Rêbertiyê derketiye ji xwe, tevger û Rêbertiyê bawer kiriye. Rojekî Rêbertiyê ji kesekî tiştek nexwestiye,

her dem daye. Çi yê wan mirovan jî hebe, dane Rêbertiyê û tevgerê. Ji ber ku zêdetir ji tevgerê bigirin, çi yê wan heye dane tevgerê. Şêwazê vê tevgerê û Rêbertiyê ev e.

Ti Kes Nikare Bi Derfetên PKK'ê Axatiyê Bike

Mirov li gelek hevalan temaşe dike tiştekî nade gel, lê her tiştekî ji gel dixwaze. Dibêje 'vê bide vê bide' ger neda jî dibêje "ev xayîn e" û diçe bi ser de, yan teşhîr dike, yan tecrîd dike û yan jî dixe bin zextê. Ti têkiliya vê nêzîkbûnê bi PKK'ê û Rêbertiyê re nîne. Ev şêwaz û uslubê ku desthilat dimeşînin e. Çi heqê te heye ku tu ji wan mirovan van tiştan dixwazî, te çi daye vî gelî ku tu van tiştan jê dixwazî? Te çi dabe tu dikarî ewqasî bixwazî. Tiştê te nedayî tu çawa dikarî jê bixwazî, ji hêza wî zêdetir tu çawa dikarî tiştan bixwazî. Heke tu bidê, jixwe wê bedelê wê bide te. Mirov nexwaze jî wê bide mirov. Tu hem tiştekî nadê hem jî jê her tiştî dixwazî. Eynî wek axayan. Axa tenê nanekî dide û bîst û çar demjimêran ji bo xwe wan însanan dixebitîne. Dibêjê "tê vî karî-wî karî bike."

Di şêwazê Rêbertiyê de rêzgirtina gel esas e. Rêzgirtina gel çî ye, vîn û hêza wî derxistina holê ye. Moral, bawerû û zanebûn dana wî ye. Ew kişandina rêxistinê û çalakiyê ye. Da ku gel ji xwe bawer bike û bi serê xwe bikaribe li ser piyan bisekine û bixwe xwe bimeşîne. Heke kar wiha hate kirin, wê demê tu rast kar dikî û hedef ev e. Jixwe dijmin zext û gefan li gelê me dike, tu jî biçî bi navê PKK'ê zext û gefan bikî û bibêjî "ez ji bo vî gelî kar dikim." wê demê ferqa te û dijmin namîne.

Diçin nav gel û derewan dikin, dixapînin, sozan didin û pêk nayînin, rêza PKK'ê jî bi vî rengî dişkênin. Heman weke axa û began dikin. Wekî parlementerên Tirkan, dema hilbijartinê diçin sozan didin û piştî hilbijartinê ew soz hemû li erdê dimînin. Milîtanê PKK'ê nikare bi hinekî nêzî gelê xwe bibe, nikare wiha bi gelê xwe bileyîze û wiha bixapîne û derewan bike. Tiştê ku nikare pêkbîne soz nade, ger soz jî da wê pêkbîne. Soza jî wiha li gorî xwe nade. Bi derfetên PKK'ê axatî nabe. Hinek bi derfetên PKK'ê axatiyê dikin. Niha, li gelek cihî gel dibêje "em hevalên berê dixwazin." Vê pêşniyarê dikin û vê rexne dikin. Di rastî de ev jî kadroyên PKK'ê ne, lê çima gel hevalên kevin dixwaze. Ev tê vê maneyê ku dibêjin "em di van de pîvan û nêzîkbûnên PKK'ê nabînin. Hestên PKK'ê, ruh, jiyan, kesayet, exlaq, çanda wê, em di van de nabînin. Şêwazê xebatakarên PKK'ê em di

van de nabînin." Lewra qebûl nakin, rexneyan dikin. Ji ber vê dibêjin "bila milîtanên PKK'ê bên." Ji ber ku dibînin yên bi navê PKK'ê kar dikin, têkiliya xwe bi PKK'ê re nînin. Gel kadroyên PKK'ê nas dike.

Xebera wî ji vî gelî nîne ka gel wî çawa dibîne, qet naxwaze fêm bike û rû jî nade gel. Gel çi dibêje bila bêje, ji bo axayekî tiştekî îfade nake, we dîtiye axayekî guhê xwe daye gundiyan? Gundî çi dibêjin bila bêjin, axa jî axatiya xwe didomîne. Kadroyên vê tevgerê nikarin wiha bin. Ev nêzîkbûn hemû ji bo vê tevgerê îfadeya dijminiyê ye. Ger bala we kişandibe kesayetên wiha texrîbatên mezin di nav gel de dikin. Nav gel de najîn, kar nakin. Tiştekî nadin gel, bi derfetên gel dijîn, jiyaneke şexsî û gemarî dijîn, paşê jî dibin bela serê gel. Gel li wan temaşe dike, ji rêxsitinê sar dibe û dûr dikeve. Dibêjin "rêxistina em dinasin ne wiha bû, dema em ji rêxistinê re dibêjin bila kadroyên kevin bên, bila kadroyên PKK'ê bên, heke naşînin û dîsa van li serê me dikin bela û dihêlin, yan hêza vê rêxistinê nemaye, yan jî ev rêxisitin wiha bûye, van wiha qebûl dike û ji ber vê nayê bi ser van de û daxwaziyên me pêknayîne." Ji ber van sedem û nêzîkbûnan ji rêxistinê sarbûn û dûrketin çêdibe.

Heqê kesî nîne gel ji rêxistinê sar bike, dûr bixe! Ger milîtanê vê tevgerê ye, wê vê neke, ger vê bike, ev mirina wî/ê ye. Erka milîtanê vê rêxistinê çî ye, ne ku gel sar bike û dûr bixe ye. Pêwîst e, her dem gel qezenc bike. Tu dinêrî tu dişînî cihekî da ku kar bike, diçe wir û salekî dimîne, tiştên li wir heyî jî nîv bi nîv xelas dike. Ger sed mal heye, dike pêncî mal. Dibêje ez kar dikim. Ev çi karkirin e? Rêbertî dema çû Suriyê tenê malek di dest de hebû, ew jî malbata hevalekî bû, bi wê malbatê destpêkir û bi hezaran malbat çêkir. Şêwazê Rêber APO ev e. Bi malbatekî parçeyeke Kurdistanê rêxistin kir. Tu diçî, rêxistin bi hezaran malbatan radestî te dike, tu van nîv bi nîv dikî; dibêjî "ez kar dikim û ez milîtanê vê Rêbertiyê me." Tu bi vê nêzîkbûna xwe Rêbertiyê û rêxistinê dikujî! Paşê jî dibêjî "ez milîtanê vê rêxistinê me." Çi têkiliya te bi vê rêxistinê re heye? Ger rêxistin sed malbat teslîmî te kiribe, divê tu bikî çend qat. Eger te ev kir, wê demê te rast kar kiriye û rêxistin pêşxistiye. Ger di karê te de rêxistin lewaz bûye û paş ketiye, wê demê te ji bo rêxistinê kar nekiriye, te ji bo dijmin kar kiriye. Em dizanin ku milîtanê vê tevgerê dema biçe cihekî, bi rastî milîtantiya vê tevgerê bike, ne gengaz e li wir paşketin çêbibe, wê pêşketin çêbibe. Heke li cihekî

paşketin çêdibe, tê bizanibî li wir di temsîlkirina tevgerê de pirsgirêk hene, ewqasî zelal e, ne pêwîst e, mirov ewqasî bişopîne jî.

Rapor çawa dibin bila bibin, çi tê axaftin bila bê axaftin, divê mirov bizanibe ew rapor û axaftin derew in. Pêwîst e, em nekevin şaşitiyan. Hinek kesên fêlbaz hene li pêşberî rêxistinê fêlbaziyê dikin, ka çawa wê rêxistinê bixapînin. Li cihê lê kar dikin kar paş dixin, wer didin diyarkirin ku li wir pêşketin heye. Bi vî rengî sextekariyê dikin; kesayetên wiha bi zanebûn vê dikin. Li wir kar nake û dibêje “ez li wir kar dikim.” Li hemberî rêxistinê ev dijminiyeke mezin e.

### Rêbertî Xwe Naspêre Derfetan, Derfetan Diafirîne

Di şêwazê Rêber APO yê karkirinê de, çi esas e sebir û israr heye. Ev şêwazê Rêber APO ye. Hem tê bi sebir kar bikî, hem jî bi israr bî. Rêber APO şêwazê xwe çawa îfade kir, bi serê derziyê bîr kolan û ji bîrê av derxistin. Got “şêwazê min yê xebatê ev e.” Li gorî gelekan bi derziyê bîr nayê kolandin. Mirov nikare bîrê bi derziyê bikole û avê derxe. Lê li gorî şêwazê Rêber APO mirov dikare bi derziyê bîrê bikole û avê jî derxe, şêwaz ev e.

Di şêwazê Rêber APO de heta av ji bîrê dernekeve, sekin nîne. Heke hedef av derxistin be, wê derxe. Heta ku avê dernexe rehet nikare bisekine. Mirov bala xwe bidê, hedefa Rêber APO li Sîwerekê propagandaya biçek pêşxistin bû, bi wê hîmê gerîla li Botanê ava kirin û dana rûniştandin bû. Lê dema ev hedef li Sîwerekê pêknehat, qet dest jê berneda. Tiştê ku di sala 1979’an de pêkbihata, di sala 1983-84’an de pêkanî. Ti car dev ji hedefa xwe berneda. Negot nabe, ji ber ku di felsefe, uslub û şêwazê Rêber APO de tiştekî ku nabe nîne. Tenê dema mirov nexwest nabe, dema yek nexweze nabe, lê dema mirov bixwaze dibe. Teqez mirov dikare encamê bigire.

Di şêwazê Rêber APO de derfet derfet e, derfetê biçûk û mezin nînin. Dema te derfetek bi destê xwe xist tê bêjî, ev derfeteke mezin e, divê tu heqê wê bidê. Dema te heqê derfetê daye, wê demê tu dikarî wî derfetê biçûk mezin jî bikî. Mirov dikare bi wî derfetê biçûk derfetên nû bi dest bixe. Ji bo Rêber APO derfeteke biçûk ji bo xebatê bes e, têra wî dike. Heta di şêwazê Rêber APO yê xebatê de derfet nînin, derfet çêkirin heye. Ger derfet hebe jî derfetên heyî şixulandin û mezin kirin, pê derfetên nû çêkirin esas e. Di şêwazê Rêber APO de ev nêzîkbûneke bingehîn e.

Gelek heval dema ku derfet nînbin dibêjin, bê derfet xebat nayê kirin û nabe. Lê dema derfet hebe dibêje, derfet kêm in, lewra dîsa nabe. Weke ew dixwazin divê derfet hebin, bi wî rengî kar û şoreşgeriyê bikin. Her tim dibêjin wiha nabe. Weke dixwazin divê her tişt hazir be. Ev nêzîkbûneke çewt e, şaş e û ne rast e. Ti carî li ti cihî weke daxwaziyên te derfet nabin, ne gengaz e, ev tiştekî xeyalî ye û nabe. Ji ber vê yê ku li bahaneyan digerin, naxwazin kar û xebatê bikin, li rehetiya xwe digerin, her dem bihaneya kêmbûna derfetan, ji xwe re esas digirin. Vê bikartînin da ku kar û xebatê nekin, qet xwe naêşînin. Yên ku çavên xwe ne li kar û xebatê bin, her dem li bihaneyan digerin, dibêjin "felan tişt nîne, bêvan tişt nîne, ger ev nebe nabe" wiha dema xwe derbas dikin. Wer nêzîkî derfetên rêxistinê dibin. Ya rastî ev şêwaz ti têkiliya xwe bi Rêbertiyê re nîne. Şêwazê Rêbertiyê dema derfet nîn be, tê çêbikî, tu çi dikî bike, tê derfetan biafirînî. Derfetên heyî tê tam heqê wan bidê, bikar bînî ji wan derfetan hinekên din çêbikî, şêwaz ev e. Divê hemû derfetên çêdibin û mezin dibin bikevin xizmeta tevgerê.

Akademiya Mahsum Korkmaz ya li Lubnanê cihekî wiha pir xweş nebû. Lê mirov dikare bêje baş bû, mezin û fireh bû. Li ser çiyayekî rût bû, hinek dar derdorê hebûn, zinar û ber hebûn. Di navbera wan çiyayan de cihekî hinek ax lê hebû, ne wiha pir fireh bû, li wir me akademiya xwe çêkir. Rêbertiyê ew akademî çêkir. Li cihekî wiha biçûk û besît şoreşek pêşxist, gelek û gerîlayek pê ava kir.  Kesayeta jina azad pê ava kir. Hîmê gelek tiştan li wir hate avêtin û pêşxistin. Bi wan derfetên kêm ev ava kir. Ti carî negot ev derfet kêm in, besît in, mirov nikare şoreşê pê pêşbixe. Ew cihê akademiyê ne yê me bû, yê Cepheya Demokratîk bû. Wan di şerê Îsraîl û Filîstînê de hîştin û revîn, kêmek mabû ku Îsraîl bikeve wir, lê hevalên me nehîştin ku bikevin wargehê. Hevalên me girên derdora wê girtin û nehîştin leşkerên Îsraîlî bikevinê. Me ew der ji bo xwe kir wargeh. Ev me bi keda xwe çêkir, me kir akademî, me bi wê akademiyê şoreşa vejînê pêşxist.

Wê demê bi derfetên besît jî mirov dikare encamên pir mezin derbixe holê. Di wê pêvajoya Rêbertî çû Suriyê, malbatek hebû li Kobanê, mirovê hevalê Ethem bû. Rêbertiyê ne ew malbat nas dikir, ne jî diyar dibû ka wê Rêbertiyê qebûl bikin, qebûl nekin. Ji ber ku ne malbateke me bû, malbat xizmên hevalekî me bû, dibû ku qebûl bikin jî û qebûl nekin jî, lê derfet ew bû. Weke din derfetên me nîn

bû. Rêbertî negot “ez ê çawa biçim wir, ger derfet hebe ez ê biçim wir.” Derfet ew bû, derfeteke pir lewaz bû. Lê Rêbertî çû wê malbatê û ew malbat qezenc kir û di serî de ew malbat kir ya me û bi rêka wê malbatê malbatên din qezenc kir. Bi vî rengî Başûrê Rojava, bi wê têkiliyê qada Lubnanê hemû ava kir. Bi têkiliyeke wiha ji rêzê, têkiliya bi Suriyê, Flîstînê hemû ava kir. Bi têkiliya bi malbatekî re têkiliya bi dewletan û rêxistinan re pêşxist. Bi wê têkiliyê bi hezaran malbat pêşxist, wiha kar kir. Ev ispata bi derfetên biçûk tiştên mezin ava kirinê ye. Ev rastiya li ber çavan e. Heke ku mirov bixwaze dibe, axaftineke Kurdan ya kevin heye dibêje “dilê şivan bixwaze şîr ji nêrî didoşe, lê ger dilê şivan nexwaze ji bizinê jî nadoşe.”

Bi rastî jî tiştê ku Rêber APO kirî, ji nêrî şîr dotin e, ne ji bizinê. Her kes dikare bizinê bidoşe, ya girîng ne ji bizinê şîr dotine, ya girîng ji nêrî şîr dotine. Ya ku PKK’ê kir ev bû, wê milîtanên PKK’ê vê bizanin û li gorî wê xebatê bikin. Lê mixabin tu dibînî gelek milîtanên PKK’ê dibêjin ji nêrî şîr nayê dotin, heta dibêjin ji bizinê jî şîr nayê dotin. Destê xwe navêje guhan û dibêje şîr tê de nîne, wiha nabe. Têkiliya vê û Rêbertiyê bi hev re nîne. Tiştên ew dibêjin şêwazek e, lê ya Rêbertiyê jî şêwazek e. Şêwazê Rêbertiyê ji tinebûnê hebûnê çêdike, ji mirinê jiyanê çêdike, ji bêderfetiyê derfetan çêdike. Lê di şêwazê me de ji jiyanê em mirinê çêdikin, di nav derfetan de bêderfetiyê çêdikin. Em xwe jî hevalê Rêber APO dibînin. Pirsgirêkên me û Rêbertiyê di vir de derdikeve holê. Navbera me û Rêbertiyê de nakokî ji ber vê derdikeve. Heke yekîtiya me û Rêbertiyê çênabe ji ber vê çênabe. Ger Rêbertî tam nikare encamê bigire ji ber vê nagire, ji ber ku wê bi me encamê bigire. Heke em jî wiha bin, Rêbertî helbet nikare encamê bigire. Pirsgirêk ev e, pêwîst e, ev pirsgirêk çareser bibe. Wê çawa çareser bibe, dema ku şêwaz û uslubê Rêber APO me ji bo xwe esas girt, wê ev pirsgirêkê çareser bibe. Lê heke em şêwazê xwe esas bigirin ji xwe şêwazê me diyar e, tê de felsefeya nebûnê, wendakirinê esas e. Tiştê ku bibin jî ji bo wê felsefeyê em dibêjin nabe. Berê her kesî ji bo Rêbertî û PKK’ê digot, ji tinebûnê dixwaze hebûnê çêbike, ev ne gengaze. Lê belê Rêbertî û PKK’ê îspat kir ku ji tinebûnê hebûn çêdibe. Ji ber vê her kes şaşwaz dimîne ka ev pêngav çawa çêbûn. Bi şêwazê Rêbertiyê ev çêbû, ji ber xwe çênebû.

Çima bi şêwazê Kemal Burkayî, yên din çênebû, ji ber ku şêwazê wan tiştek ava nedikir. Şêwazê wan û yê hinek hevalan weke hev e. Nayê zor û zehmetiyê, li bihaneya digere, li rehetiyê û rêkên kin digire, ji ber wê weke hev in. Lê di Rêbertiyê de ew nîne, li rêkên kin, rehetiyê ger nîne. Rêbertiyê xwe di serkeftinê de kilît kir û xwe mehkumî serkeftinê kir. Ji ber ku bi vê ancax karibû pêdiviya gelê Kurd pêkbîne. Vê bersiv dida daxwaziyên gelê Kurd û bersiv dida daxwaziyên Rêbertiyê bi xwe jî. Weke din ne gengaz e, tu hem li kêfa xwe binêrî, hem jî tu bêjî ez ê vî gelî ji vê rewşê derbixim. Ger wan kesên me gotî encamek negirtibin, ji ber vê negirtine. Ji ber şêwazê Rêbertiyê PKK'ê encam girt, têkoşîn xurt kir.

## Di Têgihîştina Rêbertiyê De Derfetê Herî Mezin Mirov Bi Xwe Ye

Di şêwazê Rêbertiyê yê xebatê de, ji bo ku xebatê bike tenê tiştekî ji rêxistinê dixwaze, ew jî ew e ku rêxistin derfetên xebatê bidê. Weke din tiştekî naxweze. Ji rêxistinê derfetan naxwaze, nabêje bila rêxistin derfetan bide min, da ku ez bixebitim. Tenê ji rêxistinê derfetên xebatê dixwaze, wê jî Rêbertî bes dibîne. Yanî tenê derfetên xebatkirinê dixwaze. Têgihîştina Rêbertiyê ya ji xebatê re ev e. Ger derfet nebin çêdike, heke hebin jî lê dihizire ka wê çawa mezintir bike. Vê ji bo xwe esas digire. Ji bo vê jî pêwîstiyên rêxistinê çi ne, yên gel çi ne, yê azadiyê çî ye, wê çawa van pêwîstiya pêkbîne, di xebat û têkoşîna xwe de vê ji bo xwe bingeh digire.

Derfeteke biçûk hebe besî Rêbertiyê ye. Ger têkilî û derfeteke biçûk jî bikeve dest, besî wî ye. Bi wê têkiliyê û derfetê dikare bixebite, dikare wê derfetê mezin bike, encamê jê bigire. Di kesayeta Rêbertiyê de encam girtin esas e. Heta ku encamê negire û hedefê xwe pêkneyne, dest ji kar bernade. Ji ber wê Rêbertî her dem encamê digire, şêwazê Rêbertiyê ev e. Weke hevalan bi derfetan şoreşgeriyê nake. Li ser hêz û baweriya xwe şoreşgeriyê dike. Derfet û pêdiviyan bihêz dike û bi keda xwe diafirîne.

Lê di kadroyên me de çi pêşketiye pêwîst e, gel, rêxistin derfetan bidê, da ku bikaribe kar bike. Dixwaze li ser derfetên hazir kar bike. Ev çi îfade dike, bêked dixwaze kar bike û bijî. Ji vê xeternaktir tiştek nîne. Ev têgihîştin di nav PKK'ê de dejenerebûne çêdike. Ev bi xwe re xeteriyê pêşdixe. Heke em naxwazin di nav PKK'ê de xirabî çêbibe, pêwîst e em vê têgihîştinê di nav rêxistinê de, di kesayeta

kadro de rakin. Bi temamî divê kadro li ser bawerî û hêza xwe derfetan çêbike. Li ser wan derfetan têkoşînê pêşbixe, vê ji xwe re esas bigire. Ev rastiya Rêbertiyê û PKK'ê ye.

Di nav PKK'ê de van salên dawiyê dejenerebûn pêşketiye. Kadro ji kedê, rêxistinê û gel dûr ketiye. Lewra derfetan naxuliqîne, yê heyî jî ziyan dike. Bi rêxistinê û gel didin wendakirin. Dema gel dibêje em kadroyên kevin dixwazin, ji ber vê dibêjin.

Di têgihîştina Rêbertiyê de derfet însan bi xwe ye. Însanan wekî derfetê herî mezin dibîne, ji ber ku her tişt bi însan çêdibe. Ev jî çî ye? Hestên mezin e, hizirê rast e, ramana rêxistin û çalakiyê ye. Ger ku te ev kir, tu dikarî her derfetekî çêbikî. Derfetên ku PKK'ê çêkir wisa çêkir. Kesekî derfet nedaye PKK'ê. Tê zanîn di destpêkê de kesekî derfet neda PKK'ê, PKK'ê bêderfet destpêkir. Hemû pêdiviyên xwe bi vî şêwazî çêkir û pêşxist. Însan wekî derfet û bingehê herî mezin dît û wiha tevgeriya. Bi însan derfetên madî manewî çêkir. Derfetên mezin û biçûk çêkir, wiha derfetên xwe çêkir. Ger tu dixwazî derfetan çêbikî, tê însana çêbikî. Însan çawa tê çêkirin? Dema ku te pê re hest û ramanên mezin pêşxist, kesayeta wî/ê li ser vî esasî pêşxist, îradeya wî/ê te pêşxist, bi rêxistin kir, ew pratîze kir ew mirov çêdibe. Bi çêbûna mirov re jî hemû derfet çêdibin. Bi temamî PKK'ê bi vê têgihîştinê derfetên xwe pêşxist.

Her kesî digot "gelo PKK çawa van derfetan digire, gelo ji ku digire, kî dide wan." Her kesî PKK çawa nas dikir, digotin PKK rêxistineke dewlemend e. Di welatekî weke Kurdîstanê ku talan bûye, civak û însanên wê feqîr in, birçî ne, belangaz in de, tevgerê ewqas derfet çêkir. Her tişt bi însan û vê têgihîştinê çêbû. Mirov bixwaze çi çêbike, divê ku bi însanan çêbike. Bi însan mirov dikare her tiştî çêbike.

Rêbertî li madîyatê negerî, li însan geriya, şev û roj însan çêkir, her ku însan çêdikir wan însanan jî têkoşîn kir, têkoşînê jî derfet çêkir. Mînak niha gelek kes dibêjin "bila rêxistin derfetan bide me, derfetên me nînin." Ev şermeke mezin e. Ji rêxistinê jî şerm nakin ku vê dixwazin! Xwe naêşînin têkoşînê nakin, da ku gel ji wan bawer bike û derfetan bide wan. Lewra dibêjin bila rêxistin derfetan bide me. Tiştekî ku rêxistin bide nîne. Rêxistin tenê mirovan qebûl dike û derfetên xebatê dide mirovan û dibêje xebatê bike. Dibêje ha ji te re şerefa PKK'ê, bi vê nasnamê kar bike. Tiştê ku rêxistin bide mirov ev e. Wekî din tiştekî ku rêxistin bide mirov nîne.

Ev nêzîkbûnên ji rêxistinê xwestin û wiha şaş nêzîkî rêxistinê bûn, dide nîşandan ku rêxistinê û gel wek çêlekê dibînin û dixwezin bidoşin, wek kerekî jî lê siwar bin û ji xwe re bijîn. Têgihîştina ku pêşkitiye ev e, ev têgihîştin pir xeternak e. Têgihîştineke li dijî PKK'ê ye. Ev PKK'ê xirab dike û pê dide wendakirin.

Asta moral û baweriya Rêbertiyê pir xurt û bilind e. Lê belê li hemberî tiştan û bûyean Rêbertî biguman e jî. Rêbertî bi vê her dem çavdêriyê li ser xwe çêdike. Ev nahêle di kesayeta wî de ji rê derketin û belavbûn çêbibe; ev xaleke gelekî girîng e. Niha ger mirov bala xwe bidê, di gelek hevalan de kêmek moral çêdibe, bawerî çêdibe, xwe wenda dikin, xwe belav dikin, tevdîran ji dest xwe berdidin. Gumanan ji bîr dikin. Ji bo wê jî mirov bala xwe didê xwe wer belav kirine, xwe perîşan kirine, tevger jî bi xwe re şepirze kirine. Ya rastî însanên PKK'ê û mîlîtanên PKK'ê, tu carî bêmoraliyê, bêbaweriyê najîn. Ji ber ku ev di PKK'ê de sûc e. Çima sûc e, ji ber ev dijmin jiyîn e. Dijmin her tim bi moralê dileyîze, bi baweriyê dileyîze. Tu jî di nav PKK'ê van tiştan bijî, wê demê tu suc dikî. Ji bo vê jî mîlîtanên PKK'ê nikarin bêmoraliyê, bêbaweriyê bijîn. Lê çiqas bawerî û moralê bijîn jî, wê xwe di nav de belav nekin. Wê xwe ji bîra nekin, wê her tim li ser xwe çavdêriyê bikin. Da ku ziyanê nedin rêxistinê. Lê mirov bala xwe didê di hevalan de çi derdikeve pêş, gavekî bi serkeftî diavêjin, bi wê kêfxweş dibin, baweriya wan xurt dibe, moralê wan xweş dibe; xwe, rêxistinê, gel û dijmin jî ji bîr dikin. Her tiştî ji bîr dikin. Ji ber wê jî darbe tên xwarin. Tişta herî basît di eylema Bezelê de komek heval tên cihekî pir te zanîn, yanî piştî wê çalakiyê pêwîst e, teqez mirov li wir nesekine; ew kom tên wir disekinin, li wir bi cîhazê diaxivin, li wir dimînin balafir tên lêdixin. Li wir bêsedem şehîdek û sê-çar birîndar didin. Ji ber ku însanê me zû moral digire, zû jî wenda dike. Ji ber ku di bingehê xwe de lewaz e, rûxandin zêde li ser hatiye kirin. Hem ji aliyê erênî de, hem jî aliyê neyînî de zûka bandor dibin. Tu dinêrî xwe ji ber neyîniyê jî, erêniyê jî zûka belav dike. Lê heke kesayeteke bi rêxistî, bi disîplîn be, xwe nas bike, ne bi erênîbûnê, ne jî bi neyînîbûnê bandor dibe û xwe belav nake. Bi berpirsiyarî dijî, ti carî wî ruhî ji dest bernade. Kesayeteke zeyîf û di xwe de rêxistin, dîsîplîn, çavdêrî û cidiyet çênekirî, her dem xeter e û bela ye.

Ji ber ku me di xwe de çavdêrî, dîsîplîn, berpirsiyarî û rêxistin çênekiriye, em lewaz in û her dem pêwîstiya xwe dibînin ku hinek

me kontrol bikin. Da ku em xwe belav nekin. Dema ku li ser me kontrol nebe, em tavilê xwe belav dikin, dest bi keyfiyetê dikin. Ya rastî jî li ku keyfiyet hebe, li wir mirin heye, li ku rêxistin hebe li wir pêşketin û serkeftin heye. Pêwîst e, mirov vê ti carî ji bîr neke. Mîlîtanên PKK'ê heke bi rastî mîlîtanên Rêber APO ne û wî esas digirin, wê her tim li ser xwe çavdêriyê bikin. Wê xwe bi xwe vê bikin, ne ku her dem rêxistin bike. Ne jî rêveberiya rêxistinê wê vê bike. Çavdêrî ji bo mirovên derveyî rêxistinê re pêwîst e, ji bo yên ne bi rêxistinê re pêwîst e, da ku xwe belav nekin. Da ku xeteriyê nejîn. Lê însanên rêxistinê yên ku xwe bi rêxistin kirine, di xwe de berpirsiyarî, cidiyet pêkanine, li ser xwe çavdêrî pêkaniye. Însanên wiha li ku dibin bila bibin, xebata xwe kontrol dikin. Ti carî bêberpirsiyatiyê û keyfiyetê najîn.

Kesên di rêxistinê de lewaz in her tim pêwîstiya xwe bi çavdêriyê dibînin. Dema tê kontrol kirin kar dike, dema asta kontrolê kêm dibe, keyfiyetê dike. Jixwe keyfiyet xirabiyê pêşdixe. Ev nabe însanekî rêxistinê, ev kesayeteke xeter e. Rêxistin wê li ku her demjimêr te kontral bike! Mirovek ku nikaribe bêyî ku bê kontrolkirin bimeşe, jê tiştek dernakeve, bi kesên wiha jî rêxistin ti carî nikare hedefên xwe pêkbîne û gavan biavêje. Ji bo ku em şoreşgeriyê bikin, ziyanê nedin pêwîst e, her dem em şiyar bin, bimeşînin. Hinek kes otokontrolê li ser kesayet û karê xwe pêknaynîn, lê dema rêxistin wan kontrol dike, nerazîbûnê nîşan didin, dibêjin "çima rêxistin me kontrol dike, min bi serê xwe nahêle."

Heke rêxistin te bi kêfa te bihêle, tu yê her roj aliyekî rêxistinê xira bikî. Tu yê ziyaneke mezin bidî rêxistinê û gel. Ew rastiya jî heye. Pêwîst e, şexs bi xwe xwe kontrol bike, lê ji ber ku nake rêxistin neçar dimîne ku bike, tu dibînî ji vê aciz dibe. Ji ber ku keyfî ye, li gorî xwe ye; ti berpirsiyarî, hedef û armancên wî/ê nîne. Lewra dixwaze wiha bijî û wiha bimîne.

## Soz Ji Bo Rêbertiyê Pîroz e

Di kesayeta Rêber APO de soz pîroz e. Soz ji bo ku mirov pêkbîne ye. Soza xwe pêkneanîn lanetî ye. Rêber APO ti carî tişta ku nikare pêkbîne neaxaviye û negotiye. Her dem diqet kiriye. Ger çi gotiye jî lê xwedî derketiye û ji bo ku wê pêkbîne her tişt kiriye û heta ku ew pêkneaniye nesekiniye. Rastiya Rêbertiyê ev e. Tişta ku li gel me heye çî ye, yan maneya sozê nîne, yan jî lewaz e. Em dikarin rehet her

tiştî biaxivin. Ango cuda ye ne cuda ye, xirab dike yan xizmetê dike, em dikarin vê pêkbînin yan nikarin, wateya wê çî ye encama wê çî ye... em van tiştan qet ber çav nagirin. Yan jî wiha rasterast em diaxivin û xwe, hevalê xwe, tevger û gel jî dikin nav zor û zehmetiyê. Ya rastî milîtanên vê rêxistinê dema ku diaxivin bibaldarî gotinên xwe bikartînin. Da ku şaş neyê fêmkirin, hinek encamên şaş jê dernexin û wê li dijî rêxistinê bikar neyînin. Her soza te pêwîst e, baweriyê, moralê û zanebûnê, hêzê, vînê, derfet û serkeftinê çêbike. Di nav PKK'ê de mirov wiha dikare bijî. Mirov wiha dikare milîtantiyê bike. Weke din di nav PKK'ê de mayîn û milîtantî kirin nabe.

Tu dinêrî milîtanê vê tevgerê ye, hevalê Rêber APO ye, lê axaftinê wî wek jehrê ye. Mirov dibêje qey dijmin diaxive. Li ku diaxive bêmoraliyê çêdike, rêxistinê û baweriyê nahêle. Derfetan nahêle, her tiştî xerab dike. Dikeve nav gel bi axaftina xwe gel dide revandin û sar dike û ji rêxistinê dûr dixe. Derewan dike, tiştê ku ew nikare bike û partî nikare bike dibêje. Ev jî rastiya me ye. Ti eleqeya vê bi rastiya Rêbertiyê re nîne. We dîtiye, sozeke ne di cih de, ji devê Rêbertiyê derketiye? Her sozekî li gor cîh, demê hesap dike û diaxive. Her gotina ku diaxive li gorî mirovê li hemberî xwe dibêje, rewşê dide ber çavê xwe û wiha diaxive. Da ku bikaribe encam bigire. Da ku bandorê bike û hedefên xwe pêkbîne diaxive.

Lê em hevalên Rêbertiyê ne, çi tê ber devê me, em diaxivin. Cihê wê axaftinê ye, ne cihê wê ye, bandora bike çî ye, baş dike, xirab dike... em qet hesabê wê nakin. Ev dide diyarkirin ku em ne rêxistinkirî ne. Me xwe rêxistin nekiriye. Bala xwe bidinê mirovên di nav civakê de axaftinên xwe bi baldar nakin, berpirsiyartiyeke wisa jî li ser milê wan nîne, ji ber wê jî zêde hesaban nakin û her tiştî dikare biaxivin. Lê mirovekî di nav rêxistinê de divê bi berpirsiyarî biaxive. Divê bizane ka axaftinên wî sûdê yan jî ziyanê dide rêxistinê. Faydê dide gel û hevalan, yan ziyanê dide, van hemûyan dipîve û wiha diaxive.

Lê, gelek heval di axaftina xwe de bibaldar nînin. Gelo heval û rêxistin bi van axaftinan dikeve yan na. Qet bala xwe nadê, tenê ya li gel girîng axaftina ku kiriye, wê ji xwe re esas digire. Ger axaftineke ne di cih de kiribe rexnedayîna wê jî nade. Ji ber gurûra xwe ya şexsî rê nade wê, lê ya rastî di kesayeta milîtanên PKK'ê de heke sozeke ne rast dabe, yan axaftineke şaş axivî be, dema mirov lê hayîl bû, divê ku rexnedana wê bide. Mirovê wê rast bike. Sozên şaş pêwîst e

mirov rast bike, mîlîtantî ev e. Lê tu serî jêkî dîsa nîzîkê vê nabe. Di gurûrê xwe ya şexsî de tawîzan nade. Ev soza şaş, xirabiyê û ziyanê dike, lê ji bo wan ne girîng e. Tenê xwe diparêze, ev taybetmendî bitirs e. Pêwîst e mîlîtanê vê tevgerê li sozên xwe şiyar bin, di zeman û mekanê wê de soz bidin û biaxivin. Divê sozên şaş, zêde nepixandî û kêm nedin.

Ji ber ku em li pey heqîqetê bazdidin. Rastiya Rêbertiyê ev e. Her mîlîtanekî vê tevgerê wê heqîqetê û rastiyê ji bo xwe esas bigire, wê li pey rastiyê bibeze. Wê demê wê bibe hevalê Rêbertiyê yê rast.

Rastiya Rêbertiyê Xwe Perwerdekirin Û Nûkirin e

Kesayeta Rêber APO de her tim xwe perwerde kirin, nû kirin û xwe kirina hêza çareseriyê esas e. Ji ber ku dizane heke vê neke nikare pêşengtiyê bike, nikare ji bin barê pirsgirêkan derkeve û çareser bike. Nikare serkeftî be û derfetan biafirîne. Lê hinek kesayetên ku xwe milîtanê vê Rêbertiyê dibînin, li ser xwe nasekinin, xwe perwerde nakin, xwe nû nakin. Di kesayeta xwe de hêza çareseriyê çênakin. Wer fêm dike ku xwe ji aliyên îdeolojîk û rêxistinî de pêşnexe jî dikare mîlîtaniya vê tevgerê û Rêbertiyê bike. Ev xwe xapandineke, şaşitiyeke û xeteriyeke mezin e. Ev têgihîştin ya tefsiyegeran e. Tesfiyegeran ev têgihîştin di nav rêxistinê de pêşxistin. Gotin, "ne pêwîst e, mirov xetê fêm bike û xwe xurt bike, bi xetê re mirov xwe bike hêz. Weke din jî mirov dikare şoreşgeriyê bike. Hem jî şoreşgeriya PKK'ê."

PKK tevgereke îdeolojîk, siyasî û rêxistinî ye. Di cihanê de xwedî mezintirîn îdeolojiyê ye. Mîlîtanê vê tevgerê heke dixwaze milîtantiyê bike, ti carî ji rêxistinê qut nebe, îxanetê neke, wê vê rastiyê ji xwe re esas bigire. Wê xwe her tim di îdeolojî, siyaset û rêxistinê de kûr bike. Da ku bikaribe xwe bi payeya rêxistinê re bike yek, li gorî pêwîstiyên tevgerê bimeşe û peywirên xwe pêkbîne. Li paş tevgerê de nemîne, ti carî ziyanê nede. Ji mirov ev her dem rêxistinbûnê dixwaze.

Dema mirov ev di kesayeta xwe de pêşxist mirov dibe pêşeng û milîtan. Mirov dikare peywirên milîtantiyê pêkbîne. Tê xwe di milîtantiyê de pêşnexî lê, tê xwe milîtan û rêxistinbûyî bibînî. Tê bêjî "ez dikarim wer jî rêxistinîbûnê bikim, dikarim wer jî pêşengiyê bikim." Ev ne gengaz e, bi vî şeklî nêzîkî pêşengiyê bûn, pêşengî û rêxistinbûn kuştine! Cihê ku pêşeng lê bê kuştin, tê de serkeftin çêna-

be. Li wir tesfiyegerî û belavbûn çêdibe. Gelek heval ne bizanebûn di nav tesfiyegeriyê de ne. Lê ger tu ji wan re bêjî wê qiyametê rakin. Di niyetê de li dijî tasfiyegeriyê ne, lê ev tenê di niyetê de ye. Di meseleya partibûnê de ne li dijî tesfiyê ne, tesfiyê bixwe dijîn. Nizanin tesfiyegerî çî ye û fêm jî nakin. Partîbûn ji mirov çi dixwaze nizanin. Lewra partîbûnê di niyetê de dijîn, di nav pratîkê de tesfiyê dijîn. Rewşa gelek kadroyê me ev e. Ya ku rêxistinê lewaz dike û lê dide wendakirin, ya ku hêviyê dide dijmin ev e. Yên ku hevaltiyê bi Rêber APO re dikin, wê her tim di îdeolojî û siyasetê de xwe xurt û kûr bikin. Ev tê wateya di pêşengtiyê de her tim gav avêtinê. Ev di nirxan de, însaniyetê û civakbûyînê de gav avêtin e. Di avakirina jiyaneke nû de gav avêtin e.

Hevalpêwîst e bizanibin dema xwe perwerde nekin, wê ti encaman negirin. Dawiya wan jî qutbûn û îxanet e. Rêber APO tu carî bi şaşitiyan, kêmasiyan, kirêtiyan, xirabî û neheqiyan re najî. Rastiya Rêber APO li dijî van sekin e. Li dijî kirêtiyê, neheqiyê, xirabiyê sekin e, rakirin van e, hesap pirsîn e, edelet esas girtin û pêkanîn e. Di kesayeta me de tiştên ku heyî çî ye, em ê çawa ahbab çavûştiyê bijîn, îdare bikin, dejenere bikin û pê rojên xwe derbas bikin. Em ê çawa bikin ku kes ji bo me tiştekî nebêje da ku em rehet bin. Bi vî rengî ne em ji kesekî tiştekî bixwazin, ne jî bila kesek ji me bixweze. Em xwediyê vê têgihîştinê ne. Ev tê wateya ku em bi her kêmasiyê û xirabiyê re dijîn. Dibêjin "wer jî mirov dikare bijî, mirov dikare wisa jî bibe partiyi." Di vir de xeteriyên mezin hene. Ev şaş e, mirov bi her tiştî re nikare bijî. PKK her tiştî qebûl nake. Tiştê ku qebûl dike heye, tiştê ku qebûl nake heye, pîvanên wê hene. Di wan pîvanan de her tişt qebûlkirin nîne. Ti carî xirabiyê û kirêtiyê qebûl nake. Tiştên şaş û kêm qebûl nake. Tiştên ku xizmeta edaletê, azadiyê, wekheviyê nake qebûl nake, mirina xwe di nav de dibîne. Divê mîlîtanên PKK'ê vê rastiyê fêm bikin. Lewra wê ti carî di nav kirêtiyan, şaşitiyan de nejîn. Wê van şaşitiyan nejîn û nehêlin kes jî bijî. Yê ku kirêtî, xerabî, şaşitî, bêedeletiyê bijî, bi her kesi jî dide jiyîn.

Kesên ku bi xwe heta dawiyê di nav şaşitî û neheqiyê de dijîn, wê çawa li dijî wê bisekinin? Yên di nav têkilî û xerabiyê de dijîn, li hemberî wê, wê çawa bisekinin? Çavê xwe jê re digirin, teşwîq dikin. Ji ber ku bi xwe wiha dijîn, lewma yê ku bi xwe di nav şaşitiyan de dijîn, wê çawa li dijî têkiliyên şaş bisekinin? Lê kesayetên ku xwe bi rêxistinê re kirine yek, dema têkiliyeke şaş dîtin, tavilê li wir li

dijî wan şaşitiyan radiwestin. Dema em behsa têkîliyên şaş dikin, em ne tenê behsa têkiliyên di navbera zilam û jinê de dikin. Navbera jin-jinê de ye, navbera zilam-zilam de ye, navbera şervanan û rêveberiyê de ye, navbera şervanan bi xwe de ye, di navbera rêveberiyê bi xwe de ye. Di navbera mîlîtan û însanên di nav civakê de ye. Gelek têkiliyên şaş hene û pêşdikevin.

Lê belê wisa dizanin ku têkîliyên şaş tenê di navbera jin û mêr de tê dîtin. Di wê de qiyametê radike, lê derveyî vê gelek têkîliyên şaş hene, wan nabîne û qiyametê ranake, naçe bi ser de. Ev çi dide diyarkirin, kadro bi têgihîştinên kevineşop dijî, ne bi têgihîştina rêxistinê. Heke bi têgihîştinên rêxistinê bijî, wê van têkiliyên şaş hemûyan bi awayekî berbiçav bibîne. Kadro li ku dît, têkiliyên şaş hene, wê biçe bi ser de û wan rast bike. Dît ku nêzîkatiyeke şaş li hemberî mirovan tê kirin, wê wan jî rast bike. Di nav rêxistinê de têkîliyeke şaş dît, wê biçe bi ser de û rast bike. Di nav gel de wê biçe bi ser de û wê rast bike. Têgihîştina rêxistinê vê ji mirov dixwaze. Heke vê nake wê demê têgihîştinên şaş dijî û bi têgihîştina rêxistinê re najî, lewra naçe bi ser kêmasiyan de. Lewma mîlîtanê vê tevgerê wê ti car têkiliyên şaş nejîn, wê şaşitiyan nejîn. Şaşitî li ku û çawa derbikeve wê milîtanê vê tevgerê qebûl neke. Heta ku wê raneke wê nesekine û wê li dijî van bisekine. Divê ku mirov şaşitiyan qebûl neke.

Niha di kadroyên me de çi derdikeve? Dema li dijî rêveberiyê nêzîkbûneke şaş derdikeve, li dijî vê derdikeve, derveyî vê gelek têkiliyên şaş dibîne, lê dengê xwe qet nake. Ev têgihîştineke kevneşop diyar dike. Têgihîştinên şaş çawa ne? Dema berpirsekî di nav civakê de şaşitiyek kir, her kes diçe bi ser de û qebûl nakin. Weke din çi dibe kes dengê xwe nake. Ev têgihîştineke kevineşop e, di nav rêxistina me de tê meşandin. Kadroyên tevgerê wê xwe ji hemû têgihîştinên kevineşop xelas bikin, ji her milê ve wê terk bikin. Wê têgihîştina rêxistinê û zêhniyet û şêwazê wê ji bo xwe esas bigirin. Erka wî/ê ev e ku bi wê têgihîştinê bijî û li her kesî bide jiyîn. Partîbûn ev e, weke din nabe.

Dema Rêbertî li dijî kirêtî û neheqiyê disekine, armanc rakirina wan e. Gelek heval bi kirêtî û xerabiyan re dijîn û dibêjin “min nedît” lê ya rastî çavê xwe jê re digirin. Yan jî dibêjin “ez qebûl nakim” li dij disekine, lê li gorî xwe bi şêwaz û uslubê xwe disekine. Qaşo wê şaşitiyan û neheqiyê rake, lê tu lê dinêrî xerabtir dike. Hinek

pirsgirêkên nû çêdikin. Mesele ne qebûlnekirina xirabî û şaşitiyan e, mesele ew rakirin e. Neqebûlkirin, tê wateya rakirinê. Ji bo ku tu kêmasiyekî, şaşitiyekî, xirabiyekî rakî cih, wext, hewldan, uslub û şêwazê wê tu yê baş diyar bikî da ku tu bikaribî wê şaşitiyê ji holê rakî. Tu yê wê kirêtiyê baş fêm bikî, da tu bikaribî ji holê rakî. Tu yê van esas bigirî, tenê rastî axaftin nabe. Hinek heval dibêjin “ez rast axivîm, min rast kir.” Rastî gotin û çêkirin pir zehmet e. Ger te xwest ku tu rastiyê çêkî, te hawildanên wê rast pêşxist, di zeman û mekanê wê de pêşxist, li gorî uslubê wê pêşxist tê encam bigirî, wê demê te rast kiriye. Rastî ev e, heke te rast nekiribe, encam di holê de nîn be, wê demê te tiştek nekiriye. Di holê de rastiyek nîne. Wê demê tu xwe dixapînî.

Heke ku hinek çavê xwe digirin, li dijî şaşitiya nasekinin ya têgihîştinên xwe wek wan in, çavê xwe jê re digirin û îdare dikin, xwe di wan de dibînin ji bo wê naçin bi ser de, yan jî bi rastî wan şaş dibînin ji bo wê naçin bi ser de? An jî bi rastî jî şaşitiyan dibînin, lê ji ber quweta çareseriyê di xwe de çênekirine, ji xwe ne bawer in naçin li ser pirsgirêkan. Dema hinek diçin bi ser kêmasiyan de û encamê nagirin, sedem ev e, ku bi şêwazê xwe diçin bi ser de. Bi şêwazên ferdî encam nayê girtin. Ji ber pirsgirêkên ku tu dixwazî çareser bikî, pirsgirêkên rêxistinî û îdeolojîk in. Di bin her helwestê de têgihîştin û îdeolojî heye. Ger tu dixwazî wan şaşitiyan di nav rêxistinê de çareser bikî, tê bi têgihîştina rêxistinê çareser bikî, bi îdeolojî, felsefe, şêwaz, uslub û siyaseta wê tê çareser bikî. Wiha tê encamê bigirî.

Hinek heval jî ji bo ku bêje ez li dijî şaşitiyan sekinî me, tenê rexne dike û dibêje ev şaş e. Yanî dema ku rêxistin hesabê bixwaze karibe xwe biparêze. Da ku bêje, ez çûme bi ser de. Bi rastî ne ku dixwazin şaşitiyan rabikin, ji bo xwe biparêzin wiha dikin. Yê ku şaşitî qebûl nekir, wê radike. Heta raneke israr dike û rehet nasekine, ta ku encamê bigire. Mirov xwezya xwe bi wan kesên ku li dijî şaşitiyan û kirêtiyan disekine, tîne. Rêber APO heta encamê negire nasekine. Hem li pêşiya xerabiyê û kirêtiyê digire, hem jî ji holê radike û pêşketinê çêdike. Şêwazê Rêbertiyê ev e.

Li cem me tiştê derdikeve çî ye? Kê kar nake, xirabiyê dike, bi nirxan dileyize, em bi wan re hevaltiyê dikin. Em wan xeternak nabînin. Lê Rêbertî pariyeke nan jî nade yên ku kar nakin. Ji ber ku dizane wan ew nan heq nekiriye. Rêbertî yên ku di nav kirêtî û şa-

şitiyan de ne qebûl nake. Li ser disekine da wan kirêtiyan rabike. Wexta ew kesan ji wê kirêtiyê xelas kir, wan kesan wisa qebûl dike. Wiha rehet di wê rewşê de kesî qebûl nake. Yan dê kirêtiyan di wan de rabike, dema dît ku ranabe bi wan re hevaltiyê nake. Tu wî bikujî jî hevaltiyê bi wan re nake. Rêbertî ti caran bi mirovên bêked re, yên xerabiyê dikin re hevaltiyê nake. Di têgihîştin û rastiya Rêbertiyê de, ew nêzîkbûn nîne.

Em çi dikin? Tu dinêrî kar nake, xebatê nake, lê devê xwe vedike behsa bêheqiyê dike, em jî guh didinê. Em nabêjin tu bêked î, tu xebetê nakî çima tu diaxivî? Hinekî hedê xwe bizane. Tu ji bo vê tevgerê, gel, erd û nirxên mirovahiyê çi dikî? Tu têkoşîna çi dikî? Te çi nirx, jiyan avakiriye, te çiqas hawildanê wê kiriye. Em vî hesabî napirsin, lê pê re hevaltiyê dikin, guhê xwe didinê, wê ber de, em jî ji hinek aliyan ve tevlî dibin. Wiha em neyîniyê, kirêtiyê kûrtir dikin, wiha em dibin şirîkê wan nêzîkbûnan. Ne gengaz e ku tu vê nêzîkbûnê di Rêbertî de bibînî.

Li gel Rêbertiyê kê biaxive rast diaxive. Rêbertiyê dema dît ku rast naaxive şaşitiyan guhdar nake. Tavilê şaşitiyan pê dide fêmkirin, rastiyê pê dide fêmkirin. Vê esas digire. Tu caran Rêbertî guh nade şaşityan û xerabiyê. Dema yekê gilî û gazind kir jî, tavilê Rêbertiyê ew daye sekinandin û nehiştiye ku bi wî rengî giliyan bike. Ji ber ku însanê zeyîf, kole û bêçare gilî û gazindan dikin. Bêçaretiyê, koletiyê, layîqî însan nabîne û qebûl nake. Lewra Rêbertî dibêje “tê gilî û gazindan nekî û tê wiha bikî” dikişîne uslubê rast.

Lê tu dinêrî li gel me hevalê me bi uslubê şaş diaxive, em vê xeter nabînin, em destwerdanê nakin, rast nakin, em hevalê xwe nakişînin uslubê rast û wî/wê rast nakin. Em guh didinê, heq didinê, lewra wî uslubê şaş kûr û xurt dikin. Di niyetê de em xwe mîlîtan dibînin, lê di pratîkê de her roj em tesfiyegeriyê dijîn û pêşdixin. Pêwîst e, em xwe ji vê rewşê derbixin.

### Bi Dîsîplînê Mirov Serkeftî Dibe

Rêbertî bi dîsîplîn û bi plan xebatê dike. Dema te got Rêbertî, ji serî heta binî dîsîplîn e, rêxistin e, bi plan kar kirin e. Tu Rêbertiyê bêhnekî jî bêkar nabînî. Xwe bi temamî plan kiriye, li gor wê kar dike, da ku di wî karî de encamê bigire. Bi dîsîplîn û berpirsiyarî kar dike. Lewma tu di karê Rêbertiyê de tevlîheviyê û keyfiyetê nabînî. Ji bo Rêbertiyê dem pir girîng e. Pêwîst e, mirov keyfî nêzîkî demê

nebe. Divê mirov kêliyekî jî bêkar nemîne. Da ku bi temamî mirov encamê bigire, divê ku heqê demê mirov bidiyê. Rêbertî dizane ku her roj, ji temenê însên diçe. Divê, mirov di jiyana xwe de cîh bide hinek tiştan. Yanî jiyanê bidest bixe, ji bo wê jî nirxan ava bike. Ev, ji mirov rêxistinîbûnê, dîsîplînê û biplan karkirinê dixwaze. Yên wiha nêzîkî meseleyan bibin û xwedî pêşbînî bin, serkeftinê dijîn. Lê yên ku wer kar nekin, ti serkeftinan tu di jiyan û pratîka wan de nabînî. Ji tevlîheviyê, wendakirinê zêdetir tu tiştekî din nabînî.

Em vê Rêbertiyê qebûl dikin, pê re hevaltiyê dikin, lê em ji dîsîplînê acîz dibin! Em bi plan û bername karkirinê aciz dibin. Pêwîst e, hinek li ser serê me bin, da ku em şiyar bin. Ger kesek li ser serê me nebe, em ji xwe re radizên û tavilê belav dibin û dest bi keyfiyetê dikin.

Dîsîplîn çî ye? Li gorî hedefê, bi plan, bi bername, rêxistinî jiyîn e. Dîsîplîn di wextê de peywirên xwe pêkanîn e, meşa ji bo serkeftinê ye, gavên wê avêtin e. Dîsîplîn di nav PKK'ê de ev e. Ji dîsîplînê acizbûn, nepêkanîna wê tê çi manê? 'Ez tevlî rêxistinê nabim; kar nakim, ji bo serkeftinê û hedefê nameşim.' wateya wê bi temamî ev e. Mirov bi keyfiyetê qet hedefan pêknayîne. Mirov nikare bi bê planiyê, bê rêxistinîbûnê ti hedefan pêkbîne. Kesek bêhedef negihêştiye ti cihan û mirovên bihedef ji bo ku bigihîjin hedefên xwe, divê ku xwe bi rêxistin bikin. Li cem xwe, xwê cidiyetê, berpirsiyariyê çêbikin. Wê di kesayeta xwe de îradê çêbikin. Wê prensîban û rêzikan çêbikin. Wê bi plan kar bikin, da ku bikaribin hedefan bidest bixin.

Lê ya ku bi me re heye çî ye, tu dinêrî em nayên dîsîplînê, jê nerehet dibin, jê nerazîbûnê nîşan didin. Firsendeke herî biçûk jî dît, berê xwe dide keyfiyetê, wê ji bo xwe esas digire. Bi wê kêfxweş dibe. Ev tişt, îfadeya necidîbûna me ye. Bi me re ruhê berpirsiyariyê û cidiyetê nîne, pê ve girêdan jî nîne. Li gorî wê çavdêrî kirin, pîvan û prensîb çêkirin nîne. Ev kesayet wê çawa bibe însanê rêxistinê, wê çawa bibe hevalê Rêber APO? Di mirovekî wiha de çi pêşdikeve; di nav rêxistinê de be wê ji bo rêxistinê çi pêşkeve, ji xeteriyan, wendakirinê û xerabiyê zêdetir, wê çi pêşkeve? Kesayeteke wer her tim bingehê tesfiyegeriyê û dijminiyê ye. Ev ne kesayeta rêxistinê ye û hevaltiya bi Rêber APO re ye.

Yên ku hevaltiyê bi Rêber APO re dikin, wê xwedî dîsîplîn bin, ji serî heta binî, wê xwe bikin kesayeteke rêxistinî. Di kesayeta xwe

de wê pîvan, prensîb, kontrol, girêdana bi hedefê çêbikin, da ku bikaribin hevaltiyê bi Rêber APO re bikin. Wisa nebe bi niyetê nabe. Hem wê heta dawiyê bê îradebûnê, bê rêzikiyê, belavbûnê bijî, hem jî wê bibêje 'ez hevalê Rêbertiyê me.' ev tişt nabe. Hevaltiya bi Rêber APO re wiha nabe. Rêber APO ji serî heta binî, berpirsiyarî ye, cidiyet e, prensîb e, rêxistin e û dîsîplîn e. Tu keyfiyetê nikarî pê re bibînî; Rêbertî nikare ji kêliyeke wexta xwe jî wiha vala vala derbas bike.

Yê me ne kêliyek, ne roj, sal jî ji bo me ne girîng in. Ev jî rastiya me ye. Tiştê îro em bikin, em dibêjin "piştî heftekî jî dibe, tiştek nabe, ez li kêfa xwe binêrim, dema ku min wext dît ez ê karê xwe bikim." Ya ku di nêzîkbûnên me de heye ev e. Rêbertî ne gengaz e vê qebûl bike. Tiştê di xwe de qebûl nekir, nikare di heval û gelê xwe de jî qebûl bike. Cîh nade bê dîsîplîniyê. Ji bo wê, di nav PKK'ê de di nav gel de, ti carî nikare keyfiyetê qebûl bike, derenghîştinê qebûl nake. Wiha li gorî xwe nêzîkî demê û derfetan bûnê, nikare qebûl bike, ne gengaz e ku qebûl jî bike. Mirina xwe qebûl dike, dîsa van qebûl nake.

Hûn ê Rêbertiyê qebûl dikin û pê re dimeşin, wê wextê hûn ê Rêbertiyê rast fêm bikin. Ji her aliyê ve. Wiha gotina, em girêdayî Rêbertiyê ne, nabe. Ew gotinek e û tê de zêde tiştek nîne. Heke tu dibêjî ez girêdayî Rêbertiyê me, tu yê wateyê bidê. Watedayîn jî çî ye, rastiya Rêbertiyê ji her aliyî ve ji bo xwe esas girtin e û pê re jiyîn e, her kes kişandina nav wê rastiyê û jiyanê ye.

Rêber APO, li dijî xiyanetê, teslîmbûnê û nokeriyê pir bihêrs e. Li cem Rêbertiyê ev hêrs, bêsînor e. Ji ber ku hestekî wiha mezin li dijî îxanetê, teslîmiyetê û hevkariyê heye. Hizirê xwe jî li ser vî esasî pêşdixe, rêxistin û çalakiya xwe jî li ser vî esasî pêşdixe. Bi vî rengî kar dike. Lewra ti carî li gel Rêbertiyê teslîmiyet, îxanet û hevkarî pêşneketiye. Lewma Rêbertî nahêle di nav rêxistin û gel de jî ew raman hebe û bijî. Tim û tim bi wê fikrê re şer dike, bi ser de diçe. Teslîmiyetê, îxanetê û hevkariyê wekî mirinê dibîne. Di têkoşîna Rêber APO de çi esas e, li ser bingehê azadiyê jiyîn esas e. Mirinê ji her aliyê ve red dike. Rêbertî jiyanê ji nav mirinê derdixe.

Ya bi hevalan re tê dîtin çî ye? Kîna xwe li hemberî teslîmiyetê, îxanetê û hevkariyê mezin nakin. Di hinek cihan de van xwezayî dibînin. Xwe bi tiştên îxanetê sazkirî re dikin yek. Heta hinek ji nav me çûne îxanetê, di nav me de hinek hevalên me bi wan re danûs-

tandinê dikin. Heta derfetên rêxistinê û gel didin wan, wan bi dizî tînin, di malên rêxistinê de dihewînin û pere didin wan. Yê van tiştan dike çawa dibe milîtanê Rêber APO? Ev li dijî Rêber APO şer kirin e. Her roj Rêber APO kuştin e. Çi têkiliya vê bi Rêber APO re heye? Bi yên reviyayî re di nav têkiliyê de ne. Bi telefonê û bi înternetê, bi nameyan, heta rasterast wan dibînin, wan tînin malê rêxistinê û bi têkiliyên rêxistinê wan xwedî dikin. Ji yên wiha re îxanet û azadî weke hev e. Qet cudatiya wê nabînin û li gorî wan cudatî nîne jî.

Rastiya PKK'ê û Rêber APO çî ye, li dijî îxanetê têkoşîn pêşxistin e. Îxanet û welatparêzî, îxanet û şoreşgerî, îxanet û mirovahî ji hev cuda kirin e. Heta ku Rêber APO û PKK derket, ev hemû di nav hev de bûn, çi îxanet e çi welatparêzî ye, çi li gorî mirovahiyê ye, çi ji mirovahiyê derketin e, nehatibû fêmkirin. Destwerdana ku Rêber APO kirî yek jî di vir de bû. Îxanet, welatparêzî, mirovahî û derveyî mirovahiyê ji nav hev derxist, her tişt zelal kir. Li ser vî esasî li Kurdistanê pêşketin çêbû. Ger ne wiha ba, ne gengaz bû ku pêşketin çêbûya. Yek ji rastiyên Rêbertiyê ev e. Cudatiya vê Rêbertiyê û vê tevgerê ji tevger û pêşengên din ev e. Ti carî îxanet û hevkarî qebûl nekir. Ji ber ku qerekterê mirov vê red dike. Esasê mirov vê red dike. Mirov nikare bibe hevkar, nikare bibe xayîn, nikare berovajiyê xwe be. Nikare ji bo hinekan bijî. Di serî de mirov ji bo xwe dijî.

Milîtanê vê tevgerê wê vê baş fêm bike. Mirovekî rêxistinê, bêyî ku biryarê rêxistinê hebe, nikare wiha bi mirovekî/ê revî re têkiliyan çêbike. Ger çêkir, ew derveyî têgihîştina rêxistinê ye, ew dikeve nav karê sîxûriyê. Bi yekî xayîn re têkilî pêşxistin, bê biryarê rêxistinê be, dibe karekî sîxûriyê. Hinek di nav rêxistinê de wiha karê sîxûriyê dikin. Ji bo îxanetê kar dikin. Bi îxanetê re têkiliya xwe qut nekirin û têkilî berdewam kirin, xizmeta wê kirin, dijmintî ye. Bila milîtantiya PKK'ê li aliyekî bimîne, nabe karê mirovahiyê jî. Ji ber ku îxanet, teslîmiyet û hevkarî li dijî mirovahiyê ye. Li dijî qerekterê mirov e. Yê ku li dijî vê derneket û hem jî bi kîneke mezin li hember nesekinî, tê bizanî wî mirovahiya xwe wenda kiriye û ti têkiliya wî bi mirovahiyê re nemaye.

Niha hinekan mirovahiya xwe wenda kirine û niha di nav me de ne û bi derfetên vê tevgerê dijîn. Milîtanê vê tevgerê nikare vê qebûl bike. Mirina xwe dikare qebûl bike, lê vê nikare qebûl bike.

Rastiya Rêber APO ji îxanetê, teslîmiyetê û hevkariyê hesab pirsîn e. Hem jî bêsînor hesab pirsîn e. Yên ku bi Rêber APO re hevaltiyê dikin, wê vê ji xwe re esas bigirin. Wê tu carî îxanetê nêzîkî xwe nekin. Wê ti carî û ti deverî nehêle îxanet bijî. Milîtanê PKK'ê wê li ser vî esasî xwe rêxistin bike. Hevaltiya bi Rêbertiyê re ancax wiha dibe.

Niha têgihîştinek pêşketiye, çî ye ev? "Ez dixwazim ji statuya kadroyê rêxistinê derkevim, bibim kadroyê ragihandinê û çapemeniyê, çandê, hwd..." Vê normal dibînin û dixwazin bi me jî bidin qebûlkirin. Rastiya Rêbertiyê çi bû, pîvan mezin kirin bû. Bi Rêbertiyê re hevaltî, li ser vî esasî dibe. Milîtantiya PKK'ê li ser vî esasî dibe, wek din nabe. Van pîvanan paş de dikişînin, dixwazin van pîvanan paş de bikişînin û bi me jî bidin qebûlkirin. Vê jî rast dibînin û dixwazin em wan wiha qebûl bikin. Ne gengaz e em wan bi vî awayî qebûl bikin. Em kar dikin ku mirovên ne rêxistinî bigihînin pîvanê rêxistinê. Em dixwazin hemû însanan bigihînin pîvanên rêxistinê. Ji ber ku pîvanên PKK'ê, pîvanên pir li pêş in û pir mezin in. Em ji bo wê kar dikin. Gelek kes di nav tevgera me de, li şûna pîvanên rêxistinê pêş de bibin, gavan paş de diavêjin. Vê rast dibînin û dixwazin em jî qebûl bikin. Ev ne gengaz e em qebûl bikin. Nabe ku mirovekî rêxistinê pîvanê rêxistinê terk bike, paş ve bikişîne û vê ji bo xwe esas bigire.

Gelek kes xwe milîtan dibînin, lê pîvanên rêxistinê paş de dikişînin. Vê nêzîkbûna xwe rast dibînin û dixwazin bi me jî bidin qebûlkirin. Ev fêlbazî ye, fêlbaziya burjuwaziyê biçûk e. Burjuwaziyê biçûk xeteriyan dibîne, lê naxwaze bi wan re rûbirû bimîne. Berpirsiyariyê dibîne û naxwaze berpirsiyariyê hilde. Yên wisa naxwazin dest ji PKK'ê jî berdin, ji ber ku li gel tevgerê derfet heye, prestîj û şeref heye. Ger bi temamî dest ji PKK'ê berdin, wê van hemûyan wenda bikin û nikarin bijîn. Lê dema PKK'yî be, ew jî ji mirov berpirsiyariyê û cidiyetê dixwaze. Naxwazin berpirsiyariyê û cidiyetê bijîn, dixwazin li gorî xwe bijîn, hem jî bi derfetên PKK'ê. Dibêje "ez dixwazim bibim kadroyê çandê yan jî ragihandinê." Pîvanên mezin terk dike, rêxistinê terk dike û dixwaze vê têgihîştinê jî pêşbixe û belav bike. Ev çî ye; bêrêxstinîbûn pêşxistin e. Civakbûn ji holê rakirin e. Van kiryarên xwe normal jî dibînin.

Li Kurdisanê di partîbûnê de gav avêtin, di mirovahiyê de gav avêtin e. Ji vê gav paş de avêtin, dest ji van hemûyan berdan e. Dest

ji vê berdide û dixwaze em jî vê yekê qebûl bikin. Qebûl kirin çî ye, dest berdan e. Tê vê wateyê, em jî dest ji civakbûnê û mirovahiyê berdin. Ev têgihîştin hinde xeternak e. Lewra yên xwedî vê têgihîştinê ne û dixwazin vê têgihîştinê bi me jî bidin qebûlkirin re me got: "yan hûn ê partiyî bin, yan jî hûn nabin kadroyên çand û çapemeniyê. Pêwîst e hûn dûrî me bisekinin." Pêwîst e, yên wiha bên qewitandin. Wiha bi derfetên PKK'ê xwe xwedî kirin nabe. Hem wê hemû derfetên PKK'ê xerc bike, hem jî wê li beramberî PKK'ê û dîrokê berpirsiyar tevnegere. Ev fêlbazî ye, ne tiştekî din e. Bila biçin fêlbaziyê li dijî dagirkeran bikin, li dijî dewletan bikin. Ne li dijî PKK'ê bikin. Fêlbazî li dijî PKK'ê nabe, divê mirov li hemberî PKK'ê rêzgirti be, rabe û rûne ji bo PKK'ê û Rêber APO dua bike. Yê li dijî PKK'ê bi vî rengî fêlbaziyê bikin, pir xeternak in. Dawiya wê nêzîkbûnê sîxûriya pergalê ye, ya dagirkeriyê ye. Têkiliyeke xwe ya subjektîf nebe jî, maneya xwe ya objektîf ev e. Herî dawiyê wê bibe subjektîf jî. Tecrûba me hemû vê bi me dide fêmkirin.

Rêbertî Her Tim Rexê Mirov Yê Erênî Esas Digire

Rêber APO bi her kesî re kar dike û encam girtinê esas digire. Di şêwazê karkirina Rêbertiyê de herî zêde ew xal girîng e. Nabêje ez bi vî re kar dikim, bi vî re nakim, ez bi mirovê weke xwe re dixwazim kar bikim, yê weke min nebin ez bi wan re kar nakim. Ev negotiye û ti carî nabêje jî. Bi her însanekî xwe re kar kirin, di kesayetê wan de, her dem encam girtin ji xwe re esas digire. Kar kiriye da ku her mirovî bike nav karê siyasetê û xebatê. Dema mirov ketin nava siyasetê, kar û xebatê, pêşdikevin û mezin dibin. Ji wan kesayetan, kesayetên siyasî û rêxistinî pêşdikevin. Weke din ne gengaz e kesayet ava bibe. Her çiqas lewaz û nezan bin jî dîsa pirsigirêkên xwe hebin jî bila hebin, pê re kar kirin esas e. Ev nayê wê wateyê ku lewazî û kêmasiyên wan qebûl dike, bi lewazî, kêmasî û kirêtiyên wan re têkoşîn û şer nake.

Rêbertî her dem rexê mirov yê baş esas digire. Di rastiya Rêber APO de nêzîkbûna ji însanan de ev esas e. Wiha kar û xebatê dike, nêzîk însanan dibe. Ji ber vê encamê digire. Lewra got "di însanekî de ji sedî yek aliyê xwe yê baş hebe, ji sedî not û neh xirab be; ez ji sedî yekê esas digirim, ne ji sedî not û nehan." Milê mirovbûnê, tiştên erênî pir biçûk be jî esas digire. Têkoşîna Rêber APO ji bo mirov e. Lewra tim di mirov de aliyê însanî esas digire. Alîkariya mirov di-

ke û hewl dide ku mirov mezin bike. Ne ku tenê aliyekî însan ji mirovahiyê dûr dixe, dorûberê mirov qirêj dike, xirab û bêhêz dike, bêencam dike. Ji ber vî aliyê mirovan ê neyînî û kirêt esas nagire. Aliyê erênî esas digire.

Wê çawa aliyê erênî serwer bike, da ku aliyê neyînî lewaz bike û bêbandor bihêle. Bi vî rengî nêzîkî meseleyan dibe. Ji sedî yekê wê çawa xurttir bike, wan taybetmendiyên neyînî bêbandor bihêle, li ser vê disekine. Di nêzîkbûna xwe de vê esas digire. Lê belê aliyê erênî esas girtin, nayê wê wateyê ku aliyê neyînî nabîne û çavên xwe jê re digire. Di nêzîkbûnên Rêbertiyê de ev nîne û ne gengaz e ku hebe jî.

Rexê erênî esas digire û aliyê neyînî jî dibîne û qebûl nake, bi ser de diçe, xurtkirina kesayetê esas digire. Wiha li gel mirov pêşxistin çêdibe. Bi wan însanan derfetan çêdike. Wiha nabêje "ev lewaz e kêm e, ez bi vî re kar nakim." Binêrin Rêbertiyê bi her kesî re kar kiriye, ger Rêbertiyê encam girtiye û kar kiriye, ji vê nêzîkbûnê encam girtiye.

Rêber APO di vê wateyê de ne vebijêre. Lê belê di têkoşîna Rêber APO de mirovên bijare çêkirin esas e. Ango di nav mirovan de nabêje ev baş e, ev xirab e, bi her mirovî re kar dike. Hedefê Rêbertiyê çî ye? Her mirovan pêşbixe û bike hêza çareseriyê. Da ku di mirov de lewazî û kirêtiyê nehêle. Da ku mirovekî vebijêr derbixe holê, ya ku layîqî mirov jî ev e. Di têkoşîna Rêbertiyê de mirovên vebijêr pêşxistin armanc e û esas e. Lê dema ku kar dike, ev taybetmendiya wî ti carî nabe asteng, ji bo her kesî re kar bike. Di wî karî de jî weke min gotî, wê çawa wan însanan hemûyan pêşbixe, mirovên dixwaze wê çawa çêbike? Vê esas digire û wiha nêzîk dibe.

Lê em çawa nêzîk dibin, dema em xwe di însanekê de dibînin, besî me ye û em dibêjin, "ev mirova baş e." Em bi wî/ê re kar dikin, lê dema me xwe tê de nedît, em pê re kar nakin û em dibêjin "ew ne baş e." Eger li gorî me nebe lewaz, kêm û bi pirsgirêk be, em dibêjin "em pê re kar nakin." Nêzîkbûna me nêzîkbûneke vebijêr e. Lê Rêbertî ne wiha ye. Di vir de em derdikevin li derveyî şêwazê Rêbertiyê. Bi mirovên em wan re kar dikin re jî, em ê çawa wan bihêz bikin, bikin hêza çareseriyê, bikin mirovekî/ê vebijêr, em wê esas nagirin. Lê Rêbertî bi kê re kar dike, bi wan re di nav têkiliyê de be, wê çawa wan pêşbixe û bike mînak, wê esas digire. Di vir de jî em ne weke Rêbertiyê ne.

Di axaftin û niyetê de em xwe hevalên Rêbertiyê dibînin. Lê di pratîkê de rewşa em dijîn berovajiyê jiyana Rêbertiyê ye. Ev nabe hevaltiya bi Rêbertiyê re. Yê ku hevaltiya Rêbertiyê esas digire, Rêbertî çawa nêzîkî mirov dibe, wê vê esas bigire. Wê bi her însanekî re kar bike, vebijêr nebe, wê hewl bide hevalê xwe yî kar pêşbixe, xurt bike û bike xwedî kesayet. Tê de kesayeteke azad pêşbixe, di vir de jî wê vebijêriyê esas bigire. Lewra wê demê dibe hevalê Rêbertiyê.

Ji ber ku em berovajiyê Rêber APO ne û li gorî xwe ne, em li gel xwe gelek pirsgirêkan dihewînin. Gelek mirov hene rêxistin wan qebûl dike, lê em dibêjin “ez vî qebûl nakim û ez bi wî re kar nakim.” Ev çî ye, rêxistin ne qebûlkirin e. Çawa rêxistinê tu qebûl kirî, ew jî qebûl kiriye. Tu nikarî bêjî bila rêxistin min qebûl bike û wî/ê qebûl neke! Di nav rêxistinê de mirovek bi hemû kêmasî û şaşitiyên xwe ve dema li vir be, ew însanê rêxistinê ye. Tu nikarî bêjî “ez vî qebûl nakim.” Dema ku partiyê ew qebûl nekir û avête derveyî xwe, wê demê tu dikarî qebûl nekî. Heta ku di nav rêxistinê de ye, çiqas kêmasî û şaştiyên wî/ê hebin jî, tu neçarî wan wekî mirovê rêxistinê û heval bibînî. Tê pê re kar bikî, tu nikarî bêjî “ez pê re kar nakim, ez wî/ê qebûl nakim.” Ev nêzîkbûn rêxistin redkirin e. Mirovên rêxistinê redkirin e.

Di vir de têgihîştineke keyfî heye. Xwe partiyî dibîne, lê yên din partiyî nabîne. Dixwaze ku rêxistin jî wiha nêzîk însanan bibe û wan partiyî nebîne. Ev têgihîştineke xeter e, li gorî xwe ye û di nav partiyê de partî redkirin e.

Heke mirovek ne rêxistinî ye, yan tê di nav partiyê de bikî mirovekî partiyî, yan jî divê ku di nav rêxistinê de nemîne. Pêwîst e tu wiha kar bikî ku ew bi têgihîştina rêxistinê di nav rêxistinê de bimîne. Tê wiha kar bikî.

Rêbertiyê wiha kar dikir. Xwest her kesî bikişîne rastiya partiyê, yê ku nehatin jî jixwe qut bûn û çûn. Ji ber ku nedikarîn wek xwe di nav rêxistinê de bimana. Li vir yan wê kes weke partiyiyekî di nav rêxistinê de bijî, di têkoşîn û çalakiya wê de cih bigire, ger vê ji bo xwe esas negire wê qut bibe biçe. Nikare wiha bijî. Karê me yê îdeolojîk û rêxistinî vê encamê derdixe holê. Mirov temaşe dike şerê îdeolojîk û rêxistinî pêşnaxe, da ku mirov wî/ê bikişîne rastiya rêxistinê, ji wê rewşê derbixe. Ser halan de dibêje “ez wî qebûl

nakim û bila rêxistin jî qebûl neke.” Ya rastî dema şerê îdeolojîk, rêxistinî pêşbixe dibe ku ew mirov bibe partiyî.

Li gorî xwe bûn xurt e. Ji berk u pîvanên xwe esas digire, pîvan yên partîyê bin jî dibêje: “ev ne partiyî ye.” Bila partî jî wiha weke min nêzîk bibe û qebûl bike. Ev nêzîkbûneke xeter e, dibe ku ew mirovê tu partiyî nabînî, ji te zêdetir nêzikî rêxistinê be. Rêxistin nikare bi pîvanê kesan tevbigere, rêxistin bi pîvanên xwe tevdigere. Divê ku tu li gorî pîvanê rêxistinê tevbigerî. Mafekî te nîne tu bi pîvanê xwe mirovan partiyî îlan bikî, yan jî derveyî partiyê bibînî. Pîvanê rêxistinê hene, li gorî wan pîvanan kê partiyî ye, ne partiyî ye, ka çiqas rêxistine di kesayeta xwe de dijî, yan jî li dijî rêxistinê ye, derdikeve holê. Pêwîst e nêzîkbûna te jî li ser vî esasî be.

Di nav partiyê de hev neqebûlkirin, hev redkirin, li dijî hev sekinîn, hevaltî bi hev re nekirin û bi hev re kar nekirin, çi îfade dike? Nehatina xeta rêxistinê û rêxistin neqebûlkirinê, partî red kirinê îfade dike. Mixabin di nav partiyê de hinek heval her tim bi hev re di nav şer de ne. Hev qebûl nakin û bi hev re kar nakin, hevaltiyê nakin. Her dem di nav fesadî û pevçûnê de ne, li ber hev didin. Ser halan da jî xwe partiyî dibînin. Ew şerê ku li dijî hev dikin ne li dijî hev e, li dijî partiyê ye. Hêza xwe nînin ku wê li dijî partiyê pêşbixin, ancax wê li dijî hev pêşbixin. Ya rastî di esas de li dijî partiyê ne, lê belê nikarin vê eşkere bikin. Ji ber wê perdeyekî diavêjin ser, da ku wiha bê dîtin ku hev qebûl nakin û hev red dikin.  Wiha didin diyarkirin.

Ev nêzîkbûn di nav vê rêxistinê de nabe. Her du jî mirovê vê rêxistinê ne. Bi vî rengî ev şerê di navbera wan de nabe. Ger şerek di navbera wan de heye, ew şer bi rêxistinê re ye. Ji ber ku her du alî jî mirovê vê rêxistinê ne. Wê demê ligorîxwebûn heye, ji bo xwe ne, lewra bi vî rengî vî şerî dimeşînin. Mirovê rêxistinê wê li gorî xwe nebe. Di nav PKK’ê ferd, bi temamî xwe dibuhirîne, şerê dike şerekî îdeolojîk û rêxistinî ye.

Ger mirovek derveyî têgihîştina rêxistinê be, divê bi têgihîştina rêxistinê têkoşîn li hemberî wî bê dayîn. Têkoşîn divê bi têgihîştina rêxistinê bê dayîn. Di navbera gelek hevalan de ew pirsgirêkên ku derdikevin sedema wê, ne ku yek rêxistinê temsîl dike yê din nake ye. Ger wiha be rast e. Şêwazê wan yê şer şaş e. Li holê ti rastî nîne, ew xwe rast dibîne yê din xwe rast dibîne. Şaşitiyan li ser hev ferz dikin. Lewma hev qebûl nakin, bi hev re şer dikin.

Ger hevaltiyê û rêxistinê esas bigirin, wê bi hev re biçin bi ser kêmasiyan de û wan kêmasiyan rast bikin. Wê heta dawiyê bi hev re hevaltiyê bikin û bêrêziyê li hemberî hev nekin. Li dijî şaşitiyan sekin cuda ye, li dijî hevaltiyê sekin cuda ye. Dibêje “ez li dijî şaşitiyan disekinim.” Tu dinêrî li dijî hevaltiyê disekine. Heval in lê, li hev nakin, bi hev re kar nakin, bi hev re naaxivin. Silavê jî nadin hev, hev weke dijmin dibînin. Ev xwe partiyî û hevalê Rêbertiyê jî dibînin! Ev çawa dibin milîtanê Rêber APO, berovajî milîtantiya Rêbertiyê ne. Li dijî Rêbertiyê disekinin di xwe de her roj hevaltiyê, Rêbertiyê dikujin û dibêjin em milîtanê Rêber APO ne? Ev tefsiyegerî ye, ev têgihîştina civakê di nav rêxistinê de, di kesayeta xwe de pêkanîn e. Li dijî partiyê sekin e. Lewra yê ku naxwaze bê têgihîştina Rêbertiyê û rêxistinê bihêz bike, yê ku naxwaze li gorî hedefê gavan biavêje, serkeftinê bijî, kesayeta dijmin dide axaftin.

Ew çand, exlaq û pîvanên ku dijmin dayê temsîl dike, rêxistinê temsîl nake. Di nav rêxistinê de yekîtiya rêxistinê esas negirtin, hevaltî esas negirtin, rêznedana hev, hev du her dem pêşnexistin û li dijî hev sekinîn, hev red kirin, fikrên dijmin ji xwe re esas girtin, ji rêxistinê dûr mayîn... wateya van çî ye? “Ez li dijî dijmin nasekinim, ez li dijî dijmin kar nakim, ez yekîtiya rêxistinê esas nagirim. Ez vê rêxistinê pêş naxim. Ez hevaltiyê di vê rêxistinê de pêş naxim.” Wateya vê ev e û vê îfade dike. Ev di nav partiyê de kesayeta dijmin pêşxistin e. Kesayeta dijmin di nav partiyê de dana pêş e, ji sîxûriyê wêdetir ne tiştekî din e. Kes nikare bi navê Rêbertiyê û PKK’ê, kesayeta dijmin bide pêş û pêşbixe. Mafekî xwe yê wiha jî nîne. Ev bi PKK’ê re şer e, dijmintî û sîxûrî ye. Temsîlkirina kesayeta dijmin e.

## Mirovên Azad Mirovên Vekirî Ne

Di rastiya Rêbertiyê de, bi heval, rêxistin û gelê xwe bawer kirin esas e. Ji ber ku bawer dike kare dike eşkere dike, prensîba vekirîbûnê esas digire. Rêbertî ji bo gel, hevaltiyê û rêxistinê dijî, kar dike. Rêbertî çi esas digire? Hesabdayînê esas digire. Heke ji bo rêxistin, gel û hevaltiyê kar dike, divê her tim hesabê xwe jî bide, ka li ku rast kiriye û li ku şaş kiriye. Li ku wenda kiriye, li ku bidestxistiye. Girêdayîn, rêz û pê bawer kirin ji mirov vê dixwaze.

Hinek dibejin “ez girêdayî Rêbertiyê û rêxistinê me, hurmeta min heye” lê di heman demê de heta dawiyê girtî ye. Wekî bîreke kûr in, dilê wan jî weke qîrê ye, venabe. Yê ku bi rastî girêdayî û du-

rust in, vekirî ne. Yê ku rêzê digire, bi gel bawer e karê xwe de jî vekirî dibe. Ger mirov bawer neke mirov girtî ye. Mirov bi rêxistinê û gel bawer nekir, wê demê mirov hurmetê nade û vekirî jî tevnagere. Wê her tim xwe biparêze. Gelek tiştan diyar nake, nabêje û vedişêre. Rêbertî heta dawiyê hesab dide, vê esas digire. Tu dinêrî dibêje "ez hevalê Rêber APO me" lê ji hesabdayînê direve. Dema tu dibêjî were hesabê xwe bide, tu dibêjî qey tu îdama wî dixwazî, nerazîbûnê nîşan dide. Heta ku te zêde kir, ew dest bi gefan û şantajan dike. Heta hinek berê xwe didin rêkên îxanetê, da ku hesab nedin. Bi vî rengî nabe, mirov temaşe dike, heta dawiyê girtî ye û girtî dimîne. Her tiştî ji rexistin, gel û hevaltiyê vedişêre.

Niha gelek di nav rêxistinê de hene, qaşo mirovên rêsitinê ne, lê ji rêxisitnê bawer nakin. Ji ehbabên xwe bawer dikin. Hemû sirên xwe bi ehbab çawîşên xwe re parve dikin, her tiştî ji ehbab çawîşê xwe re dibêje, tiştekî xwe nahêle veşartî û ji hev re dibêjin. Lê belê ger hate rêxistinê heta dawiyê girtî ne. Rêxistin wan nas nake, da ku rêxistin bizanibe ka çi difikirin, çi dijîn û çi hedef dane pêşberî xwe. Ji bo rêxistin wan nas neke, her tiştî dikin. Bi rêxistinê re naxivin û parve nakin. Ji ber ku ji rêxistinê bawer nakin. Ji ehbab çawîşê xwe bawer dikin. Heke ji rêxistinê bawer bikin, wê her tiştên xwe bi rêxistinê re parve bikin. Ji ber ku rêxistinê esas nagirin, ehbab çawîşên xwe esas digirin û bi wan re parve dikin. Ango ehbab çawişên xwe re her tiştî daxivin û esas digirin. Ferdiyetê esas digirin, ne rêxistinîbûnê. Berê xwe nade rêxistinê, dide ehbab çawîşên xwe, li gel wan çareseriyê digere, di rêxistinê de li çareseriyê nagerin.

Lê ya rastî mirovekî rêxistinê çareseriyê di rêxistinê de dibîne. Di kesan de nabîne. Her tiştî ji rêxistinê re vedike û diaxive, da ku rêxistin her aliyê wan bizane, ji kesan vedişêre. Lewra mirovê ku rastiya rêxistinê nejiya be û bi rastiya rêxistinê re xwe nekiribe yek, di nav rêxistinê de, hinek kesan ji bo xwe esas digirin. Têgihîştin û teybetmendî, çalakî, daxwaziyên xwe di kê de dibîne, wan ji bo xwe esas digire. Di nav rêxistinê de ehbab çawîşî esas girtin, rêxistin parçe kirin e, bê rêxistinîbûn pêşxistin e. Kî di nav rêxistinê de van karan bikin, sîxûriyê dikin. Binêrin di nav rêxisitnê de karê wan çî ye, wê çawa di nav rêxistinê de bêrêxistinîbûnê û parçebûnê çêbikin. Wî karî dikin. Tu karê sîxûriyê dikî, rêxistinê parçe parçe dikî, bi ehbab çawîşiyê siyaseta dijmin dimeşînî, paşê dibêjî ez PKK'yî me û hevalê Rêber APO me? Dibe ku di niyetê de tu wiha bî, lê ew-

qas tu berovaj î û li hember î. Di pratîkê de biqasî erd û ezman dûrî Rêbertî û rêxistinê yî. Bi vî rengî di nav rêxistinê de dijmin dijîn.

Xeta dijmin çî ye, kar dike, da ku Kurd negihîjin hev. Kurdên ku bigihîjin hev jî bi hev re kar nekin û parçe bibin. Hemû karê dijmin li ser vî esasî ye û xeta wî ev e. Karê wî ev e ku Kurd negihîjin hev, dema gihîştin hev jî nikaribin bi hev re kar bikin. Wê çawa parçe bike, di nav wan de bêbaweriyê çêbike, li ser vî radiweste. Dijmin timî vê di nav Kurdan de dike.

Dema tu jî karê dijmin di nav rêxistinê de bikî, tu dibî sîxûrê dijmin. Tu siyaset û xeta dijmin pêktînî. Di nav xeta PKK'ê de, ehbab çawîşî û her cure parçekirin nabe. PKK û Rêber APO, li dijî parçekirinê, malbatgerayiyê, eşîretgerayiyê, mezhebgerayiyê, parçegerayiyê, ezezîtiyê ... hwd disekine û têkoşînê dike. Tu çawa dibî hevalê Rêbertiyê û van di nav PKK'ê de dikî û didî kirin! Vê jî normal û wek mafê xwe dibînî. Ev li dijî Rêbertiyê sekin e û Rêbertî kuştin e. Mirovê ku hevaltiyê bi Rêbertiyê re bike wê li ser rastiya Rêbertiyê bike, ne li dijî vê rastiyê. Ne li ser rastiya dijmin, yan jî li ser çand, exlaq, kesayet û pîvanên dijmin wê bike. Ev nabe hevaltî, ev dibe dijmintî. Mirov temaşeyî Rêbertiyê dike tiştekî xwe ji rêxistin û gel venaşêre. Her tiştê xwe gotiye. Tiştekî ku veşartî bimîne nemaye. Ji malbata xwe bigire, bav, dayîk, bira, gund, têkiliya xwe û Fatima... her tiştê xwe bi awayekî vekirî gotiye. Çima, ji ber ku ji bo vê rêxistinê û gelî dijî. Girêdan û rêza xwe jî li hemberî gel û rêxistinê wiha dide diyarkirin. Mirov dikare bêje yê girêdayî ye wiha dike. Yê ku girêdayî nebe û rêza xwe nebe, ti car wê nake. Yekî jî Rêber APO zêdetir li ser rastiyên xwe rawestiyabe û ew eşkere kiribe nîne.

Bi vê Rêber APO çandekî û exlaqekî pêşdixe. Bi pîvanan pêşdixe, zêhniyetekî ava dike. Dixwaze hemû hevalên xwe jî bikişîne vê. Ji bo durûtî, sextekarî, dekûdolab û xapandin nebe ev pêwîst e.

Dijmin niha tiştê ku Rêbertiyê bi awayekî eşkere gotiye dixwaze li dijî Rêbertiyê û PKK'ê bikarbîne. Lê nikare encamê bigire, ji ber ku Rêbertiyê bi xwe ew tişt hemû gotiye. Niha dibêjin têkiliya Rêbertiyê bi Ergenekonê re heye. Çima wiha dibêjin? Ji ber ku Fatima keça sîxûrekî bû, Pîlot jî sîxûrê dewletê bû. Di destpêkê de Rêbertiyê ev vekirî gotibûn. Yên ku van niha li hemberî Rêbertiyê bikar tînin, bi îzahên Rêbertiyê bi van meseleyan hemûyan hesiyane. Ne bi lêkolînên xwe gihane van agahiyan. Lewra jî ev agahî kêrî qurîşekî nayê, bandora xwe nake. Ger tu dixwazî li dijî dijmin bisekinî tê

wiha bisekinî. Tiştê ku dijmin li dijî te bikarbîne çi hebe tê ji dest dijmin bigirî. Ew jî ji mirovan çi dixwaze? Prensîba vekirîbûnê esas girtinê dixwaze.

Yên desthilatdar çand, exlaq û zêhniyeta wan çawa ye û çî ye? Her tiştî veşartî çareser dikin. Da ku kes pê nehese, bi taybet jî gel pê nehese. Vê esas digirin, ev çand û exlaqê wan e. Lê tu li dijî wê zêhniyet û çandê disekinî. Tu nikarî girtîbûnê ji bo xwe esas bigirî, tê her tiştî eşkere bikî. Da ku her kes bizane.

Tiştê pêwîst e her kes bizane, divê her kes bizane. Di karê rêxistinî de her tişt wiha eşkere dibe? Wisa nebe nabe, ji ber ku li hemberî te dijmin heye û tê wî jî ber çavan bigirî. Tiştê tu divê bê eşkerekirin, tê eşkere bikî, ew dijmin lewaz dike, propogandaya dijmin a li ser te hemûyî pûç dike û ji holê radike, bêbandor dike. Wê demê tê her tiştî vekirî bibêjî û her kesî agahdar bikî. Lê tiştên ku dijmin ji faydê bibîne û derbê li te bixe, tê eşkere nekî. Mînak plansaziyeke te heye, tê plansaziya eşkere nekî. Tê li ku çi bikî eşkere bêjî, paşê tu nikarî pêkbînî. Wê demê tu derbê dixwî. Tiştê pêwîst e eşkere nebin hene. Lê ger xetayeke te çêbûye, tu dikarî wê eşkere bikî, kêmasiyeke te çêbûye, tu dikarî wê eşkere bikî. Ev bi mirov nade wendakirin, bi mirov dide bidestxistin û baweriya mirov bihêz dike.

Li ser kêmasî xirabî û kirêtiya girtin, bawerî bi mirovan re çênake. Kîngê be wê derkeve holê ku te veşartiye. Wê demê bawerî bi te namîne. Niha ger di nav rêxistinê de hevalekî bi şaşitî kêmasiyek kir û bêje “ez ê xwe biparêzim, bi vî rengî da ku dernekeve holê, rêxistin û heval pênehesin.” Lê teqez wê rojekî derkeve holê. Ger derket holê jî, baweriya mirovan bi wan kesan namîne. Lê heke mirovek sucekî bike û bêje min ev suc kir û li gorî vî sucî rêxistin çi cezayê dide, bila bide ez hazir im, ev baş e. Mirov ji mirovên wisa natirse, ji ber ku ev mirov tiştekî venaşêre û durust e. Ev milîtan e û mirov baweriyê didê.

Temaşe bikin, Rêbertiyê ti carî li ser şaşitiyên xwe û yên rêxistinê negirtiye. Eşkere bi ser şaşitiyan de çûye. Ev nêzikbûn anora PKK’ê naşkîne, hîna mezintir dike. Ti kêmasî û şaşitiyên xwe veneşart. Ji ber ku bi xwe bawer bû. Rast bû, li ser heqîqetê bû ji bo wê veneşart, heke ne li ser rêka heqîqetê bûya, ji xwe nebawer ba, lewaz ba, di dudil ba û bêbiryar ba, hilbet wê kêmasî û şaşitiyên xwe veşarta.

Ez di sala 1990'î de dema ku ji Ewrûpa ji bo kongreya çaran hatim welêt, beriya ez bêm, min ji Mihri Belli re telefon vekir û gotê: Ez diçim û hevalekî din li vir dimîne û êdî tu têkiliyên xwe bi wî re bimeşîne. Heta wê demê têkiliya wî tenê bi min re hebû. Da ku bizanibe ez diçim, min je re got "ez diçim gel Rêbertiyê, ti peyamê te hene?" Di telefonê de ji min re got: "ez heyranê Rêber APO û PKK'ê me." Min gotê, ji bo çi? Wî got, "tiştê ku ti dewletên sosyalîst, partiyên sosyalîst pêkneanî, we pêkanî. Hûn her tiştê xwe eşkere dikin û kêmanî û şaşitiyên xwe venaşêrin û rexne dikin, rexnedayîna xwe didin. Hûn hinde ji xwe bawer in. Ez heyranê we me. Min li gel we sosyalîzm dît. Lewra ez heyranê we me." Ev axaftina wî rast bû.

Ti carî kesekî ew nekir. Temaşeyî dîroka gelek rêxistinan û tevgeran bikin, her tim tiştên baş nivîsîne, tiştên xerab nenivîsîne û veşartine. Piştî encam girtine û şûn de ew pirtûk nivîsîne û hemû aliyên xwe yên erênî nivîsîne. Qet kêmasiyên xwe nenivîsîne. Tu dibêjî qet tiştên wan ê xerab nebûne, ev xapandineke mezin e. Ev ne durustiyek e, lê ya rastî li PKK'ê binêrin, aliyê xwe yê erênî û neyînî hemû vekirî ye. Niha rêveberiya PKK'ê ya di asta jor de, di derbarê PKK'ê de çi dizane, hevalekî nû tevlî dibe jî wan agahî û tiştan dizane. Cewazî qet nîne. Ji ber ku PKK her tiştê xwe ji bo mirovên xwe vedike û dibêje. Venaşêre û pêdiviya wê jî nabîne ku veşêre. Ji xwe û mirovê xwe bawere. Niha ferqa min û hevalekî nû zêde nîne, ez çi dizanim ew jî dizane. Ji ber ku hemû tiştê PKK'ê eşkere bûne û hatine xuyakirin. Ev girêdan û rêzdayîna PKK'ê ji gelê wê re nîşan dide. Çawa rêzgirtina gelê xwe digire, wê diyar dike. Nîşan dide çawa bi mirov û gelê xwe bawer e. Yê ji xwe bawer, rêza xwe hebe vê dike.

Lê yên lewaz her tiştî her tim vedişêre, da ku kes lewaziyên wan nebîne, nizanibe, li dijî wan bikar neyîne. Ev zêhniyet û çand ya desthilatdaran e. Desthilatdaran ew çand û exlaqê xwe daye civakê hemûyî. Heta daye civaka jêrîn jî. Ev durûtî û xapandinê çêdike, pêdiviya xwe bi vê dibîne. Ev çand û exlaq mirovan ji rastiya wan dûr dixe.

### Rêber Apo Heta Ku Nede Naxwaze

Rêber APO dema tiştekî nede kadro û gel ji wan tiştekî jî naxwaze. Çiqas dabe ewqasî dixwaze. Ji vê zêdetir tiştek nexwestiye û ew heqê xwe jî nedîtiye. Dema Rêbertî tiştekî nede kesekî, jê jî

naxwaze. Ji ber ku Rêber APO hem daye gel û hem jî daye kadro, lewra pêwîst e kadro û gel jî li gorî wê kar û xebatê bikin.

Di kesayeta me de dayîn nîne, em nadin, lê em her tiştî dixwazin. Yan jî em didin û beramberî wê jî naxwazin. Bi me re ev heye, di vir de jî em berovajiyê Rêbertiyê ne. Rêbertî çi dabe, xwedî lê derketiye û ango çi daye gel û kadro, beramberê wê jî xwestiye. Lewra Rêbertiyê gotiye "min ev daye te." Ya diyar dibe di wir de kedek heye û xwedî lê derketin heye. Li cem me ev nîne, dema em bidin jî em lê xwedî dernakevin. Em nabêjin "min ev derfet daye te, pêwîst e, tu lê xwedî derkevî, vî karî bikî û encamê jê derbixî." Em mirovan neçarî vê nakin. Ya ku em dikin çî ye? Em dibêjin: "me daye te, lê tu dikarî keyfî jî nêzîk bibî, tu dikarî ti karî nekî û dema xwe ziyan bikî." Em li ser vî esasî nêzîk dibin. Yan jî em tiştekî nadin û her tiştî dixwazin, barekî pir giran didin ser milan. Em wiha di bin wî barî de dikujin.

Em ne weke Rêbertiyê nêzîk dibin, di kesayeta Rêbertiyê de ev nînin. Pêwîst e, em di vê xalê de jî rastbûnekî çêbikin. Ti carî dema me tiştek neda, pêwîst e em nexwazin. Dema me da jî pêwîst e, em li ser bisekinin da ku di wir de kes keyfî nêzîk nebe; li gorî xwe nêzîk nebe. Rêber APO berdêlek ji bo şexsê xwe nexwestiye. Di têkoşînê de erk pêkanîn, ji bo xwe esas digire. Wê erkên xwe pêk bine, wê ji bo xwe tiştekî nexwaze. Yanî wê nebêje min heq kir. Min ev kar kir, ev min heq kir, bila tevger û rêxistin mafê min bide. Di rastiya Rêbertiyê de ev nîne. Di vê wateyê de bêşert û merc xwe tevlîkirin, bê berdêl kar kirin, esas e.

Em bi şert dixwazin kar bikin, xwe tevlî bikin. Ger me kar jî kir, em dibêjin min kar kiriye û hinde keda min heye, ez beramberî wê, vî dixwazim. Çima rêxistin wê berdêlê nade min, çima erka min mezintir nake, çima meqamê min mezin nake, çima derfetên mezin nade min. Ger rêxistin wiha nêzîkî min nebe, wê demê mafê min tê xwarin, ez kar nakim. Heqê min tê xwarin. Bi vî rengî li pey heq dikeve. Ango şoreşgeriya ku dike ji bo xwe dike, ne ji bo rêxisitnê, gel, hevaltiyê û mirovahiyê dike. Ger çi kiribe berdêla wê dixwaze. Ger rêxistinê neda aciz dibe û nerazîbûnê nîşan dide, nerazîbûna xwe dizîvirîne ber bi dijbertiya rêxistinê. Qaşo dewa mafê xwe dike. Ger dît ku nabe dibêje "mafê min hate xwarin." Paşê direve û diçe gel dijmin û di sengerê de êdî êrîşan li ser rêxistinê dike. Dibêje "di nav rêxistinê de neheqî, maf tê xwarin."

Di nav PKK'ê de maf çî ye? Tê bêjî bila PKK min qebûl bike û bila vê şerefê bide min, bila vê nasnameyê bide min, da ku ez pê bijîm û kar bikim. Bila PKK derfetên kar bi vê nasnameyê bide min. Tê tenê vî mafê xwe bizanî, mafê te ev e. Wekî din heqekî te nîne. Ger rêxistinê ev maf da te, rêxistinê mafê te daye. Li derveyî vî heqê tu ji rêxistinê bixwazî nîne. Rêxistinê tu tevlî xwe kirî, ew şeref û nasname daye te. Ger tu bi wê nasnameyê kar jî bikî ew daye te, êdî tiştê tu ji rêxistinê bixwazî nemaye. Rêxistin ji bo ku tu xizmeta gel û mirovahiyê bikî, pêwîst e îdeolojiyê, felsefê, teoriyê, siyasetê û hêza rêxistinê bide te. Taktîk û stratejiya pêwvist, xwe bide te. Ji bo tu xwe biparêzî pêwîst e, sîlehan bide te; derfetên tu bikarî pê kar bikî dide te, da ku tu nemirî xwarinê jî dide te, ji bo ku tu tazî nebî cil û bergan jî dide te. Tiştên ku ji bo te pêwîst, da ku tu şoreşgeriyê bikî çi heye hemûyan dide te. Êdî tiştê tu ji rêxistinê bixwazî nîne. Tu deyndarê vê rêxistinê, gel û mirovahiyê yî, pewîst e, tu deynê xwe bidî. Ger te ev ji rêxistinê girtin, tê deynê xwe jî bidî.

Tu hatî nav rêxistinê û te gotiye bila rêxistin min qebûl bike, ji bo ez xizmetê bikim. Rêxistinê tu qebûl kirî û çi pêdiviyên te hebe daye te, êdî divê tu xizmetê bikî. Ya rastî êdî tê şev û roj kar bikî.

PKK bi xwe cihê ku mirov heqên xwe bistînin çêbûye. Jixwe hatina nav PKK'ê, hatina heq girtinê ye. Kê mafê te xwaribe, tê mafê xwe ji wan bigirî. Dagirkeran heqê te girtine, hêza te tenê têrê nake, ji bo tu mafên xwe bidest bixî. Tu tê yî nav rêxistinê da ku tu hêza xwe bi rêxistinê re bikî yek û mafên xwe ji dagirkran bigirî. Ger te çiqas mafê vî gelî girt, hinde tu dibî xwedî maf. Tu jî mirovek ji vê civakê yî, tu parçeyek ji vî gelî yî û te ji bo vî gelê çi kir, te ewqas jî ji bo xwe kiriye. Ger te mafên vî gelî bidest nexist, tu bi xwe jî nabî xwedî maf.

Rêber APO rojekê ji vê tevgerê û gel maf nexwast. Ji bo hevaltiyê, gel û tevgerê hinde kar kir rojekî negot bila ev rêxistin, gel û heval mafên min bidin. We dîtiye îro jî tiştekî ji bo xwe dixwaze? Di Îmralî de di wan şert û mercan de ji bo xwe tiştek xwestiye? We rojekî bihîstiye ku ji bo şexsê xwe tiştek xwestiye. Di nav wê zilmê de jî dibêje "ez dijîm, dîsa ji bo we ez dixwazim bijîm. Lewra ez tehemula vê îşkencê dikim."

Xeyrî xwe heland, bû hestî û çermek û di dawiyê de got: "li ser qebristana min 'deyndarê Welat e' binivîsînin." Ya rastî Xeyrî dema ku li der ve bû jî heta şehîd ket, di zindanê de jî ji bo vê tevgerê û gel

xebitî. Tiştek jî nexwest, di navenda Amedê de jî tiştek nexwest. Xwe ji bo vî gelî û tevgerê heland û got, “binivîsin deyndar e.” Wiha rexnedana xwe da. Got, min ji bo rêxistinê, gelê xwe û mirovahiyê erka xwe tam pêkneanî. Ger ew xwe deyndar dibîne, di vê tevgerê de kes nikare bêje min heq kiriye, ka mafê min. Ger ew deyndar e, her kes deyndar e û wê xwe deyndar bibîne. Wê çawa deynê xwe bide, li ser vê biponije. Ne karek kiriye û ne jî erka xwe pêkaniye, piçek encam jî negirtiye dibêje “ka mafê min.” Te erk pêkaniye, tu mirovê vê rêxistinê yî, tu hatî nav vê rêxistinê ji bo tu erkan pêkbînî, di vê rêxistinê de erk pêkanîn jî pîroz e û serkeftin esas e! Erk wiha pêk tên. Ger tu serkeftî bî û te hinek encam girtin, nayê wê wateyê ku tu bûyî xwedî maf. Te tiştên divê bê kirin, kiriye. Ka kijan heval li gorî erka xwe tevgeriyaye? Zêde zêde bi erkên rêxistinê leyîstin û ew pûç derxistin heye. Pir kêm e erk pêkanîn. Çawa tu dibî xwedî maf?

Di nav gerîla de fermandar e, çûye çalakiyek kiriye û dibêje “min heq kiriye, pêwîst e hûn min mezin bikin, erk û derfetên min mezin bikin.” Ger nadinê dest bi çûna ber bi îxanetê ve dike. Wê demê di vir de jî şaşitiyek heye, pêwîst e ev jî bê rastkirin û rakirin.

## Rêber Apo Mirovê Kurd Mehkumî Çareseriyê Kir

Rêbertî neçarmayînê red dike û mehkûm dike. Mirovê Kurd mehkûmê çareseriyê dike. Dijmin Kurd neçarî jiyanekê kiriye ku pê ew lewaz kiriye. Koletî pê daye qebûlkirin. Bêbiryar, bêîrademayîn û têkçûn qebûl kirine. Di kesayeta Rêbertiyê de tenê rêka çareseriyê heye, li derveyî vê rêkeke din qebûl nake. Ji ber ku li derveyî vê rêyeke din qebûl kirin koletî qebûl kirine. Çima tenê vê rêkê qebûl dike? Ji ber ku civak û mirovê Kurd bi tenê bi vê rêkê dikarin zincîrên koletiyê bişkînin. Bi vê rêkê dikarin dawî li bêîradetiyê bînin. Hedefa wî ya azadiyê bi tenê dikarin bi vî awayî pêk bînin.

Rêbertî wexta li çareseriyê digere, heke astengî, zor û zehmetî derdikevin pêşberî wî, ji bo ji holê rake bi ser de diçe û ji sedî sed encamgirtinê esas digire. Lewma milîtaniya Rêber APO û PKK’ê milîtaniyeke çareseriyê esas digire. Ji bo xwe çareseriyê esas digire. Çareseriya lê digere berê pêşî bi xwe pêkanî ye. Bi temamî çareseriyê bi hêza xwe û derfetên pêk tîne. Rastiya Rêbertiyê bi temamî vê îfade dike. Tu dinêrî dibêje ‘ez hevalê Rêbertiyê me û Rêbertiyê esas digirim’, lê heya dawiyê pratîk û zêhniyeta wî neçarî ye. Ne-

çariyê çareserî dibîne. Ev ew siyaset e ku li ser Kurdan tê meşandine. Ev siyaseta dagirkeriyê ye ku li ser Kurdistanê tê meşandine. Yê ku li dijî dagirekeriya sîstemê disekine, nikare vê siyasetê û rêkê ji bo xwe esas bigire. Heke tu dixwazî li dijî dagirkeriya sîstemê bisekinî, divê tu çareseriyê ji bo xwe esas bigirî. Kengî te tenê ew rê ji bo xwe esas girt û rêyeke din ji bo xwe esas negirt, te yên din hemû girtin û xwe mehkûmê çareseriyê kir; hingê tu dikarî li dijî dagirkeriyê bisekinî.

Sîstema dagirker her tim mirovê Kurd, civaka Kurd neçar dihêle û bi vî awayî dide meşandin, da ku karibe sîstema xwe ya desthilatdar li ser bide meşandin. Ango ya layiqî mirovê Kurd dibîne tenê ev e. Yê ku bi navê vî gelî û bi navê azadiya vî gelî tevdigere nikare bêçarebûnê layqî vî gelî bibîne. Tişta tenê layîq bibîne çî ye, çareserî ye. Wê her kesî di vî warî de serwext bike. Mînak, di sala 1979'an de me tevger bi rêxistin dikir. Yê ku bi rêxistin kirin, yek ji berpirsiyaran ez bûm. Dema ku rêxistin çêbû, me partî bi rêxistin dikir. Di warê rêxistinê de ne zanebûn, ne jî tecrûba me hebû. Lê li gorî zanebûna xwe me bi rêxistin dikir. Dema ku dijmin bi ser rêxistinê de hat, derbeke mezin xwar. Nikarîbû xwe li ber dijmin bigire. Nikarîbû ji gel re pêşengiyê bike. Rêxistin çêbibû û gel jê zêdetir dixwest gavan biavêje. Ji bo xwe ji rêxistinê pêşengî dixwest, lê rêxistinê wê demê nikarîbû pêşengiyê bike, nikarîbû li hemberî êrîşên dijmin bisekine. Me di wir de derb xwar. Dema ku me derb xwar min xwe berpirsiyarê vê dît. Min got “Me tevger bi rêxistin kir û di bin berpirsiyariya me de rêxistinê ev derb xwar. Heke rêxistinê di bin berpirsiyariya me de ev derb xwariye, em berpirsiyar in.' Min xwe berpirsiyar dît. Li vir ez gihiştim wê encamê ku ez nikarim tevgerê bi rêxistin bikim. Lewma kî dikare rêxistin bike bila bike, ez ê jî bikevim xizmeta wî. Ya rast ev e, berjewendiyên rêxistinê jî di vê de ye. Rêxistin, durustî û dilsozê jî vê ji mirovî dixwaze. Min ev xwe bi xwe nîqaş kir û di pratîkê de min xwest ez pêkbînim.

Tam di vê nuqteyê de Rêbertiyê got: “Yan tu yê bi rastiyên rêxistinê di nav vê rêxistinê de bimînî, yan jî tu yê di nav vê rêxistinê de nemînî.” Dema ku Rêbertiyê ev got cîhana min xirab bû. Min got min çi kir ku Rêbertiyê vê ji min re dibêje. Ango ez ne karyarîst bûm, ez li pey erk-meqamê nedibeziyam. Ez ji bo xwe jî tiştekî naxwazim û ez nabêjim ez ê dest ji şoreşgeriyê jî berdim. Ez dibêjim, bila hinek vî karî bikin û ez ê jî di xizmeta wî de kar bikim, ma ji vê

baştir tiştek heye!? Ez bi vî awayî rêxistinê diparêzim. Ez Rêbertiyê nas dikim, heke Rêbertiyê gotinek wiha kiriye wê demê di vê nuqteyê de divê ez bifikirim. Eger Rêbertiyê weha gotibe wê wextê şaşiyeke min heye.

Li ser vê yekê ez gelekî fikirîm û min serê xwe gelekî êşand. Di dawiya dawî de ez gihiştim encamekê. Ew jî ev bû: Rewş, têgihiştin û nêzîkatiya ez ferz dikim a dijmin e. Ji ber vê jî Rêbertî ji min re wisa dibêje. Ji ber ku li gorî îdeolojî û felsefa Rêbertiyê durustî, dilsozî, parastina rêxistinê, parastina berjewendiyên rêxistinê, wisa bi paşvegavavêtinê nabe. Heke di bin berpirsiyariya te de rêxistinê derb xwaribe, tu çi dikî bike, divê ku tu vê rast bikî. Tu yê careke din tevgerê bi rêxistin bikî. Divê ew derb bibe sedem ku tu wê rake ser piyan û wê pêşde bixî. Rastiya Rêbertiyê ev e: Divê tu karibî derbên hatine xwarin ji bo rastkirina şaşiyan veguherîne hêz û taqetê. Ev jî duristî bi xwe ye. Dilsozî, berjewendiyên rêxistinê, parastina partiyê bi vî awayî dibe û ji mirov vê dixwaze.

Ya din çî ye, rev e, xeta dijmin qebûl kirine. Dijmin çi daye mirovê Kurd ew qebûl kiriye. Ji ber ku di bin berpirsiyariya min de rêxistinê derb xwariye, ez dibêjim: “Bila hinek bên û wê xerabiyê rakin.” Ev ne durustî û ne jî rêxistinîbûne. Ev rev e, bêberpirsiyarî ye.

Dijmin her roj ji mirovê Kurd re çi dibêje, “tu nikarî”. Min jî ew qebûl dikir, ez gihîştim encamê ku di bin berpirsiyariya min de rêxistinê derb xwariye û ez jî vê qebûl dikim. Ya ku dijmin layiqî mirovê Kurd didît û her roj li ser wî ferz dikir, min jî ew bi cih dianî. Ez nikarim bikim bila hinekî din bikin, min ew qebûl dikir. Ev çî ye? Li ser siyaseta dijmin meş e. Di nava rêxistinê de tu bi van têgihîştinan bimînî, tu yê ya dijmin pêk bînî. Bi van têgihiştinan min ê zirar û ziyan bidiya rêxistinê û lewma Rêbertiyê digot, “Yan tu yê bi rastiyên partiyê re bimînî, yan jî tu nikarî weke xwe bimînî. Dema tu weke xwe bimînî tu yê bi rastiyên dijmin re bimeşî.”

Nêzîkatiya min jî weke ya hevalan niyet bû, ez bi niyetên xwe radibûm. Lê rastî cuda bû. Ji ber ku ez bi niyeta xwe radibûm û nêzîk dibûm, min digot, ez erk- meqamê naxwazim, min di karê xwe de encam negirtiye, partiyê di bin berpirsiyariya min de derb xwariye û lewma helwesta durist û rast ew e ku kî bi vê erkê rabe, ez ê jî di bin berpirsiyariya wî de kar û xebatê bikim. Ev niyeta min bû û di vê nuqteyê de xeta Rêber APO tinebû. Li gorî xeta dijmin tevger û gavavêtin hebû. Ev li gorî xwe nêzîkbûneke ferdî bû. Jixwe

ev jî çanda dagirkeriyê bû. Zêhniyet û xeta dagirkeriyê bû. Dagirker her roj dibêje 'hûn nikarin', min jî digot, 'rast e ez nikarim', ez vê xeletiyê qebûl dikim. Ez dixwazim Rêbertî jî vê qebûl bike. Bi vî awayî min di nava rêxistinê de xeta dijmin ferz dikir. Jixwe Rêbertiyê ev qebûl nekir û lewma got "Yan tu yê bi rastiyên rêxistinê di nav rêxistinê de bimînî yan jî tu yê nemînî".

Min bêçaretî qebûl dikir. Têgihiştina min û xeta min çareserî nebû. Heke ew hebûna wexta ku partiyê di bin berpirsiyariya min de derb xwar min ê bigota, divê ez vê bikim, ji bo ku rêxistinê ji vir derxim û partiyê pêş bixim. Diviyabû min ew esas girtiba, ji ber ku rastiya Rêbertiyê û xeta rêxistinê ev ji min dixwest. Lê ya min rev bû, min ew weke durustiyê jî diyar dikir. Ez ji berpirsiyariyê direviyam. Min digot, xerabûye kî dikare çêke bila çêke, bila hinek çêkin û ez ê di nava rêxistinê de bimeşim. Ev reva ji berpirsiyariyê bû. Di vê de dilsozî û berpirsiyarî nîne. Lewra partîbûyîn bi niyetan nabe bi xetê dibe. Min ev mînak jî ji bo wê da.

Rêber APO di têgihiştin, xet û şêwazê xwe de, nabêje çênabe, nêzîkbûneke wî ya wiha nîne. Ger mirov nexwest çênabe, ger bixwaze ji sedî sed çêdibe. Ger di hedefên te de çêkirin û çareserî hebe, tu yê tevgera xwe hemûyî li ser wî esasî bike. Tu kêmasî û şaştiyan bike jî ji ber ku di hedefa te de çareserî heye ew kêmasî û şaştî jî wê rastiyan bi te bidin fêmkirin, tu yê çareseriyê esas bigirî û pêk bînî. Heke di hedefa te de çêkirin û çareserî tinebe tu yê di nava şaşiyan de bimînî. Şaşîtî jî wê bi xwe re şaşiyên nû bîne. Lewma jî ti carî pêşketin û serketin pêk nayên. Ji ber vê, wê her milîtanekî PKK'ê xwe bike mehkûmê çareseriyê û wê tevahiya rêyên din di kesayeta xwe de bikuje. Hingê dikare milîtaniyê bike û dikare hevaltiya Rêbertiyê bike. Heke wiha neke, wê di kesayeta xwe de pêşî li rêyên din hemûyan veke û bi vî awayî ji rê derkeve. Bi vî awayî jî wê zirar û ziyanê bide rêxisitinê. Çawa ku di kesayeta hinek hevalan de ya pêk tê ev e.

## Di Têkoşîna Rêbertiyê De Nemirbûn Û Jiyana Azad Bingehîn e

Di bingehê têkoşîna Rêbertiyê de têkoşînek heye; mirinê çawa veguherîne bêmiriniyê. Di felsefe û îdolojiya Rêbertiyê de, di şêwazê Rêbertiyê de, mirin nîne, redkirina wê heye. Bêmirinî û jiyaneke azad esas e. Hebûn her tim li ser vî bingehî ye. Têkoşîna Rê-

bertiyê hemû li ser hîmê bêmiriniyê ye. Lê em çawa ne? Felsefeya me, felsefeya mirinê ye. Kengî em hinekî zor û zehmetiyê dibînin, em berê xwe didin mirinê, da ku em xwe xelas bikin. Em xelasiyê di mirinê de dibînin. Em hewl nadin serî bi zor û zehmetiyan re derxin. Em ji vê dûr disekinin û xelasbûnê di mirinê de dibînin.

Felsefeya mirinê felsefeya dagirkeriyê ye. Ev felsefe bi salan dan mirovên Kurd. Ji ber vê mirovên Kurd ev cîhan ji dest dabûn û xwe ji cîhana din re amade dikirin. Êdî wê cîhana din çawa bi dest bixe, ev li ser mirovên Kurd dihate meşandin. Ji ber ku îradeya wî şikestibû û her tiştê xwe ji dest dabû. Li vê cîhanê tiştekî xwe û cihekî xwe nemabû. Ji bo cîhana din jî ji dest nede xwe ji bo wê amad dikirin. Bi temamî li ser rêya felsefa mirinê dimeşiyan. Ji ber vê, xwedî li xwe derneketin û ji bo xwe tênedikoşiyan. Sedema bê têkoşîniyê jî ev bû.

Rêber APO şerê herî mezin di vê nuqteyê de da ango li dijî felsefeya mirinê. Felsefeya mirinê red kir. Felsefeya jiyanê, jiyana azad da pêşiya mirovê Kurd. Ne ku tê çawa bimirî, lê tu yê çawa bijî, tu yê ji bo çi bijî, ev felsefe pêşde bir. Ev şerekî pir mezin e. Heke ev şera pêşnexistiba û felsefeya dijmin nedabûya fêmkirin û felsefeya jiyana azad pêşnexistiba, ti carî ev pêşketin li Kurdistanê çênedibûn.

Di têgihiştina Rêbertiyê de ti carî felsefeya mirinê nîne. Her tim ji bo jiyana azad karkirin heye. Jiyana azad mezinkirin heye. Ya ku mirov bide jiyîn jî ev e. Rêbertiyê timî mirovan dan jiyînê. Heke te ji bo mirovahiyê nirx û jiyaneke mezin avakir, tu yê her tim di dilê mirovahiyê de cih bigirî. Wê mirovahiyê her tim te bibîr bîne. Heke na te ji bo mirovahiyê, gelê xwe, hevalên xwe nirx û jiyaneke mezin ava nekir, hingê tu dimirî.

Mirineke fîzîkî heye ew jî xwezayî û qanûnî ye. Mirinek din jî heye, ew jî ya ku dûrî mirov û rastiya wan e. Divê ku mirov wê mirinê nêzî xwe neke. Yanî divê ku mirov bi felsefeya mirinê ranebe. Rêbertî timî têdikoşe wê çawa jiyanê pêş bixe, bi hêz bike û wê bi nirx bike. Bi vî rengî li dijî mirinê şer dike û wê têk dibe. Jiyanê û jiyankirinê wiha ava dike. Lewra yên ku ji felsefeya mirinê xwe xelas nekirîn û ji nav felsefeya dijmin derneketî, di felsefa Rêber APO de xwe xurt nekirî, hema kêmasiyeke biçûk bike, yan jî zor û zehmetiyan bibîne, li astengiyekê rast bê hema çareseriyê di mirinê de dibîne.

Jixwe têgihîştineke pir erzan pêşketiye, ew jî ya fedaîtiyê ye, biçe çalakiyekê bike û şehîd bikeve. Bi vî rengî wê namûsa xwe xelas bike! Têgihîştineke bi vî rengî ya vê rêxistinê nîne. Fedaîtî ne ji bo mirov çalakiyekê bike û bimire, tê kirin.

Fedaîtî di nav vê tevgerê de weke derwêşan kar kirine. Ango tu bi vî awayî ji xwe dibihurî û xwe bi temamî dixî bin xizmeta gelê xwe, hevaltiyê, mirovahiyê û dayîkê. Ji bo vê jî divê mirov têkoşîneke dijwar bide, ji bo xwe ti tiştî nexwazî, ji bo xwe nejî. Ji vê re em dibêjin bi temamî xwe feda kirine. Derwêş jî wiha ne. Felsefeya wan ebayek û loqmeyek e. Ji bo xwe tiştekî nakin û timî di xizmeta mirovahiyê de kar dikin. Fedaîtî ji bo gel, mirovahiyê û azadiyê kar û xizmet kirine. Ji bo wê jiyan kirine û jiyana xwe li ser wî esasî rêxistin kirine. Têgihîştinek wisa erzan di nav fedaîtiya vê tevgerê de nîne. Em ji bo pêkanîna çalakiyekê najîn, serîbinî çalakiyek e. Em vê bi tenê weke 'pifekê' bi nav dikin. Şoreşgerî û milîtaniya vê tevgerê ne wiha ye. Serokatiya vê tevgerê ne serokatiyek wiha ye. Serokatiya vê tevgerê ji bo rojekê û demekê najî, ti carî têgihîştineke Rêbertiyê ya wiha nîne. Serokatiya vê tevgerê ne ji bo demekê, dixwaze ji bo mirovahiyê bijî. Milîtanê ku vê Rêbertiyê ji xwe re esas digire wê vê ji xwe re esas bigire.

Wê çawa bike ku mezin bijî û mezin bide jiyîn? Eger te ji bo gelê xwe, mirovahiyê û hevaltiyê jiyaneke azad pêk anî, tu mezin jiyaye û mezin daye jiyîn. Lewma jî tu her heyî û zindî yî.

Dibe ku Zîlan, Mezlûm, Egîd û Nûda fîzîkî miribin, lê kî dikare bêje ew mirine? Niha her kes wan ji bo xwe esas digire. Nav, taybetmendî, kesayet û têkoşîna wan ji bo xwe esas digirin, ew wiha dijîn. Yê ku mirov zindî dihêle, ev e. Ma we qet dîtiye ku kesî xwestiye navê yekî xayîn li xwe bike, wî ji xwe re esas bigire? Yan jî yekî ji bo vî gelî û mirovahiyê nirxek çênekiribe kes ji xwe re esas digire? Kes ji xwe re esas nagire, hebûn û tinebûna wan kesayetên wiha diyar nîne. Gelek kes fîzîkî dimirin, em bêjin hevalên me jî dimirin, kesên din jî dimirin, lê ya wan kesên din kes nabihîze, lê belê hevalê me bi hezaran însan ji bo wan dimeşin û li ser wan civînan çêdikin, li ser wan diaxivin û li ser rêka têkoşîna wan şer dikin. Lewma mirov bi hêsanî dikare tê derxe ku ya li vir insên dide jiyîn çî ye.

Di vê çarçoveyê de wê her milîtanek felsefeya Rêber APO ji bo xwe esas bigire. Ango wê bêje, ez li dijî mirinê disekinim û jiyaneke mezin ji bo xwe esas bigire. Ji ber vê jî wê nirxê mezin çêke û ji bo

wan têbikoşe. Jiyan bi xwe jî ev e. Binêrin di dîrokê de kê ji bo mirovahiyê nirxên mezin ava kirine û derfetên jiyanê pêkanîne, navê wan hertim têne hildan, kes wan ji bîr nake. Dibe ku sed sal jî di ser re bihurîbe jî lê hîna jî navê wan li ser ziman e. Di paşerojê de jî her hebin. Ya ku bi rastî mirov dide jiyîn ev e.

Di şêwazê Rêber APO yê rêveberiyê de, bi gelemperî ji mirovan re bûna rêveber esas e. Ti car xwe nake rêveberiya hinekan, hinekan wiha nêzîkî xwe û hinekan dûrî xwe nake. Hinekan baş û hinekan nebaş nabîne. Rewşa her însanekî, kadroyekî dibîne û pê re kar dike. Dibe ku li cem Rêber APO yek ji yekî zanetir û zîrektir be, lê ev nayê wê maneyê ku yekî ji yê din çêtir dibîne. Rêbertiyê ev qet nekiriye. Ji roja ku Rêbertiyê dest bi xebatê kiriye û heta roja me ya îro ez pê re me, min nedîtiye Rêber APO gotiye filan heval ji bo min baş e, fîlan heval ji bo min ne baş e. Heke hinekan bide pêş, yan jî hinekan bide paş, derfetên tevgerê bide hinekan û nede hinekan, hinekan mehrum bihêle; min ev nedîtiye û nebihîstiye. Heke wiha kiriba nedibû serok. Yekitiya tevger, kadro û gel nikarîbû çêke û temsîl bike. Weke hevalan kiriba wê parçe-parçe bibûya.

Ji aliyekî ve dijmin parçe dike û ji aliyekî din ve jî wê bi xwe parçe kiriba. Wiha pêşketin çênedibûn. Li vir ruhê netewe ya Kurd, hestê Kurd, fikra Kurd, rêxistin û çalakiya Kurd ti carî pêşnediket. Rêbertî ji mirovan çi dixwaze; bi her kesî re karkirinê û têkiliyê dixwaze. Her kesî dixe xizmeta azadiyê. Ango tê xwe bike serokê her kesî, ne yê hinekan. Ger te kir yê hinekan wê demê tu bi destê xwe parçebûnê çêdikî. Tu hinekan nêzî xwe bikî û wê yên dûrî te dest bi nerazîbûnê bikin. Wê demê tu bi xwe, xwe pûç dikî û xeta dijmin di nav xwe de dimeşînî. Di vir de ti carî encam nayê girtin.

Niha serokatiya em qebûl dikin serokatiyek wiha ye, lê em çi dikin, em dinêrin kî nêzîkî me ye û li xweşiya me diçe em wî nêzî xwe dikin û hemû têkiliya xwe bi wî re datînin, derfetan didin wî û em bi yê din re jî qet têkeliyê danaynin. Bi giranî di şêwazê rêveberiya me de ev heye. Li gelek qadan rêveberî vê dike. Ev têgihîştina desthilatane, ne ya Rêber APO ye. Desthilat ti demê bi her kesî re têkiliya xwe nameşîne. Bi her kesî re bi tewazin nakeve nav têkiliyan. Desthilat bi desthilatan re têkiliya esas digirin, wan nêzîkî xwe dibînin û bi wan re rûdinên û radibin. Bi wan re her tiştê xwe parve dikin. Bi gel re ti wextî par ve nakin û nêzîkî gel nabin. Gel jî besît dibînin û dûrî xwe dibînin. Ji ber ku sîstem wer hatiye avaki-

rin, ev pênc hezar sal in, çand, zêhniyet û pîvanê wê serwer in. Ev zêhniyet û çand di nav rêveberiya me de xwe dide diyarkirin. Rêveberiya vê tevgerê ye, lê belê di pratîkê de tiştê pêk tîne yê desthilatane. Yan xwe dike weke axayekî, yan jî weke burjuwaziyekî. Ma we dîtiye axa bi gundiyan re rûdine û bi wan re dimîne? Ne gengaz e. Axa bi axa re rûdine, têkiliya xwe hemû bi axan re ye, bi axa re parve dike, ti karê xwe bi gundiyan re nîne. Ma karê wî bi gundiyan re çi ye, we dîtiye ku axayekî derfetek daye gundiyekî? Tenê zikê gundî têr dike, da ku ji wî re kar û xulamtiyê bike. Gundiyan ji her tiştekî mehrûm dike.

Heke heman têgihiştin li cem rêveberiya me re peyda bibe, divê mirov zanibe ku ew têgihiştina desthilatiyê ye ku di nav tevgera me de tê meşandin. Rêveberiyeke bi vî rengî nabe rêveberiya vê tevgerê. Ev rêveberiya desthilatane, ev rêveberî rê li parçebûnê vedike, zirar û ziyanê dide. Ev rê li ber desthilatî û koletiyê vedike. Şêwazê rêveberiyê yê Rêbertiyê ti carî rê li ber desthilatî, parçebûn û koletiyê venake. Yektiyeke berfireh esas digire. Her dem demokrasiyê, wekheviyê û edaletê esas digire. Cudahiyê naxe navbera hevalan, parçebûnê newekheviyê pêşnaxe. Yê ku rastiya Rêbertiyê ji bo xwe esas negirtibe, tu dinêrî di rêveberiyê de ji sîstemê çi girtiye wî pêk tîne. Dibêje “Ez rêveberiya PKK’ê me, girêdayî Rêbertiyê me, ez xwestekê Rêbertiyê pêk tînim”. Dibêje ez temsîla Rêbertiyê dikim, lê ya rastî bi vî awayê xwe Rêbertiyê pûç dike û dikuje. Dibe ku di fermiyetê de rêveber be, lê ya ya girîng ne tenê di fermiyetê de ye.

Ya girîng divê ku di jiyan û pratîka xwe de jî bibe rêveberê xetê. Ew rêveberê xetê ye, yan jî ne yê xetê ye, wê çawa diyar bibe, mirov vê yekê di xetê de fêm bike û bibîne. Mirov ê vê rêveberiyê li ku qebûl bike û li ku qebûl neke, wiha derdikeve holê. Mirovê zanibe ka rêveberiya vê xetê ye, yan jî ya desthilatane. Niha gelek heval ne li gorî xetê nêzîk dibin, li gorî xwe û berjewendiyên xwe yên şexsî nêzîk dibin. Heke rêveberiyek daxwazên wan yên ferdî pêkanîbe, dibêje “ev rêveberek baş e”. Heke daxwazên wan pêk ne anîbe, dibêje “ev rêveber pir xerabe”. Dest pê dike û der heqê wê rêveberiyê de her tiştî dibêje. Rast nerast zêde her tiştî dibêje. Ji ber ku daxwaziyên wî-wê bi cih nehatine anîn.

Rêveberî, rêveberiya xetê ye ku daxwazî û pêdiviyên xetê pêk tîne. Ne ku daxwazî û pêdiviyên kesan pêk tîne. Rêveber ji ber ku yê

xetê ye û tu jî milîtanê xetê yî, di vî alî de ji bo te çi hewce dike wê pêkbîne. Li dervayî vê ji bo te, keyfiyeta te û daxwazên te yên şaş ne mecbûre tevbigere. Erkek wan ya wiha nîne, erka rêveberiyê çi ye, te bikişîne xetê û tu di xetê de te bihêle. Divê rêveberiyek bibîne ka şervanên wî di çi rewş û hewayê de ne. Heke xerabî, bêpîvanî, bêçarebûn û krêtî heye wê rake. Lewra rêveber, erka rêveberiyê xet danîn û meşandine. Kesên ji xetê dûr bikevin, wê wan bikişîne xeta rêxistinê. Şerê îdeolojî û têkoşînê wê pêş bixe û endamên xwe bikişîne wê. Dema kes nehate pîvanan jixwe xetê diterikîne û diçe.

Rêveberî wê tiştên ne di xeta rêxistinê de, bi mirovan nede meşandin. Wê bi xeta rêxistinê wan bimeşîne. Wê devê ti kesî şîrîn neke û nede meşandin. Divê rêveberek, ne şerbetgeriyê, lîberaltî, axatî, begtî, bûrjûwatî û desthilatiyê jî neke, yek ji van teybetmendiyan jî ne yê rêveberiya vê tevgerê ne. Erka rêveberiyê ew e ku her kesî li ser xetê bide meşandin, lewma erka şervanan jî ew e ku rêveberiyê bikişîne xetê. Wê binêre ka rêveberî di xetê de ye yan na, li gorî xeta rêxistinê kar dike. Derfetên rêxistinê danê dike xizmeta rêxistinê yan jî wan şexsî bi kar tîne, li gorî rêxistinê dimeşe yan na. Divê ev hemû bên dîtin. Ji ber ku rêxistinê ev derfet û erka ku dayî, ne ji bo rêveberiyê li gorî xwe bi kar bîne û bike bahaneya gefan, şantaj, sistî, sivikî û xulamtiyê.

Erka rêvberiyê ew e ku ji bo pêşdebirinê dil, mejî, guh, çav, fikir û devê mirovên derdora xwe veke. Dijmin her dem dev, çav, guh, mejî û dilê însanên me digir da ku kole bimîne. Da ku bikaribe desthilatiya xwe li ser bide meşandin. Rêveberî wê dev, çav, guh, mejî û dilê wan veke. Lê wê nehêle ew vekirin şaş bê bikaranîn. Di vê çarçoveyê de wê veke da ku ew kadro pêş bikeve. Kadro bibe kadroyê xetê, karê ku dike bi awayekî serketî bibe yê rêxistinê.

Rêveberî wê ti car kêmasiyên xwe bi civata xwe rave neke. Niha çandek wiha jî pêşketiye, civat devê xwe vedike li dijî rêveberiyê diaxive, rêveberî jî diaxive hemû kêmasî û şaştiyên xwe bi civatê rave dike. Yanî li vir herdu alî jî xwe bi hev rave dikin. Ya rastî divê ku rêveber û civat jî hevdu li gorî xeta rêxistinê rave bikin. Ger xwe û yê din li gorî xetê rave kirin, wê demê rast rave dikin. Axaftinên din hemû fîtne û fesadî ne, ti qîmetek wan jî nîne. Gengaz e ku rêveberek xetê esas negire, tu nikarî bêje, rêveberiyê xeta rêxistinê esas negirt sûcê wî/ê ye. Rêveberî xetê esas negire jî tu yê bikişînî xeta rêxistinê, tu berpirsiyar û milîtanê vê tevgerê yî, divê ku ew

rêveberî nikaribe li wir ji xeta rêxistinê derkeve. Tu yê li wir xeta rêxistinê esas bigirî. Tu nabêjî yê ku bûye rêveber endamê partiyê ye, yê nebûyî rêveber ne endamê partiyê ye. Rêveber berpirsiyarê xeta rêxistinê ye, yên ne rêveber ne berpirsiyar in, endamê rêxistinê wisa nabêje. We hemûyan nîzamnameya rêxistinê xwendiye, tê de dinivîse, yê pêdiviya xeta rêxistinê esas digire, bernameta wê pêktîne, pîvan, kesayet, tektîk stratejî, çand, exlaq û zêhniyeta wê pêk tîne, ew kes endamê partiyê ye. Di bernameyê de nayê gotin, rêveber xwediyê rêxistinê ye, li ber xeta rêxistinê tenê rêveber berpirsiyar e. Her mirovekî rêxistinê li beramberî xeta rêxistinê berpirsiyar e. Wê xwedî li xetê derkeve û pêk bîne. Divê her milîtan bi berpirsiyariya xwe rabe.

Çawa ku erka rêveberiyê ye, civata xwe li ser xeta rêxistinê bide meşandin, erka civatê jî ew e ku rêveberiya xwe li ser xetê bide meşandin. Têkoşîn wê li ser vî esasî bi pêşkeve. Lê têkoşîna ku dibe ne li ser vî esasî ye. Dibêje “Ew bûye axa û li ber axatiya wî radibe û dibêje ez dikarim bibim axa. Ez ji wî baştir dikarim axatiyê bikim”. Mesela wan hemû ev e, heke zêde rêveberiyê rexne dike, ji ber vê zêdetir rexne dike. Çima ew bûye axa û ez nebûme axa, pêwîst e ku ez bibûma axa, heqê min e. Yan jî rêveberek wexta bi ser civatê de diçe, civat jî li ber axatiya wî radibe û dibêje çima li ber axatiya min radibin, divê min weha qebûl bikin. Ne ku bi rastî cıvata xwe dikişîne xeta rêxistinê. Heke civat axatiya wan qebûl bike û rexne neke, qet dengê xwe jî nake. Di pratîkê de ya ku diqewime ev e.

Têkiliya yekî ji van jî bi rastiya Rêbertiyê re nîne. Rastiya Rêbertiyê her roj kadro û hevalên xwe di xeta rêxistinê de digire, mezin dike û kûr dike. Li ser vî esasî her kesî dikişîne xetê û hevaltiyê. Li gorî xwe nêzîk nabe, li gorî berjewendî, pêdiviyê rêxistinê nêzîk dibe. Mirov nêzîkbûnên ferdî di kesayeta Rêbertiyê de nabîne.

Wexta ferdî nêzîk dibe, tu dibînî, li gorî xwe derfet û erkan dide hinekan, her kesî nabîne, her kesî naşopîne, bê eleqe nêzîk dibe. Tu yê wiha çawa yekîtiya rêxistin û kadro çêkî! Ger te yekîtiya kadro û rêxistinê çênekir tu yê çawa li dijî dijmin şer bikî?

Heke gelek însan dikevin û dibin bela û yan jî direvin, sedemek jê jî uslûb û nêzîkatiya rêveberiyane. Baweriyê, moralê, zanebûnê, kesayetê û îradeyê nadin mirovên derdora xwe. Yan jî mîna axayekî nêzîk dibin, mirovan di nav şaşîtî, kêmasî, bêçaretî, bê eleqebûnê de dihêlin. Kesê di rewşeke welê de were hiştin herî dawî bi tevahî ji

taqetê dikevin û diçin. Şêwazê rêveberiyê di revan de sedemek e. Bêguman dijmin jî kar dike, hemû derfetên xwe bi kar tîne da ku revan çêke; rêveberiya me vê dizane, li şûna ku nêzîkî civatê bibe, eleqeyê nîşan bidiyê, bê eleqe, di nav xerabiyê de û li naverastê dihêle. Bêbergirî li naverastê dihele û bi vî awayî jî dijmin dikare bi propagandaya xwe bandorê li ser bike. Dijmin bi hêsanî dikare vê bike û bi hêsanî bide revandin.

Ji aliyekî ve dijmin dike da birevîne, ji aliyê din ve şêwazê rêveberiyê xizmeta vê nêzîkbûnê dike. Ya rastî jî divê ku rêveberiya vê tevgerê dema ku dît dijmin vî karî dike, divê her tiştî bike da ku karê dijmin pûç bike. Wê eleqeyeke tam rast bi însanê xwe re çêke, wê sekter û lîberal nêzîk nebe. Bi lîberalîzmê tu nikarî mirovan bigirî, bi sekterîzmê jî tu nikarî mirovan bigirî. Bi erk-meqamê û belavkirina derfetên maddî jî tu nikarî mirovan bigirî. Ger te mirov bi îdeolojî, felsefeyê, siyasetê û rêxistinê têrkirin tu nekarî mirovan bigirî. Tu dikarî hemû xebatên dijmin pûç bikî.

Em niha dikarin derfetên maddî û erkê bidin da ku mirovan bigirin. Derfetên dewletan ji yên me zêdetirin yê YNK-PDK'ê ji yên me zêdetirin; heke mesele maddiyat be em nikarin ji wan zêdetir bidin. Dewlet dikare her erk-meqamê, derfetan bidiyê. Mînak binêrin hinek rêveberên me vê dikin. Ji bo xwe neêşînin, rêveberiyê bi erk û derfet dike. Bila derfet, erkê belav bike û şerbetgeriyê bike, da ku mirovan bigire. Yên wiha kirine mirovek jî negirtine. Mirovên bi derfetan hatine girtin hemû jî reviyane û çûne. Bi xwe jî reviyane û yên dayî wan jî reviyane. Li ku te xeta rêxistinê serdest kiribe, li wir rev nîne. Yan jî bi îstisna direve û dibe sîxûrek. Yan jî qet bi kêr nayê lewra direve. Li ku rev çêbe, li wir rêxistin nîne. Cihê ku şerbetgerî, sekterîzm, erk-meqam, bê eleqebûn hebe, rev jî li wir heye.

Ev tevger rûmet, anor, nasname, kesayet, zanebûn û îradeyê dide mirovan. Wekî din tiştekî rêxistinê nîne ku tevger bide mirovan. Pêwîst e ku milîtanê vê tevgerê vê baş fêm bikin. Divê ti carî erk-meqam belav nekin, wiha şerbetgeriyê û axatiyê jî nekin. Di nav PKK'ê de rêveberî cihê kar û xizmetê ye. Ji her kesî zêdetir karkirin û xizmetkirin e. Heke xeteriyek hebe beriya her kesî xwe dide ber, bi berpirsiyarî radibe û bar dide ser milê xwe.

Di nav PKK'ê de rêveberî ev e. Di nav PKK'ê de rêveberî tiştekî welê ye; tu kirasekî dixe nav benzînê li xwe dikî û agir pêdixî, heke kiras şewitî tu yê şiyar bibe da ku tu neşewite. Di nav PKK'ê de

rêveberî tiştekî welê ye; te agirek di bin sêlê de dadaye û tu li ser sêlê yî, tu yê şiyar bî da lingê te neşewitin, tu neşewitî. Di nav PKK'ê de rêveberî cihê keyfiyet, axatî û şerbetbelavkirinê nîne. Bi temamî cihê kedê û xizmetê ye. Bi temamî pêdiviya xetê bi cihanîn e, û xeta rêxistinê bi ser xistin e. Tu bi tevahî derfet, hêz û taqetê dixe bin xizmeta tevgerê. Ne cihê têrkirina xwe û ajoyên xwe ye. Nabe ku tiştên di nav dewlet, malbat û civakê de bi dest me neketine em bi derfetên PKK'ê bijîn û pêkbînin. Gelek wiha fêm dikin, heta ku ne rêveber e, tu temaşe dikî mirovekî xwezayî ye, lê dema dibe rêveber xwe şaş dike û xwe belav dike. Ev nayê vê maneyê ku mirovên xirabin, sedem û bingehekî vê jî heye.

Heke milletek ji her tiştî mehrûm be, dema derfet dikevin destê mirovên wê, şaşmaşo dibin. Ev rastiyek e. Hevalê me jî dema dikevin rêveberiyan û ev pirsgirêk çêdibin, sedem ev e. Lewma dema dibe rêveber û dibe xwedî hinek derfet û îmkanan, wê demê xwe şaş û belav dike. Gotinek heye dibêjin "Qereçî dema dibe axa, di serî de bavê xwe bi darve dike". Ma mirov bavê xwe bi darve dike?! Wê demê ev mirovan dide darve kirin. Qereçî çî ye? Yê birçî ye, yê ku zêde derfetên wan nînin, ji vir û wir ji xwe re digirin û wiha dibara xwe dikin. Dema te ew kir paşa û gelek derfet danê, wê demê xwe şaş dike û serxwe diçe. Ji ber ku di emrê xwe de ew derfet ti carî nedîtine.

Mirovên me jî di nava civakê, dewletê û malbatê de zêde tiştek nedîtine, bi rêka PKK'ê digihêje gelek derfetan. Şeref, keramet heye, derfetên madî û menewî hene, jixwe heke bû fermandarek her kes hesabê wî-wê dike, fermî nêzîk dibinê û qîmetê didinê, wê wextê ji wer tê ew bûye tiştek û xwe wisa dihesibîne. Xwe wiha dibîne û aşiqî xwe dibe û di vê rewşê de xwe belav dike, dibe axayek û çeteyek. Sedem ew e, ji ber ku heman mirov e, xwezayî ye, dema dibe rêveber tavilê tê guhertin û tu dibêjî ev ne ew mirovê min berê nas kiriye. Ew hest û ajoyên ku dijmin berovajîkirî, dema ku dixwaze bijî nikare pêkbîne, dema van derfetan bi dest dixe, dixwaze bi wan bijî. Lewra tu nikarî zûka wî/ê nasbikî.

Ji kesayetekî wiha de kirêtî û qirêjî peyda dibe. Divê ku mirov ti carî ji bîr neke rastiya civaka me zemînê vê ye. Di saziyan de jî pêwîst e ku mirov şiyar be. Mirov kesayetên ku xeta rêxistinê fêm nekiribin divê neke rêveberiyê û rêveberiyê neke cihê desthilatiyê. Divê mirov di vê mijarê de hişyar be. Lewra her dem pêwîst e ku

mirov xetê bide pêşiya rêveberiyê da ku desthilatî û têgihîştina desthilatiyê pêşnekeve. Heke ku çavdêriya xeta rêxistinê, şerê wê nebûya, di gelek rêveberiyan de çetekarî û têgihîştina desthilatiyê wê derketa û serwer bibûya. Di pratîkê de axatî, çetekarî pêşdikeve. Lewra yê ferdî, li gorî xwe, ezez, xeta navîn be, dema dikeve rêveberiyê wê bi van xisletan rabe. Yan wê pir bê însiyatîf be, di rêveberiyan de hebûn û tinebûna wî/ê nediyar be, weke koleyan be, yan jî wê hinekî weke axa be, ev girêdayî civaka me ye.

Ger em naxwazin ev bibin divê em xwe ji ferdiyetê xelas bikin, di xwe de bikujin, xwe bikin civakî da ku em ji bo civakê kar bikin. Ne ku em ji bo xwe û ehbabçawîşê bikin.

Dîsa di şêwazê Rêber APO yê têkoşîn, berxwedan û şer de, şêwazekî çawa heye? Pir dijwar û bi bandor e. Bi temamî ji bo encamgirtinê bi ser kar de diçe. Di têkoşînê û şer de bi temamî vî şêwazî dimeşîne. Rêbertiyê di gelek analîzên xwe de ev şêwaz îzah kiriye. Rêbertî behsa “Awirên bazwarî” dike, çawa şahînek bi ser nêçîra xwe de diçe, wer bi ser de çûye. Bi hemû bal û taqeta xwe bi ser de diçe, pir bi rêzik û pîvan bi ser de diçe. Dema diçe ser nêçîra xwe lê dixe û wiha digire. Ji vê re dibêjin, şêwaz û lêdana şahîn. Şêwazê ku Rêber APO di têkoşînê de esas girtî ev e. Her dem dijwar bi ser de çûye, radîkal û bi biryar bi ser de çûye. Ti carî dudilî nebû ye û şik neketiye dilê wî. Beriya ku biryaryarekê bide pir nîqaş dike, dema digihêje biryarê wê bêyî dudil bibe bi cih tîne.

Mirov li pratîka Rêber APO binêre dest avêtiye çi, ji xwe re çi kiriye hedef, ji sedî sed pêkaniye. Ji ber ku bi vî şêwazî rabûye. Ev şêwaz encamgir e. Tu yê jî wiha şer bikî û têbikoşî. Bi zimanê ezob nabe. Tu dinêrî di axaftinê de ne zelal e, di biryarê de ne zelal e, wê çawa di pratîkê de encamê bigire? Ji bo tu encamê bigirî divê ku tu di fikir û mejiyê xwe de zelal bî. Ger te xwe di warê fikrî de zelal kir tu yê wê bikî biryar. Tu yê di biryarê de zelal bî, ger tu di biryarê de ne zelal bî di warê fikirî de tu çiqasî zelal be jî tu nikarî encamê bigirî. Ger tu di biryarê de zelal bûyî tu yê biryarê bixî pratîkê. Ji bo encamgirtinê tu yê her tiştê xwe deynî holê, wê demê tu yê encamê bigirî. Lewma em bi hêsanî dikarin bibêjin ku ji bo encamgirtinê zelalbûna di warê fikrî de girîng e. Lê ji bo encamgirtinê zelalbûna di warê bicihanîna biryarê de şert e. Naxwe wekî din tu nikarî encam bigirî. Rêbertî ya pêk tîne ev e, şêwaz ev e. Bi vê encamê digire. Em li xwe binêrin, em li fikrên xwe binêrin, zelalî tê de nîne.

Yan jî em piçekî xwe di fikrê xwe de zelal dikin, lê em biryarê nadin. Ji vê jî wêdetir gelek biryarên me girtî jî em pêk nayînin. Yan jî dema em dikin pratîkê em bi şêwazê xwe pêk tînin. Ji ber vê biryarên me di pratîkê de kêm pêk tên, yan jî qet pêk nayên, carinan jî xweber pêk tên. Ev jî rastiya me ye.

Gelek saziyên me di kongre, konferans û civînan de gelek biryaran didin, gelo çiqasî biryarên didin di pratîkê de dişopînin û pêk tînin? Ji sedî yan yek e, yan jî didu ne. Ji bo ku biryaran bidin, digirin. Ne ku ji bo pêk bînin biryaran didin. Ev jî bêbaweriyê çêdike. Biryarên ku saziyên me digirin çiqasî di pratîkê de ji bo pêkhatinê bi kêr tên? Di vê nuqteyê de jî pirsgirêk hene.

Mînak çalakiya Bêzelê, ya Amedê, Dêrsimê. Plansazî çêkirine û biryar dane, lê di pratîkê de çiqasî pêk hatine, ji sisiyan yek ancax pêk hatiye. Heke tam pêk bê, wê encamê hîna xurtir be. Gelo ew tam pêk nayê, yan jî çima pêk nayê? Ji ber ku bi biryar naxe pratîkê, keyfiye û keyfî nêzîkî biryarê û plansaziyê dibe, lewra pêk nayê, lê belê dikare pêk were. Hinek civîn çêdibin ji van civînan biryar dernakevin, ger ji civînekê biryar derneket ew civîn vala ye. Ji bo ku civîn çêbibe çêbûye. Nirxekî wê nîne, ha çêbûye, çênebûye, çênebe ji çêbûna wê baştire. Biryaran digirin û piştî civînê wan biryaran didin aliyekî. Tu dibêjî qey ew biryar negirtine, keyfî nêzîk dibin, kîjanê dilê wî bixwaze pêk tîne, dilê wî nexwaze pêk nayîne.

Gelek ji wan biryaran pêk nayên. Ji bo ku pêk werin tu zelalî û biryardariyê nabînî. Herweha tu ji bo zelalî û biryardariyê hewldan û israrê nabînî. Lewra şêwazê lêdanê lewaz e, çûna bi ser hedefê û hedef girtin, bi dest xwe xistin lewaz e. Di karê rêxistinî de jî ev wisa ye, di yê siyasî û diplomatîk de jî wisa ye, dîsa di nav civakê û hemû waran de jî mirov vê dibîne. Ev ne şêwaz, bê şêwaziyê îfade dike.

Şêwazê Rêbertiyê li kîjan qad dibe bila bibe; çi qada siyasî, çi jî ya rêxstinî û leşkerî be, xebatê dimeşîne. Çawa ku şahîn bi ser nêçîra xwe de diçe, wisa bi ser karê xwe de diçe. Ji sedî sed encamê digire. Lewra dema ku bêşêwazî hebe, mirov encamê nagire. Ji ber ku mirov bi şêwazê encamê digire. Ya ku serketinê tîne şêwaz e, bêşêwazî ti carî encamê nayne. Ger li cihekî bêbiryarî hebe, zelalî tinebe, pratîk nabe, encam nayê girtin. Ji ber ku li wir şêwaz nîne ango rêxistin nehatiye kirin, belavbûn û keyfiyet heye. Lewma divê tu tavilê fêhm bikî ku li wir bêberpirsiyartî heye.

Rêbertî li Suriyê bû, lê weke li welat be li ser kar hakim bû. Te digot qey di nav rêxistinê de li wê qadê ye. Hakim bû, ji ber ku xwedî şêwaz û xet bû. Ne şert e ku li Dêrsim yan jî li Botanê be. Li Surî bû, lê tiştê li Dêrsim û Botanê diqewîmîn fêm dikir. Li rêxistin, pratîk, çalakî, encam û zirarên wê dinêrî û rewş fêm dikir. Li wir çi heye, çiqasî tesfiye, xeta rêxistinê heye, çiqasî li ser hedefê xwe ye, yan jî dûrî hedefe, fêm dikir. Li gorî wê jî tavilê tevdîrên xwe digirtin. Lê em divê her tiştî li ber çavên xwe bibînin da ku fêhm bikin. Ev jî rastiya me ye, rastiya Kurdekî ku dagirkeriyê ava kiriye.

Lê Kurdê Rêber APO avakirî ne wiha ye. Kurdê ku dagirekran avakirî ancax her tiştî li ber çavên bibîne da ku fêm bike. Gelek tişt li ber çavên wan diqewimin jî dîsa nabînin, fêm nakin. Dijmin ew kor kiriye, mejiyê wî reş kiriye, dilê wî reş kiriye, guhê wî kerr kiriye, nikare bibihîse. Ji bo mirov bibîne hewce nake ku li ber çavên mirov biqewime, tiştê ku ne li ber çavên mirov jî divê ku mirov bibîne. Rastiya Rêbertiyê û milîtaniya wî ev e. Ji mirovan vê dixwaze. Tu her tiştî bidî ber çavên kê wê bibîne, xêreke vê nîne. Wiha milîtanî nabe. Milîtan her tiştî dibîne û dibihîze, analîz dike, fêm dike li gorî wê şaştiyan îzah dike. Rastiyê îzah dike û li gorî wê dibe xwedî helwest û di pratîkê de vê pêşde dibe. Milîtanî jî bi vî awayî dibe.

Li cem a herî zêde pêk tê û tê dîtin bêşêwaziye. Ango bê rêxistinîbûn, bê pratîkbûn û keyfiyet e. Em dibêjin, “Ger bibe jî dibe, nebe jî dibe”. Ger me çalakiyek daye pêşiya xwe, em dibêjin bibe jî dibe nebe jî dibe, tiştek nabe, em ê carek din bikin. Têgihiştin û şêwazê me ev e, yanî em xwediyê bê şêwaziyê ne. Ji ber vê ye ku em encamê nagirin.

Li cem Rêber APO her dem cesaret, kadro û gel esas e. Ji ber ku dijmin her tim îrade û wêrekiyê dişkîne. Tu yê jî her tim rê li îrade û wêrekiyê vekî. Ev şert e, ji bo tu karibî encamê bigirî. Lê belê bi tenê wêrekbûn meselan çareser nake. Tevî wêrekiyê tu yê derfetên serketinê, rê û şêwazê wê jî bidî fêmkirin. Tu yê bi kesan bidî îqnakirin ku bi rastî dikarin encamê bigirin. Ango tu yê li cem kesan wêrekî û zanebûnê çêkî. Divê kes bawer bike. Heke bawerî nebe ku bawerî bi xwe zanebûne, wê demê bi tenê bi wêrekiyê nabe. Gelek mirovên wêrek hene, xwe li vir wir didin, dema ku encamê jî nagirin tu dibînî ku wêrekiya wan dişkê. Ew mirovê pir wêrek di encamê de bûye newêrek. Ji bo ku wiha nebe divê li cem wêrekiyê

zanebûn jî hebe. Divê îrade hebe. Ji ber ku îrade bi zanebûnê dibe. Hingê kes wêrek dibe û ti carî naşkê û natirse. Di kîjan karî de dibe bila bibe hingê ew dikare bi wêrekî bi ser armanca xwe de biçe û encamê bigire. Di helwesta xwe de dudil û newêrek nabe. Bi însiyatîf û wêrek bi ser karê xwe de diçe. Mînak, Rêbertî hem wêrekiyê hem jî derfetên wê yên serketinê dide, wan herduyan bi hev re dide. Lewra mirov bi wê îqna dibe. Bi wê rehet dibe, lewra dikare kar bike û encamê bigire.

Rêbertî bi çi vê bi mirovan dide fêmkirin, bêguman bi jiyan, kesayet û şêwazê xwe. Mînak yê ku Rêbertî dîtî û pê re rûniştî derfetên serketinê dibîne û jê bawer dike. Rêbertî wê dide mirovan, yê ku hevaltî bi Rêbertî re kir wê vê esas bigire. Bi kê re hevaltî kir û bi kê re danûstand, wê vê li cem çêke. Kengî ev kir, hingê bi rastî hevaltiyê bi Rêbertiyê re dike. Hevaltiya ku dike hevaltiyek durust e, tê de sextekarî nîne. Heke ev tê de nebe, wê demê hevaltiyek kêm e, tê de sextekarî heye.

Em jî di hevaltiya xwe de yan kêm in, yan jî ters in. Mînak em nikarin wêrekiyê, derfetê wê yê serketinê, bidin mirovan û bi wan bidin fêmkirin. Em nikarin wan îqna bikin. Mînak herî zêde em çi esas digirin, ferman û emran em esas digirin. Em bi telîmat û emiran dixwazin bi mirovan bidin fêmkirin. Emir û telîmat her tiştî bi mirovan nadin fêmkirin. Hinek tiştan pê dide kirin, lê dema ferman û telîmat nebe ew mirov nikare tiştekî bike. Mirovê li vê serwext bibe, pêdiviyê pê bibîne û wisa kar bike. Ew jî bi çi çêdibe, dema te ruh da wî mirovî, dema ku te derfetên serketinê û bawerî da wî mirovî. Hingê ew mirov dikare kar bike. Ya girîng jî tu yê wî mirovî çêke, kengî te ew çêkir wê demê te ew mirov bidestxistiye. Dema ku te ew çênekir, ew mirov çiqasî di nav te de be jî bi ferman bimeşe jî ew mirov ne yê te ye. Kengî wê qut bibe û biçe ba dijmin nediyar e. Mirov nizane li ku û çawa wê xwe bigihîne dijmin.

Li cem serokatiyê di şêwazê meşandina karê dîplomasiyê de çi esas e? Yê li hemberî xwe fêmkirin e. Kesayeta wî çî ye, berpirsiyariya wî çî ye, ew di çi rewşê de ye û çawa nêzîkî meselan dibe. Hewl dide wî ji her aliyî ve fêhm bike. Kengî te yê li hemberî xwe fêm kir tu dikarî bi wî re têkiliyê pêşbixe. Tu yê li ser çi têkiliyê pêş bixe, bêguman li ser esasekî rast. Kesê li hemberî xwe yê ku tu pê re dikevî nav danûstandinê, kes be, rêxistin be, yan jî dewlet û mirovekî ji rêzê be, ger te ew fêm nekir tu yê çawa pê re danûstandineke rast

û qehîm pêş bixî? Yan tu yê şaş nêzîk bibî, yan jî tu nikarî wê têkiliyê pêş bixî û tu yê têk biçî.

Dîsa dibe ku tu yê bikevî şaştiyê u tu nikarî sûdê ji wê têkiliyê bigirî û heye ku tu bikevî bin bandor û xizmeta wê. Jixwe cîhana heyî em bînin ber çavan bi temamî cîhana berjewendiyan e, û nexasim berjewendiyên aborî esas digirin. Bi temamî berjewendiyên xwe yên siyasî û aborî esas digirin, heke ku tu vê rastiyê baş fêm nekî û di têkiliyên xwe de baldar nabî, wê demê tu av û av diçî. Tu her tiştî radestî wan dikî, tu wenda dikî û xizmeteke mezin ji wan re dikî.

Di karê dîplomasiyê de çiqasî fêmkirin esas e, ciddî nêzîkbûn jî esas e, bi berpirsiyarî nêzîkbûn jî esas e. Tu yê hem ji her alî ve fêm bikî û hem jî ciddî nêzîk bibî ku yê li hemberî te jî te ciddî bibîne. Ger bibîne tu ciddî nêzîk nabî, wê bêje wê demê di vir de tiştek heye. Ew jî ciddî nêzîkî te nabe. Çawa ku tu li gel mirovê pêşberî xwe de gelê wî, dewletê, rêxistinê, hedef û armancên wan dibînî, ew jî heman tiştî te de dibîne. Tu wexta dixwazî bi dewlet, kesayet yan jî bi rêxistinekî re bi navê PKK'ê rûnê, wê bixwazin te de asta PKK'ê, hedef û armancên PKK'ê û rewş gel û pirsgirêkan fêm bikin. Wê li gorî sekna te biryarê bide ka wê bi te re têkiliyê deyne û yan na. Yan jî eger dayne, wê li ser çi bingehî dayne. Lewma di vî karî de maneya her gotinê û her hereketê heye. Tu yê pir hesas nêzîk bibî, ger wiha nebe tu yê wenda bikî.

Yê li hemberî te mînak ji bo ku te fêm bike hinek tiştan diaxive. Tenê ji bo wê diaxive. Ka tu sivik î yan na, tu ji bo çi amade yî, ji bo çi ne amade yî, dixwaze fêm bike. Asta te çî ye, tu çiqasî fêm dikî û fêm nakî, dixwaze fêm bike. Li gorî wê bi te re têkiliyê pêşxe. Te diceribîne. Di vî karî de ji bo ku di dîplomasiyê de usluba serweran tê meşandin, her tişt eşkere nayê axaftin. Hinek tiştan eşkere diaxivin, ew jî pir kêm e. Ji sedî nod, tiştên diaxivin veşartî û neyekser in. Ger tu pir şiyar nebî tu nikarî fêm bikî. Tu dikarî av û av jî biçî. Tê wê jî bizanî. Mînak ji bo ku em vekirîbûnê esas digirin, em vekirî diaxivin. Lê belê cîhana ku heye û zêhniyeta ku li vê cîhanê heye, ne zêhniyeteke ku vekirîbûnê esas digire. Ji ber wê dplomasiya tê meşandin li ser wê hîmî nayê meşandin û bi temamî girtî ye û veşartî ye. Di nav xwe de veşartî ye. Ji gel û raya giştî veşartî dimeşîne. Kes tiştekî nizane, veşartîbûnê esas digire. Pir kêm tiştan vekirî diaxivin û tê şiyar bî ka çi dibêjin. Da ku tu fêm bikî. Gotinekî ne di cih de tu biaxivî tu her tiştî wenda dikî. Mînak hinek kes li

hemberî te dema diaxivin ji bo ku te fêm bikin, gotinan dikin, da ku te sorbikin hela ka tu çi dibêjî, di liv û tevgera te de hela çi derdikeve. Tu yê nerazîbûnê nîşan bidî yan na, tu yê bitirsî yan na, dixwazin van hemûyan fêm bikin. Mesela di axaftina wî de hedefê wî çî ye tê bixwazî fêm bikî. Dema ku xwest tu hêrs bibî, divê tu hêrs nebî, ger dixwaze tu reng bidî tê reng nedî, dema te da, wê demê tu têkdiçî û bindikevî.

Ji bo ku heval baş fêm bikin dema ku em nû çûn Filîstinê -piştî Darbeya Danzdê Êlûnê bû-rêxistineke Filîstinî ji bo ku rewşa me ya li welêt fêm bikin, ji me re wiha gotin: "hinde sîlah hene hûn dikarin di çalakiyan de bikar bînin?" Hevdîtinê de wisa gotin. Min bersiva wan wiha da "rewşeke me ya wiha nîne, ne jî em wan sîlahan dizanin. Hêzeke me ya wiha niha nîne, em wan sîlahan bi kar bînin." Ne ku bi rastî xwestin wan sîlahan bidin me. Xwestin me biceribînin û me fêm bikin. Ka em ê di têkiliyên xwe de xwe zêde mezin bikin, rastiya xwe cuda nîşan bidin, da ku em wan bixapînin yan na. Ew ji bo wê bû. Min bigota temam, gengaz bû ku bi me re qet têkilî çênekiriban. Lewra di karê dîplomasî de divê mirov şiyar be, da ku mirov nekeve şaşitiyan. Ger tu dixwazî hedefeke xwe pêkbînî, da ku tu derfetan ji bo xwe çêbikî, yê li hember jî dixwaze hedefan pêkbîne û derfetan ji bo xwe çêbike; heke tu di wir de ne şiyar bî, wê yê li hember ji bo xwe derfetan çêke. Tu jî yan kêm, an jî qet tiştekî bi dest naxî. Tê bikevî bin bandora wan û bikevî bin xizmeta wan. Jixwe li vê cîhanê jî kî bi kê re dixwaze têkiliyê pêşbixe dixwaze wî bi temamî bike bin xizmeta xwe. Em di nav cihaneke wiha de ne.

Niha gelek hevalên me hene diçin nav gel, dema yek xwarinekî dide wan, yan jî cilekî ji bo wan dikire, tu dibînî xwe difroşin. Dibêje "çawa hebe ew welatparêz e." Rêxistinê jî dike bin xizmeta wî/wê. Heke yekî xwarineke xweş nedabê dibêje "ev ne welatparêz e û welatparêziya wî lewaz e." Nêzîkî wî însanî nabe. Li kîjan mal xweşhal be, xwarina xweş lê hebe, cihê razanê yê xweş lê hebe, tu dibînî li wir e û dibêje "maleke stratejîk e." Hemû malên me stratejîk in, hemû însanên me ji bo me stratejîk in, ne hinek ji wan. Ew nêzîkbûn sextekarî ye, ew ne rêxitinbûn e, bi temamî xwe jiyîn e. Binêrin ka yên wiha kar dikin, ti karî nakin.

Lewra pêwîst e, em di karê xwe de, di têkiliyên xwe de hem axaftinên xwe hem jî liv û tevgera xwe de pir şiyar bin. Ev bi dewletekî

re dibe, bi rêxistinekî re dibe, bi derdor re dibe heta bi mirovekî re dibe divê wisa be. Heke em bi mirovekî re diaxivin, divê em wî mirovî dest bixin û em wî mirovî bi uslub û tevgera xwe nedin revandin. Yan jî em îmajekî xirab nedin çêkirin, heke em dixwazin wî mirovî bikin xizmeta xwe. Em wiha bikin ku ew mirov xeteriyê bijî, ger te ew îmaj dabê, ew mirov wê ji te bireve û tu nikarî wî bidî sekinandin.

Lewma ew ji mirov çi dixwaze, pîvanan, prensîban dixwaze û bi tewazinî tevgerê dixwaze. Lê belê di gelek hevalên me de bêpîvanî û bêtewazinî heye. Bi dewletan re, bi rêxistanan re, bi kesayetan re diaxive, lê tu dibînî tu bê qey ji xwe re diaxive. Yê li hemberî wî fêm dikin û dibînin ku ew kes besît e. Ew mirovên li wir dibêjin, wê demê ew rêxistin jî besît e. Ji ber ku yê diaxive besît e, wê demê pêwîstiya dan û standinê jî nabînin, cidî nêzîk nabin.

Mînak li Suriyê tesfiyê çi kir? Ji bo ku têkiliyên me û Suriyê xerab bikin û me neçarî Emerîkayê bikin, bi zanebûn xwestin têkiliyên me û Suriyê xerab bikin, jixwe kirin jî. Çawa kirin, li wir Rêbertî bi salan mabû û têkiliyên me bi rêyekî re dihate meşandin. Botan çû got, “pêwîst e em derveyî vê rêka têkiliyan, rêyeke din pêşbixin, da ku em baştir bikaribin encamê bigirin. Ev rêk zêde ji bo me encamê nade.” Ketin nav wê lêgerînê, Suriyê çawa pêhesiya hema girt. Hinek heval girtin û teslîmî Tirkiyê kirin. Botan hema revî û hat welêt, ew kir û revî hat. Bi zanebûn ew kir. Wek çawa Rêber APO aqil nake ku bi rêyeke din veke, ew aqil dike. Yê ku ew têkilî pêşxist, di serî de heta komployê jî Rêber APO bû. Rêber APO ew têkilî û rê pêşxistibû. Her dem kar dikir da ku wê têkiliyê bihêz bike.

Lê tê biçî wê qenalê terk bikî û bixwazî qenaleke din di nav dewletê de vekî, ev dibe karekî çawa? Ev karê sîxûran e, sîxûr karê wiha dikin. Dîplomasiyê de dewlet bin, rêxistin bin, heta eşîretan de jî wezîfedar dikin, wê kî bi kê re têkiliyan bimeşîne. Yê didin û distinîn jî wê bi kê re bimeşînin wan wezîfedar dikin. Di pêşxistina dan û sitandinan de heman rêk û kes diyar dibin. Wiha nebe têkilî pêşnakevin.

Ev kaîdeya ewqas besît e. Baş e, Botan wan ev fêm nedikirin, fêm dikirin. Lê bi zanebûn ew kirin da ku têkiliyên me û Suriyê xerab bikin û me neçarî Emerîkayê bikin. Ew ji bo wê bû. Jixwe wiha têkilî xirab jî kirin. Ti car mirovê nekeve vê rewşê. Mînak li Rusyayê têkiliyek hebû, wê demê Berxwedan li wir bû, wî çû derveyî wê bi

hinekên din re xwest têkiliyan çêbike, ew jî saziya dewletê bû, her du jî saziyên dewletê bûn; dewlet ew sazî ji bo te diyar kiriye, lê tê biçî bi saziyeke din re têkiliyê deynî! Dewletê çi kir got, "bila vir terk bikin." Ew nêzîkbûn bû sedema ku dewletê hemû têkiliyên me cemidandin. Ev karê sîxuran bû, sîxur karê wiha dikin. Berxwedan wan xwestin ji wê qenala dewletê destnîşan kirî derkevin, lewra ji bin çavdêriyê derkevin. Da ku ji xwe re qenalên din vekin, karê sîxûriyê bikin. Ew ji bo wê bû. Kes vê qebûl nake, tavilê diçin bi ser de. Heke li Suriyê û Rusyayê em bi wan birsgirêkan re rû bi rû man, ji ber wê bû. Wê demê mirovê nekeve bêtewaziniyê û bêpîvaniyê.

Hinek tu dinêrî dewsa li ser rêxistinê biaxivin, li ser xwe diaxivin. Çiqas mezin e û çiqasî qehreman e, xwe bi van gotinan mest dike. Yên wiha biçin nav gel, wê gel çawa şiyar bikin, zane bikin. Wê çawa cihekî di dilê gel de ji bo xwe çêbikin, wê çawa gel bîirade bikin, eşkere ye wê van nekin. Wê xwe esas bigirin û xwe bidin axaftin. Li ku be wê qala qehremantî û mezinahiya xwe bikin. Ji ber vê tiştekî çênakin. Ji bo ku gel bike xizmeta xwe, wiha daxivin. Ti têkiliya van bi Rêbertiyê re nîne. Sedî sed ev têgihîştin û pratîk li dijî Rêbertiyê ne.

Em ê Şêwazê Vê Tevgerê Ji Bo Xwe Esas Bigirin

Şêwaz biqasî îdeolojî û felsefê girîng e. Şêwaz bi mirovan dide qezenckirin, bêşêwazî jî bi mirovan dide wendakirin. Ji ber wê girîng e. Heke ku em naxwazin wenda bikin, divê em şêwazê vê tevgerê ji bo xwe esas bigirin, ji ber ku em milîtanê vê tevgerê ne. Em nikarin şêwazên din ji bo xwe esas bigirin. Şêwazên YNK-PDK'ê yan jî hêzên din, em nikarin li gel xwe pêşbixin. Ji ber ku em milîtanê vê tevgerê ne.

Em ê hem milîtanê vê tevgerê bin, hem jî şêwazekî din bidin pêşberî xwe. Wê demê bêşêwazî û bênasnemeyî derdikeve pêşberî mirov. Li gundê me ji yên wiha re digotin 'toltajî'. Ango ne tajî ye ne jî se ye, di navbera her du yan de ye. Ev derdikeve ku çî ye ne diyar e. Ji bêşêwaziyê ti carî mirov nikare encamê bigire. Di bêşêwaziyê de her tim wendakirin heye, êş heye, pirsgirêk hene. Pêwîst e, ev wiha bê fêmkirin. Yê ku bi rastî dixwaze bi Rêbertiyê re hevaltiyê bike, ne hevaltiya sext e, ya rast wê bi temamî şêwazê Rêbertiyê esas bigire. Wê uslubê Rêbertiyê, tempoya Rêbertiyê esas bigire. Di şer de, di rêveberiyê de, di xebatê de, nêzîkbûna ji pirsgirêkan re, nêzîk-

bûna ji nirx û jiyan avakirinê re, nêzîkbûna ji însan re hwd… di her nêzîkbûnê de, di her têkoşînê de, wê uslub û tempoya Rêbertiyê ji bo xwe esas bigire. Da ku bikaribe encamê bigire. Da ku bikaribe xeta rêxistinê bimeşîne û hêza rast pêkbîne. Li derveyî vê hevaltî bi Rêbertiyê re nabe. Wê ji her aliyî ve Rêbertiyê ji bo xwe esas bigire. Bi temamî wê terciha xwe li ser vî esasî pêşbixe.

Rêber APO ji sifirê dest pêkir û gihand roja me ya îro. Bi temamî ew pêşketin û derfet bi şêwazê xwe, bi zêhniyeta xwe çêkir. Kesekî tiştek neda Rêber APO û PKK'ê. Hemû destkeftiyên PKK'ê û gelê Kurd bidestxistî ne û hemû di encama keda xwe de bidestxistiye. Vê tevgerê û gelî çi bidestxistiye, bi Rêber APO bidestxistiye. Bi şêwaz û zêhniyeta wî bidestxistiye, ev ji sedî sed e. Ev çî ye, di kesekî de rêxistinek, gelek û dîrokek pêkanîn e. Rêber APO di kesayeta xwe de rêxistinek, gelek, dîrokek çêkir, di wê dîrok, gel û rêxistinê de her tim xwe afirand. Şêwazê ku meşandî ye ev e. Yê ku pê serkeftin û pêşketin çêkirî jî ev e. Her milîtanek wê vî şêwazî ji bo xwe esas bigire. Wê di xwe de rêxistin, gel û dîrokê çêbike û bi wan re jî xwe çêbike. Dema ku ev esas girt, dibe hevalê Rêbertiyê. Yê din hemû axaftin in û qîmete wan nîne.

Heke bi rastî em hevalê Rêbertiyê yên rast in, yan jî em dixwazin bibin hevalên Rêbertiyê yên rast, ger em dixwazin serkeftî bin, ger em dixwazin vê bi rêxistin û gel bidin jiyîn, pêwîst e, em şêwazê Rêber APO ji bo xwe esas bigirin. Dibe ku di hizir de tam kûranî çênebe, lê kes li dijî hizirên Rêbertiyê dernakeve. Kesên tesfiyeger jî li dijî hizirên Rêbertiyê derneketine. Qebûl dikirin. Çi qebûl nedikirin, şêwazê Rêber APO yê rêxistinê, yê têkoşînê qebûl nedikirin. Ji ber vê pirsgirêkên di kadroyên me de tên dîtin, ji fikir zêdetir, di şêwaz de derdikeve. Di bingeh de ev çi îfade dike, raman qebûl nekirinê dide diyarkirin.

Dema em bixwazin fêm bikin ka yek ramanê me, felsefeya me, îdeolojiya me qebûl dike yan nake, em ê şêwazê wî binêrin. Kê bi rastî îdeolojî û felsefeya Rêbertiyê qebûl kiribe, di pratîka xwe de wê pêktîne. Çiqas pêkanîbe, wê demê ewqas jî îdeolojî û felsefe qebûl kiriye. Yê ku îdeolojî û felsefê qebûl nake, wê demê şêwazê xwe jî pêşnaxe. Yên ku nakevin nav şêwaz ji ber vê nakevinê. Bêşêwaz mayîn jî ji ber wê ye. Bi rastî yê ku îdeolojî û felsefeya tevgerê qebûl dikin, yan nakin tê li ku bizanî, tê di pratîka wan binêrî. Pratîka wan rastiya wan îfade dike. Tê hem îdeolojiya vê rêxistinê qebûl bikî û

hem jî ji bo wê kar nekî û ji bo serkeftina wê kar nekî û encamê negirî! Ev nakokî ye, ne gengaz e.

Heke zêhniyeta Rêbertiyê û şêwazê Rêbertiyê me ji bo xwe esas girt, wê demê em dibin hevalên Rêbertiyê yên rast. Ya ku me bike hevalê rast ev e. Ya ku me û gelê me serbixe ev e. Dema me ev esas girt, ti hêz nikare li pêşiya me xwe bigire. Îspata vê jî dîroka vê tevgerê ye. Di serî de heta niha gelek hêz pêşberî vê tevgerê sekinîn, lê nikarîn serkevin. Zêhniyet û şêwazê vê tevgerê nehiştiye ku hêzên dijber hedefên xwe pêkbînin. Çi dema tevger di zêhn û şêwazê xwe de lewaz ket, wê demê hêzên dijber gav li hember tevgerê avêtin. Demên ku vê tevgerê bi zêhniyet û şêwazê xwe re, xwe kir yek û li ser wî esasî gav avêt, tevgerê kariye hemû komplo, êrîş û hewldanên tesfiyegerî pûç derxe. Rastiya wê ev e ku pêşketin pêkaniye. Ev dîroka vê tevgerê ye. Ev dîroka ku mirov encam û dersan jê derbixe ye.

## Azadiya Rêbertiyê Çareserkirina Pirsgirêka Kurd e

Di vê pêvejoyê de me hedef û biryarên xwe destnîşan kir. Hedef û biryarên me girtine hene. Me azadkirina Rêbertiyê wek biryarê herî mezin û esasî girtiye. Biryarên din hemû girêdayî vê ne. Çî ye ev biryar, azadkirina Rêbertiyê ye. Yanî pirsgirêka Kurd çareserkirin e. Ji ber ku azadiya Rêbertiyê, pirsgirêka Kurd kirina rêya çareseriyê ye. Me ev da pêşberî xwe. Hedefeke wiha zelal û mezin me da pêşberî xwe. Pêwîst e, hemû têkoşîna me li ser vî hedefî be û di xizmeta vê hedefê de be. Heke ku me xwe li gorî vî hedefî rêxistin kir, me pratîk pêşxist, em dikarin vî hedefî pêkbînin.

Ji ber wê em pêvajoya "Êdî Bes e!" çend sal e dimeşînin. Me gotiye êdî bi vê hemlê em ê sîstema Îmralî nejîn. Me ev biryar girtiye. Di kongreya dehemîn de ev biryar hate girtin. Ji ber wê, me got azadiya Rêbertiyê hedef e. Ango vê sîstemê em red dikin û êdî em nikarin pê re bijîn. Li ser wê, me ew biryar daye, êdî pratîkbûna xwe bi temamî li ser vê pêşbixin. Da ku em bikaribin vî hedefî pêkbînin. Em dibêjin êdî ji dagirkeriyê re bes e, ji siyaseta îmha û înkarê re êdî bes e! Em dibêjin sîstema li ser desthilatiyê hatiye avakirin re êdî bes e! Ji koletiyê re em dibêjin êdî bes e! Ji ber wê hemû têkoşîna me pêwîst e, li gorî azadiyê be, pêngav û hedef ev e. Heger ku me di pratîkê de gav li ser vî esasî avêt, wê demê em rêya rast de ne û em di xizmeta xetê de ne. Heger em wiha kar bikin ti hêz nika-

re li pêşiya me bigire. Dibe ku em hinek êşan bikişînin, bedelan jî bidin, lê kes nikare li pêşiya wê bigire, encamgirtina me ji sedî sed e.

Niha dijmin dizane em li ser vî esasî dixwazin xwe pratîze bikin. Ew jî çi dikin, pergala moderníteya kapîtalîst, dagirker, noker û xayînên Kurd hemûyê didin hev, ka wê çawa pêşiya vê pêngavê bigirin. Wê çawa bikin ku nehêlin em vî hedefî pêkbînin. Wê çawa bikin ku pêngava me pûç bikin. Wê çawa bikin ku me tesfiye bikin. Me bifetisînin, ew jî vê didin pêşberî xwe. Ger heval bala xwe didinê dema me got, kongreyê azadiya Rêbertiyê esas girtiye, dewleta Tirkiyê jî bi ser Rêbertiyê de çû. Îşkence û gefên mirinê lê kirin. Peyamek da me, gotin: 'pêwîst e hûn azadiya Rêbertiyê esas negirin. Heger hûn ji bo wê kar bikin û kar mezin bikin, em ê jî rêbertiya we bikujin. Pêwîst e hûn wê gavê neavêjin.' Wiha bersiv dane me. Gef xwarin û şantaj kirin, da ku me bitirsînin û em gavan paş de biavêjin. Me gav paş de neavêt. Em navêjin jî. Gav paş de avêtin, jixwe mirina me pêktîne. Çiqasî em gavan pêş de biavêjin, em ê rojekî rojan zûtir di pêş de bigihîjin hedefên xwe. Di gav pêş avêtinê de mirin nîne, serkeftin û hedef pêkanîn heye. Pêwîst e, kadro vê rastiyê baş fêm bikin. Ew gef û şantaja dijmin, ew planê ku li ser me dixwazin bimeşînin, dibe sedema em têkoşînê mezintir bikin, da ku em hedefên xwe pêkbînin. Ji ber vê pêwîst e, karê ku dijmin dike, gefên ku dixwe û konsepta ku li dijî me dimeşîne, komploya dimeşîne, divê em ji her milî ve baş fêm bikin. Ev fêm kirin, di zanebûna azadiyê de gaveke mezin avêtin e. Di rêxistinbûn û çalakiya wê de gav avêtin e, serkeftin e.

Em mehkumê vê ne, mehkumê serkeftin û azadiyê ne. Azadiya Rêbertiyê ne. Me ji bo wê biryar girtine û ji bo wê sond xwariye. Em milîtanê vî gelî û vî Rêbertiyê ne. Em milîtanê fedayî ne, weke Rêbertiya xwe. Ji ber ku Rêbertiya me rêbertiyeke fedayî ye, em jî milîtanê vî Rêbertiyê ne. Em jî fedayî ne. Bi Rêbertiyê re hevaltî kirin, bi Rêbertiyê re hatina girêdan, bi axaftinê nabe. Ev bi çi çêdibe, bi taybetmendiyê Rêbertiyê ji bo xwe esas girtinê çêdibe. Bi zêhniyeta Rêbertiyê fikirandinê çêdibe. Bi şêwazê Rêbertiyê tevgerînê çêdibe. Bi temsîliyeta jiyana Rêbertiyê kirinê çêdibe. Bi tarzê têkoşîna Rêbertiyê têkoşanê çêdibe. Ya ku me bike hevalên Rêbertiyê yên rast, ev e. Eger li ser van esasan em hevaltiyekî pêşbixin, ew hevaltî û girêdan dibe ya rast. Ev jî bi xwe re ji sedî sed encamê tîne. Me soz daye ku, em xwedî sozên ku em didin derkevin.

Lewra em dixwazin bi pratîka xwe vê îsbat bikin. Bi her kesî jî, ew bi kîjan zimanî dixwazin bidin fêmkirin. Me biryara wê da, sonda wê xwar. Pêvajoya ku em tê de ne û lê derbas dibin, em ê vê bi her kesî jî bidin fêmkirin. Her milîtanê vê tevgerê di vê pêvajoyê de wê li ser vî esasî bimeşe. Di vê pêvajoyê de her milîtanekê bi van erk û berspirsiyariyan, we biçe ser karên xwe. Wê berpirsiyariya xwe wiha pêkbîne.